



KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

'ADAT Û RUSÛMATNAME'Ê
TEWAYIFÊ EKRADEYEA MELA MEHMÛDE BAZÎDÎ
(Metn û Lêkolîn)

Murat ÇELİK

12711008

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2015

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

‘ADAT Û RUSÛMATNAME’Ê
TEWAYIFÊ EKRADEYEA MELA MEHMÛDE BAZÎDÎ
(Metn û Lêkolîn)

Murat ÇELİK

12711008

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn 2015

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum ‘**Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiyeya Mela Mehmûdê Bazîdî (Metn û Lêkolîn)** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../.....

Murat Çelik

KABUL VE ONAY

Murat Çelik tarafından hazırlanan ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiyeya Mela Mehmûdê Bazîdî (İnceleme ve Metin) adındaki çalışma, 19/11/2015 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında YÜKSEK LİSANS TEZİ olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

[Unvanı, Adı ve Soyadı] (Başkan)

KURTEBÊJE

amd.	: Amadekar
B.	: Berg
Bnr.	: Binêre
ç.	: Çap
çap.	: Çapxane
H.b.	: Heman berhem
H.c.	: Heman cih
H.g.	: Heman gotar
H.r.	: Heman rûpel
Hwd.	: Her wekî din
j.	: Jimare
KT	: Komara Tirkiyeyê
nd.	: Nivîskarên din
r.	: Rûpel
vgz.	: Veguhêz
wer.	: Wergêr
weş.	: Weşanxane

KURTE
‘ADAT Û RUSÛMATNAME’Ê TEWAYIFÊ EKRADIYEYA
MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ
(Metn û Lêkolîn)

Di vê tezê de li ser ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiyeya Mela Mehmûdê Bazîdî, jiyana wî û hevkarîya wî ya li gel Auguste Jaba lêkolîn hatiye kirin. Lêbelê beriya ku Bazîdî û berhemên wî bîn nirxandin bi kurtasî qala rojhilatnasiyê jî hatiye kirin.

Tez ji xêncî pêşgotin, destpêk û encamê ji çar beşan pêk tê. Di destpêkê de armanc û çarçoveya tezê hatiye ravekirin û her wiha behsa rêbaza lêkolîna tezê hatiye kirin û çavkaniyên sereke yên ku hatine bikaranîn jî hatine nasandin.

Di beşa yekem de di serî de têgehên rojhilatnasî, rojhilata navîn, kurd, Kurdistan û kurdolojiyê hatine nirxandin. Lê ji wan têgehan ya herî zêde li ser hatiye sekinîn, kurdolojî ye. Ango kurdolojiya ku wekî şaxeke rojhilatnasiyê reng vedide, hatiye destnîşankirin. Helbet A. Jabayê konsolosê Rûsyayê yê Erziromê jî bû xaleke vê tezê. Ji ber vê hindê jiyana, xebatên wî û têkilî û hevkarîya wî ya bi Bazîdî re bûn beşeke girîng ya vê lêkolînê. Ev mijar hemû, gav bi gav ji bo xuyabûna cihê Bazîdî û xebatên wî yên di dîroka edebiyata kurdî de hatin lêkolînkirin.

Di beşa duyem de wekî pêngava duyemîn, jiyana û berhemên Bazîdî hatine vegotin. Li pey wê re hevkarîya Bazîdî û Jaba û berhemên wekî xulesaya vê xebata hevpar ya herdu zanyaran derketine holê hatine nîşandan. Berhemên Bazîdî di bin 6 serenavên wekî dîrok, ferheng, rêziman, wêje, folklor û civaknasiyê de li gor 19 binnavan hatine nirxandin.

Di beşa sêyem de ji berhemên Bazîdî ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiyeya ku ji bo vê tezê bûye mijara nirxandinê, babetên wê yên bûne egera rexneyan yên derheqê eslê kurdan û zimanê wan de hatine hilsengandin. Berhem ji hêla nusxeyên wê, dema nivîsê, qebareya wê, zimanê wê ve hatiye şîrovekirin û cihê wê yê di dîroka edebiyata kurdî de hatiye nîşandan. Her wiha xebatên li ser ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiyeya, hatine danasîn. Di vê çarçoveyê de wergerên wê yên bo 6 zimanan, şîroveyên wê hatine nirxandin. Peyra li ser naveroka wê hatiye rawestan û mijarên wê bi hûrgilî hatine nirxandin.

Di beşa çarem de jî li gor herdu nusxeyên ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye tîpguhêzî û edîsyon-krîtîka wê ya ku bi destê me hatiye kirin, heye. Lê beriya vê xebata me tîpguhêziyên wê yên latinî yên bi destê kesên cuda amade bûne hatine danasîn. Her wiha di vê beşê de me qala rêbaza xwe ya tîpguhêziyê jî kir. Di vê tîpguhêziyê de, berhem li gor eslê wê û bêyî ku were guherandin ji tîpên erebî bal bi tîpên latinî hatiye veguhaztin. Her wiha cudahî û kêmasiyên di navbera herdu nusxeyan de hatine kifşkirin. Li cihên pêwîst jî bi jêrenotan agahî hatine dayîn.

Bêjeyên Sereke: Mela Mehmûdê Bazîdî, ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye, Auguste Jaba, Kurdolojî



ÖZET
MOLLA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ'NİN 'ADAT Û
RUSÛMATNAME'Ê TEWAYİFÊ EKRADIYE ADLI RİSALESİ
(İnceleme ve Metin)

Bu tezde Molla Mehmûdê Bazîdî'nin 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye (Kürtlerin Örf ve Adetleri) adlı kitabı, yaşamı ve Auguste Jaba ile birlikte yaptığı çalışmalar üzerinde durulmuştur. Ancak bu çalışmada Bazîdî ve eserleri değerlendirilmeden önce kısaca şarkiyatçılığa da değinilmiştir.

Önsöz, giriş ve sonuç haricinde, tez dört bölümden meydana gelmektedir. Girişte tezin amaç ve çerçevesi açıklanmış, takip edilen metot anlatılmış ve kullanılan ana kaynaklar tanıtılmıştır.

Birinci bölümde başta şarkiyatçılık olmak üzere Ortadoğu, Kürt, Kürdistan ve Kürdoloji kavramları incelenmiştir. Ancak bu kavramlardan üzerinde en çok durulanı, Kürdolojidir. Şarkiyatçılığın bir dalı olarak gelişmekte olan Kürdolojiye bu yüzden dikkat çekilmiştir. Buna bağlı olarak Rusya'nın Erzurum konsolosu olan A. Jaba da bu tezde değerlendirilmiştir. Dolayısıyla hayatı, çalışmaları, Bazîdî ile olan bağlantısı ve ortak çalışmaları tezin önemli bir bölümünü oluşturdu. Bu konuların tümü Bazîdî ve çalışmalarının Kürt Edebiyatı Tarihindeki yerinin tespiti için incelenmiştir.

İkinci bölümde Bazîdî'nin hayatı ve eserleri incelenmiştir. Ardından Bazîdî ve Jaba'nın ortak çalışmaları ve bu iki bilim adamının araştırmalarının neticesinde ortaya çıkan eserler tanıtılmıştır. Dolayısıyla Bazîdî'nin eserleri tarih, sözlük, dilbilgisi, edebiyat, folklor ve sosyoloji olarak 6 başlık ve 19 alt başlık altında incelenmiştir.

Üçüncü bölümde Bazîdî'nin eserlerinden tezin inceleme konusu olan 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye'nin eleştiri konusu olan Kürtlerin kökeni ve dillerine dair kısımları ele alınmış, nüshaları, yazım tarihi, hacmi ve dili incelenerek Kürt Edebiyatı Tarihindeki önemine dikkat çekilmiştir. 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye hakkında yapılmış çalışmalar tanıtılmıştır. Bu meyanda farklı dillerde yayınlanmış 6 çevirisi ve şerhleri değerlendirilmiştir. Ardından kitabın içeriği üzerinde durulmuş ve konusu etraflıca incelenmiştir.

Dördüncü bölümde eserin farklı iki nüshası esas alınarak bizim tarafımızdan yapılan transkripsiyonu ve edisyon-kritiki yer almaktadır. Ancak çalışmamıza

geçmeden önce bu eserin farklı kişilerce Latin alfabesine yapılan transkripsiyonları tanıtılmıştır. Ardından aslına uygun olarak yapılan bu transkripsiyonda izlenen metot hakkında bilgi verilmiştir. Bu çalışmada gerekli görülen yerlerde dipnotlarla izahat yapılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Molla Mehmûdê Bazîdî, ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye, Auguste Jaba, Kürdoloji



ABSTRACT
MULLAH MEHMÛDÊ BAZÎDÎ'S BOOKLET OF 'ADAT Û
RUSÛMATNAME'Ê TEWAYIFÊ EKRADIYE'
(Text and Analysing)

This research focuses on Kurdish historian Mullah Mehmûdê Bazîdî, his booklet 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye' (Habits and Customs of Kurds) as well as studies conducted with Ottoman-era Russian Consulate of Polish origin to Erzurum province Auguste Jaba. However, the research briefly mentions about orientalism before evaluating Bazîdî and his works.

The thesis is composed of four chapters except from a preface, introduction and conclusion. The introduction explains purpose and frame of the thesis and its method as well as giving information about the main references.

In the first chapter, orientalism and the concepts of Middle East, Kurd, Kurdistan and Kurdology are discussed. But the mostly focused concept is Kurdology. Attention is mostly attached on Kurdology, which has been developing as a separate branch of the orientalism, due to its relation with the other concepts. Accordingly, the research also discusses Jaba. Therefore, Jaba's life, works, relation with Bazîdî and his joint works with Bazîdî constitute a key part of the thesis. All of these issues are discussed to ascertain position of Bazîdî and his works in history of Kurdish Literature.

The second chapter includes Bazîdî's life and works, giving information about joint works of Bazîdî and Jaba as well as pieces that emerged after these two scientists' researches. Therefore, Bazîdî's works are studied under six titles and 19 sub-titles as history, dictionary, grammar, literature, folklore and sociology. Copies of 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye', which is the research's subject, are studied in terms of writing date, volume and language in order to pay attention to its importance in Kurdish Literature history.

The third chapter gives information about the 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye' and discusses origin of Kurds and their language, which is the subject of criticism of the booklet. In addition, it studies the booklet's copies, written date, volume and language, while attaching importance on its position in Kurdish literature. In this sense, this booklet's six translations, commentaries and transcriptions into Latin

alphabet were assessed. Later, the content and subject of the booklet were studied in detail.

The last chapter includes the transcription and edition-critique issued by us with regarding the two different copies of the piece. However, before moving to the research, the transcriptions into Latin alphabet by different people were introduced. Then, information was given about the method used in this transcription and also explanations were given with annotations in accordance with its originality.

Key Words: Mullah Mehmûdê Bazîdî, 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye', Auguste Jaba, Kurdology



NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	III
ABSTRACT	V
NAVEROK	VII
PÊŞGOTIN	XIV
DESTPÊK	1
1. Armanc û Çarçove.....	1
2. Çavkanî û Rêbaz.....	3

BEŞA YEKEM

KURTENÊRÎNEKE GIŞTÎ LI ROJHILATNASÎ Û KURDOLOJIYÊ

1. Rojhilatnasî.....	5
1.1. Bingeha Rojhilatnasyê.....	6
1.2. Di Dîroka Rojhilatnasyê de Rojhilata Navîn.....	7
1.2.1. Rojhilata Navîn.....	7
1.2.2. Kurd.....	10
1.2.2.1. Eslê Kurdan.....	11
1.2.2.2. Kurdistan.....	12
2. Kurdolojî.....	14
2.1. Kurtedîroka Kurdolojiyê.....	16
2.1.1. Îtalya.....	18
2.1.2. Fransa.....	20
2.1.3. Almanya.....	21
2.1.4. Amerîka.....	23
2.1.5. Îngiltere.....	24
2.1.6. Rûsya.....	24
2.2. Auguste Jaba.....	28
2.2.1. Jiyana Wî.....	28
2.2.2. Navê Wî.....	29
2.2.3. Xwendina Wî.....	30
2.2.4. Konsolosiya Wî.....	30
2.2.5. Zewaca Wî.....	31

2.2.6. Jaba û Polonya.....	31
2.2.7. Jaba li Erziromê ye.....	33
2.2.8. Jaba li Îzmirê ye.....	33
2.3. A. Jaba û Xebatên Wî Yên li Ser Kurdî.....	34
2.3.1. Paşxaneyê Berhevkarîya Jaba.....	36
2.3.2. A. Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî.....	34
2.3.3. Destxetên Peşîn Yên Jaba Berhev Dike.....	37
2.3.4. Li Akademiyê Nirxandina Destxetan.....	37
2.3.5. Pirtûkxaneyê Jaba.....	41
2.3.6. Çawaniya Karê Jaba.....	42

BEŞA DUYEM

MELA MEHMÛD, JIYAN Û BERHEMÊN WÎ

1. Mela Mehmûdê Bazîdî.....	44
1.1. Jidayikbûn û Wefata Wî.....	44
1.2. Navê Wî; Bazîdî an Bayezîdî.....	46
1.3. Perwerdeya Wî.....	46
1.4. Cihê Bazîdî yê di Civakê de.....	47
1.5. Xebatên Mela Mehmûdê Bazîdî yên li Erziromê.....	50
1.6. Berhemên Wî.....	51
1.6.1. Dîrok.....	53
1.6.1.1. Şerefnameya Şerefxan Bedlîsî.....	53
1.6.1.2. Kitêba Tewarîxî Cedîdî Kurdistan.....	53
1.6.2. Ferheng.....	54
1.6.2.1. Ferhenga Kurdî-Fransî (Dictionnaire Kurde Francais)	54
1.6.2.2. Ferhenga Rûsî-Fransî-Kurdî û Kurdî-Rûsî-Fransî.....	54
1.6.2.3. Ferhenga Kurdî ya Devoka Hekarî-Rewendî.....	55
1.6.3. Rêziman.....	55
1.6.3.1. Rêzimana Erebi bi Zimanê Kurdî.....	55
1.6.3.2. Risaleyî Tuhfe en-Nehlan fî ez-Zimanî Kurdan.....	56
1.6.4. Wêje.....	57
1.6.4.1. Çîroka Mem û Zîn.....	58
1.6.4.2. Çîroka Leyla û Mecnûn.....	58
1.6.4.3. Çîroka Siyamend û Şemsê.....	59

1.6.4.4. Hikayeta Şêxê Sen'an.....	59
1.6.4.5. Yûsif û Zuleyxaya Selimê Silêman.....	59
1.6.4.6. Kela Dimdimê.....	59
1.6.4.7. Wergera Îskendernameya Gencewî.....	60
1.6.5. Folklor.....	61
1.6.5.1. Berhevoka Şîret û Gotinên Pêşyan.....	61
1.6.5.2. Berîte, Lawij û Kilamên Kurmancî.....	61
1.6.6. Civaknasî.....	61
1.6.6.1. Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan.....	61
1.6.6.2. 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye.....	65

BEŞA SÊYEM

‘ADAT Û RUSÛMATNAME’Ê TEWAYIFÊ EKRADIYE

1. Nirxandinek li ser ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye.....	66
1.2. Li Gor Mela Mehmûdê Bazîdî Eslê Kurdan.....	66
1.2.1. Îtirazên li vê Nêrîna Bazîdî.....	67
1.2.2. Di Şerefnameyê de Kurd.....	68
1.2.3. Di Dîroka Kurd û Kurdistanê ya M. Zekî Beg de Kurd.....	71
1.3. Li Gor Mela Mehmûdê Bazîdî Zimanê Kurdan.....	71
1.3.1. Zimanê Kurdî û Farisî.....	72
1.3.1.1. Zimanê Medan-Farisiya Kevn.....	72
1.3.1.2. Zimanê Partî-Farisiya Navîn.....	73
1.3.1.3. Zimanên Îranî Yên Nû.....	74
1.3.1.3.1. Farisiya Nû.....	74
1.3.1.3.2. Osetkî.....	74
1.3.1.3.3. Peştunkî.....	74
1.3.1.3.4. Beluckî.....	74
1.3.1.3.5. Kurdî.....	75
1.3.2. Zimanê Kurdî û Erebî.....	76
2. Navê Berhemê.....	77
2.1. ‘Adat û Rusûmatname’ê Ekradiye an ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye?.....	77
2.2. Dema Nivîsandina Berhemê.....	78
2.3. Nusxeyên Berhemê.....	78

2.3.1. Nuxeya Nivîskar.....	78
2.3.2. Nuxeya Duduyan.....	79
3. Taybetiyên Berhemê.....	80
3.1. Zimanê Berhemê.....	80
3.1.1. Devoka Berhemê.....	81
3.1.2. Zimanê Wê Demê û Îro.....	81
4. Di Berhemê de Peyvên Biyanî.....	82
4.1. Peyvên Farisî.....	82
4.2. Peyvên Erebi.....	82
4.3. Peyvên Tirkî.....	82
4.4. Peyvên Ermenîkî.....	83
5. Cureyê Berhemê.....	83
6. Di Dîroka Edebiyata Kurdî de Cihê Wê.....	84
7. Xebatên li Ser ‘Adat û Rûsnameyê Ekradiye Hatine Kirin.....	90
7.1. Gotara Maria Paradowskayê.....	90
7.2. Ferhengoka ku Hemîd Kiliçaslan Amade Kiriye.....	91
7.3. Ravekirin, Tîpguhêzî û Lêkolîna Jan Dost.....	91
8. Wergerên Berhemê.....	93
8.1. Fransî.....	93
8.2. Rûsî.....	94
8.3. Erebi.....	94
8.4. Soranî.....	95
8.5. Farisî.....	95
8.6. Tirkî.....	95
9. Di Berhemê de Folklor.....	96
10. Naveroka Berhemê.....	97
10.1. Eslê Kurdan.....	99
10.2. Zimanê Kurdan.....	100
10.3. Çend Biwêjên Kurdî û Çîrokên Wan.....	100
10.3.1. Li Dorê Gerîn.....	101
10.3.2. Ketina Çînaqê.....	101
10.3.3. Li Pîl Nihêrîn.....	102
10.4. Gotinên Pêşîyan.....	103
10.4.1. Şerê Kopekan li Ser Dêlan in.....	103

10.4.2. Mirîn Riya Me Hemûyan e.....	103
10.4.3. Hekîm Xudê ye, Derd û Derman Herdu jî ji Nik Wî ne.....	104
10.5. Dua û Nifir.....	105
10.5.1. Bismillahirrehmanirrehîm.....	105
10.5.2. Elhemdu Lîllahî Rebbîl ‘Alemîn.....	106
10.5.3. Wesselatu ‘Ela Muhemmedîn We Alîhî Ecme‘în.....	106
10.5.4. Dame ‘Edluhû.....	107
10.6. Bîr û Baweriyên Kurdan.....	107
10.6.1. Dîn û Mezheb.....	107
10.6.2. Îbadet û Taet.....	108
10.6.3. Baweriya Wan ya bi Ziyaret û Ocaxan.....	109
10.6.4. Baweriya Wan ya bi Fal, Mîncim û Efsûnê.....	110
10.6.5. Baweriya Wan ya bi Şomî û Oxirê.....	111
10.6.5.1. Şomiya Rêwîtiyê.....	111
10.6.5.2. Şomiya Hin Tiştên Curbecur.....	111
10.6.5.3. Nezer.....	111
10.6.5.4. Wateya Hin Bûyeran.....	112
10.7. Jina Kurd.....	114
10.7.1. Di Malê de Jin.....	114
10.7.2. Di Nav Civakê de Jin.....	115
10.7.3. Di Şer û Silhê de Jin.....	115
10.7.4. Di Şîn û Şahiyan de Jin.....	116
10.7.5. Cudahiya Jinên Koçer û Xwecih.....	117
10.8. Mêvanperweriya Kurdan.....	119
10.9. Mêrxasiya Kurdan.....	120
10.10. Xwendina Kurdan.....	121
10.10.1. Perwerde û Medrese.....	121
10.10.2. Mela, Şêx û Mizgeft.....	122
10.10.2.1. Mela.....	122
10.10.2.2. Şêx.....	123
10.10.2.3. Mizgeft.....	123
10.11. Xwarin û Vexwarinên Kurdan.....	124
10.12. Cil û Bergên Kurdan.....	125
10.13. Xirabiyên Kurdan.....	126

10.14. Zewac û Dawetên Kurdan.....	127
10.14.1. Bêşikkertme.....	127
10.14.2. Berdêl.....	128
10.14.3. Qelend û Xelat.....	128
10.14.4. Dawet.....	129
10.14.5. Gerdek.....	130
10.15. Eyd û Şahiyên Kurdan.....	130
10.15.1. Eyda Remezan û Qurbanê.....	130
10.15.2. Zadika Hêksorê û Kafirk.....	131
10.15.3. Çarşenba Axir, Axirçarşenbe yan Qereçarşenbe.....	131
10.15.4. Beranberdan û Serêpêz.....	132
10.15.5. Yexnax.....	132
10.15.6. Kirîvatî û Sinetkirina Zarokan.....	133
10.16. Lîstikên Kurdan.....	134
10.16.1. Şertlîstin.....	134
10.16.2. Setrenc, Tame û Gustîr.....	134
10.16.3. Cînaq û Yadest.....	135
10.16.4. Cirîd û Hol.....	136
10.17. Hesp, Çek, Kuçik û Heywanên Kurdan.....	136
10.17.1. Hesp.....	136
10.17.2. Çek.....	137
10.17.3. Kuçik û Heywanên Din.....	138

BEŞA ÇAREM

TÎPGUHÊZÎ Û EDÎSYON-KRÎTÎK

1. Tîpguhêziyên ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye.....	139
1.1. Tîpguhêziya Jaba.....	139
1.2. Tîpguhêziya Delîlo Îzolî.....	140
1.2.1. Rexneyek li ser vê Tîpguhêziyê.....	141
1.3. Tîpguhêziya Reşîd Findî.....	142
1.4. Tîpguhêziya Jan Dost.....	142
1.5. Tîpguhêziya Ziya Avcî.....	143
2. Rê û Rêbaza Tîpguhêzi û Edîsyon-Krîtîka Me.....	144
2.1. Tabloya Tîpguhêziya Alfabe ya Kurdî ya Erebî-Latinî.....	145

3. ‘Adat û Rusûmatname’ê Ekradiye.....	146
ENCAM.....	188
ÇAVKANÎ.....	191
PÊVEK.....	205
1. Destxeta li Petersburgê ya bi jimara (Kurd 34).....	205
2. Destxeta li Petersburgê ya bi jimara (Kurd 35).....	208



PÊŞGOTIN

Hemû gel di dîroka xwe de li gor girîngiya wan cih didine kes, bûyer û berhemên wan. Bi vî awayî dîroka xas ya her civakê derdikeve holê û ji gelên din cuda dibin. Peywira dîroknas ew e ku bûyer, kesayetî û berhemên civakekê bi awayekî wisa şîrove bike ku ew civak ji wan hêzê hilde, xwe binase û bikaribe pêşeroja xwe li gor ders û rêbazên bi saya wan bi dest xistiye plan bike. Ango dîrok û pêşeroj çiqasî ji hevdu dûr dibin bila bibin dîroknas bi xebatên xwe bîreweriyeke micîd hasil dike û wan herdu demên ji hevdu cuda bi hevdu ve gire dide û dîroknas bi xwe jî karê pireyê pêk tîne. Bîreweriyeke rast û li ser esasên saxlem avabûyî kesayetî û her wiha civakeke xwenas, xwebawer û qenc derdixe holê. Bi xêra van hêmanan kes û civak di serî de xwe nas dike, hêjahî û kêmasiyên xwe dibîne, loma ji bo parastina hêjahiyên û temamkirina kêmasiyan hewl dide. Dema ev kara pêk hat jî hesta xwebaweriyê xwebera çêdibe û di axiriyê de encameke qenc pêk tê.

Ev xebata ku mijara wê şexsekî di dîroka kurdan de girîng Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867) û berhemên wî ye, heke ji bo pêkhatina bîreweriya dîrokê tevkariyê bike dê merema me hasil bike.

Di beşa yekem de di serî de rojhilatnasî, rojhilata navîn, kurd, Kurdistan û kurdolojî hatin nirxandin. Qala karên Bazîdî û August Jaba (1801-1894) hat kirin. Di beşa duyem de wekî pêngava duyemîn jiyân, berhemên Bazîdî û her wiha cihê wî yê di civaka kurdan de, tîkiliya wî ya bi mîrên Kurdistanê û dewleta Osmanî re hate diyarkirin. Derbarê çawaniya berhem û xebatên wî de agahî hat dayîn. Di beşa sêyem de nirxandina xebatên li ser *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* hatine kirin cih digre. Ê peyra naveroka wê ji hêla ziman û mijarên wê yên balkêş ve hat nirxandin. Di beşa çarem de jî tîpguhêzî û edîsyon-krîtîka wê ya bi destê me hatiye kirin heye.

Çawa ku mirov bêyî civak, malbat û heval nikare bijî, kar û xebatên wî jî tenê bi ked û hewldanên wî pêk nayên. Wekî ku mirov di nav hawirê hatiye dinyayê de mezin dibe, xwe û derûdora xwe nas dike, dikemile, xebatên wî jî di heman atmosferê de teşe digrin, pêş dikevin û di dawiyê de ber û berhem çêdibin. Loma dema me dest bi vî karî kir, gelek heval û hogiran alîkariya me kir, rê nîşanî me dan û ji tecrubeyên xwe em agahdar kirin. Ji ber vê bêyî ku em navê wan yek bi yek rêz bikin em ji hemûyan re sipas dikin. Lê heke em navê hinekan bidin di serî de ez sipasiya şewirmendê xwe Mamoste Doç. Alk. Dr. Hayrullah Acar û Mamoste Doç. Dr. Abdurrahman Adak dikim,

bi rêberî û alîkariya wan ev şeklê dawî derket holê, xebat kemilî, her wiha bi navgîniya herdu mamosteyên hêja me xwe gîhande destxeta orjînal ya Mela Mehmûdê Bazîdî. Ji hêla din ve hevalên min Ayhan Geverî, Huseyn Şemrexî, Haydar Şahin, Onder Beyter, Îbrahîm Atmaca û yên din her yekî di qada pisporiya xwe de alîkariya min kir, ji ber hemû keda wan ez sipasiya wan dikim. Dema ez li ser vê tezê xebitîm min hevala xwe, dayika zarokên min Yildiz û herdu keçên xwe Evîn û Hêlîn û lawê xwe Ebdullah Baran jî hemal hîştin, însallah dê li min biborin, mala hemûyan ava be.



DESTPÊK

1. Armanç û Çarçove

Di vê tezê de li ser Mela Mehmûdê Bazîdî, xebatên wî, têkilî û tevkeriya wî ya bi A. Jaba re û bi taybetî jî li ser *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* xebat hatiye kirin. Bi vê armanç ew e ku wêneyekî jiyan û xebata Bazîdî û taybetiyên pirtûka wî *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* derkeve holê. Lewra di dîroka wêjaya kurdî û kurdolojiyê de Bazîdî û xebatên wî xwedî cihêkî taybet in. Lê beriya ku Bazîdî û berhemên wî bîr nirxandin divê qala rojhilatnasyê bihata kirin da ku girînga xebatên wî ya kurdolojiyê de derkeve holê û wisa jî hatiye kirin. Çimkî qada xebatên rojhilatnasî û rojhilatnasan wekî ku ji nav jî tê fehmkirin erdnîgariya rojhilat û gelên wê herêmê û her wiha li gel vê jî hemû hebûnên wan ên dîrok, çand, ziman, wêje û baweriyên wan in. Jixwe berhemên Bazîdî jî di encama hewl û xebatên rojhilatnas Jaba derketine holê. Ji ber vê hindê jî pêwîstî bi pênaseya vê disiplînê heye.

Di beşa yekem de di serî de têgehên rojhilatnasî, rojhilata navîn, kurd, Kurdistan û kurdolojiyê bi kurtasî hatine nirxandin. Lewra ev têgehana hemû wekî zincirekê bi hevdu re têkildar in. Di encama vê de derdikeve holê ku hebûna ji van têgehyan yekê hewcedarê ya beriya xwe ye û hevdu xwedî dikin. Lê ji wan têgehyan ya herî zêde li ser hatiye sekinîn kurdolojiyê. Lewra kurdolojiyê jî wekî şaxeke ji rojhilatnasyê reng vedide, heya îro jî bi piranî bi destê kurdologên biyanî, ango rojhilatnasan hatiye pêşve xistin, loma kurdolojiyê bi taybetî hatiye nirxandin. Piştî wê li ser dewlet, sazî û gelên bi kurdan re eleqedar bûne û bi wan re ketine têkiliyê hatiye sekinîn. Ji wan dewletan jî Rûsya û xebatkarên wê yên li çar aliyê herêmê bela bûne û ji bo navendê dokuman berhev kirine derdikevin pêş. Di encama van xebat û lêkolînan de Rûsya ji bo kurdolojiyê bûye navendeke sereke. Helbet ji wan xebatkarên ked dane vê navendê, di vê babetê de girîng û balkêş kesayetiya A. Jabayê konsolosê Rûsya yê Erziromê ye. Bi ked û xebata xwe Jaba bûye wesîleya gelek karên baş û bû xaleke vê tezê. Ji ber vê hindê jiyan, xebatên wî û têkilî û hevkeriya wî ya bi Bazîdî re bûn beşeke girîng ya vê lêkolînê. Lewra ev mijarana hemû ji bo xuyabûna cihê Bazîdî û xebatên wî yên di dîroka edebiyata kurdî de girîng in.

Di beşa duyem de wekî pêngava duyemîn jiyan, berhemên Bazîdî û her wiha cihê wî yê di civaka kurdan de, têkiliya wî ya bi mîrên Kurdistanê û dewleta Osmanî re hatine diyarkirin. Bi vê beşê armanç ew e ku ilim, xwendin û statuya Bazîdî ya li nik

gelê kurd û rêveberiya heyamê derkeve holê. Li pey wê re hevkarîya Bazîdî û Jaba û ew kulliyata wan berhemên ku her yeka wê di dîrok û wêjeya kurdî de cihêkî wê yê berceste heye hatine dahûrandin. Lewra ev pirtûkxaneya degme wekî xulesaya vê xebata hevpar ya herdu zanayên ji du dinya û erdnîgariyên ji hevdu cuda lê li ser mijar û armançeke hevpar bûne hevgel derketiye holê û îro jî hê ji bo xebatên kurdolojiyê gencîneyeke hêja ye. Ji ver vê rastiyê berhemên Bazîdî û her wiha yên Jaba di bin 6 serenavên wekî dîrok, ferheng, rêziman, wêje, folklor û civaknasiyê de li gor 19 binnavan hatin nirxandin. Derheqê naverok, babet û teşeya wan de agahî hat dayîn, xebat û weşanên li ser wan hatine destnîşankirin.

Di beşa sêyem de ji van berheman *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiyeya* ji bo vê tezê bûye mijara nirxandinê, babetên wê yên bûne egera rexneyan yên derheqê eslê kurdan û zimanê wan de hatine hilsengandin. Bazîdî di destpêka kitêba xwe de kurdan wekî milekî ji ereban dihesibîne û destnîşan dîke ku hinek eşîrên ereb ji warên xwe koç kirine û hatine ser sînorên Îran, Xorosanê û bi vî awayî kurd derketine holê û zimanê wan jî ji têkilhevbûna peyvên erebî û îranî pêk hatiye. Loma ev nêrîna Bazîdî li gel çavkaniyên dîrokî hat nirxandin. Wekî din berhem ji hêla nusxeyên wê, dema nivîsê, qebareya wê, zimanê wê ve hatiye şîrovekirin û cihê wê yê di dîroka edebiyata kurdî de hatiye nîşandan. Bi vî awayî nirx û hêjahiya wê ya ji hêla edebiyata kurdî ve derket holê û zelal bû. Lewra ji armancên vê xebatê yek jî kifşkirina vê rastiyê bû. Her wiha di vê beşê de nirxandina xebatên li ser *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye* hatine kirin cih digre. Di vê çarçoveyê de wergerên wê yên bo 6 zimanan, şîroveyên wê hatine nirxandin. Ji pey vê re li ser naveroka wê hatiye rawestan û mijarên wê bi hûrgilî hatine nirxandin.

Di beşa çarem de jî tîpguhêzî û edîsyon-krîtîka wê ya ku bi destê me hatiye kirin, cih digre. Lêbelê di vê beşê de pêşiyê qala tîpguhêziyên *Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye* yên beriya me hat kirin. Her wiha di vê beşê de me qala rêbaza xwe ya tîpguhêziyê jî kir. Me di vê tîpguhêzî û edîsyon-krîtîka xwe de herdu nusxe dane ber hevdu û nirxandin. Cudahî, kêmasî û zêdehiyên di navbera herdu destxetan de hatin tesbîtkirin. Her wiha bi vî awayî hin gotinên di nusxeya duduyan de ji ber şaş û kêma nivîsînê tu mene jê dervediketin jî bi rêberiya nusxeya nivîskar rast hatin xwendin.

Di vê tîpguhêziyê de tîpên erebî yên di alfabeya kurdî ya latinî ya îro de tunene, li ser bingeha alfabeya navneteweyî ya ji bo transkrîpsiyona erebî-latinî hat bikaranîn. Bi vî awayî ev transkrîp û edîsyon-krîtîk nîşan dide ka di destxetê de kîjan tîp û deng çawa hatiye nivîsîn. Ev rêbaz di tîpguhêziyên din de nehatiye tetbîqkirin û jixwe jêdera wan

xebatan tenê nusxeya duduyan bûye. Ji ber wê kêmasiyên wan hene. Me di tîpguhêziya xwe de, berhem li gor eslê wê û bêyî ku were guherandin ji tîpên erebî veguhaztiye tîpên latinî. Li cihên pêwîst jî bi jêrenotan agahî hatine dayîn. Lê mixabin di wanê beriya me de bi zanebûn yan jî şaşî hin guherîn hatine kirin.

2. Çavkanî û Rêbaz

Ev teza ku ji xêncî pêşgotin, destpêk û encamê ji çar beşan pêk tê li ser bingeha danasîn, tehlîl û şîrovekirina dîroka peydabûna xebatên li ser kurdan hatiye avakirin. Bi vê rêbazê Bazîdî û berhema wî ya bûye mijara lêkolînê hatiye danasîn. Dema ev lêkolîna hatiye kirin ew xebatên dildarên edebiyata kurdî bi dilsoziya xwe kirine wekî çavkanî hatine nîşandan. Lê çawa ku di derheqê dîrok û zimanê kurdan de xebatên akademîk û berfireh kêr in, di vê xebatê de jî ev astengî derketiye holê. Ji ber vê hindê di serî de xebatên Bazîdî û Jaba yê ji bo kurdolojiyê bûne çavkanî hatine hilsengandin, kurtedîroka kurdolojiyê hatiye neqilkirin û cihê *Adat û Rusûmatname'ê Ekradiyeyê* yê di dîroka wêjeya kurdî de hatiye destnîşankirin.

Dema lêkolîn hatiye kirin li gel xebatên kurmancî ji yê soranî, farisî û tirkî sûd hatiye wergirtin. Ew berhemên li ser Bazîdî hatine kirin ya Ferhad Pîrbal ya bi navê *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd* ya soranî û lêkolîna Jan Dost ya li ser *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* ya kurmancî bi kêrî me hatine. Her wiha tîpguhêziya Ziya Avcî ji bo muqayese û peydakirina metnê rûsî ya Margarîta Borîssowna Rudenkoyê (1926-1976) çêkiriye karê me hêsan kir. Ji bo tîpguhêziyê li gel nusxeya Bazîdî bi xwe nivîsiye, ew nusxeya duduyan ya ku Rudenkoyê bi sernavê *Puavy i Obyaj Kurdov* wergerandiye rûsî hat bikaranîn û di jêgirtinê lêkolînê de hejmarê rûpelên wê nusxeyê hatin nîşandan. Ji bilî van seba dîroka kurdolojiyê pirtûka Rohat Alakom ya bi navê *Kurdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişî (1787-1987)* çavkaniyeke bikêrhatî bû. Ji bilî vê jî bo teqîbkirina xebatên li ser kurdan yê bi inglîzî û fransî bîbliyografyayên Necat Ebdulla *Bîbliyografyayî Kurdnasî –Kurd û Kurdistan le serçawe Fransiyekanda û Bîbliyografyayî Kurdnasî –Kurd û Kurdistan le serçawe Ingilîziyekanda* barê me sivik kirin.

Ji bo tîpguhêziya metnê *Adat û Rusûmatname'ê Ekradiye* me serî li ya Delîlo Îzolî *Adetên Kurdistanê*, ya Reşîd Findî *Pertûka Adat û Rusûmatname'ê Ekradiye* ya *Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867*, ya Ziya Avcî *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* û ya Jan Dost *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* xist û bi vî awayî derfeta muqayeseyê û peydakirina cudahî, şaşî û kêmasiyan çêbû. Her wiha rexne û nirxandinên Selman

Dilovan yê di gotara wî ya bi navê “Hin şaşiyên transkrîpsiyona ‘Adat û rusûmatnameyê ekradiye” rê li ber me xistin. Ji bilî vê gotara Maria Paradowska (1932-2011) ya bi navê “Destnivîseka Kurdî ji Koleksiyonên August Kościesz Jabayî û Girîngiya Wê bo Etnografiya Polonî” û Sidqî Hirorî ji polonî wergerandiye kurmancî ji bo me bû derfeteke baş ka em pê bihesin biyanî bi çî çavî li *‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayîfê Ekradiyeyê* dinihêrin û çawa dinirxînin. Wekî din ji bo hin hûrgiliyên jiyana Bazîdî gotara Rohat Alakom, “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba” û gotarên Mehmet Gültekin; “Di arşîvên Rojava û Osmanî de derheqê Mela Mehmûdê Bazîdî de agahiyên nû” û “Di arşîva Osmanî de Mela Mehmûd Bazîdî” rê li ber me vekirin.

BEŞA YEKEM

KURTENÊRÎNEKE GIŞTÎ LI ROJHILATNASÎ Û

KURDOLOJIYÊ

1. Rojhilatnasî

Rojhilatnasî an jî oryantalîzm ji ber fonksiyon, peywir û pênasîya wê têgeheke pir bi nîqaş e. Li ser heya vêga gelek lêkolîn û nîqaş hatine kirin û gava qala vê mijarê tê kirin bivê nevê Edward Wadie Said (1935-2003) tê bîra mirov.¹ Lê ji ber em naxwazin qala hûrgilî û van nîqaşan bikin tenê emê bi giştî çawa tê zanîn û em bi xwe jî wisa qebûl dikin, emê wê neqil bikin. Li gor vê oryantalîzm navê wan xebatan e ku bi destê kes û komên li gor pîvan û xwastekên rojavayê li ser civak, ziman, bawerî, çand û ziman û hwd yê rojhilatê ku di nav vê de hemû rojhilat; dûr, nezîk û navîn heye, hatine kirin û tên kirin.²

Heke em li Said bawer bikin ku bi giştî bawer jî dikin piştî sedsalên XVIIIan û XIXan vir ve lêkolînerên ji Amerîka, Ewropa û Rûsyayê ji bo nasîn ya rast nasandina gelên ji derveyî rojavayê ye ku ev millet hov in, nezan in, nelihevhatî ne dest bi xebatan kirine. Piştî xebatên wan ew rojhilata welatê mirovên hov ji sedî nod ketiye bin pencê mêtîngeriya wan. Jixwe ew gelên wê derê –peyva gel ne rast e, lewra gel xwedî dîrok, ziman û îdeal in- hişê xwe naxebitînin, nikarin ji dewlendiyên li ser erdê xwe îstifade bikin, divê hin kes wan birêve bibin. Lewra mirov bi giştî ji du çînan pêk tên axa û kole, em û yê din, rojavayî û rojhilatî, bi kurtasî medenî û hov. Vêca di vê nexşeya ziman, dîrok, çand, bawerî, folklor û hemû gencîneyên wanê sererd û binerd bê çêkirin. Ji bo van hemû karan oryanalîstên pispor ên zimanzan lazim in da ku bikaribin têkevî nav gelên herêmê û bi wan re têkiliyê daynin. Emê li vir ji van xebatên dûr û dirêj qala beşeke pir piçûk bikin.

Li vê derê divê pênasîya rojhilatnasîyê bê zanîn. Lewra bi saya vê disîplîna pîralî li ser erda ku dijberê rojavayê ango rojhilatê xebateke dorfireh û berfireh were kirin. Loma hewcedarî bi pisporên dildar çêbû. Gava Edward Said li ser pênasîya û qada oryantalîzmê disekine hemû terîfên oryantalîzmê wiha rêz dike:

¹ Edward Said, *Oryantalizm -Sömürgeciliğin Keşif Kolu-*, ç. 4., wer. Nezih Uzel, İrfan Yayıncılık, İstanbul, 1998; Edward W. Said, *Şakîyatçılık -Batının Şark Anlayışları-*, ç. 8., wer. Berna Ülner, Metis Yayıncılık, İstanbul, 2014.

² Yücel Bulut, *Oryantalizmin Kısa Tarihi*, ç. 5., Küre Yayınları, İstanbul, 2014.

“Antropolog, civaknas, dîroknas yan jî zimanzan, kesê ku bi rêbezake giştî yan jî taybet rojhilatê hîn dike, derbasî nivîsê dike yan jî li ser lêkolînê dike rojhilatnas (oryantalîs) e û karê ku ew dike jî rojhilatnasî (oryantalîzm) ye. (...) Oryantalîzm awayekî ramanê ye ku li ser cudahiya ontolojîk û epistemolojîk ya di navbera “Rojhilat” û “Rojava” ava bûye. (...) Nika jî ez tîm ser meneya sisyan ya oryantalîzmê: Di vê meneyê te oryantalîzm ji wan herduyên din bêtir bi awayê “dîrokî û maddî” hatiye terîfkirin. Heke em dawîya sedsala XVIIIan wekî destpêkeke elehesab qebûl bikin, oryantalîzm ew kom-muessedese ye ku bi rojhilatê re mijûl dibe; ango di derheqê Rojhilatê de hikman dide, ji bo pejirandinê qenaetên derbarê Rojhilatê de kontrol dike, Rojhilatê teswîr dike, tadrîs dike, îskan dike, bi rê ve dibe; bi kurtasî ew rêyeke wisa ye ku “Rojavayê” ji bo “bibe hakimê Rojhilatê, wê ji nû ve saz bike û bibe amirê wê” peyda kiriye.”³

Di terîfa herî dawîn de karê oryantalîstan li ser navê mezinên xwe li erdên dûrê ku li gor dilê xwe nav lêkirine pêk anîne hatiye destnîşankirin.

1.1. Bingeha Rojhilatnasîyê

Peyva oryantalîzm/rojhilatnasîyê koka xwe ji zimanê latînî hildide û ew jî oriens e, ew jî tê maneya hêla ku roj lê hiltê. Ji ber ku di dema Împaratoriya Romayê de hê Rojhilata Dûr nedihata nasîn, zanîn, ew herêma ku îro êdî wekî rojhilata navîn tê zanîn wek rojhilat dihat zanîn. Piştî keşfên coxrafîk (1492) êdî rojhilat mezin bû û hêlên wê jî li gor Ewropayê hat terîfkirin.

Di encamê de ger û lêgerînên li van herêman piştî sedsala XVIIIan xurt bûn. Lêbelê miletên rojavayê hê ji dema seferên xaçparêzan (1095-1270) vir ve bi rojhilatê çavnas bibûn û di nav wan gelên herêmê de kurd jî qewmekî sereke bûn. Lewra Selaheddînê Eyyûbî (1169-1193) di sala 1187 de Qudsa 88 salan di destê frenkan de bû fetih kir⁴ û dema di şerê Hittinê⁵ de dîsa xaçparêz tîk birin û êdî kurd ji bo wan bûn miletekî nas. Jixwe ji wê rojê vir ve rojhilata navîn ji hemû hêlên wekî dîn, dîrok, şaristanî, dewlemendiyên binerd -nift- û serderd ve bala rojavayê kişandiye û rûdanên rojane yê îro jî di rojeva siyasî ya dinyayê bûne xalên sereke.

³ Edward Said, *Oryantalîzm -Sömürgeciliğin Keşif Kolu-*, ç. 2., wer. Selahattin Ayaz, Pınar Yayınları, İstanbul, 1989, r. 15-16; vgz. Yücel Bulut, *Oryantalîzmin Kısa Tarihi*, ç. 5., Küre Yayınları, İstanbul, 2014, r. 8.

⁴ Amin Maalouf, *Arapların Gözünden Haçlı Seferleri*, wer. Ali Berktaş, Yapı Kredi Kültür Yayınları, İstanbul, 2006.

⁵ İbn Xelikan, *Siltan Selaheddînê Eyyûbî*, ji erebî wer. M. Emîn Narozî, Avesta, Stenbol, 2008, r. 70-80.

1.2. Di Dîroka Rojhilatnasiyê de Rojhilata Navîn

Wekî ji nav jî diyar e, ji ber misiyona xwe erdnîgariya ku divê bibe qada xebata rojhilatnasiyê rojhilat e. Ji bo hebûna vê disiplînê, qada lêkolînê yan jî zanista rojhilatnasiyê divê beriya her tiştî, terîfa rojhilatê bê kirin. Vêca gelo rojhilat ku der e û li gor kê rojhilat e. Pirsra ku divê li ser bê sekinîn ev e. Rojhilat ku der e?

Li gor terîfa ferhengan rojhilat ew hela berevajî rojavayê ye, ango cihê roj jê hiltê rojhilat e. Jixwe di zimanê latinî de ku ev ziman wekî maka piraniya zimanên rojavayê ye peyva oriensê di wateya cihê hilatina rojê ye.

Ev terîf ne terîfeke vebîr e, lewra li ser rûyê dinyayê meriv li ku derê be îlam ji bo wî rojhilat û rojavayek heye. Lê li vir ji rojhilatê mebesta me ew hêl e ku îro gava qala wê tê kirin û ew cih tê bîra mirov. Ev ji li gel rojhilata dûr, nêzîk û navîn ew hêl e ku dikeve rojhilata Ingilistan û welatên Ewropayê. Li gor vê nêrîn û terîfê navend Ingilistan û bi giştî Ewropa ye. Vêca dema em divê xebatê de qala rojhilatê dikin gotî ev terîf bê bîra mirov. Ango ev binavkirin û terîf ne li gor me, li gor ‘rojvayiyên’ me ye. Wan li gor xwe herêma me terîf kirine û dane nasîn.

1.2.1. Rojhilata Navîn

Çawa ku li jor jî qala wê hat kirin rojhilat dîsa li gor hêzên serdest di serî de Ingilistan, Ewropa û Amerîkayê hatiye terîfkirin û dabeşkirin. Di encama van terîfan de Rojhilat wekî Rojhilata Dûr, Rojhilata Nêzîk û Rojhilata Navîn hatiye dabeşkirin. Ji van hersêk beşên Rojhilatê tenê Rojhilata Navîn me eleqedar dike. Derbarê binavkirina Rojhilata Navîn gelek nîqaşên girîng hene, lê ji bo me çarçoveyeke serkî bes e. Li gor vê Rojhilata Navîn ji bo wê li parzemîna Asyayê ew herêma li hêla rojavaya başûr dikeve, di warê dîrokî û çandî de nêzîkî hevdu ne, ango hevpar in tê gotîn. Jixwe ev terîf dîsa li Ewropayê di dawiyê sedsala XIXan û serê sedsala XXan ji bo bername û planên wan hatiye bikaranîn. Dema ev têgeha rojavayî ji bo cihekî li rojhilatê hat bikaranîn berjewendiyên Ingilistanê li ber çavan hatine girtin. Ango di heyama terîfa vê herêmê de rastî û sînorên herêmê ne girîng bûne, lê menfaetên dewletên mezin hebûne. Ji ber vê di nav sînorê rojhilatê de ev herêm û dewlet hene: Misir, Parzemîna Ereban, Anadolu, Mezopotamya, Kurdistan, Qefqasya. Heke meriv bi navê dewletên îro terîf bike Tirkiye, Sûriye, Iraq, Îran, Urdin, Libnan, Filistîn, Îsraîl, Qetar, Kuweyt, Behreyn, Misir,

Erebistana Siûdî, Uman, Yêmen û Mîrektiyên Erebên Yekgirtî dikevî nav sînorê Rojhilata Navîn.⁶

Lê divê tu carê ev neyê jibîrkin ku ev herêm her çendî îro bi vî navê çêkirî bê nasîn jî di dîrokê de herdem jeopolitik bûye. Lewra vê derê rojhilat û rojava, Behra Spî û Hind, Rûsya û behrên mezîn gihandine hevdu û di têkiliyên bazirganî û çandî de bûye pîreyeke sereke.

Her wiha mirov nikare ji bo vê herêmê terîf û sînorekî mutleq jî diyar bike. Lewra di dîrokê de herdem ev binavkirin li gor konjktorê guheriye. Hinek caran sînor fireh bûye hin caran jî teng, ya rastî berê sînor teng bû lê berêka sînorê Rojhilata Navîn fireh bûye. Dema ku herêma Balqanan di bin destê dewleta Osmanîyan de bû, ji Balqanan û qiraxên Rojhilata Behra Spî wekî Rojhilata Nêzîk dihat binavkirin, herêma ku di navbera Mezopotamya û Hindistanê de dima jî wekî Rojhilata Navîn dihat qebûlkirin. Lê piştî ku Dewlata Osmanî lawaz bû, li Balqanan dewletên nû yên serbixwe hatin avakirin, êdî ew terîfa berê guherî, ji wê şûnda êdî ew herêma di navbera Tirkiyeya îroyîn û Hindistanê de dimîne wekî Rojhilata Navîn hat binavkirin. Ev yek ji bo me nîşan dide ku ev binavkirin keyfî ne û li gor berjewendiyên hêzên serdest teng û fireh dibe. Li gor nêrînên siyasî û berjewendiyên madî saz dibe.

Ji bo me pirs girîng ew e ku gelo ev peyva cara ewil kîngê, li ku, ji teref kê ve û ji bo ku derê hatiye bikaranîn? Lewra gava em vê bizanibin sînor û pîvanên vê binavkirinê dê bi awayekî zelal diyar bibe.

Wekî me li jor jî qal kir ev pênaseyên ji bo erdnîgariya ku em jî lê dijîn di çarçoveya berjewendiyên dewletên Ingilistan, Fransa û ewên din ên Ewropayê hatine îcadkirin. Loma wan Rojhilat ji bo xwe dabeş kirine. Di serê sedsala XXan de Fransayê ji axa Osmanîyan re digot Rojhilata Nêzîk, lê ji bo vê sînorekî vebir nehatiye diyarkirin. Lê berevajî vê tiştêkî vebir e ku Çîn, Japonya û yên wê herêmê Rojhilata Dûr in.

Lê têgeha Rojhilata Navîn (Middle East) cara pêşîn Alfred Thayer Mahan (1840-1914) di gotareke xwe de ya di kovara *National Review* de ku li Londonê der diçe hatiye weşandin de bi kar tîne. Mahan serbazekî amerîkayî ye. Mijara pisporiya Mahan di warê hêza leşkeriya deryayî ya Ingilistanê de ye. Li gor wî kîjan hêz bibe hakimê behrên dinyayê dê bibe hakimê dinyayê jî. Mahan akademîsyenekî girîng e û zanîgehên Cambridge û Oxfordê payeya doktoraya fexrî danê.

⁶ Ji bo kurtedîroka rojhilata navîn bnr. Bernard Lewis, Ortadoğu -Hiristiyanlığın Doğuşundan Günümüze Ortadoğunun 2000 Yıllık Tarihi-, wer. Mehmet Harmancı, Yeni Binyıl Yayınları, İstanbul, tarîx tune.

Navê maqelaya Mahan “Kendava Persan û Têkiliyên Navneteweyî ye” [*The Persian Gulf and International Relations*]. Di vê maqaleya xwe de Mahan dibêje ji bo ku Ingilistan ewlehiya Hindistan û Rojhilata Dûr pêk bîne, divê ewlehiya wê riya ku diçe van herêman jî pêk bîne. Ji ber ku Rûsya li hela trans-Sibîrya û Asyaya Navîn de pêşve diçe bi awayekî xeternak gelekî nêzîkî Hindistan û Pasîfikê bûye. Di vî halî de Kendava Persan piştî Qanala Suweyşê ji bo derbasbûna Hindistanê “kevîrê çengdanê” yê herî girîng e. Divê Ingilistan ji bo rê li ber Rûsyayê bigre bi almanan re tevkariyê bike û rûsan jî ji bîra neke. Li gor Mahan ev der “Rojhilata Navîn” e, ango Kendava Persan û hawirdorê wê.

Piştî ku Mahan ev têgeha “Rojhilata Navîn” bi kar aniye, gelekî bal kişandiye, The Timesê ev maqale ji nû ve weşandiye û ji pey wê re jî maqaleya Vanatine Iganitius Chirol (1852–1929) ya bi sernavê “Pirsgirêka Rojhilata Navîn” [*The Middle Eastern Question*] weşandiye. Berêka hêdî hêdî maqaleyên di vê mijarê de hatine belavkirin û ji pey re bi sernavê “Pirsgirêka Rojhilata Navîn an jî Hinek Pirsgirêkên Parastina Hindistanê” wek pirtûk hatine çapkirin. Lê li pey vê re ev têgeha li gel bikaranîna wê êdî herêmeke hê ji ya berê firehtir tê bîra mirov. Lewra gava Chirol dibêje “Rojhilata Navîn” meqsedê wî ne tenê Kendava Persan e, lê ew hemû herêmên ku rêyên Hindistanê tê re derbas dibin, Iraq, Erebistana Rojhilatê, Efxanistan, Tîbet û ew herêmên din yên Asyayê nîşan dide. Li gor vê sînorê “Rojhilata Navîn” berfireh dibe û paşê dê wekî îro hê firehtir bibe. Jixwe Ingilistanê di dema Şerê Cîhanê yê Yekemîn de û her wiha piştî wê Misir jî tevî “Rojhilata Navîn” kir. Ji hela din ve neftê û şerê cîhanê jî li ser vê berfirehbûnê bandoreke mezin kir. Piştî vê “Rojhilata Navîn” a ku ji hela dîn, ziman, şaristanî û dewlemendiyên xwe yên dîrokî, çandî, madî -ku sererd û binerd- û erdnîgariya xwe ya stratejîk ve bû çavkaniya berjewendiyên. Di serî de Ingilistan, DYA, Rûsya û bi giştî hemû hêzên rojavayî çav berdane vir û îro jî em kartêkirina vê yekê bi awayekî eşkere dibînin.

Vêca “Rojhilata Navîn” binavkirineke nû û bêbingeh e. Ji hela hêzên dereke, ango yên rojavayî ve hatiye îcadkirin, îro jî ji bo berjewendî û serdestiya wan a li ser herêma û her wiha seba cîhanê wekî erdnîgariyeke balkêş e.⁷

⁷ Roger Adelson, *London and the Invention of the Middle East; Money, Power, And War, 1902–1922*, (Londra ve Ortadoğu'nun İcadı; Para, Güç ve Savaş, 1902–1922), New Haven ve Londra, Yale University Press, 1995; vgz. Serdar Laçiner, Ortadoğu Diye Bir Yer Var Mı? *Uluslararası Hukuk ve Politika*, c. 3, j. 10, Ankara, 2007, r. 153, 155.

Wekî me li jor jî got li vê herêma ku êdî bi navê “Rojhilata Navîn” ve muşexes bûye, bi navekî din terîfkirina wê pir zehmet e, gelek dîn, millet û şaristanî lê jîndar in. Lê emê dev ji van hemûyan berdîn tenê qala milletê kurd bikin û ji wir derbasî mijara xwe bibin.

1.2.2. Kurd

Kurd ji neteweyên herî kevn yek e ku li ser vê erdnîgariya îro jê re êdî Rojhilata Navîn tê gotin dijîn. Di derheq kurdan de agahiyên berbiçav em piştî sedsala VIIan, dema ku kurd dînê Îslamê nas dikin dibînin.⁸ Lê wê demê jî rasterast kitêbên ku kurd – ya rastî wan deman tu netewe wekî mijara serke nehatine hîlbijartin- wekî mijar hîlbijartine û bi wê mebestê hatine nivîsîn pir kêman in. Lê kitêbên qala kurdan kirine mirov dikare wiha rêz bike; *Tarîxa Taberî* ya Taberî, *Murucuz-Zeheb we Ma’dînul-Cewahîr*, li gel vê *et-Tenbîh wel-Îşraf* ên Mesûdî, *Futûhûl-Buldan*⁹ we *Ensabul-Eşraf* ya Belazurî, *Exbar et-Tiwal*¹⁰ ya Ebû Henîfe Dînewerî, *Tarîxîl-Îslam* ya Îmam Zehebî, *Kîtab et-Tac fî Exlaq el-Mulûk* ya Cahîz, *Tecarib el-Ûmem* ya Îbnî Mîskeweyh, *Tarîxî Amed we Meyyafariqîn* ya Îbnûl-Ezraq, *el-Kamîl fit-Tarîx* ya Îbnûl-Esîr, *Mu’cemul-Buldan*¹¹ ya Yaqût El-Hemewî, *Exbarî Îşfehan* ya Hafîz Îşfehanî, *el-Bedî wet-Tarîx* ya Mutahhar Tahir el-Maqdîsî, *el-Bîdaye wen-Nîhaye* ya Îbnî Kesîr, *Buxye et-Taleb fî Tarîxî Heleb* ya Kemaleddîn Îbnî Adîm, *Wefayatul-‘Eyan we Enbau Ebna’z-Zeman* ya Îbn Xalîkan û *Tarîxî Îbnî Xaldun* ya Îbnî Xaldun.¹² Di van pirtûkên ku piraniya wan ji gelek cildan pêk tên de ji hevdu belav be jî gelek agahiyên kêrhatî hene. Lê ji bilî van pirtûkên rasterast qala kurdan dikin û navê wan jî bi kurdan re eleqedar in hene. Ji van yek *el-Qîla’ wel-Ekrad* ya Ebûl-Hesen el-Medaînî (mirin 840) û yek jî *Ensabul-Ekrad* ya Ebû Henîfe Ed-Dînewerî (mirin 895) ye. Lê mixabin ev herdu pirtûk jî bi xwe negihiştine ber destê me. Tenê ji çavkaniyên ji wan neqlan dikin û em bi hebûna wan

⁸ M. S. Lazarev-Ş. X. Mihoyan, *Kürdistan Tarihi*, ji rûsî wer. İbrahim Kale, Avesta, İstanbul, 2001, r. 27-68.

⁹ El-Belazurî, *Futûhûl-Buldan*, ç. 2., wer. Mustafa Fayda, T.C. Kültür Bakanlığı, Ankara, 2002.

¹⁰ Ebû Hanîfe Dînewerî, *İslam Tarihi*, wer. Nusrettin Bolleli-İbrahim Tüfekçi, Hivda, İstanbul, 2007.

¹¹ Seyfettin Çetin, *Yâkût el-Hamevî’nin Mû’cemü’l-Büldan’ında Kürtler*, Nûbihar, İstanbul, 2014.

¹² Bekir Biçer, Selçuklular ve Kürtler, *International Journal of Social Science*, c. 6, beş, 2, 2013, r. 167-168.

dihesin. Pirtûka pêşîn ji bo dîrokzanê mezin Taberî (838-923) bûye çavkanî û ya duduyan jî di pirtûkan de navê wê derbas dibe.¹³

Di pirtûkên curbecur de agahiyên derbarê kurdan de kêm û tevlihev bin jî îro êdî bi giştî derheqê kurdan de dîrokeke diyar heye¹⁴ û ji bo rabirdu, welat, çand û zimanê wan agahiyên pêwîst hatine tesbîtkirin.

Ji ber statû û rewşa wana îro derheqê nifûsê kurdan de agahiyên vebir tunene. Li got texmînan nifûsê kurdan di navbera 25-40 milyonî de diguhere. Ji ber dabeşbûna Kurdistanê her çendî piraniya kurdan li ser axa xwe ya resen ku îra di navbera Tîrkiye, Îran, Iraq û Sûriyeyê de hatibe dabeşkirin bijîn jî, her wiha li Qefqasya, Asya Navîn, Efxanistan, Sûdan, Ewropaya Rojava, Amerîkaya Bakur jî nifûsekî zêde kurd li dîasporayê dijîn.¹⁵ Di nav kurdan de ji endamên gelek dînan hebin jî piraniya wan xwe li ser dîne Îslamê mezhebê şafîî qebûl dikin, lê li gel vê yê elewî, êzdî, ehlê heq/yaresan jî hene.¹⁶

1.2.2.1. Eslê Kurdan

Di derheq etîmolojiya peyva kurd de gelek nîqaş û îdia hene û bi awayekî vebir nayê îsbatkirin ka ji çi pêk hatiye. Ya rastî ev îdia û angaşt di derheq hemû millet û navên wan de hene û piştî serdestbûna netewedewletan ev angaşt û xebatên di vî warî de gûr û geş bûn. Di xebatên di vî warî de hatine kirin de tarîxa vê peyvê di hin lêkolînan de heya beriya mîladê sedsala XXIVan diçe. Li gor vê peyva kurd bi peyva Gutî re eleqedar e û ew jî di tabletên Sumeriyan de derbas dibe û ji vê peyv meqsed jî gelê kurd e. Dîsa nivîsên Xenophon de peyva Kardukhoi derbas dibe. Li gor agahiyan dema ku Xenophon li wê erdnîgariya ku îro kurd lê dijîn digere ji bo hin qebîleyên vê herêmê peyva Kardû bi kar tîne. Piştî van di gelek berheman de peyvên ji hêla bilêvkirin û wateyê de nêzîkî van jî hatine dîtin. Bo mînak kitêbên Livy, Polybius û Strabo de peyva Kyrtiae derbas dibe. Ev peyv di pêvajoya dîrokê de guheriye û di destana bi navê

¹³ Wisif Zozanî, “Alfabeya kurdan a herî kevn”, wer. Newzad Emînoğlu-Mihemed Jîyan, *Nûbihar*, j. 110, Stenbol, 2010, r. 35-36.

¹⁴ Şerefîxanê Bedlisî, *Şerefname*, wer. M. S. Cuma, Spîrêz, Duhok, 2006; M. Zekî Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, ç. 2., wer. Heyet, Nûbihar, 2011, İstanbul; Mehrdad R. Izady, *Kürtler*, ç. 2., wer. Cemal Atîla, Doz, İstanbul, 2004.

¹⁵ Murad Celalî, “Jimar, War û Wargehên Kurdan”, *Nûbihar*, j. 102, Stenbol, 2007; Murad Celalî, “Warên Kurdan û Kurdên Sûdanê”, *Nûbihar*, j. 121, Stenbol, 2012.

¹⁶ M. Reza Hamzeh’ee, *Yaresan (Ehl-i Hak)*, ji ingilîzî wer. Ergin Öpengin, Avesta, İstanbul, 2008.

Karnamagî Erdeşîrî Babagan de ku di dema Sasaniyan de hatiye nivîsîn kurd tê dîtin. Li gor hin îdiayan dibe ku ev peyv ji peyva Îranî Gord a ku tê meneya mêrxas çêbûbe.

Lê nîqaşên di vî warî de hê berdewam in û hê jî tîn nîqaşkirin. Ji bo mirov vê îsbat bike jî disiplîna dîrokê vê îmkanê nade me. Li gor hin îdiayan ev berhemên ev peyvên Kardukhoi, Kardû, Kyrtiae hwd derbas dibin qala kurdan nakin. Li gor hinekan ev peyva Kardû, wekî Qardu (QRD) ye, ne aryayî ye, semîtîk e ku tê maneya 'bêtirs û bihêz'. Lê ji hêla din de hinek jî vê peyva Kardû bi peyva Kartvelî ya ji bo Gurciyan tê gotin re eleqedar nîşan didin.¹⁷

Di lêkolînên di vî warî de ji bi eslê ji Asuriyan heya Gurciyan gelek îdia hene. Lê bi piranî tê qebûlkirin ku kurd ji hêla rîşeyî ve ji gelek nîşan pêk hatiye. Kurdolog Vladimir Minorsky (1877-1966) vê fikre qebûl dike. Lê ji bilî vê di hinek çavkaniyan de eslê kurdan wekî ereb,¹⁸ pers jî tîn nîşandan. Ji bo persbûna kurdan îsbat bikin jî efsaneyê Kawayê Hesinker ku di *Şahnameyê* de derbas dibe delîl tê nîşandan. Ji bilî vê kurd ji Med, Urartiyan jî hatine hesabandin. Lê bi delîlên berdest piştrastkirina van angaştan ne pêkan e. Bi baweriya me tu pêwîstiya wê jî tune.

1.2.2.2. Kurdistan

Welatê kurdan ango Kurdistana ku îro di nav çend dewletên li herêma dabeş bûye, ji rojhilatê ji çiyayên Zagrosê dest pê dike li rojava heya çiyayên Torosê, ji başûr çiyayên Hemrînê heya li bakur herêma Rewan-Qers-Erziromê tê. Bi terîfeke din li bakur ji Gurcistan, Ermenistan û Azerbeycana îroyîn, Çiyayê Gilîdaxê, bigre li başûr heya Kendava Hurmuzê diçe. Li rojhilatê Behra Xezerê, Gola Urmîyê, Çiyayê Zagrosê heya Çemê Ferat, Sêwazê tê. Ji wir Meletî, Mereş û heya binxetê diçe. Lê Kurdistan welatekî berfireh e, armanca me ne destnîşankirina sînor û herêmên Kurdistanê ye. Tenê seba wekî dîmenekî were li ber çavan me qala van çend çiyayên kir. Ji bo nasîna Kurdistanê, *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* (1543-1599?),¹⁹ *Seyahetnameya Ewliya Çelebî* (1611-1682),²⁰ *Qamûsul-'Alam* ya Şemseddîn Samî (1850-1904),²¹ *Dîroka Kurd û Kurdistanê*

¹⁷ M. Minorsky, Th. Bois, D. N. Mac Kenzie, *Kürtler ve Kürdistan*, ç. 2., wer. Kamuran Fıratlı, Doz, İstanbul, 2004, r. 41, 47; Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, r. 29, 139.

¹⁸ Mesudî, *Müruc ez-Zehab*, ç. 2., wer. D. Ahsen Batur, Selenge Yayınları, İstanbul, 2011, r. 194, 195, 196; Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, r. 66.

¹⁹ Şerefxanê Bedlîsî, *Şerefname*, wer. M. S. Cuma, Spîrêz, Duhok, 2006, r. 40.

²⁰ Evliya Çelebî, *Seyahetname*, wer. Seyit Ali Kahraman-Yücel Dağlı, Yapı Kredi Yayınları, c. 4, İstanbul, 2012; Reşîd Findî, *Er-Rihle Ewliya Çelebî Fil Kurdistan*, Duhok, 2008.

²¹ Şemseddîn Samî, *Qamûsul-'Alam*, c. 5, İstanbul, 1896, r. 3840, 3843.

ya M. Emîn Zekî Beg (1880-1948)²² ji çavkaniyên kevn çend heb in, heke li wan bê nihêrin dê agahiyên bi hûrgilî werine peydakirin. Her wiha pirtûka wenda *Tewarîxî Cedîdî Kurdistan* ya Mela Mehmûdê Bazîdî²³ jî heke derkeve holê dê di warê zelalkirina dîroka Kurdistanê de gelekî kêrhatî bibe.

Îro li Rojhilata Navîn ji gelên sereke yek jî gelê kurd e û di dîrokê de ji bo welatê wan peyva Kurdistanê hatiye bikaranîn. Beriya peyva Kurdistanê di dema Sasaniyan (224-651) de ji bo warê wan Kurdabad jî hatiye gotin.²⁴ Kurdistan tê maneya warê kurdan. Cara ewil di dema Selçûqiyan (sedsalên XI-XIV) de ev têgeh hatiye bikaranîn. Di sedsala XIIIan de di dema Siltan Sencer (1086-1157) de ji bo herêmeke piçûk a îro di nav sînorên Îranê de ye Kurdistan hatiye gotin û serbajarê wê jî Bahar e û paşê dibe Çemçemal. Jixwe beriya vê ji welatê kurdan re Zewzan jî dihat gotin.²⁵ Mehmûdê Kaşkarî di kitêba xwe *Dîwanû Lugatî Turkê* de ji bo warê kurdan dibêje Erdul-Ekrad ango erdê kurdan û vê di nexşeya xwe de jî nîşan dide. Her wiha dîroknasên Îslamê di pirtûkên xwe de ji bo welatê kurdan Biladul-Ekrad, Memalîkul-Ekrad û Menatiqul-Ekrad jî gotine.²⁶

Di pêvajoya dîrokê de bi taybetî jî ji sedsala VIIan şûnda dema artêşên Îslamê berve jor welatên cînar fetih dikin rastî kurdan tînin û bal bi hêla welatê wan ve tînin. Jixwe ev fetih di dema Hz. Emer de xurt dibin û Amed jî di wê serdemê de (639) tê fetihkirin.²⁷

Ya rastî mirov dikare bibêje ku piştî fethên Îslamî û welatê kurdan dikeve nav sînorên dewleta Îslamê, êdî bi awayekî eşkere navê kurdan û welatê wan tê xuyan. Lewra piştî vê merheleyê him di şerên li hember artêşa Îslamê de û him jî di nav artêşa Îslamê de navê kurdan tê bihîstin. Ji ber vê di pirtûkên Mesûdî û Îstaxrî de navê kurdan zêde derbas dibe. Van muelîfan di derheqê wargeh û bajarên kurd lê dijîn de agahiyên - li gor wê demê- berfireh neqil kirine. Di pirtûka bi navê *Farsnameyê* de qala komeke

²² M. Emîn Zekî Beg, *Kurtîyek Ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan*, wer. M. S. Cuma, Hewlêr, 1999, r. 16, 49.

²³ Murad Celalî, "Adat û Rusûmatnameê Ekradiye û Çend Gotin", *Nûbihar*, j. 112, Stenbol, 2010, r. 50-54.

²⁴ Biçer, *Selçuklular ve Kürtler*, r. 170.

²⁵ Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, r. 30.

²⁶ Biçer, *Selçuklular ve Kürtler*, r. 170.

²⁷ Ji bo agahiyên berfireh bnr. Ahmet Demir, *İslâm'ın Anadoluya Gelişi*, ç. 2., Kent Yayınları, İstanbul, 2008, r. 107-126.

mezin tê kirin ku li gel artêşa farsan li hember artêşa Îslamê şer kirine.²⁸ Li gor vê çavkaniyê ev artêşa li hember mislimanan têk çûye, piraniya wan qir bûne û yên mayî jî hatine li ser dînê Îslamê.

Piştî vê welatê kurdan di nav sînore dewleta Îslamê de maye û wekî Zewzan, Cezîretî Îbn Umer hatiye zanîn.

Lê kurdan li gel îtaeta xwe car carna jî serî hildaye û bi rêveberiyê re şer kirine. Jixwe di serdemên pêşîn de hin kurdan mezhebê xariciyan qebûl kiriye û lewma serî hildane. Di dema malbata Emewiyan de di sala 685an de kurdan serî hildaye. Her wiha di sala 708an de kurdan li herêma farsan talankarî kiriye, lewma Hecac li ser wan de hatiye û ewna têk birine. Di serdema malbata Ebasiyan de sala 764an de Ermenistan bi destê qewmê xezariyan tê dagirkirin û li welêt aloziyek derdikeve holê. Di heman demê de kurd jî serî hildidin. Di encama van tevliheviyan de ji kurdan hin eşîr bervî aliyê Azerbeycanê ve koç dikin û li wê herêmê dibine xwedîhêz. Peyra eşîra Rewadiyan ku malbata Eyyûbiyan û Selaheddîn ji vê eşîrê ye li herêmê derdikeve pêş û Mihemed Şeddad bîn Kartuyê Rewadî li Tebrizê dibe walî.

Piştî vê berêka eşîrên kurdan radibin ser xwe û hikûmetên herêmî ava dikin. Di heyama Ebasiyan de serokê hikûmeta Hesenweyhiyan Bedîr bîn Hesenweyh payeberz dibe û xelîfeyê Ebasiyan nasnavê Nasruddîn didê. Dema Buweyhî serdest dibin li Kurdistanê Merwanî hene.

Di pêvajoya dîrokê de kurdan li ser axa xwe gelek hikûmet û dewlet ava kirine. Eyyûbî ji van ya herî bi nav û deng û bi bandor e. Ji ber cih û warê wan bi tirkên oxuz, peyra selçuqî, moxolî, memlûkî, her wiha ereb, xaçî, ermenî, suryanî, nasturî hwd gelek millet û dewletan re têkilî danîne. Ji ber vê heya îro carna bi dewletên serdest Osmanî û Safewiyan re carna bûne hevpeyman û carna jî neyar. Ev pêvajo îro jî bi hemû jîndariya xwe ve berdewam dike. Îro jî ne tenê hêzên herêmê ji çar aliyên dinyayê netewe û hêzên navdewletî bi şirket û artêşên xwe yên cihêreng ve bi kurdan û Kurdistanê re eleqedar in. Îro li Kurdistana Başûr û Rojava de fakto rêveberiyên kurdan yên xweser hene û lê mirov pê dernaxe ka dê sibê çi bibe.

2. Kurdolojî

Kurdolojî navê disiplîn û xebatên zanistî yên ku li ser ziman, wêje, dîrok, etnografya, bawerî, çand, folklor û erdnîgariya kurdan e û beşek ji rojhilatnasiyê tê

²⁸ Îbnul Belxî, *Farsname*, wer. Abdulhalik Bakır, Ortaçağ Tarihi ve Medeniyetine Dair Çeviriler, Weşana Şexsî, Ankara, 2008.

hesabê.²⁹ Her çendî armanca misyoner (kêşe, papaz û hwd), leşker, seyah, balyoz ku paşê dê lîteratorê de wekî rojhilatnas bên nasîn, nemaze ne ji bo nasîna kurdan -li vir wekî kurdan divê hemû gelên li rojava dijîn bên bîra mirov- be jî ku lewra ewna ne tenê ji bo teblîxa dîn û mezhebê xwe, her wiha ji bo mêtîngeriya dewleta xwe derfetpeydakirinê, derbarê ziman, dîn, edet û bi kurtasî keşkirina hemû çavkaniyên sererd û binerd yên li erdê roj lê hiltê lêkolîn kirine, geriyane, xebitîne û jiyane. Xebatên rojhilatnasan bi giştî bi vî rengî ne û Edward Said bi hûrgilî li ser disekine. Lê wekî Martin van Bruinessen jî bale dikşîne xebatên li ser kurdan hatine wekî encam bi kêrî wan hatine û di vê pêvajoyê de ev xebat, proje û encam wekî kurdolojî derketiye holê.³⁰

Xebatên kurdolojiyê li Rûsyayê di serdema Rûsyaya Çarîtiyê (1547-1721) dest pê dikin heya dema Yekîtiya Sovyetê xurt dibin. Di encama van xebatan de gelek kurdologên rûs derdikevin holê. Ji pey re li welatên Ewropayê yên wek Fransa û Îtalyayê belav dibin. Berê, navend û dezgehên kurdolojiyê yên giranbiha li Lenîngrad û Erîvanê bûn. Ji ber hilweşîna Yekîtiya Sovyetê, îro rewşa kurdolojiyê û dezgehên wê yên li Rûsya û Ermenistanê, pir xirab e. Niha jî navend û dezgehên ku xwe bi navê kurdolojiyê didin nasîn li Almanya (Berlîn) û li başûrê Kurdistanê derdikevin pêş. Her çiqas li Zanîngeha Sorbonê ya Fransayê, perwerdeya bi ziman û edebiyata kurdî tê dayîn jî, navenda kurdolojiyê li Parîsê tuneye. Lê ji sala 2009an vir li Kurdistana Bakur li gelek zanîngehan beşên zimanê kurdî vebûne, di serî de jî Zanîngeha Mardîn Artûklûyê û li Mûş, Bîngol, Dêrsim, Amed û Wanê li gelek zanîngehan di warê kurdolojiyê de xebatên girîng tên kirin. Di vê çarçoveyê de 80 berhemên bi destê koma zanayên ku A. Jabayê konsolosê Erziromê yê Rûsyayê (1848-1866) ava kiribû hatine amadekirin ji bo “Pirtûkxaneya Kurdolojiyê ya Zanîngeha Mardîn Artûklûyê” hatin neqilkirin.³¹ Lê ji ber ku mijara me ya sereke nîne emê wekî kurteyekê qala hin kurdologên sereke û berhemên wan bikin.

²⁹ Di derheqê nîqaşên li ser çawanî û naveroka kurdolojiyê de ji bo nêrîneke balkêş binihêrin: Salih Akin, “Çend Pirsgirêkên Kurdolojiyê”, *Kovara Bîr*, j. 1, Diyarbekir, Bihar 2005, r. 9, 14.

³⁰ Martin van Bruinessen, “Türkoloji Varsa Kürdoloji de Vardır, Kürdoloji; Kürtlerle İlgili Bütün Bilimleri Kapsar”, *Kovara Bîr*, j. 1, Diyarbekir, Bihar 2005, r. 15-20.

³¹ Arşîva Kurdolojiyê ya Aleksander Jaba li Mêrdînê ye <http://www.aa.com.tr/kk/s/287617--arsiva-kurdolojiye-ya-aleksander-jaba-li-merdine-ye> (13.02.2014)

2.1. Kurtedîroka Kurdolojiyê

Pirsa ‘rojhilatnas çi demê rastî kurdan hatine?’ mijara dîroknasan be jî ji bo wêneyek derkeve holê, sînorên wan bên kifşkirin, xebatên van kesên piştî çavnasiya xwe ya bi kurdan re çi kirine, girîng e û ev hêmanê ji bo vê xebata me bibine delîl. Di mijara dîroka kurdolojiyê de, her wiha di mijara tarîxa destpêka kronolojiya wan xebatên ku dikevîne ber vê pêvajoya lêkolîn-nasîna kurdan de pirtûka “Rêzimana Kurdî” ya kêşeyê katolîk Maurizio Garzoni (1734-1804) ya di navbera salên 1764 û 1770yan de bi navê *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda* hatiye nivîsîn wekî xebata pêşîn tê qebûlkirin.³² Ji ber ku ev pirtûka qala gramera zimanê kurdî dike û tê de ferhengeke ji 4600 peyvan pêk tê heye di dîroka kurdolojiyê de Garzonî bi vê xebata ve wekî bavê kurdolojiyê “pêşengê zimannasiya kurdî” hatiye nasîn.³³ Heta Francesco Predarî dibêje “Ji rojhilatnasên gewre yê ewropî tu kesî fikra zimanê kurdî nekiriye” û Angelo De Gubernatis nîşan dide ku Garzonî “heq dike ku di nav pêşengên ku li ser zimanên rojhilatî xebat kirine de cihê xwe bigire.”³⁴

Piştî Garzonî pêvajoya kronolojiya kurdolojiyê dest pê dike û heya roja me bi sedan xebatên ku mirov dikare li ser hesabê kurdolojiyê bihesibîne derketine holê.³⁵ Lê gava em qala vê mijarê dikin divê em teqez helwesta Rûsyayê bi bîr bin. Lewra di warê kurdolojiyê de Rûsya û bajarê Petersburgê pir girîng e. Wekî tê zanîn Petersburgê di dema Rûsyaya Çarlixê de 200 salî paytext bûye. Ji ber vê yekê li gel cihê xwe yê siyasî her wiha ji hêla çandî ve jî wekî navendeke sereke derketiye holê.³⁶

Di warê kurdolojiyê de di sedsala XVIIIan de Rûsya dest bi xebatan dike. Di serê sedsala XVIIIan de Herbelotê Rûs pê dihesa ku kronolojiyê qala jiyana eşîrên kurdan

³² Maurizio Garzoni, *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda - Rêziman û ferhenga zimanê kurdî*, Roma, stamperia della Sacra Congregazione di Propaganda Fide, 1787.

³³ Bazil Nikitin, *Kürtler -Sosyolojik ve Tarihi İnceleme- 1-2*, ç. 4., wer. Hüseyin Demirhan-Cemal Süreyya, Deng Yayınları, İstanbul, 1994, r. 493.

³⁴ Maurizio Garzoni, *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*, Re-edisyon, Pêşgotina inglîzî: Mirella Galletti û wergera wê ya kurdî: Şerif Derince, Avesta, Stenbol, 2013.

³⁵ Joyce Blau û Nivîskarên Din, *Kürtler ve Kürdistan –eleştirel bir bibliyografya 1977-1990-*, wer. Aytekin Karaçoban, Mezopotamya Yayınları, Almanya, 1994; Rohat Alakom, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, ç. 2., Weşanên Deng, İstanbul, 1991; Necat Ebdulla, *Bibliyografyayî Kurdnasî –Kurd û Kurdistan le serçawe Fransiyekanda-* Hewlêr, 2009; Necat Ebdulla, *Bibliyografyayî Kurdnasî –Kurd û Kurdistan le serçawe Ingilîziyekanda-* Hewlêr, 2009.

³⁶ Vasilij Vilademirowiç Barthold, *Asyanın Keşfi Rusya ve Avrupada Şarkiyatçılığın Tarihi*, wer. Kaya Bayraktar-Ayşe Meral, Yöneliş Yayınları, İstanbul, 2000.

ya çiyân dike heye û ji bo bidestxistina vê dest bi xebatan dike. Di vê heyamê de seyahên ingilîz jî li pey vê dikevin û çend kopyeyên wê bi dest dixin, lê nusxeya herî baş leşkerên rûsan peyda dikin. Li Rûsyayê li ser daxwaza Katerînaya Mezin (1729-1796) xebat tên kirin.

Ji van xebatan yek jî ferhenga pirzimanî ya Peter Simon Pallas (1741-1811) ya bi navê “Ferhenga Berawerdkirî ya Hemû Ziman û Zaravayên Wan” e. Ev ferheng di bin banê Akademiya Zanistî ya Rûsyaya Çarlixê de hatiye amadekirin û P. S. Pallas jî endamê vê akademiye ye. Di vê ferhenga berawerdkirî de 276 peyvên kurdî hene.³⁷

Bi rastî dema mirov lêkolînerên biyanî dinihêre dibîne ku ev kesana yan leşker in an keşiş in yan jî karmendên dewletên xwe yên balyoz û nûner in. Lê bi gotina Edward Said hemû zimanzan in. Ango ev kesana hemû bi armanceke diyar van xebatan dikin. Bo mînak di dema şerê Rûs û Îranê de yê sala 1828an de bajarê Erdebîlê dikeve destê rûsan û Serheng Şuştelen pirtûkxaneya bi nav û bang wekî xenîmetê şer zeft dike û dişîne Petersburgê. Di nav van pirtûkên giranbiha de *Şerefnameya Şerefxan Bedlîsî* jî heye.³⁸ Heta ev nusxeya ya Şerefxan bi xwe ye ku di sala 1599an de bi destê xwe sererast kiriye.³⁹

Di salên 1830yî de xîmdarê edebiyata modern ya ermeniyân ya bi zaravayê aşxarabar Xaçatur Aboviyan (1809-1848) ji bo lêkolînerên alman H. Abich, F. Farrot, M. Wagner ên ji bo keştiya Hz. Nûh tên li ser çiyayê Gilîdaxê lêkolîna dikin wekî rêber û wergêr dixebite. Di wê heyamê de li ser kurdan dibe xwedî agahiyên berfireh û piştî

³⁷ Abdülmecit Tuğrul, *Batı'da Kürdoloji Çalışmaları ve Kurumları*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, İstanbul Üniversitesi, İstanbul, 2010, r. 12.

³⁸ Nikitin, *Kürtler -Sosyolojik ve Tarihi İnceleme- 1-2*, r. 494.

³⁹ Şerefxan Bedlîsî *Şerefnameya* xwe ya ku qala dîroka mîr û mîrekiyên Bedlîsê dike bi farisî nivîsiye û cara pêşîn 1860î de Véliaminof Zernof metnê wê yê farisî diweşîne. F. Charmoy jî di navbera salên 1869-1875an de di nav çar cildan de wergera wê ya fransî diweşîne. M. Emîn Zekî Beg di sala 1938an de werdigerîne kurdiya soranî. Beriya vê di sala 1858an de Mela Mehmûdê Bazîdî *Şerefnameyê* wergerandiye kurmançî û ev wergera wî bi amadekirina Seîd Dêreşî li başûrê Kurdistanê di sala 2007an de hat weşandin û çapeke vê wergerê bi destê weşanên Nûbiharê tê amadekirin. Her wiha Mihemed Elî Ewnî di 1945an de *Şerefname* bo erebî wergerand, cildê pêşîn di sala 1958an de cildê duduyan jî di sala 1962an de li Qahîreyê hat weşandin. M. Emîn Bozarslan jî vê wergera erebî ew beşa pêşîn ya qala dîroka kurdan dike wergerande tirkî û di sala 1971ê de di nav weşanên Antê de hat belavkirin. Ji vê şunde ev berhem bi gelek caran hat wergerandin û weşandin. Ji bo agahiyên berfireh li bibliyografya Yusuf Baluken amade kiriye û di destpêka wergera *Şerefnameyê* ya tirkî ku Nûbiharê weşandiye de hatiye bicihkirin binihêrin: Şerefxan Bidlîsî, *Şerefname I*, ç. 2., wer. Abdullah Yeğin, Nûbihar, İstanbul, 2014, r. 25, 43.

ku Wagner rê li ber dixe ku ew agahiyên xwe yên li ser folklor, edet, dîrok û çanda kurdan binivîse û li ser vê ew jî çend maqeleyan dinivîse, qala dewlemendiya zimanê kurdî dike, derheqê jiyana civakî ya kurdan de agahiyan dike, li ser helbest û şairên kurdan şîrovayan dike.⁴⁰

Di salên 1850yî de Aleksander Borejko Chodzko (1804-1891) û Auguste Jaba bi kurdî û berhemên kurdî re eleqedar bûne. Ji ber ku emê dorfirehî li ser A. Jaba bikin em li vir qala xebatên wî nakin.

Peter Ivanovich Lerch (1828-1884) di sala 1856an de li ser şervanên kurd yên di deste rûsan de dîl in raporekê amade dike û ev xebat ji bo xebatên kurdolojiyê girîng e. Ji hêla din ve li Petersburgê Ferdinand Justi (1837-1907) xebata xwe “Gramera Kurdî” di sala 1880yan de diweşîne.

Lê ji bo ku mirov bikaribe paşxaneya kurdolojiyê hîn bibe divê bi kurtebirî be jî qala kronolojiya wê bike.

2.1.1. Îtalya

Di dîroka xebatên Kurdolojiyê de xebata Maurizio Garzoni ya di navbera salên 1764 û 1770yan de bi navê *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda* hatiye nivîsîn wekî xebata pêşîn tê qebûl kirin.⁴¹ Ji ber vê hindê Garzoni wekî bavê kurdolojiyê tê hesabê. Her wiha di sala 1802an de hevpîşeyê wî M. Giuseppe Campanile (1762-1835) ji bo xebatên dîni dişînin Mûsilê. Şeş sal şûnda wekî berpirsyarê dîni yê herêma Mezopotamya û Kurdistanê tê destnîşankirin. Di sala 1815an de vedigere Napoliyê û li wir zanîngeha Napoliyê bûye mamosteyê zimanê erebî. Di sala 1818an de kitêba wî ya dîroka Kurdistanê ya bi navê *Storia della Regione del Kurdistan* hatiye weşandin. Campanile di vê xebata xwe de qala maceraya xwe ya li Kurdistanê dike. Thomas Bois (1890-1975) ji îtalî werdigerîne fransî û bi navê *Histoire du Kurdistan* li Libnanê diweşîne. Ev kitêb bi tirkî jî hatiye weşandin.⁴²

Di sala 1836an de Gottlieb Christian Hornle (1804-82) yê ku misyonerekî ji Baselê ye li gel F. Schneider li Urmiyeyê cara pêşîn li ser etnografya û zimanê kurdî

⁴⁰ Xaçatur Aboviyan, “Kurdî”, *Kavkaz*, j. 46-51, Tiflis, 1848; Xaçatur Aboviyan, Yêrkêrî Joxovatsu, Hator 8, Êrîvan, 1958, vgz. Metin Yüksel, *Kurdoloji û Malbata Celîlan*, Avesta, Stenbol, 2014, r. 18.

⁴¹ Maurizio Garzoni, *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda - Rêziman û Ferhenga Zimanê Kurdî*, Roma, stamperia della Sacra Congregazione di Propaganda Fide, 1787; Maurizio Garzoni, *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*, Re-edisyon, Pêşgotina inglizî: Mirella Galletti û wergera wê ya kurdî: Şerif Derince, Avesta, Stenbol, 2013.

⁴² M. Guiseppe Campanile, *Kürdistan Tarihi*, wer. Heval Bucak, Avesta, İstanbul, 2009.

dixebitin. Li gor gotina Thomas Bois ew kes e ku cara pêşîn Încîla St. Johna wergerandiya kurdiya mukrî.⁴³ Alessandro De Bianchi di xebata xwe ya bi navê “*Viaggi in Armenia Kurdistan e Lazistan*”ê [Gera li Ermenistan, Kurdistan û Lazistanê] ya ku di sala 1863an de weşandiye de qala dîrok, çand, keleşor û baweriyên kurdan dike.⁴⁴ Gerokê swêdî Sven Hedin (1865-1952) di sala 1905an de derdikeve gereke dirêj û heya Hindistanê diçe. Di encama vê gera xwe de kitêba xwe ya bi navê “Gera li Îran, Hindistan, Sîstan û Belucistanê” bi almanî [Zu Land nach Indien durch Persien, Seistan und Bclutschistan] bi du cildan li bajarê Leipzigê di sala 1910an de dide çapkirin û bi navê “*Dalla Persia, all’India Attraverso il Seistan e il Belucistan*” jî bi zimanê îtalyayî di sala 1912an de li Milanoyê dide çapkirin.⁴⁵ Sven Hedinê kaşif di ve gernameya xwe de qala kurdan jî dike.

Her wiha Mirella Galettiyê⁴⁶ di berhema xwe ya bi navê “*Curdi e Kurdistan in opere Italiane del XIII-XIX secolo*” [Di Çavkaniyên Îtalî yê Sedsalên di Navbera XII-XIXyan de Kurd û Kurdistan]ê de qala xebatên Îtalyayê li ser kurd û Kurdistanê hatine kirin dike. Ev berhem di navbera salên 1973-1978an de hatiye amadekirin û ji bo xebatên li ser kurdan yê îtalyanan berhemeka kêrhatî ye û mirov dikare weke berhevdana hemû xebatên di vê mijarê de bihesibîne. Jixwe Mirella Galettiyê ji 1970 vir ve gelek caran li rojhilata navîn geriyaye, li ser herêmê gelek xebatên curbecur kirine. Kitêbeka wê ya li ser pirsgerêka kurdan e û bi navê “*Sviluppi del Problema Curdo Negli Anni 1976-1978*” [Di Navbera Salên 1976-1978an de Geşedana Pirsgerêka Kurdan] û ji xebatên wê yeka balkêş jî derbarê xwarinên kurdan de ye. Ev kitêba xwe li gel kurdekî ji Kerkûkê yê bi navê Fuad Rahman amade kiriye û bi hûngilî qala çanda xwarinê ya kurdan kiriye.⁴⁷

Xebateke din ya li ser kurdan jî gramer û ferhenga Alessandro Coletti (1928-1985) ye. Ji berhema wî ya du cildî “*Grammatica e Dizionario della Lingua Curda Con*

⁴³ Me di vê beşê de gelekî ji nivîsa Joyce Blau ya bi sernavê “Kurdish Language II. History of Kurdish Studies, îstifade kir, <http://www.iranicaonline.org/articles/kurdish-language-ii-history-of-kurdish-studies> (07.09.2014)

⁴⁴ Alakom, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, r. 30-31.

⁴⁵ H. b, r. 31.

⁴⁶ Mirella Galetti, *Curdi e Kurdistan in opere italiane del XIII-XIX secolo*, in: *Oriente Moderno*, anno LVIII, 11, Rome, 1978; *Kurd û Kurdistan la nusrawakanî Italî da, la saday sêzdam - nozdam* (Kurds and Kurdistan in the 13th-19th century Italian texts), trad. Jasim Tawfiq, Éd. Binkay Hangaw, Stockholm, 1987.

⁴⁷ Fuad Rahman-Mirella Galetti, *Kürt Yemek Kültürü*, wer. Fuat Serdaroğlu, Avesta, İstanbul, 2010.

esercizi lettere” [Rêziman û Ferhenga Kurdî] cildê pêşîn derketiye, lê ferhenga wî ji ber mirina nivîskar nêvcî maye.⁴⁸ Ji bilî vê Alessandro Coletti li ser zimanên îranî gelek xebat kirine. Di salên 1984-1985an de ji xebata wî ya li ser ferhenga berawirdkirî ya kurdiya mukrî du fasîkul derçûne.⁴⁹

2.1.2. Fransa

Bi giştî li rojava hemû welatan mirov kesên bi rojhilatê re eleqedar bûne dibîne. Piraniya wan jî gerok, misyoner, zimanzan û bi kurtasî oryantalist in. Di vê babetê de xebatên qala kurdan, kurdistanê dikin yê di rengê gernameyan de ne. Lewra seyah piştî ku vegeyriyane welatê xwe li ser seyahetên xwe gername nivîsîne. Li Fransayê kesên qala kurd û Kurdistanê kirine Jean de Thevanot, Jean Chardin, J. B. Tavernier, P. Am. Jaubert, C. F. Volney, Hommaire de Hell, E. Flandin, P. Coste, E. Bore, P. Muller Simonis, H. Hyvernet, Henry Binder û Jacques de Morgan û yê din in.

Ji ber taybetiya disîplîna rojhilatnasyî em dikarin bibêjin hemû dewlet û sazîyên rojavayê bi gel, ziman, çand, erdnîgarî û dîroka wê re eleqedar bûne. Loma Fransa jî di warê kurdolojiyê de çalak e. Di navbera sedsalên XVII-XIXyan de û her wiha îro jî xebatên li ser kurdan gelek in.

Seyahê fransî Jean-Baptiste Tavernier (1605-1689) di emrê xwe de 36 salên xwe bi gerê borandiye û di navbera salên 1631-1663yan de şeş caran li Rojhilata Navîn geriyaye û çûye Amed, Cizîrê, Bedlîsê, Erziromê, Qaqizman, Qers, Mêrdîn, Riha û Wanê. Piştî van gerên xwe kitêba xwe ya bi navê “*Les Six Voyages de...*” dinivîse û tê de qala kurd û Kurdistanê dike.⁵⁰

John Chardin di gernameya xwe “*Voyages du chev Chardin en Perse et autres lieux de l’Orient*” [Gerên Şovalye Chardin yê li Îran û welatên din ên Rojhilatê] de bi kurtî qala kurdan dike. Ev gername di sala 1686an de li Amsterdamê hatiye weşandin.⁵¹

Li Fransayê xebatên kurdolojiyê yê akademîk di destpêka sedsala XXan de dest pê dikin û peyra dema li Parîsê kursiyê Kurdolojiyê tê avakirin li wir dewam dike. Li

⁴⁸ Alakom, *Kurdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, r. 31.

⁴⁹ Alessandro Coletti (1928-1985) <http://www.iranicaonline.org/articles/coletti-alessandro> (07.04.2015)

⁵⁰ Jean-Baptiste Tavernier, *Les Six Voyages de J. B. T. Etc., en Turquie, en Perse, et aux Indes*, Ist ed., Paris, 1677; Jean-Baptiste Tavernier, *The Six Voyages of J. B. T. La Haye, Through Turkey Into Persia, and the East Indies*, 1677; Jean-Baptiste Tavernier, *Tavernier Seyahatnamesi*, Editör: Stefanos Yerasimos, wer. Teoman Tunçdoğan, Kitap Yayınevi, İstanbul, 2006.

⁵¹ Tuğrul, *Batı’da Kürdoloji Çalışmaları ve Kurumları*, r. 12.

wir bi giştî li ser ziman, şaristanî û dîroka kurdan xebat tê kirin. Xebatên kurdolojiyê pey wê re li Zanîngeha Sorbonê di Enstitûya Ziman û Şaristaniyên Rojhilatê de berdewam dîkin. Li vir Roger Lescot (1914-1975) jî sala 1945an pê ve xebatên kurdolojiyê bi rê ve dibe. Lê dema ku 1946an de diçe Şamê li dewsa wî Kamuran Bedirxan (1895-1978) dibe serokê kursiyê kurdolojiyê. Peyra li Fransayê Enstitûya Kurdî ya Parîsê hatiye avakirin û ev enstitûya pêşîn e li ser kurdan xebatan dike. Wekî vê her wiha li Swêdê jî li Dibistana Mamosteyan ya Bilind ya Stockholmê beşa kurdî vebûye. Li wir dersên ziman, wêje û dîroka kurdî tînin dayîn.

2.1.3. Almanya

Li gor Cemal Nebez di xebata xwe “*Kurtemêjûyekî Kurdnasî lê Elmaniyada*” ya ku di sala 1974an de li Bexdayê hatiye çapkirin de qala xebatên kurdolojiyê yên li Almanyayê hatine kirin dike û balê dikşîne ku di sala 1473yan de Johann Schitberger belgeyeke derbarê kurdan de diweşîne û ev belge li Almanyayê ya herî kevn e.⁵² Her wiha lêkolîna xwe ya di sala 1841ê de *Das Land und Volk der Kurden*, amade kiriye, piştî mirina wî di sala 1892an de li Berlînê hatiye çapkirin.

Wêjekarê alman Karl May (1824-1912) jî romaneke bi navê “*Durchs Wilde Kurdistan - Li Kurdistanê Hov*”⁵³ nivîsiye û filma wê jî hatiye kişandin. Her wiha J. A. Bergk di gernameya xwe ya bi navê “*Anadolu, Gurcistan, Ermenistan, Kurdistan, Iraq û Cizîre*”yê de derbarê jiyana kurdan ya civakî û çandî de agahiyan dide û di sala 1799an de hatiye weşandin. Li gor îdiaya Bilal N. Şimşir jî kesên seyahî yên cara ewil qala “Kurdistanê” kirine yek jî ew e û navê Kurdistanê wî ragihandiye dinyaya derva.⁵⁴

Moritz Wager (1813-1887) di berhema xwe ya bi navê “*Reise nach Persien und dem Lande der Kurden*” [Rêwîtiya li welatê Fars û Kurdan] de bi berfirehî qala jiyana û etnografîya kurdan dike û di sala 1851ê de li Leipzigê hatiye çapkirin.⁵⁵

Di serdema dewleta Osmanî de subayê alman Hellmut von Moltke (1800-1891) di çarçoveya peymanê di navbera osmanî û almanan de sê salan (1836-1839) di artêşa osmanî de wezîfeyê dike. Beşdarî hereketên li Kurdistanê jî dibe. Van serdaboriyên xwe bi nameyan ragihandiye malbat û hezkiriyên xwe û peyra ev name bi sernavê “*Nameyên*

⁵² Cemal Nebez, “Kurtemêjûyekî Kurdnasî le Elmaniyada” *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, c. 1, beş, 2, Bexda, 1974; vgz. Alakom, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, r. 33.

⁵³ Karl May, *Vahşi Kürdistan İçlerinde*, wer. Atilla Dirim, Yurt Kitap Yayın, Ankara, 2001.

⁵⁴ Bilal N. Şimşir, *Kürtçülük (1787-1923)*, ç. 2., Bilgi Yayınevi, Ankara, 2007, r. 539.

⁵⁵ Alakom, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, r. 33.

Tirkiyeyê” daye weşanê.⁵⁶ Moltke di vê berhema xwe de bi berfirehî qala kurdan û herêma wan jî dike.⁵⁷ Malmîsanij di kovara *Tîrêjê* hejmara çaran de nivîsek li ser vê kitêbê nivîsiye û ji wê nameya bi navê “*Çiyayên Kurdistanê*” wergerandiye kurmançî. Dema mirov nameyê dixwîne bi rastî jî dibîne ku di derheq rewşa kurdan ya siyâsî, erdnîgarî, debar, aborî, nifûs û hwd ya wê demê de gelek agahiyan dide û ji hêla babetên curbecur ve dide nasîn.⁵⁸

Gava mirov dêna xwe dide xebatên almanan ên li ser kurdan, tê xuyanê ku di navbera salên 1840-1930yan de gelek xebatên berbiçav derketine holê. Her wiha têkiliyên di navbera zanyarên alman û rûs jî di wê heyamê de geş dibin. Ji ber vê hindê zanyarên alman ji tecrubeya rûsan sûd werdigirin û li Almanyayê xebatên Kurdolojiyê zêde dibin. Di vê çarçoveyê de Emil Rodiger (1801-1874) û August-Friedrich Pott (1802-1887) li ser xebatên li Almanyayê hatine kirin lêkolînê dikin û di vê xebatê de cara pêşîn balê dikşînin ku kurdî di nav zimanên Îranî de zimanekî bi serê xwe ye.⁵⁹ Albert Houtoum-Schindler (1846-1916) di salên 1882-1888an de li bajarê Leipzig ferhenga xwe ya Kurdî-Almanî ya bi navê “*Beiträge zum Kurdischen Wortschatze*” [Tevkariyek li Kana Peyvên Zimanê Kurdî] diweşîne.⁶⁰ Ji hêla din ve rojhilatnasê alman Ferdinand Justi jî di sala 1880yê de lêkolîna xwe ya bi navê “*Gramera Kurdî*”⁶¹ de bi dîrok û etîmolojiya kurdî re mijûl bûye. Her wiha Ferdinand Justi li ser ferhenga A. Jaba ya *Kurdî-Fransî*⁶² ya di sala 1879an de li Petersburgê hatiye weşandin jî xebitiye û pêşgotinek jê re nivîsiye. Herdu xebatên wî “*Notên li ser Peyvên Biyanî yên di Kurdî de*” û “*Di Kurdî de Navên Heywanan*” jî bo fransî û zimanên din jî hatine wergerandin. Rojhilatnasê alman yê bi navê deng Albert Socin (1884-1899) li gel Eugen Prym (1843-1913) berhevdanek kiriye. Di vê xebatê *Mem û Zîn* ya Ehmedê Xanî (1650-

⁵⁶ Helmuth van Moltke, *Türkiye Mektupları*, wer. Hayrullah Ors, Remzi Kitapevi, İstanbul, 1969; Helmuth Graf von Moltke, ‘*Türkiye Mektupları*’, Varlık Yayınları, 1967.

⁵⁷ Osman Aytar, “Hesenkêf dê di bin avê de bimîne!”, *Kovara Çira*, j. 17, Swêd, 1999, r. 6.

⁵⁸ M. Malmîsanij, “Nameyên Tirkiyeyê - Çiyayên Kurdistanê”, *Kovara Tîrêjê*, j. 4, Swêd, 1981, r. 44-48.

⁵⁹ Emil Rodiger-August-Friedrich Pott, “Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes 3”, *Kurdische Studien*, 1840, r. 1-63; 4, 1841, r. 1-42 û r. 259-280; 5, 1843; r. 57-83; û 7, r. 91-167; vgz. <http://www.iranicaonline.org/articles/kurdish-language-ii-history-of-kurdish-studies> (16.04.2015)

⁶⁰ Albert Houtoum-Schindler, “Beiträge zum kurdischen Wortschatz”, c. 38, ZDMG (Zeitschrift der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft, Leipzig) r. 43, 116.

⁶¹ Ferdinand Justi, *Kurdische Grammatik*, Commissionäre der Kaiserlichen akademie der wissenschaften; Eggers & C. U. J. Glasunow, 1880.

⁶² *Dictionnaire kurde-français* par M. August Jaba, publiée par M. Ferdinand Just, Petersburgê, 1879; A. Jaba, *Dictionnaire Kurde-Français*, Pêşgotin: Salih Akin, Avesta, Stenbol, 2014.

1706), tevî destana *Zembîlfiroş* gelek çîrok û kilamên gelêrî tê de hene. Her wiha ji bo sûdwegirtinê A. Socin ferhengokeke Kurd-Almanî jî li vê berhemê zêde kiriye. Her wiha li ser çîrok û kilamên kurdî yên di devoka Tur Abidînê jî xebateke wan hatiye weşandin.⁶³

Viennese Hugo Makas (1857-?) di sala 1892an de li Petersburgê hin metnên folklorîk yên kurdî li gel wergera almanî, şîroveya gramer û ferhengekê weşand. Li Berlînê di sala 1903an de Albert von Le Coq (1860-1930) nusxeyeke *Nûbara Biçûkan*⁶⁴ ku Ehmedê Xanî ji bo biçûkên kurmancan erebî baş hîn bibin Erebi-Kurdî amade kiriye û Yûsif Ziyaedîn el-Xalidî di sala 1892an de li Stenbolê daye çapkirin.

Gava meriv li van xebatan dinihêre bi rastî jî derdikeve holê ku rojhilatnasên alman gelekî li ser kurdan xebitîne. Ji wan yek jî Eduard Sachau (1845-1930) ye. Ev zanyar li Zanîngeha Berlînê dekanê beşa Zimanên Rojhilat e. Seba ku lêkolînên zanistî bike çûye Kurdistanê û bi navê “*Reise in Syrien und Mezopotamien*” [Gera li Sûriye û Mezopotamyayê] berhemeke berfireh amade kiriye û di sala 1883yan de weşandiye. Paşê jî bi navê “*Am Euphrat und Tigris: reisenotizen aus dem winter 1897-1898*” [Gera Zivistana 1897-1898 ya li Derûdorê Dicle û Feratê] berhemek nivîsiye û di sala 1900î de li Leipzigê daye weşandin. Ji ber van xebatên bi vî rengî ji bo kurdolojiyê Zanîngeha Berlînê bi saya Sachau dibe derfeteke baş.⁶⁵ Di sala 1904an de Martin Hartman (1851-1918) li Berlînê *Dîwana Melayê Cizîrî* diweşîne.⁶⁶ Hartman li gelek deverên Kurdistanê geriyaye û li ser erdnîgarî⁶⁷ û edebiyata kurdan⁶⁸ jî xebat kirine. Hartman wekî rojhilatnasekî çalak ji bilî kurdan bi ereb, tirk, fars û cihûyan re eleqedar bûye û di derheqê wan de jî xebatên girîng kirine.

2.1.4. Amerîka

Ji Amerikayê misyoner Samuel A. Rhea di navbera salên 1851-1865an de tê Kurdistanê li Hekariyê bi cih dibe. Lê bi taybetî Nasturiyên li herêmê gundê Memikan a

⁶³ E. Prym and A. Socin, *Kurdische Sammlungen, Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tür Abdin*, St. Petersburg, 1887.

⁶⁴ Ehmedê Xanî, *Nûbihara Biçûkan*, Şîrovekirin: Huseyn Şemrexî, Nûbihar, Stenbol, 2008.

⁶⁵ Bilal N. Şimşir, *Kürtçülük (1787-1923)*, r. 53.

⁶⁶ Martin Hartman, *Der kurdische Diwan des Schëch Ahmed*, genannt Malā-i Cizrî, Berlin, 1904.

⁶⁷ Martin Hartman, Bohtān, *Eine topogr-histor Studie* (Botan, Lêkolîneke Topografîk û Dîrokî), Berlin 1897. Aus: Mitteil der Vorderasiat, Gesellschaft 1896, 2 und 1897, 1.

⁶⁸ Martin Hartman, *Zur kurdischen Literatur - Mit Tafel* (Wêjeya Kurdî – Bi Wêneyan), Wiener Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes XII, 102.

li Geverê dijîn re eleqedar dibe. Ji hêla din ve li ser kurdan jî lêkolîna dike û xebata xwe ya “*Gramera Kurdî*” amade dike.⁶⁹ Di vê gramerê de ferhengeke ji 1600 peyvan pêk tê jî heye. Ludvig Olsen Fossum li ser devoka mukrî a li herêma Mehabadê tê axaftin dixebite û di sala 1919an de vê xebata xwe ya bi navê “*A practical Kurdish grammar*” diweşîne.⁷⁰ Wekî dîn Încîlî werdigerîne herdu zaravayê kurdî soranî û devoka mukrî. Ji zanîngeha Michiganê N. Mc. Carus li ser zaravayê kurdiya li herêma Silêmaniyeyê tê axaftin xebitiye û bi navê “*A Kurdish Grammar*”ê li New Yorkê di sala 1958an de dide çapkirin.⁷¹ Her wiha ferhenga xwe ya *Kurdî-Ingilîzî*⁷² amade dike.

2.1.5. Îngiltere

Xebatên Dibistana Ingilîzan a Lêkolînên Kurdî di destpêka sedsala XXan de geş bûn. Major Ely Banister Soane (1881-1923) sala 1902an de hat Îranê. Farisî û kurdiya wî ewqasî baş bû çend salan li Mezopotamya û Kurdistanê di dilqê kesekî xwecih de geriya. Wî xebata xwe ya li ser gramera kurdî de li Londrayê di sala 1913an de bi navê “*Grammar of the Kurmanji or Kurdish Language*” weşand. Ji pey wê re rêzimana xwe ya di asta pêşîn de “*Elementary Kurmanji Grammar*” li Bexdayê di sala 1919an de da çapê. Herî dawîn jî ferhenga xwe ya *Ingilîzî-Kurdî* diweşîne.

Robert Fier Jardine (1894-?) li Kurdistanê wekî şewirmendê siyasî dixebite û xebata xwe ya li ser zaravayê kurdên Behdînî yên li Mûsil û dorberê wê dijîn bi navê “*Kurmanji a Grammar of the Kurmanji of the Kurds of Mosul Division and Surrounding Districts of Kurdistan*” li Bexdayê sala 1922an de çap dike.

2.1.6. Rûsya

Ji bo xebatên kurdolojîyê navenda sereke û herî pêşîn tê bîra mirov Rûsya ye. Li Rûsya yê xebatê hê di serdema Çarîtiya Rûs de dest pê dikin û bajarê St. Petersburgê dibe war û wargehê kudolojîyê. P. S. Pallas ferhengeke berawirdkirî ya bi navê “*Ferhenga Berawirdkirî ya Hemû Ziman û Zaravayan*” amade kir. Di vê ferhengê de 149 zimanên

⁶⁹ Samuel A. Rhea, “Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District,” *Journal of the American Oriental Society*, 10/1, 1872, r. 118, 56.

⁷⁰ Ludvig Olsen Fossum, *A practical Kurdish grammar*, The inter-Synodical Ev. Lutheran Orient-Mission Society, Augsburg Publishing House, Minneapolis, 1919.

⁷¹ Ernest N. McCarus, *A Kurdish grammar*, American Council of Learned Societies, New York 1958.

⁷² Ernest N. McCarus, *A Kurdish-English Dictionary: Dialect of Sulaimania*, Iraq (Kurdish) Paperback, 1967.

Asyayê û 51 zimanên din hene. Ji ber ku kurdî jî zimanek ji zimanên Asyayê ye di beşa 77an de cihê xwe digre. Pallas dema ev beşa derheqê kurdî de amade kiriye, ji xebatên J. A. Guldenstadt yê di navbera salên 1768-1775an de li Qefqasyayê kirine sûd wergirtiye û ew peyvên ku berhev kirine wekî bingeh hildaye.⁷³

Li Rûsyayê di warê kurdolojiyê de tenê lêkolînerên rûs nexebitîne, li gel wan ji Fransa, Polonya û Almanyayê jî gelek kes li ser kurdan xebitîne. Li Zanîngeha Kazanê di warê filolojiya zimanên îranî de Il'ya Nikolaevich Berezîn (1818-1896) lêkolînan dike. Dema li ser zimanên îranî gilani, tatî, talişî, lahicanî, mazenderanî lêkolîne dike di nav wan zimanan de kurdî jî heye.⁷⁴

Ji kurdologên rûs yê girîng yek jî P. I. Lerch e. Lerch dema rastî êsîrên kurd yê di şerê Kırımê de ketine destê rûsan tê, bi wan re dikeve têkiliyê û bi vî awayî lêkolînen xwe yê li ser kurdan pêş ve dibe. Lerch li ser dîrok û etnografya kurdan û pêşiyên wan disekine û di vî warî de sê pirtûk weşandine. Lê di xebata wî de tiştê herî balkêş yek jî ew e ku li ser herdu zarvayên kurdî kurmançî û zazakî tev sekiniye. Lerch di pirtûka xwe ya pêşîn de bi gelemperî li ser kurdan disekine, bi baldarî qala kurdên Kurdistana Îran, Tirkiye û Rûsyayê dijîn dike. Di ya duduyan de metnên bi herdu zarvayên kurdî kurmançî û zazakî û wergera wana rûsî hene. Xebatên wî yê li ser rêzimanê û xebata ferhengê ya kurmançî û zazakî jî di cildê sisyan de ne.⁷⁵

A. Jabayê polonyayî di navbera salên 1848-1866an de li Erziromê balyoziya Rûsyayê kiriye. Di wê heyamê de Jaba li ser ziman û wêjeya kurdî xebitiye. Akademiya Zanistê ya Rûsyayê û Mûzeyaya Asyayê ji bo xebatên Jaba piştgiriya wî kiriye. Her wiha rojhilatnas Albrecht Bernhard Dorn (1805-1881) bi pêşniyazên xwe rê li ber Jaba xistiye da ku li ser folklorê kurdî, ziman û edebiyata kurdî, etnografya û dîroka kurdan bixebite. Jaba li Erziromê bi Mela Mehmûdê Bazîdî re bûye heval û ji wî kurmançî hîn bûye. Piraniya xebatên xwe yê li ser zimanê kurdî û kurdan bi xêra wî û bi hev re pêk anîne. Ji xebatên Jaba ya herî girîng “*Receuil de Notices et Extraits Kurdes*” e ku li ser metnên kurdî xebitiye. Jaba li ser ferhengan jî xebitiye, ferhenga *Kurdî-Fransî* û ferhenga

⁷³ Reisen durch Russland und Gaucacischen Gebürge, hrsg. Von P. S. Pallas, T. I-II, St. Petersburg, 1787-1891.

⁷⁴ Il'ya Nikolaevich Berezin (1818-96) <http://www.iranicaonline.org/articles/berezin-ilya-nikolaevich> (04.09.2014)

⁷⁵ Peter Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer - 1*, St. Petersburg, 1856; Peter Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer - 2*, St. Petersburg, 1857; Peter Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer - 3*, St. Petersburg, 1858.

Fransî-Rûsî-Kurdî amade kiriye. Margarîta B. Rudenkoyê di sala 1957an de xebata xwe ya bi navê *Koleksiyona A. Jaba-Destnivîsên Kurdî* da çapê. Ev xebata ji bo rojhilatnasî û kurdolojiyê çavkaniyeke sereke ye.

Di sedsala XIXan de çavkaniyên kurdolojiyê bal bi rûsî tên wergerandin. Ji van yeka girîng jî *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* ye. Her çendî *Şerefname* wekî dîroka malbata Şerefxan be jî wekî dîroka kurd tê qebûlkirin. Şerefxan pirtûka xwe bi farisî nivîsiye û di cildê pêşîn de qala malbata xwe ya ku bi qasî 5 sedsalan rêveberiya herêma Bedlîsê kirine dike û di cildê duduyan de jî qala dîroka dewleta Osmanî dike. Ji ber ku nivîskarê wê kurd e û bi berfirehî qala kurdan, rêveberiya wan dike ji bo dîroka kurdan wekî çavkaniyeke sereke tê qebûlkirin. Nusxeya *Şerefnameyê* ku nivîskar bi xwe sererast kiriye û bi tarîxa 1599an îmze kiriye, piştî şerê Rûs-Îranê 1828an anîne Petersburgê. *Şerefname* bi destê V. Véliaminof-Zernof (1830-1904) bi navê “*Scheref-Nameh ou Histoire des Kourdes, Preince de Bidlis*” tevî farisiya wê hatiye weşandin. Peyra François Bernard Charmoy (1793-1863) *Şerefnameyê* ji farisî werdigerîne rûsî û di navbera salên 1868-1875an de di nav çar cildan de bi navê “*Cheref-Nameh ou Fastes de la Nation Kourde*” hatiye weşandin.⁷⁶

S. A. Egiazarovê ermenî gelek salan di nav kurdên Rewanê de maye û kurmancî hîn bûye. Paşê xebata xwe ya bi navê “*Kurteceribandina Etnografiya Kurdên Rewanê*” li Tiflîsê da çapê. Her wiha xebata wî ya mezin ferhenga *Rûsî-Kurdî* û *Kurdî-Rûsî* jî heye. Egiazarov ji bo vê ferhengê çavkanî berhev kirine û Zagoski jî ji bo çapê amade kiriye.⁷⁷

Zimanzanê rûs A. Chodzko li ser filolojiya zaravayê kurdî soranî dixebite û vê xebata xwe li Parîsa paytextê Fransayê di sala 1857an de di kovara *Jornal Asiatiqueyê* bi navê “*Etudes philologiques de la Langue Kurde (dialecte Suleimanie)*” dide weşandin.

Oskar Mann (1867-1917) di salên 1901-1903ên de Îran ziyaret kir û li ser zimanên îranî yên kevin û yên hemdem xebitî. Her wiha ji Kurdistana Îranî koleksiyoneka baş ya ji metnên folklorîk bi dest xist. Di sala 1906an de cara ewil xebata wî ya bi navê “*Die Mundart der Mukri-Kurdenwas-Devoka Kurdên Mukrî*” li Berlînê hat çapkirin. Lê ji ber

⁷⁶ Ev nusxeya *Şerefnameyê* ya fransî bal bi tirkî ve hat wergerandin û ji nav weşanên Yabayê bi 5 cildan derçû. Şerafeddin Han, *Şerefname, Kürt Ulusunun Tarihi*, wer. Celal Kabadayî - Rıza Katı - Vedii İlmen, Yaba Yayınları, İstanbul, 2009-2010, 2648.

⁷⁷ “*Belavoka Komeleya Geografik ya Rûsî, liqa Qefqasê*” pirtûk 13, berg 2, 1891, r. 1, 122 (bi rûsî), vgz. Jan Reyhman, “Ji Rûpelên Nenaskirî yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, wer. Sidqî Hirorî, *Nûdem Werger*, j. 1, Swêd, Payiz 1996, r. 141.

ku di sala 1917an de wefat kir ew meteryalên wî yê di heyama gerên xwe yê li Riha, Sêwreg, Diyarbekir, Bedlîs, Cizîr, Duhok, Mûsil û Helebê de di navbera salên 1906-1907an de bi dest xistin nehatine çapkirin. Lê paşê beşek ji van lêkolînên Mann yê li ser Kurd-Farsan bi destê Karl Hadank hatin weşandin.

Li Rûsyayê ji 1917an piştî Şoreşa Mezin ya Cotmehê ji bo xebatên li ser kurdan û zimanê kurdî derfetên nû pêk hatin. Di sala 1931ê de li Zanîngeha Dewletê ya Lenîngradê li Kursiyê Îranolojiyê beşa kurdî jî vedibe. Li vir zanyarên kurd û biyanî li gel hev xebatan dikin. Di encama vê de Erebe Şemo (1897-1978), Qanadê Kurdo (1909-1985) û Isak Sukerman û yê din derketine pêş. Di sala 1934an de Kongreya Yekemîn ya Kurdolojiyê hat lidarxistin. Dîsa li Taşkentê di sala 1957an de Kongreya Hemû Rojhilatnasên Rûsyayê civiya û kurdologên rûs pêşkêşiyên xwe yê li ser kurdan kirin. Li Ermenistanê sala 1958an Akademiya Zanistê Ya Ermenistanê-Beşa Rojhilatnasan hat avakirin. Li vê beşa rojhilatnasan ji bo li ser gelên rojhilata navîn bixebitin komên xebatê yê Kurdoloji, Îranoloji, Tirkoloji û Erebolojiyê jî hatin amadekirin. Her wiha di sala 1959an de li Şaxa Lenîngradê ya Enstitûya Rojhilatnasiyê ya Akamediya Zanistê ya Yekîtiya Sovyetê beşa kurdolojiyê hat vekirin. Ev beş ji vê şûnda heya hilweşîna Yekîtiya Sovyetê bûye navenda lêkolînên kurdolojiyê. Di navbera salên 1940-1984an de li Sovyetê 75 tezen doktorayê hatine nivîsîn û ji wan 15ê wê li ser kurdî ne.⁷⁸

Hakop Gazaryan bi navê Şems alfabeya kurmançî amade dîke û di sala 1921ê de dide weşandin. Lê yekemîn alfabeya kurdî ya bi tîpên latinî bi destê Erebe Şemoyê kurmançî û Îsahak Marogûlavê (1868-1933) aşûrî hatiye amadekirin. Wan di sala 1929an de yekemîn pirtûka xwe bi alfabeya kurdiya latinî bi navê “*Xə-xə hinbuna xəndəna nvisara kyrmançî*”⁷⁹ “Xwe-xwe hînbûna xwendina nivîsana kurmançî” çap kirin.⁸⁰ Ji pey wê re 1930yê de *Riya Teze* bi alfabeya latinî dest bi weşanê dîke.

Ji van kurdologan yekî herî zêde divê qala wî bê kirin Minorsky ye. Minorsky xebata xwe ya pêşîn di sala 1911an de St. Petersburgê weşandiye. Rojhilatnas Minorsky beşdarî 8 civînên Kongreya Navneteweyî ya Rojholatnasan û di van civînan de ji bo kurdolojiyê de hewl daye. Minorsky di Kongreya Navneteweyî ya Rojhilatnasan ya 20an de ku li Brukselê hatiye lidarxistin, “pêşkêşiya xwe ya bi navê “Eslê Kurdan”

⁷⁸ Rohat Alakom, *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, r. 111-115.

⁷⁹ Marogulov û Ə. Ş, *Xə-xə hinbuna xəndəna nvisara kyrmançî*, Nəşre dawləte Şewre Ərmenistane, Revan, 1929.

⁸⁰ Têmûrê Xelil, “Elfabeya pêşin, romana pêşin û romannivîsê pêşin”, http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=2&ArticleNr=4399#.VAr9pPl_vIU (06.09.2014)

kiriye û ev xebat îro jî ji bo dîroka kurdan çavkaniyeke girîng e. Xebata wî ya bi navê “Kurd” li Petersburgê di sala 1915an de hatiye çapkirin. Her wiha Minorsky madeya “Kurdan” ya *Ansiklopediya Îslamê* jî nivîsiye⁸¹ û ev xebat paşê wekî kitêb jî hatiye weşandin.⁸² Her wiha kitêba xwe ya li ser Ehlê Heq ên Kurdistanê jî di sala 1921an de da çapê û bi saya vê xebatê jî madolyaya zêr ya zanistên siruştî ya civaka Împaratoriye ya li Moskovayê qezenc kir.

Bi rastî dema mirov li dîroka kurdolojiyê dinihêre ked û xebata rojhiltnasên rûs an jî ya kesên ji Yekîtiya Sovyetê lê ji milletên din dibîne. Lewma dema qala kurdolojiyê bê kirin îlam divê navê P. Lech, N. Marr, A. Jaba, M. B. Rudenko, I. Orbeli, V. A. Gordelevski, V. F. Minosky, B. Nikitin, Hakop Gazaryan û hê gelekên din bê gotin.

2.2. Auguste Jaba

Wekî me li jor jî qala wê kir kurdolojî di destpêkê de bi tevkariya lêkolînerên rûs - ya rastî di nav wan de gelek kesên ji milletên din polonî, alman, ermenî û kurd jî hebûne-hatiye avakirin. Ji van lêkolîneran yê me eleqedar dike A. Jaba ye. Lewra Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî bi hevkarîya xwe ji bo xebatên kurdolojiyê koleksiyoneke girîng berhev kirine û loma beriya ku em qala xebatên wî bikin emê jî hinekî behsa jînenîgariya wî bikin da ku xebata me natemam nebe.

2.2.1. Jiyana Wî

August Jaba kurê Dominik Jaba û Anna Holowiankayê ye û di sala 1801ê de li Kraslawê⁸³ ji diya xwe re bûye.⁸⁴ Jaba ji binemaleke leh/polonî ye û eslê xwe ji wîlayeta

⁸¹ Vladimir Minorsky, “Kürtler”, *İslam Ansiklopedisi*, c. VI, MEB Yayınları, İstanbul 1997; V. F. Minoriskî, *Kurd, Rûnkirin û Dîtin, Kurd Nevîyên Mîdîyan*, wer. M. S. Cuma, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, 1999.

⁸² M. Minorsky, Th. Bois, D. N. Mac Kenzie, *Kürtler ve Kürdistan*, ç. 2., wer. Kamuran Fıratlı, Doz, İstanbul, 2004,

⁸³ Celîlê Celîl dibêje: “Avgust Dementevic Jaba sala 1803an, li Lehastane (Polonya), li uyezda (qeza) Troiske ser guberniya (wilayet) Vilenske maleke ji malên torinên leh e (polonî) xweyî milk da ji diya xwe bûye.” Bnr. Avgust Jaba kî bû?” *Kurdistan Press*, j. 75, 1989, r. 12.

⁸⁴ Di derheq sala jidayikbûna A. Jaba de tevliheviyek heye. Li gor Jan Reychman (1910-1975) A. Jaba di sala 1800 de jidayik bûye, bnr. “Ji Rûpelên Nenaskirî yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, wer. Sidqî Hirorî, *Nûdem Werger*, j. 1, Swêd, Payiz 1996, r. 128; Maria Paradowska, sala 1801ê ji bo jidayikbûna wî nîşan didin, “Destnivîseka Kurdî ji Koleksiyonên August Kościusz Jabayî û Girîngiya Wê bo Etnografiya Polonî”, ji polonî wer. Sidqî Hirorî <http://www.kulturname.com/?p=10321> (10.04.2015) û Celîlê Celîl ji bo sala jidayikbûna wî 1803yan nîşan dide, bnr. Celîl, “Avgust Jaba kî bû?” r. 12.

Polockê ye. Malbateke toriniya dewletî ye û xaçparêzên li ser mezhebê katolîk in.⁸⁵ Erdê bavê wî Dominik gelek nebûye û lê 120 gundî di bin destê wî de bûne.⁸⁶

2.2.2. Navê Wî

Di çavkaniyan de navê August Jaba bi gelek awayan hatiye nivîsîn. Di çavkaniyên lehî de wekî August Kościesza-Żaba, di çavkaniyên rûsî de wekî Avgust (Dementevîç) Jaba, di çavkaniyên almanî de jî wekî August Jaba yan jî Auguste de Jaba derbas dibe. Lê carna paşnavê wî wekî Saba, Shaba, Yaba, Zhaba, Zaba⁸⁷ û Caba⁸⁸ jî hatiye nivîsîn. Ji hêla din ve navê wî di hin deran de wekî Aleksander û Antonî jî hatiye nivîsîn û mirov rastî vê tê.⁸⁹ Lê li ser antolojiya çîrokên ya bi navê “*Cami’eyê Risaleyan û Hikayetan*” navê wî îcar bi tîpên erebî wekî Îskender Jaba hatiye nivîsîn ku wî ev berhem ji kurmançî wergerandiye fransî. Ev jî nîşan dide ku Jaba li gor zimanê pê kar kiriye navê xwe cuda nivîsiye⁹⁰ û bi baweriya min ew tercîha wî bi xwe bûye. Ango bi kîjan zimanî nivîsî be formeke nêzîkî bikaranîna wî zimanî diyar kiriye û navê xwe wisa nivîsiye. Ji ber vê hindê gava ev pirtûka amade kiriye, navê xwe wekî Îskender nivîsiye ku kurd vî navî baş dizanin û bi rihetî dikarin bibêjin. Lê li gor tesbîta Jan Dost dewleta Rûsyayê bi taybetî navê lêkolînerên biyanî yê ji bo wan dixebitîn li gor zimanê rûsî diguherand û bo mînak jî qala van lêkolîneran dike, navê herdu pisporên alman Peter Lerch li gor rûsî bû Peter Ivanovich Lerch, navê Albrecht Bernhard Dorn bû Boris Andreevich Dorn. Li gor vê usûlê navê August Jabayê polonî jî bûye Alexandre Jaba.⁹¹ Joanna Bocheńska jî di pêşgotina wergera polonî ya kitêba “*Cami’eyê Risaleyan û Hikayetan*” de li ser guherîna navê Jaba disekine û dibêje dibe ku navê Jaba bi şaşî ne

⁸⁵ Avcî jî dibêje eslî Jaba cihû ye. Bnr. Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmançî*, amd. Ziya Avcî, Lîs, Diyarbekir, 2010, r. 12.

⁸⁶ Celîl, “Avgust Jaba kî bû?” r. 12.

⁸⁷ Rohat Alakom, “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba”, *Kürt Tarihi*, j. 11, İstanbul, 2014, r. 49.

⁸⁸ Mela Mahmut Beyazîdî, *Adetên Kurdistan*, “Ji pêşgotina Rudenkoyê” wer. Delîlo Îzolî, Holland, Tarîx tune, r. 1-2.

⁸⁹ Reyçman, “Ji Rûpelên Nenaskirî yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 132.

⁹⁰ Di çapa vê pirtûkê ya bi destê Ziya Avcî hatiye amadekirin de nav li gor orîjîna wê ne Îskender Jaba lê wekî Alexander Jaba hatiye nivîsîn. Bnr. Bazîdî, *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmançî*, r. 43.

⁹¹ Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, ç. 2., Lêkolîn: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, 2012, r. 202.

August lê wekî Aleksander nivîsîne yan jî ev nav li wan xerîb hatiye loma guherandine û tiştên nêzî vê dibêje.⁹²

2.2.3. Xwendina Wî

Jaba li Wilneyê dest bi zanîngehê kir. Ya rastî di serî de -berevajî birayên xwe yên leşkerî tercîh kiribûn- dixwest here Enstitûya Komunîkasyonê, lê Wilney di sedsala XIXan de ji bo rojhilatnasiyê navendeke binecî bû û ji bo xebatên rojhilatnasiyê û damezirandina fakulteya edebiyatê ya zimanên erebî, farisî û tirkî/osmanî hîn bike di sala 1809an de xebat hatibûn kirin, lê nikarin vî karî pêk bînin. Di encamê de li zanîngehê karên rojhilatnasiyê ji ber hinek kêmasiyan -nebûna kadroyên hîndekariyê- bi qasî hevî dikin bi ser neketin û loma biryar dan ku ji xwendekarên xwe hinekan bişînin Rûsyayê li bajarên wekî Moskova, Petersburg û Kazanê. Jixwe wê hingê Lehistan di bin desthilatdariya Rûsyayê de bû. Di vê çarçoveyê de A. Jaba jî di nav de 6 xwendekaran dişînin Petersburgê.⁹³

Jaba di sala 1824an de li Petersburgê di Enstitûya Zimanên Rojhilatî ya li ser Rêveberiya Peymangeha Asyewî ya Pirsên Derve de dest bi xwendina zimanên rojhilatî kir. Li gel xwendina xwe di sala 1824an de li wezaretê rê/gihandinê de wekî wergêr dest bi kar kir. Di vî karî de bi qasî salekê xebitî.

2.2.4. Konsolosiya Wî

Piştî ku wî di sala 1828an de perwerdeya xwe kuta kir, li konsolosxaneyên Rûsyayê de wekî wergêr dest bi kar kir. Di sala 1830yî de li konsolosxaneya Rûsyayê ya li Yafayê wekî wergêrê tirkî-osmanî dest bi xebatê kir. Jixwe Jaba ji bilî zimanê xwe polonî, rûsî, tirkî, ingilîzî, fransî, farisî, kurdî û hinek erebî dizanibû.⁹⁴

⁹² Joanna Bocheńska, “Zbiór uwag i opowieści kurdyjskich - Przedmowa do wydania polskiego-”, *Fritillaria Kurdica*, j. 9, Kraków, 2015, r. 9.

⁹³ Celîl, “Avgust Jaba kî bû?” r. 12.

⁹⁴ Ferhad Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Weşanên Aras, Arbil, 2000, r. 3. Lê dema Halit Ziya Uşakligîl qala zimanzaniya mamosteyê xwe Jaba dike û van zimanan jî lê zêde dike: Almanî, italyanî, ermenîkî û rûmî. Bnr. Halit Ziya Uşakligîl, *Kirk Yil*, r. 126, 127. Her wiha madeya *Ansîklopediya Îslamê ya Weqfa Diyanetê (DÎA)* de jî dema qala mamosteyê zimanên biyanî yê Halit Ziya Uşakligîl parêzer Auguste de Jaba tê kirin, tê diyarkirin ku zimanên farisî, fransî, almanî, italyayî û rûmî baş zanibûye, bnr. Zeynep Kerman, “Halit Ziya Uşakligîl”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. 42, İstanbul, 2012, r. 227.

2.2.5. Zewaca Wî

Jaba li Yafayê keça konsolosê Rûsyayê yê wê derê Grecznikayê ji xwe re xwest.⁹⁵ Xwedê pênc zarok da wan. Navê wan; Théodore, Constantin, Alphonse, Peter û Iosif e. Li Yafaya ku wê demê di destê Osmaniyan de bû û îro di nav sînorên Îsrailê de ye du salan xebitî û di sala 1832an de ciyê xebata wî diguhuzînin û wî dişînin Selanîka⁹⁶ vêga di nav sînorên Yewnanistanê de ye. Jaba di van kar û barên xwe de wekî merivekî secîh û jêhatî dixebite û sala 1835an wî bi peywira serkonsoloyê dişînin Îzmirê (Smirna). Her wiha di sala 1843yan de bi biryara senatoya hikûmatê asta wî bilind dikin û dibe şewirdarê dîwanê ya serokatîyê⁹⁷ û ji ber xebatên wî yê rêkûpêk bi xelata leşkerî ya Legia Honorowa, xelata tirkî ya mecîdiyê û gelek xelatên din tê perûkirin.⁹⁸

Jaba du caran zewiciye jina wî ya ewil di sala 1848an de dinya xwe diguhurîne û li ser vê salekê şûnda Jaba bi keça konsolosê Amerîkaya Bakur yê Selanîkê Élêna Llovlina re şû dike.⁹⁹ Ji vê jinê jî şeş zarokên Jaba çêdibin. Ango Jaba bavê yanzdek zarokan e, navê zarokên jina duduyan ev in: Marie, Auguste, Jules, Sofhie, Amélie û Wladimir. Li gor ku ji nameyên Jaba yê şandine Rûsyayê tê fehmkirin Jaba gelekî li ser zarokên xwe helak bûye û ji bo perwerdeya wan gelek caran miracaetî Rûsyayê kiriye da ku ji bo xwendina zarokên wî alîkariya wî bikin.¹⁰⁰ Ji lawên Jaba Théodore di artêşa rûs de bû efserê leşkerî û ji ber şerê li Qefqasyayê hat xelatkirin. Jixwe kalên wî jî di dîrokê de xwedî gelek paye û nîşanan bûne. Kalkê wî Dominik xwedanê payeya Husarî -ev payeya leşkerî ya bilind bû di nav leşkerên siwarçakên polonî yê ku di sedsala XVIIyan de hebû û bi Husaria dihat binavkirin- û xwedanê milkên Swierznoyê bû.¹⁰¹

2.2.6. Jaba û Polonya

Li vir divê em qala têkiliya Jaba ya bi welatê wî Polonyayê re jî bikin. Li gor em pê dihesin hemwelatîyên Jaba gelek caran jê xwestine ku bi polonî binivîse, lê wî

⁹⁵ Lê li gor nivîsa Alakom navê jina wî ya ewil Joséphine Mostra ye û keça alîkarê konsolosî Yafayê ye, bnr. Alakom, “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 49.

⁹⁶ Pîrbal li dewsa Selanîkê navê Stenbolê dide. Bnr. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 3.

⁹⁷ Celîl, “Avgust Jaba kî bû?” r. 12.

⁹⁸ Reyçman, “Ji Rûpelên Nenaskirî yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 133.

⁹⁹ Alakom dibêje navê jina wî ya duduyan Héléna Giraud e û ji malbateke levanten e û piştî Şoreşa Fransayê (1789) hatine li Îzmirê bi cih bûne, bnr. Alakom, “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 49.

¹⁰⁰ Celîl, “Avgust Jaba kî bû?” r. 12.

¹⁰¹ Reyçman, “Ji Rûpelên Nenaskirî yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 127.

piraniya xebatên xwe bi fransî, rûsî û zimanên din kir. Heta Jaba wekî merivekî xirab dihat nasîn¹⁰² ku qaşo ji bo wan welatîyên polonî yên li ser axa dewleta Osmanî dijîn teqîb bike û bişîne welêt dixebite. Lê Jaba tu carê təkiliya xwe ji welatê xwe nebiriye û heya miriye jî bi lêkolînerên welatê xwe re di nav təkiliyê de bûye. Heta carna ji wan re berhemên dîrokî jî şandiye. Bo mînak Jaba di sala 1839an de li Îzmirê hemşehriyê xwe Ignacy Holowinski nas kir. Holowinski metranê bajarê Mohileva Rûsyaya Spî ye û her wiha wergerê William Shakespeare e. Wê hingê di navbera wan de danûstandina belge û xebatan çêdibe û Jaba heft duayên mislimanan ên erebî, “hazil ewraq...” û helbesteke tirkî ya Nezîrî ya bi navê “Dengê Derwêşî” li gel esil û wergera wan dide Holowinski. Holowinski di gernameya xwe de qala van dike.¹⁰³

Ji hêla din ve kesekî dinê yê qala Jaba dike jî oryantalistê îskandînavî George August Wallin (1811-1852) ye. Wallin gernameya xwe ya swêdî de qala hevnasîna xwe û Jaba ya li Îzmirê dike. Li gor ragihandina wî Jaba wî li mala xwe dike mêvan û ew wesîqa û sikkeyên bi salan berhev kirine nîşanî wî dide. Li gor vê ev meteryalên giranbiha li Selanîkê bi saya kurê qaziyê bajêr dikevîne destê wî û ji wan re jî ji kalikê wan maye. Her wiha li gor vê gernameyê wê hingê Jaba ji bo kirîna çavkaniyên çandî yên rojhilatê destteng e, heta ji wan hinekên li ber destê xwe jî mejbûr dimîne difroşe.¹⁰⁴ Ev yek jî derheqê rewşa wî ya aboriyê de fikrekê dide mirov.

Dema sala 1889an Şahê Faris ji bo serdanê diçe Varşovayê, rewşenbîr E. Znatowiczî di kovara heftename ya polonî *Tygodnik Ilustrowanyê* de di derbarê zimanê farisî de nivîsî û beşek ji *Muxannînameya* mesnewiya Hafizî Şirazî (1325-1390) weşand. Znatowiczî destnîşan kir ku Jaba ew tevî orijînal û wergera wê ji wî re şandiye.¹⁰⁵

¹⁰² Jan Dost, “Kurdnasa Polonî Dr. Joanna Bochenska”, *Nûbihar*, j. 123, Stenbol, , 2013, r. 36.

¹⁰³ L. Holowinski, *Pielgrzymka do Ziemi Swietej*, Petersburg 1853, r. 98; vgz. Reychman, “Ji Rûpelên Nenaskirî yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 127.

¹⁰⁴ *Georg August Wallins Reseanteckningar Från Orienten Åren 1843-1849*, r. 153-154; vgz. Alakom, “Bir Îzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 50.

¹⁰⁵ E. Znatowicz, *Księga Spiwakow*, “Tygodnik Ilustrowany” j. 336, 1889. Li wir nivîskar navê Jaba wekî P. Antonî dide. Bnr. Reychman, “Ji Rûpelên Nenaskirî Yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 132.

2.2.7. Jaba li Erziromê ye

Jaba heya sala 1848an li Îzmirê dixebite û heman salê li Erziromê dibe konsolosê Rûsyayê û heya 1853an li vê derê kar dike. Ev heyam di jiyana Jaba de dibe destpêkeke nû. Lewra heya wê demê bi zimanên tirkî, erebî, fansî û ingilîzî xebat kiriye.¹⁰⁶

Jaba di sala 1848an de li Erziromê dest bi karê xwe dike û bi qasî pênc salan vî karê xwe didomîne û dema di sala 1853an de şerê Qirimê derdikeve bi qasî sê salan di artêşa rûsan de li herêma Qers, Bazîd û Erziromê wekî pispor û beledê wê herêmê karê werger û rêberiya leşkerê rûsan dike û loma ji karê xwe yê eslî dûr dikeve.¹⁰⁷ Ji ber vî karê xwe yê di leşkeriyê de bi madolya û nîşanê tê xelatkirin.¹⁰⁸ Piştî şerê dîsa di sala 1856an de li Erziromê karê xwe yê berê heya sala 1866an berdewam dike.¹⁰⁹ Li gor vê Jaba 15 salan li herêma kurdan konsolosiyê dike û heke meriv wan hersê salên di şerê Rûs-Osmaniyan de jî yên di navbera 1853-1856an de hesab bike bi tevahî 18 salan li Kurdistanê bi kurdan re têkildar bûye.¹¹⁰

2.2.8. Jaba li Îzmirê ye

Di sala 1866an de Jaba 65 saliya xwe de ji karê xwe yê li Erziromê teqawit dibe û cara duduyan diçe li Îzmirê bi cih dibe. Ji bo wî Îzmir bajarekî nas e, lewra di navbera salên 1835-1848an de 13 salan xebitiye û jina wî ya duduyan ji wir e, ango malxezurana wî li Îzmirê ye û hinek zarokên wî jî li heman bajarî bûne xwedî kar û mal.¹¹¹ Jaba emrê xwe yê mayî li Îzmirê derbas dike û di wê heyamê de bi karê xwe yê berhevkarî, werger û mamostetîya zimanê fransî dike. Li dadgeh û konsolosxaneyan karê werger û navçîtîyê dike. Ji telebeyên wî yê zimanê fransî yek jî Halit Ziya Uşakligîlê (1866-1945) nivîskarê tirk e. Uşakligîl di kitêba xwe ya xatiratê de qala mamosteyê xwe Jaba dike.¹¹²

¹⁰⁶ Ji ber ku Jaba bi zimanê xwe polonî nenivîsiye li welatê xwe Polonyayê zehf zêde nehatiye nasîn. Lê piştî xebatên li ser jinenîgarî û xebatên wî yên di kovar û rojnameyan de derçûne hinekî hatiye nasîn. Bnr. Maria Paradowska, “Destnivîseka kurdî ji koleksiyonên August Kościusz Jabayî û Girîngiya Wê bo Etnografîya Polonî”, ji polonî wer. Sidqî Hirorî <http://www.kulturname.com/?p=10321> (10.04.2015)

¹⁰⁷ Qanadê Kurdo, “A. D. Jaba û Rola Wî di Pêştaborîna Kurdzaniyê de”, *R'ya T'eze*, j. 10, 1973, r. 2.

¹⁰⁸ Celil, “Avgust Jaba kî bû?”, r. 12.

¹⁰⁹ Li gor rojnameyeke di sala 1856an de hatiye weşandin li Qersê alîkarekî Jaba yê navê wî Bozzo ye hebûye. Förtecknin öfver ryska generalkonsuler, Finlands Allmänna Tidning, (15.07.1856) vgz. Alakom, “Bir Îzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 50, 55.

¹¹⁰ Kurdo, “A. D. Jaba û rola wî di pêştaborîna kurdzaniyê de”, r. 2.

¹¹¹ Alakom, “Bir Îzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 49, 51.

¹¹² Lê dema Uşakligîl qala mamosteyê xwe yê zimanê fransî dike pesnê wî yê pir zimanzanînê dide û dibêje “ev merivê xort/can”. Lê Uşakligîl di sala 1866an de jidayik bûye û Jaba jî heman salê teqawit

Jaba di sala 1894an de meha Çileyay Paşîn roja 3yan 93 salî li Îzmirê dinyayê xwe diguhire û wî li Kemerê vedişêrin û peyra ciyê merzelê wî diguhêzine Karşiyakayê.¹¹³

2.3. A. Jaba û Xebatên Wî Yên li Ser Kurdî

2.3.1. Paşxaneyê Berhevkariya Jaba

Dema Jaba li Erziromê dest bi karê xwe dike eleqeya wî ya li ser kurdî zêde dibe. Lewra li bajêr nifûsê kurdan zêde ye û ji hêla bazirganiyê ve jî pêşketî ye. Jixwe akademîsyenên Rûsyayê wê hingê bi taybetî li ser folklor û çanda kurdan û zimanê kurdî bi baldarî disekinîn. Beriya wê di sedsala XIXan salên çilî de zanayên mîna V. Dittel li Rûsyayê dest bi xebatên li ser kurdî kiribûn û ji pey wî re di salên pênciyê de zanayê rûs I. Berezîn jî xebatên bi vî rengî domandin.¹¹⁴ Jixwe pey vê re ev xebatên li ser kurdan dê zêde bibin. Lewra beriya wan li Rûsyayê fikreke wisa hebû ku edebiyata kurdan tune ye, ya heyî jî tenê çend tiştên devkî yên bêqîmet in.¹¹⁵ Lê gava kesên mînanî V. Dittel û I. Berezîn li çiyayên Kurdistanê, Mûsil û gundên êzdiyan di nav kurdan de derbarê jiyana, bawerî û zimanê wan de lêkolîn kirin û dîtin ku di nav kurdan de edebiyateke binetî heye, gelek şair û alimên wan hene, êdî ew baweriya şaş lawaz bû.¹¹⁶ Lewra V. Dittel li ser eslê kurdan, ziman û zaravayên kurdan nivîs weşand¹¹⁷ û qala dewlemendî û reseniya wêjeyê kurdî kir:

“Min hîç nedîpa ku zimanê ‘eşîrên kurdan ê ku ji alî rojhelatnasan ewende kêr tê naskirin, bikanibe li kêleka edebiyata devkî edebiyateke nivîskî ya ewende

bûye û hatiye Îzmirê, ango wê hingê 65 salî ye. Li gor gotina Uşakligîl dema telebeyê Jaba ye 14-15 salî ye û Jaba ji ber serwextbûna wî zehf şa dibe. Li gor vê dema Uşakligîl 15 salî ye dîrok 1881 û heke wisa be çaxê Jaba mamosteyê Uşakligîl e herî kêr 80 salî ye, vêca ew çawa dibe merivekî xort? Wisa tê xuyanê di vê de şaşiyek heye.

¹¹³ Alakom, “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 49.

¹¹⁴ Ç. X. Bakayev, *Dîroka Hînkirina Zimanê Kurdî li Rûsya û Yekîtiya Sovyetê, Kurtiyek li ser Dîroka Hînkirina Zimanên Îranî*, Moskova, 1962 (bi rûsî), vgz. Reyçman, “Ji Rûpelên Nenaskirî yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 138.

¹¹⁵ E. M. Quatremere, *Notice extraite des manuscrits de la Bibliothèques du roi et autres Bibliothèques*, Paris, 1836; G. R. Driver, *The Dispersion of the kurds in ancient times*, JRAS, 1921, IV; *The name "Kurde" and its philological connection*, JRAS, 1923, III; *Studies in kurdes History*, BSOS, 1922, T. II, vgz. Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Özgü Yayınları, Ankara, 1992, r. 19.

¹¹⁶ Celîl, “Avgust Jaba kî bû?”, r. 12.

¹¹⁷ V. Dittel, Biblioteka dlya çteniya “Kurdi: İz Neizd Putevih zapisok 1846 goda” (Kurd: Notên Neweşandî Yên Gera 1846an), c. 119, beş 7, 1853. <http://www.ajansafirat.com/news/guncel/19-yuzyylda-rus-basynynda-kurtler-anjelika-pobedonosteva-kaya.htm> (26.01.2015)

dewlemend derxe... Kurd xwedî edebiyat in, piçek orijînal, piçek ji çavkaniyên Farisî.”¹¹⁸

Lêbelê tişteke heye wê hingê piraniya nivîsên li ber destê wan nîvco bûn, şaş hatibûn nivîsandin, ji devê kurdan nehatibûn hildan û bereksê wê bi zimanekî çêkirî hatibûn amadekirin. Dema şerê Qirimê (di navbera Rûsya û Osmanîyan de) gelek kurdên kurmanç û kird bi dîl ketin destê artêşa Rûs. Îrannas P. Lerch wê hingê di nav wan kurdan de xebatê dike û ji devê kurmanç û kirdan hin nivîsan amade dike. Lerch dema qala wêjeya kurdan dike dibêje ji ber nebûna tifaq û serdestiya wan ya li welatê wan wêjeyeke wan a bi serê xwe tune, ya heye jî bi keda zanayên kurdan pêk hatiye:

“Kurdan edebiyata xwe ya taybetî neafirandine, ji ber ku ew di yekbûn û bidestxistina serbixwebûna xwe de bi ser neketine. Digel viya jî xwedî giyaneke jîndar û bimeraq in, ji wan bextê hinekan dest da ku hînî kultura gelên cîran ‘Ereb, Faris û Tirk bibin. Yê dawîn di pêşketina întellektuelên kurdan de alîkar bûne...”¹¹⁹

Mereqa bi vî rengî ya Rûsyayê ku piştî jitaqetketina dewleta Osmanî û Îranê dixwest li herêma Qefqasya û Kurdistanê hêzdar be û her wiha nerazîbûna kurdan ya ji halê wan jî eşkere bû. Ji vê şûnda ev pêngav bûn wesîle da ku Akademiya Rûsî ya Zanistan ji xebatên bi vî rengî bikin, li wan herêmên ku binkeyên Rûsyayê yê diplomatîk hene û xelkê wê jî kurd in ketin nav tevgerê. Oryantalîstê Rûsê Rêvebirê Mûzeyê Asyayê Johannes Albrecht Bernhard Dorn ev daxwaz ragihand N. Chanykawayê wê demê li Tebrîzê konsolos bû û wî gelek wesîqe peyda kirin. Her wiha wî ev agahî da A. Jabayê li Erziromê û Jaba jî dest bi berhevkirin û şandina çavkaniyên kurdî kir. Jixwe dema li ser zimanên rojhilatî li enstitûyê xwendekar e, ji mamosteyên wî yek jî zanyar û oryantalistê fransî François Bernard Charmoy e. Charmoy *Şerefname* wergerandiye fransî û daye çapê, ji ber vê dibe ku hê jî wê hingê ve wî bala Jaba dabe li ser kurdan. Jixwe Lehistana welatekî di bin desthilatiya Rûsyayê de bû û vê yekê tesir li ser Jaba kiriye ku xwe nêzîkî milletên mîna wan di bin destê dewletên din de dijîn bibîne. Her wiha dema li Wilnay û Petersburgê dixwend jî li hawirekî gel û neteweyên kêmtewê dida hezkirin ew dorpêç kiribû. Fikrên romantîkê ji bo xwedî li wan gelên bindest derketin ew teşwîq dikir, di hişê wan de bi cih bibûn. Dema Jaba li welatê

¹¹⁸ V. Dittel, “Aperçu sommaire de trois ans de voyage en Asie, dans le Caucase, la Perse, le Kurdistan, la Mésopotamie,” *Nouvelles Annales de Voyages*, c. 3, Paris, 1849, r. 141-168; vgz. Joyce Blau, *Jiyan û Berhemên Ehmedê Xanî (1650-1707)*, ji fransî wer. M. Malmîsanij, *Kovara Çira*, j. 3, Swêd, 1995, r. 3-10.

¹¹⁹ H. g, r. 4.

Osmanî karê xwe yê wergêrî, konsolosî û serkonsolosiye dikir, rastî gelek neteweyan hatiye. Çaxê li welatê kurdan maye jî xwe nêzîkî wan dîtiye û bi baldarî li ser wan xebitiye. Lewra kurd jî di bin desthilatiya Osmanî de bûn. Mirov dikare bibêje ji ber vê yekê xwe nêzîkî wan dîtiye. Lewra tengasiyên herdu miletan jî bi heman rengî ne.

2.3.2. A. Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî

Sedala XIXan ji bo dewleta Osmanî her wiha ji bo Kurdistanê sedsaleke xirab e. Lewra êdî dewlet ji taqet ketiye, hemû dewletên cînar, her wekî din hemû netewe, bawerî û gelên li herêmê yên di bin destê dewleta Osmanî de dijîn, li benda firsendekê ne. Osmaniya ku wekî merivê nexweş tê qebûlkirinê li ber sekerata mewtê ye. Ji wan dewletên cînar ên tevî karên Osmanî dibin yên sereke Îran û Rûsya bûn. Heya sedsala XVIIIan Îran li herêmê çalak bû, di navbera sedsalên XV-XVIIIan de gelek caran bi Osmaniyan re ketibûne lecê. Di sedsala XIXan de ji ber rewşa Osmanî ya xirab Rûsya derkete pêş. Jixwe di berê de Rûsya li dora Qefqasyayê diçû û dihat, di salên 1814-1818, 1828-1830, 1856, 1877-1878an de sancaxa Bazîdê zeft dikin. Ev bûyerên diqewimin jiyana gelê herêmê serobino dike, piştî şerê Qirimê rewş ji binî ve xirab dibe. Mela Mehmûd jî ber şert û mercên jiyane ji Bazîdê koç dike û li Erziromê bi cih dibe. Di wan heyaman de Jaba û Mela Mehmûd hevdu nas dikin, bi vî awayî di jiyana wan de her wiha di dîroka edebiyata kurdî de jî qonaxeke nû dest pê dike. Mela Mehmûdê Bazîdî dibe mamosteyê taybet yê Jaba¹²⁰ û ji vê şûnda Jaba li ber destê wî fêrî kurdî dibe û berêka dibe çavnasê wêjeya kurdî jî. Heta kurdiya Jaba ewqasî pêşve diçe dikare wergerê jî bike û di nameyake xwe ya ji rojhilatnasê rûs Dorn re dişîne de wiha dibêje: *“Min heya asteke wisa bi zimanê kurdî xwend û fêr bûm ku ez bikaribim pê bixebitim û wergerê bikim.”*¹²¹ Jaba seba berhevkirina berhemên kurdî helanan dide Bazîdî, ji hêla aboriyê de jî alîkariya wî dike û di encama vê têkiliyê de gelek berhemên ku îro bingeha klasîkên wêjeya kurdî pêk tînin ji windabûnê xelas bûne û gihîştine navendên kurdolojiyê. Îro kê di warê kurdolojiyê de xebatekê bike, miheqeq dê pêrgî wan berhemên bê û ji wan sîd werbigire.

¹²⁰ Amir Hassanpour, *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, Avesta, İstanbul, 2005, r. 161.

¹²¹ Musaelyan, “A. Jaba û Kurdnasî”, 22; vgz. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 4.

2.3.3. Destxetên Peşîn Yên Jaba Berhev Dike

A di heyama xwe ya li Erziromê de Jaba li gel karê xwe yê fermî li ser ziman, zargotin, çîrok, şi'r û meseleyan lêkolîn kiriye. Bi hevkarîya Mela Mehmûdê Bazîdî Jaba ji bo naskirina çand û folklorê kurdan xebitiye. Loma Jaba di nameyên xwe de jê re Xoçeyê min dibêje. Ji wir wesîqe û wergerên kurd û tirkî şandine Akademiyê. Li gor ku Peter Lerch neqil dike sala 1856an meha Cotmehê Jaba destxetêke ku ji 118 rûpelan pêk tê dişîne Akademiyê. Li aliyê çepê metnê orijînal û wergera Xoçe heye û li aliyê rastê jî tîpguhêziya metnê kurdî ya Jaba ya bi tîpên latinî heye. Di navbera rûpelên 1-46an de wergera 3 beşên ji *Îskendernameya Nîzamiyê Gencewî* (1141-1209) hene. Beşa pêşîn ji 7 malikan pêk tê, ya duduyan ji 70 malikan pêk tê û ya sisyan jî ji 10 malikan pêk tê. Di navbera rûpelên 47-118an de wergera 224 biwêj û metelokên tirkî yên ji rûpelên 1-107 û 109-245an rêzimana tirkî¹²² ya oryantalistê fransî Pierre-Amédée Jaubert (1779-1847) hatine wergerandin heye.¹²³

2.3.4. Li Akademiyê Nirxandina Destxetan

Wê heyamê li Akademiyê komeke ji pisporan pêk dihat li ser berhemên ji herêmên cuda tîpên şandin xebatan dikin û di derheqê resenî, naverok û zimanê wan de nirxandinan dikin. Ji ber wê gava Jaba dest pê dike berhemên peyda dike dişîne. Mela Mehmûdê Bazîdî nivîs bi alfabeya erebî dinivîsandin û Jaba jî li aliyê çepê yê rûpelan bi alfabeya latinî transkripsiyona wan ya fonetîk, bêyî destnîşankirina devokan, li gel wergera fransî dinivîsand. Nivîsên dihatin şandin bi zaravayê kurmancî bûn. Ji ber ku nivîs bi destê kurdekî pisporê ziman Mela Mehmûd hatibûn nivîsandin, Komisyona Akademiya Zanistan ew hêja dîtin.

1857an meha hezîranê P. Lerch di civîna dîrok-filolojiyê ya Akademiya Zanistan de ji bo weşandina van nivîsan dest bi hewldanê dike. Lê wî xwest ku li ser tîpguhêziya metnan guherînan bike. Wî wisa bawer dikir ku Jaba wekî A. B. Chodzko -lêkolînerekî polonî ye- nikare dirêjiya tîpên dengdar nîşan bide.¹²⁴ Lewra di zimanên slavî de

¹²² Pierre-Amédée Jaubert, *Elements de Grammaire Turque*, Paris, 1833.

¹²³ Peter Lerch, *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer*, r. 46; vgz. Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 18.

¹²⁴ A. Chodzko, "Etudes philologiques sur la langue kurde (dialecte de Soleimanie)" *Journal Asiatique*, beş 5, berg 9, 1857, r. 297-356.). Aleksander Chodzko li ser zaravayê kurdî ya Silêmaniyê nivîsîbû. Wî Îran baş nas dikir û tîkiliya wî bi kurdan re hebû. Li gor agahiyan wî meteryalên nivîsa xwe ji Ahmed Xanayê

dirêjiya tîpên dengdar diyar nabe. Ji ber van egeran Lerch ji wan wesîqayên Jaba şandibû Akademiye beşeke *Îskendernameyê* û 25 gotinên pêşyan li gor rêbaza tipguhêziyê ya ku dirêjiya tîpên dengdêr nîşan dide çêkir û li gel wergera wan a almanî weşand.¹²⁵

Bi rastî piştî vê di navbera Akademî û Jaba de danûstandina meteryalên bi kurdî re eleqedar xurt dibe û Akademî jê daxwaza berdewamiya hinartina meteryalên bi vî rengî dike. Li ser vê Jaba hin meteryalên heya wê hingê kom kirine dişîne û heman salê meha Rezberê roja 24an nameyekê dişîne û derheqê kar û xebatên xwe de agahiyê dide. Li gor vê nameyê Jaba li ser stranên kurdî yê gelêrî berhevkarîyê dike, her wiha di destê wî de ferhengeke kurdî-fransî û fransî-kurdî heye û ji wê beşa kurdî-fransî jî qediyaye.¹²⁶ Jixwe Jaba bi xwe di kovara *Journal Asiatiqueyê* de beşek ji xebatên xwe yê ji stranên kurdî pêk dihat da weşandin.¹²⁷ Her wiha dê piştî teqawitbûnê dîsa van xebatên xwe berdewam bike û ji van berhevkarînan li ser stranên yekê herî girîng jî kilama Gewrêya keça kurd ya êzdî ye. Ev kilam behsa hezkirina Gewrê û Xelîl Begê kurê Ebdî Paşayê ku di sedsala XVIIIan de ji pêştahatiyên Eleşgirê ye dike. Kilam û çîroka wê bi destê Mela Mehmûd hatiye berhevkarînin.

Mela Mehmûd di dîroka xwe *Tewarîxî Cedîdî Kurdistanê* de qala vê çîrokê kiriye û Jaba ji Îzmirê 22ê rebendana sala 1881ê de ji Justî re li gel nameyekê beşek ji vê pirtûkê tevî destxet, tîpguhêziya wê û wergera fransî û hinek stranên din ên kurmancî hinartiyê. Jixwe kilama Gewrê bi vî awayî û bi navê “Beşek (Destxet) ji Dîroka Modern ya Kurdistanê: Gewrê û Kilamên Wê” tê weşandin.¹²⁸ Wekî din ji 23 dilokên ku Jaba ji Justî re şandine 19 hebên wan hatin weşandin.¹²⁹

Xebatên li Akademiye yê li ser berhemên ku dê ji bo kurdolojiyê bibin çavkaniyên sereke di vê pêvajoyê de berdewam dikin. Li Kurdistanê Jaba ji bo van berhemên giranbiha dest bixe bi alîkariya Mela Mehmûd xebatan didomîne, li Rûsyayê

kurdê Silêmanî yê di navbera salên 1853-1854an de li Parîsê dijiya wergirt, vgz. Reyçman, “Ji Rûpelên Nenaskirî yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 129.

¹²⁵ H. g, r. 124.

¹²⁶ H. g, r. 129.

¹²⁷ A. Jaba, Ballade kurde recueillie et traduite par A. Jaba et communiquee par M. de Tchihatcheff, *Journal Asiatique*, j. 5, 1859, r. 153-166.

¹²⁸ “Ghevri et ses chansons, extrait de l’histoire de Kurdistan par Mahmoud Bazidi”, *Bulletin de l’Athénée oriental*, j. 3, 1881, r. 145, 158, vgz. Alakom, “Bir İzmir Levantenî Auguste Jaba”, r. 53, 54, 55.

¹²⁹ Mehmet Gültekin, “Di arşîva Prof. Ferdinand Justi de Mela Mehmûd Bazîdî”, *Nûbihar*, j. 131, Stenbol, 2015, r. 17, 18; Mehmet Gültekin – Bahar ve Nihat Gültekin, *Salnama Ehmedê Xanî 2013*, “Arşîva Prof. Justi Derbarê Alexandre Jaba û Mela Mehmûd Bazîdî”, Belge, Stenbol, 2014, r. 13, 22.

jî Îrannasê alman li ser P. Lerch li ser destxet û wergerên hatine şandin bi hûrgilî karê xwe dike. Di sala 1858an de meha Rebendanê roja 8an di civîna beşê de raporeke li ser kurtasiyeke *Mem û Zîna* meşhûr ya Ehmedê Xanî ya Jaba ji wan re şandibû pêşkêşî lijneyê kir. Lerch di derheq reseniya vê beşa hatibû şandin de şikdar bû ka beşa hatiye şandin çiqasî li gor eslê wê ye.¹³⁰ Li gor Jan Reychmanê (1910-1975) poloniyê dîroknivîs, zimannas û rojhilatnas jî qalê dike¹³¹ sala 1859an meha gulanê roja 4an di civîna beşê de nameya Jaba tê xwendin û ew beşa bi sernavê “*Recueil des et udes kourdes avec transcription du texte et traduction française*” hinek xebatên kurdî û transkrîpsiyona farisî pêk dihat hat nirxandin, guhdariya rapora Dorn û pêşkêşiya Lerch hat kirin. Di encamê de ji bo weşandina van wesîqayan lijneyeke ji Dorn, Böhrling, Wiedemann û Vêliaminof-Zernof pêk tê hat damezirandin. 14 roj şûnda lijneyê li ser van berhemên li jêr rapora xwe amade kir:

- 1) Pirs *Notice sur la littérature et les tribus kourdes*.
- 2) Kurtasiya berhema *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî.
- 3) Ferhenga devoka Hekarî û Rewendî.
- 4) Gramera Elî Teremaxî (1592-1655)¹³² ya zaravayê kurmancî.
- 5) Têbînî li ser gramer û bingehên zanista zimanê kurmancî.
- 6) Desteyeka çîrokan li gel wergera wan ya fransî.

Li gor vê raporê biryar dan ku orîjînal *Mem û Zînê* ji Jaba bixwazin da ku hemûyê bê kêmasî biweşînin. Lewra wan dizanibû du nusxeyên wê li cem Jaba hene. Her wiha bal kişandin ku Jaba meteryalên gramera Elî Teremaxî¹³³ di ferhenga xwe de bi kar anîye û ji ber vê lazim nake bi tena sere xwe were weşandin.¹³⁴

¹³⁰ Resume de l'ouvrage kourde d'Ahmed Efendi Khani fait et traduit par A. Jaba, *Bulletin*, berg 15, r. 347. Her wiha binêre li *Jaba's resume du Mem ou Zin* H. Makas, *Kurdische Texte im Kurmanji Dialecte aus der Gegend von Mardin*, Lenîngrad 1926. Rudenko, Destnivîsên Jaba binêre, r. 48-51. Destana *Mem û Zîn* ya Ehmedê Xanî, bi destê M. B. Rudenko *Ahmed Xanî, Mem û Zîn*, Moskova 1962, di zincîra şûnwarên lîteratûra mîletên Rojhilatê de ku ji aliyê Akademiya Zanistan ya Yekîtiya Sovyetê ve dihatin weşandin, hat belavkirin.

¹³¹ Reychman, “Ji Rûpelên Nenaskirî Yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 130.

¹³² Ev tarîx li gor Feqî Huseyn Sağniç e, bnr. *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002, r. 389. Lê ev tarîxa hîcrî 1000/mîladî 1592 li gor hinekan sala nivîsîna rêzimanê ye. Bnr. Qedîrî, “Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yê li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê “Destura Zimane Erebi bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî” r. 192.

¹³³ Lê Teremaxî wekî rêzimanivîsê pêşîn tê qebûlkirin ji bo naveroka vê pirtûkê li vê xebatê bnr. Mamoste Qedîrî, “Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yê li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi

Di encama vê biryarê de bi destê Lerch li Petersburgê sala 1860an ji meteryalên Jaba bi vî nasnavî hat weşandin “*Recueil des notices et recits kourdes servant a la connaissance de la langue, de la litterature et des tribus du Kourdistan, reunis et traduits en français par M. Alexandre Jaba, consul de Russie a Erzerum.*” Ango kurtetêbîniyên derbarê ziman û edebiyata kurdan de, agahiyên qebileyên Kurdistanê wergera ji bo fransî ya konsolosê Rûsyayê yê Erziromê Alexandre Jaba. Di vê çapê de li ser bergê rastê navê pirtûkê kurdî bi tîpên erebî hatiye nivîsîn. Lê tiştê bala mirov dikşîne ew e ku navê berhevkar wekî Alexandre Jaba hatiye nivîsîn.

Jaba û Mela Mehmûdê Bazîdî li ser berhevkarî û wergeran xebatên xwe didomînin û Jaba wergera *Şerefnameyê* ya bi destê Mela Mehmûd hatiye kirin jî dişîne Akademiye.

Wekî heya vê derê me qala wê kir Jaba di warê berhevkerin, wergerandin, amadekirin û weşandina xebatên li ser folklor, ziman, dîrok û çanda kurdî de gelek xebatên curbecur kirine. Piştî diçe Îzmirê jî xebatên xwe yên li ser kurdî berdewam dike. Di sala 1867an de destxetên ferhenga xwe ya kurdî-rûsî-fransî ya 656 rûpelî û ya fransî-rûsî-kurdî ya 721 rûpelî tevî 100 diyalagên kurdî û wergera wan a fransî ji Akademiye re şand. Akademiye barê xebata li ser vê ferhengê sparte Îrannasê alman Ferdinand Justi (1837-1907) û ew jî li ser vê van destxetan xebitî û ji hêla tîpguhêzî, etîmolojiya peyvan ka koka wan çî ye kar kir û sala 1879an de li Petersburgê da çapê.¹³⁵ Jixwe dema Justi berhema xwe ya bi navê *Kurdische Grammatika*¹³⁶ amade kiriye ji nivîs û ferhenga Jaba gelekî îstifade kiriye. Li gor nameya ku Jaba di 22ê Çileyê Paşin 1881ê de ji Justi re nivîsiye beşa duduyan ya vê pirtûkê ya destnivîs li Mûzeyaya Asyayê ya St. Petersburgê di sandiqên arşîvê de çapnekirî sekiniye û Jaba dibêje ku ji bo wê li Tiflisê bide çapkirin dê hewl bide. Lê bi qasî em dizanin hê ew beş nehatiye çapkirin.¹³⁷ Jixwe li gor Nikitin radigihîne neviyên Jaba di sala 1913an kaxizên vê xebatê hemû dane Minorsky.¹³⁸

Navê "Destura Zimane Erebi bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî", *Kovara Bîr*, j. 1, Bihar 2005, r. 192, 198.

¹³⁴ Reyman, "Ji Rûpelên Nenaskirî Yên Rojhilatnasya Polonî ya Sedsala Nozdehan", r. 130.

¹³⁵ *Dictionnaire kurde-français* par M. August Jaba, publiée par M. Ferdinand Just, Petersburg, 1879.

¹³⁶ Ferdinand Justi, *Kurdische Grammatik*, St. Petersburg, 1880.

¹³⁷ Alakom, "Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba", r. 54, 55.

¹³⁸ Nikitin, *Kürtler -Sosyolojik ve Tarihi İnceleme- 1-2*, r. 495.

2.3.5. Pirtûkxaneyaya Jaba

Pirtûkxaneyaya Jaba ji hêla berhemên destxet û orijînal ve gelekî dewlemend e. Jaba di sala 1839an de li Îzmirê hemşehriyê xwe Ignacy Holowinski nas kir. Holowinski metranê bajarê Mohileva Rûsyaya Spî ye û her wiha wergerê Shakespeare e. Ew gernameya xwe de behsa koleksiyona Jaba dike:

“Wî komeleyeka berhemên rojhilatê yên bijare û bihadar hene. Pirtûkxaneyaya wî ji bilî bergên çapkirî, ji 260 destnivîsên erebî, farisî û tirkî pêk hatiye. Hinek ji wan destnivîsan ji pirtûkxaneyên mîr, wezîr û paşayên rojhilatê bi dest xwe xistine. Hemû jî bi rengekî baş hatine hilgirtin û sexbêrî jê hatiye kirin û bi nivîsên zêrîn û nexşine din hatine xemilandin û ciwankirin.”¹³⁹

Li gor van agahiyan mirov pê dihesa ku Jaba ji destxetên peyda dike hinekan li cem xwe dihêle. Jixwe wan tekstên kurdî yên ku wî hinartibûn Akademiya Zanistan li gel beşeke mezin ya destnivîsine din yên kurdî yên kevin di sala 1868an de, di nav koleksiyonên Pirtûkxaneyaya Giştî li Petersburgê nav destnivîsan de ne û îro li pirtûkxaneyaya bi navê Saltîkof Şedrîn ya li Lenîngradê ne.¹⁴⁰ Li wê derê 57¹⁴¹ destnivîsên kurdî hene,¹⁴² di nav wan de him nivîsên ku bi destê zanayên wekî Mela Mehmûdê Bazîdî, Mihemed Xerîb Îbn Silêman (Mem û Zîn nivîsiye),¹⁴³ Mela Mûsayê Hekarî (ji farisî ji bo wî Ferhad û Şîrîn, Yûsuf û Zuleyxa, Zuxakî Paşa, Rustem, Newşîrwan û Darewa, Bûkguestina Cengîz Xan wergerandiye û Bazîdî jî nivîsiye), Mela Mistefa

¹³⁹ I. Holowinski, *Pielgrzymka*, r. 98, vgz. Reychman, “Ji Rûpelên Nenaskirî Yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 133.

¹⁴⁰ *Raporta Pirtûkxaneyaya Giştî ya Impiratorî* ya sala 1868an, St. Petersburg 1869 (bi rûsî), vgz. Reychman, “Ji Rûpelên Nenaskirî Yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 140.

¹⁴¹ Lê ev jimara 57 di hin çavkaniyan de 54 e. Tiştê balkêş ew e ku Pîrbal van herdu jimarên jî dide û ji bo jimara 57an li jêrenota ji pey vê re binihêrin û ji bo 54an jî bnr. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çiroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 4. Ji bo çavkaniyeke din bnr. M. B. Rudenko, “*Li Ser Destnivîsên Kurdî; Hilgirtiyên Rojhilatnasiyê li Mezintirîn Pirtûkxaneyaya Yekîtiya Sovyetê*, Moskova 1961; M. B. Rudenko, *Koleksiyona A. D. Jaba (Destnivîsên Kurdî)*, “Xebatên Pirtûkxaneyaya Giştî ya Hikûmî ya bi navê M. E. Saltîkof Şedrîn, Berhemên li ser rojhilatê”, Lenîngrad 1957, vgz. Reychman, “Ji Rûpelên Nenaskirî Yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 134, 140.

¹⁴² J. S. Musaelyan, “A. Jaba û Kurdnasî”, wergeranî le rûsiyewe: Şîrwan Mehmûd Mihemed, *Ronakbîrî*, j. 3-4, Stockholm, 1993, r. 43; vgz. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çiroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 5.

¹⁴³ Blau dibêje dibe ku ev jî nasavekî Mela Mehmûd be, bnr. Blau, “Jiyan û Berhemên Ehmedê Xanî (1650-1707)”, r. 10.

(Şêxê Sen‘an û Zembîlfiroş), Şêx Nezer¹⁴⁴ (Kilam û hinek destnivîs), Mihemedê Muksî, Tahayê Hecî Ebdulezîz Xoce Mihemed Efendî, Firûz Efendî, Hesên Hekîmbaşî, Tahar Îbn Ebbas Efendî û yên din bo Jabayî hatine nivîsandin hene, him jî destnivîsên kevin yên ku Jabayî bi dest xistibûn hene. Bo mînak tenê destxetên Zembîlfiroş yên Jaba peyda kiribûn û ya Bazîdî bi destê xwe nivîsiye jî di nav de 6 heb in û li pirtûkxaneyê Petersburgê ne.¹⁴⁵ Ji bilî van di nav xebatên Jaba de 4 destnivîsên farisî, 3 yên tirkî û 3 yên fransî hebûn. Hinek ji van berheman di arşîva beşa Lenîngradê ya Enstitûya Miletên Asya û Afrîkayê ya li ser Akademiya Zanistan ya Sovyetê de hene.

Ji bilî van derket holê ku hinek ji xebatên Jaba li Îzmirê, li cem malbata jina wî û neviyên wî ne. Sala 1913an bi xêra xebata rojhilatnas û kurdologê rûs yê navdar Minorsky û bi arîkariya konsolosê Rûsyayê yê wê hîngê li Îzmirê, beşeke wan kaxizan gihişt Akademiya Zanistan li Petersburgê; beşa mayî ya ku ji nivîsên mîna “Dialogues kurdes-français” pêk dihat demeke dirêj di destê Minorsky de man û piştî şerê cihanî yê duduyan, ew jî gihiştin Lenîngradê.¹⁴⁶

Her wiha beşek ji destnivîsên rojhilatê, ji yên Jaba bi xwe berhev kiribûn gihiştin British Museumê li Londonê. Di nav wan de destnivîseka balkêş hebû, ew jî wergera tirkî ya *Şahnameyê* ku di sadsala dehan de ji bo sultanê memlûkî yê Misrê Gawrî (Gavrî) hatibû çêkirin.¹⁴⁷

2.3.6. Çawaniya Karê Jaba

Dema mirov li ser xebatên Jaba yên derbarê kurdan de lêkolînekê bike tê xuyanê ku ew tenê bi beşekê re mijûl nebûye. Ji ber peywir, perwerde û derfetên berdest heya jê hatiye tu firsend ji dest nekiriye. Ango di karên xwe yên ji bo kurdolojiyê bûne çavkaniyên giranbiha de Jaba di qadeke gelekî berfireh û rengîn de hespê xwe yê lêkolînê daye xarana. Loma heke em xebatên wî dabeş bike ev derdikeve holê; folklor - çîrok, kilam, helbest, destan-, rêziman, ferheng, dîrok.

Wekî me li jorê jî got Jaba bi hevkarîya xwe ya Akademiya Zanistan a Rûsyayê li Kurdistanê di nav gelê kurd de, bi alîkariya alimên kurdan rasterast berhevkarî kiriye û ew ber û berhemên destketî gihandine navendê. Her wiha li navendê bi komeke girîng

¹⁴⁴ Ev nav di çavkaniyan de bi van formên ji hevdu cuda tê dîtin: Şêx Nezer, Şêx Nazar, Şah Nezer, Şeh Nezer, Şeh Nazar, Şehnezer, ji ber vê me ew form mihefeze kirin.

¹⁴⁵ Aziz Samur, *Destana Zembîlfiroş û Gulxatunê*, Nûbihar, Stenbol, 2015, r. 77.

¹⁴⁶ Reychman, “Ji Rûpelên Nenaskirî Yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 134.

¹⁴⁷ H. g. r. 134.

ya pisporên dîroknas, rojhilatnas û îrannas re di nav têkiliyeke xurt de ye. Heke mirov navê wan pisporan bi gelemperî diyar bike ev dîmen derdikeve pêş çavan.

Gerok V. Dittel û gerok, dîroknas, pisporêz zimanên rojhilatê I. N. Berezîn, Îrannas P. Lerch, Oryantalîstê Rûsê Rêvebirê Mûzeyaya Asyayê Johannes Albrecht Bernhard Dorn, oryantalistê fransî François Bernard Charmoy, oryantalistê fransî Pierre-Amédée Jaubert, Îrannasê alman Ferdinand Justi, rewşenbîr E. Znatowiczî, lêkolînerê polonî A. B. Chodzko. Ev pisporana yê bi awayekî têkiliya wan bi Jaba re çêbûne ne, lê ji bilî van gelek lêkolînerên din yê mîna Minorsky, Rudenko, Maria Paradowska û yê din rasterast xebatên wî re eleqedar bûne û li ser wan xebat kirine.

Ji bilî van gelek alimên kurd dema Jaba li Erziromê bû hevnasiya wan çêbû û li gel hev xebitîn. Ji wan yê sereke ev in: Mela Mehmûdê Bazîdî, Mela Mûsayê Hekarî, Mela Mistefa, Şah Nezer, Mihemedê Muksî, Xoce Mihemed Efendî, Firûz Efendî, Hesên Hekîmbaşî, Tahar îbn Efendî. Van aliman di peydakirin, wergerandin û nivîsandina destnivîsên kurdiya kurmancî de hevgeliya Jaba kirine.

BEŞA DUYEM

MELA MEHMÛD, JIYAN Û BERHEMÊN WÎ

1. Mela Mehmûdê Bazîdî

Xebatên li ser dîroka wêjeya kurdî kêma in û yêna heyî jî hê virnî ne. Ya rastî jî ber gelek egerên jî hevdu cihê -her wiha bi hevdu ve girêdayî- çavkaniyên sereke yêna edebiyata kurdî baş derneketine ber ronahiyê.¹⁴⁸ Ji ber vê yekê divê berhemên kurdî yêna nivîskî û qedîm yêna heyî û li ber destan, wekî zêrê zerîn bêna dîtîna û wisa li wan were xwedîderketin. Lewma emê di vê beşê de qala Mela Mehmûdê Bazîdî yê ku jî bo berhevkerin, nivîsandin û wergerandina çavkaniyên ziman, etnografya, civaknasî û folklorê kurdî kedeke mezin daye bikin.

1.1. Jidayikbûn û Wefata Wî

Derheqê jiyana Mela Mehmûd de mixabin çavkaniyên zêde tunene. Yêna heyî jî yan agahiyên ku Jaba di destpêka xebatên bi hevkarîya Mela Mehmûd kirine nivîsîne û yan jî jî nameyên wî yêna jî rojhilatnasên mîna Lerch û Justi re şandine pêk tên.¹⁴⁹ Ji ber vê yekê di derheqê hûrgiliyên jiyana Mela Mehmûd de çavkanî tunene. Li gor agahiyên berdest -ew jî nameya A. Jaba ye di 10/22 îlona 1857an¹⁵⁰ de jî P. Lerch re şandiye û tê de dibêje Mela Mehmûd kurd e, 60 salî ye, lê hê li ser xwe ye. Vêca dema ku ev name di sala 1857an de hatiye nivîsîn ew jî nîşan dide ku di sala 1797¹⁵¹ de li Bazîdê -Bazîd wê demê di pergala rêveberîya Osmanî de navenda sancaxê bû- jî dayik bûye.¹⁵² Lê li gor pênc belgeyên ku Mehmet Gültekin jî arşîva Osmanî derxist -ji wan du heb nameyên Bazîdî bi xwe ne- Mela Mehmûd jî bo meaşekî bidîna serî li hikûmetê dixê. Li

¹⁴⁸ Lê gava em vê dibêjin ev tenê jî bo Bakurê Kurdistanê ye. Lewra li Başûrê Êdî sazî û dezgeh dibîne muesseseyên bi bingehe û zexm. Lewma di ciyê xwe diedilin û bi periyod weşanên xwe dikin.

¹⁴⁹ Alakom, “Bir İzmir Levantenî Auguste Jaba”, r. 53, 49, 55; Mehmet Gültekin, “Di arşîvên Rojava û Osmanî de derheqê Mela Mehmûdê Bazîdî de agahiyên nû”, *Nûbihar*, j. 129, Stenbol, 2014, r. 5, 8; Mehmet Gültekin, “Di arşîva Osmanî de Mela Mehmûd Bazîdî”, *Nûbihar*, j. 130, Stenbol, 2015, r. 9, 12.

¹⁵⁰ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 255.

¹⁵¹ Pîrbal di berhema xwe ya bi navê *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd* de sala jidayikbûnî Mela Mehmûd wekî 1799 û sala wefata wî jî wekî 1860 dinivîse, lê jî bo vê jî tu delîlî nîşan nade. Bnr. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Weşanên Aras, Arbil, 2000.

¹⁵² A. D. Jaba, *Racueil de notices et récits kourdes*, St. Petersburg, 1860, r. 8, 9.

gor nameyan Bazîdî di dawîya temenê xwe de, gava emrê wî ji 70 salî mezintir e, ji ber desttengiyê tevî kurê xwe yê 12 salî diçe paytextê dewleta Osmanî Stenbolê û daxwaznameyan dide da ku meaşekî bidine wî. Lê tarîxên van nameyan di nav sala 1860î de ne û Mela Mehmûd di herdu nameyên xwe de jî dibêje emrê min ji 70yî derbas bûye. Vêca heke wisa be divê Mela Mehmûd ji beriya 1790î hatibe dinyayê. Lê mixabin em nikarin tesbît bikin kîjan salê bûye û tenê mirov dikare texmînî wextekî nîşan bide. Jixwe mijara sala bûyîna piraniya kurdan li gor hesabên demsalê û heyamê tên zanîn û bi teqezî diyar nînin, li vir jî ew rewş derdikeve holê.¹⁵³

Mîna bûyîna Mela Mehmûd derheqê wefata wî de jî agahiyên vebir tunene û salên 1858¹⁵⁴, 1860¹⁵⁵, 1863¹⁵⁶ û 1967¹⁵⁷ wekî dîroka wefata wî tên diyarkirin. Bo mînak Pîrbal dema qala pirtûka Mela Mehmûd ya rêzimanê *Risaleyî Tuhfe en-Nehlan fî ez-Zimanî Kurdan* dike dibêje ev berhem di sala 1866an de nivîsiye.¹⁵⁸ Vêca heya wê hingê Bazîdî sax bûye, lêbelê ji hêla din ve ev agahiya ji bo Pîrbal dibe sedema nakokiyê. Lewra li gor wî Bazîdî di navbera salên 1799-1860an de jiyaye û navê pirtûka xwe jî wisa daniye.¹⁵⁹ Ango naverok û navê pirtûka wî li hevdu nakin û nakokiyê mezîn derdikeve holê.¹⁶⁰ Wekî encam em dibinin ku li gor qenaetê berbelav Mela Mehmûdê Bazîdî di sala 1797an¹⁶¹ de bûye û di sala 1867an de 70 û çend salî wefat kiriye. Li gor agahiyên berdest em jî vê qebûl dikin.

¹⁵³ Gültekin, "Di arşîva Osmanî de Mela Mehmûd Bazîdî", r. 9, 12.

¹⁵⁴ Firat Cewerî, *Antolojiya Çîrokên Kurdî*, ç. 1., Nûdem, c. 1, Stenbol, 2003, r. 41.

¹⁵⁵ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Weşanên Aras, Arbil, 2000; Evin Bilge, *Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn, 2013.

¹⁵⁶ Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurd*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002, r. 443.

¹⁵⁷ Mela Mehmûdê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, amd. Ziya Avcî, Lîs, Diyarbekir, 2010; Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, Lêkolîn: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, 2010.

¹⁵⁸ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 6. Şaşiyeke bi vî rengî di xebata Evin Bilgeyê de jî heye. Ew jî dema jiyana Bazîdî (1799-1860) nîşan dide, lê çaxê qala tarîxa destxetekê dike dibêje Bazîdî ev di sala 1867an de nivîsiye. Bnr. Bilge, *Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî*, Mêrdîn, 2013, r. 24.

¹⁵⁹ H. b, r. 1.

¹⁶⁰ Di derheq navê pirtûka Pîrbal de tişteki balkêş jî ew e ku Ziya Avcî jî di xebatên xwe de navê pirtûka Pîrbal bi vî awayî "*Mele Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867*" şaş neqil dike, bnr. Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan*, r. 42; Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, r. 42; dîsa ji bo heman şaşiye bnr. Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasik*, ç. 2., Nûbihar, Stenbol, 2014, r. 340, 341.

¹⁶¹ Baba Merdoxê Rûhanî, *Tarîxê Meşahîrê Kurd*, c. 2, Tehran, 1986, r. 1.

1.2. Navê Wî; Bazîdî an Bayezîdî

Mijareke ku mirov dide fikirandin jî nîsbeta Mela Mehmûd e. Lewra di hin berheman de wekî Bazîdî û di hinekan de jî wekî Bayezîdî, Beyazîdî, Bayazidli û bilêvkirinên wê yên din tên dîtin. Gelo ji van herduyan kîjan rast e. Di xebata Rudenkoyê, Qanatê Kurdo, Jan Dost, Şukriye Resûl, Ferhad Pîrbal û Reşîd Findî de wekî Bayezîdî hatiye bikaranîn, di ya Delîlo Îzolî de Beyazîdî û di ya Seîd Dêreşî û Ziya Avcî de wekî Bazîdî hatiye nivîsîn. Gelo ji van kîjan rast e û ji bo biryardayînê pîvana me yê çî be?

Ji bo diyarkirina vê meseleyê çend rê hene:

1. Mirovê navê fermî yê di belge û çavkaniyan de qebûl bike. Ji bo vê heke em Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî jêder qebûl bikin divê “Bayezîd” be. Lewra di wesîqeyên Osmanî û Îranî de jî wisa ye.¹⁶²
2. Di pirtûk û berhemên wî bi xwe de çî peyv çawa hatibe bikaranîn, mirov wê qebûl bike. Wê hingê gava mirov li pirtûka wî ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayîfê Ekradiye* dinihêre derdikeve holê ku Mela Mehmûd ev peyv wekî “Bazîd” bi kar aniyê.¹⁶³
3. Ya sisyan jî dibe ku mirov navê gelê herêmê wekî rastî qebûl bike. Wê çaxê jî wekî Mela Mehmûd xelkê Bazîdê/Bayîzdê ye, bi xwe forma Bazîdê bi kar tîne û îro gelê bajêr dîsa heman şeweyî dixebitîne.¹⁶⁴

Di encamê de bi baweriya me divê forma Mela Mehmûd di pirtûka xwe de bi kar aniyê rast were qebûlkirin û navê wî wekî Mela Mehmûdê Bazîdî bê nivîsandin. Ji bilî vê gelek nasnavên Mela Mehmûd yên din jî hene û evna ji wan in: Mehmûd Efendî, Feqîr Mehmûd Efendî, Xoce Mehmûd, Hecî Mehmûd, Hacî Mehmûd û hwd.¹⁶⁵

1.3. Perwerdeya Wî

Mela Mehmûd li navenda Bazîdê mezîna dibe rihate, ne êlat e, ango ne koçer e û dema berefehmi xwe dibe dest bi perwerdeya xwe dike. Li gor edetên dema xwe li medreseyan Kurdistanê bi Qur’anê dest bi xwendina xwe dike û peyra diçe Tebrîzê, di

¹⁶² Şerefxan Bedlîsî, *Şerefname*, wer. M. S. Cuma, Spîrêz, Duhok, 2006 r. 141; Şerefxan Bitlîsî, *Şerefname*, wer. Abdullah Yegin, Nûbihar, Îstanbul, 2013, r. 138.

¹⁶³ Mela Mehmûd Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, wer. M. B. Rudenko, Moskova, 1963, r. 100, 148, 153, (beşa bi tîpên erebî).

¹⁶⁴ Murad Celalî, “Adat û Rusûmatnameê Ekradiye û Çend Gotin”, r. 53.

¹⁶⁵ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 3.

nav gencîneya edebiyata serdest ya farisî û erebî de xwendina xwe diqedîne. Li gel vê welatê xwe ji ber ku zimanê dewleta Osmanî ye fêrî tirkî jî dibe. Ango Mela Mehmûd ji bilî zimanê xwe kurdiya kurmancî; erebî, farisî û tirkî dizanibû.

Mela Mehmûd wekî ji navê wî jî tê fehmkirin, di perwerdeya xwe de derketiye asta herî bilind û loma wekî mela hatiye nasîn, lê ew ne tenê melayê şerîetê ye anga ew melayên heya astekê li medreseyê dixwînin, lê di warê erebî de nabine pispore da ku bikaribin li medreseyê seydatiyê bikin. Berevajî wan Mela Mehmûd hemû pirtûkên rêzê yê medreseyê kuta kirine ku ji dersên Qur'an, Serf, Nehw, Şerî'et, Hedîs, Belaxat, Mentiq, Kelam, Cebir û hwd. pêk tên.¹⁶⁶ Piştî ku perwerdeya xwe qedandiye li welatê xwe Bazîdê heya sala 1854an li ser rêça Ehmedê Xanî li medreseya xwe dersdayîna xwe domandiye.

Li gelek bajar û herêmên wekî Tebriz, Hekarî, Botan, Mûş, Wan, Erzirom, Amediye û Stenbolê xwendiyê, geriyayê, hatiye hepiskirin, sirgûnkirin an jî ji bo kar û barê xwe lê maye. Ji hêla din ve wekî em ji nasnavê wî derdixin Mela Mehmûd çûye hec jî. Lewra jê re Hecî Mehmûd jî hatiye gotin.¹⁶⁷ Jixwe ji bo bikaribe bibe hecî divê here Mekke û Medîneyê û her wiha wê heyama ku Mela Mehmûd li heyatê bûye, mirov bi heywanan an jî peyatî diçûn hecê. Ji bo wê jî li ser rîya xwe gelek bajar û herêmên erdnîgariya Îslamê didîtin. Ji wan Şam û Qudis herêm û bajarên herî girîng in. Ji vê jî derdikeve holê Mela Mehmûd him bi xwendina xwe û him jî bi ger û seyahetên xwe xwedî ilmekî kûr bûye.

1.4. Cihê Bazîdî yê di Civakê de

Mela Mehmûd di vê heyamê de li Bazîdê seydayekî naskirî û pêştahatî ye. Lewra him di nav gel de tê naskirin û him jî li cem rayedarên dewletê kesekî girîng e. Li gor ku rojhilatnasê polonî Felician Martin von Zarembo (1794-1874) qala gera xwe ya Bazîdê ya sala 1830an dike, rûsên ku wê demê bajar zêft kirine xwarinekê didin alim û pêştahatiyên herêmê yê ji kurd, ermenî û tirkan pêk tên. A di nav wan kesên vexwendî de Mela Mehmûd jî heye û him jî wekî alimekî deryabîr tê zanîn. Loma ew bi xwe jî paşê çend caran Mela Mehmûd re dikeve têkiliyê û dema qala wî dike dibêje melayê kurd, alimê mezin, seydayê esilzade Hecî Mehmûd. Her wiha dema diçe dîtina serokê

¹⁶⁶ Zeynelabidîn Zinar, *Xwendina Medreseyê*, Pêncinar, Stockholm, 1993, r. 63, 100; Şakir Epözdemir, *Medreseyên Kurdistanê*, Nûbihar, Stenbol, 2015, r. 33, 35.

¹⁶⁷ Felician Martin von Zarembo, *Reise des Missionars Zarembo in die Russisch-türkische Provinzen am Euphrat, vom April bis Juli 1830*; *Magazin für die neueste Geschichte der evangelischen Mission – und Bibel*, r. 432, 460, vgz. Mehmet Gültekin, “Derheqê Mela Mehmûd de agahiyên nû”, r. 5, 8.

eşîra Zîlan Silêman Axa nameya Mela Mehmûd bi xwe re dibe. Zaremba misyonerekî protestan e û du salan li Bazîd, Qers û Erziromê digere û ji bo dînê xwe teblîx bike bi gel û giregirên wan re dikeve nav têkiliyê. Heta carekê diçe dîtina Mela Mehmûd piştî sohbetêke dirêj seba Qur'ana Pîroz baş nas bike jê dixwaze ku ji bo wî 42 sûretên wê wergerîne tirkî.¹⁶⁸ Ev agahiyana jî cihê Mela Mehmûd yê di nav civakê de nîşanî me dide. Lê dema ku rêveberiya Bazîdê ji destê kurdan derdikeve, Behlûl Paşa têk diçe Mela Mehmûd Bazîdê diterikîne. Lewra di şerê Qirimê yê di navbera Osmanî û Rûsan (1853-1856) de birayê wî tê kuştin û ji pey wê re karê bazirganiyê yê lawê wî jî nameşe -birayê wî di karûbarê ticarete de alîkariya kurê Mela Mehmûd dikir-¹⁶⁹ û ji ber vê aboriya malbata wî xerab dibe¹⁷⁰, Mela Mehmûd wê hingê diçe Erziromê û li wir wergêrî û seydatiyê dike.

Li gor ku Yêvgênîya Vasilyêva dibêje, Mela Mehmûd tenê bi muderrisiyê nemaye, têkiliya wî bi serhildanên kurdên Botan û Hekariyê re hebûye, lewma dewleta Osmanî wî digrin diavêjine zindana Wanê, lê piştî 15 rojan berdidin.¹⁷¹ Lê li gor rojnameya Kurdistanê Siltan 'Ebdulmecîd Mela Mehmûd sirgunî Wanê kiriye:

“Sultan Mecîd, Mele Mehmûdê Beyazîdî ji Stenbolê hinart Cezîrê nik Bedir-xan Bek, da ku pê re li ser rawestandina serhildanê bipeyive û wî bine Stenbolê. Mele efendî û Bedir-xan Bek ji mêj ve bi hev re nas bûn. Dema ew gihişt Cezîrê, ji Fermandarê Leşkerên Osmanî Osman Paşa re got: ‘Ez diçim ba Bedir-xan Bek Hunkar (wiha di teksta rûsî de, hatiye) ez hinartime, da ku ew agirê serhildanê li Kurdistanê vemirîne. Tu êrîşê nebî ser Cezîrê, heya ez bersivekê ji Bedir-xan Bek ji te re neyînim.’ Vêga wî fermana Sadir-Alazem Reşîd Paşa, şanî Osman Paşa kir. Li ser vî tiştî, di kitêba fermanên saltanatê de heye. Osman Paşa dixwest bi Bedir-xan têkeve cengê û serkewtinek mezin bi êrîşa xwe li ser Cezîrê li pey xwe xîne. Destpêkê wî nehişt Mele efendî here nik Bedir-xan Bek ew gîro kir. Lê belê dure ew berda. Beyî ku bersiveke ji Bedir-xan Bek bigire, Osman Paşa êrîş bir ser Cezîrê. Û katê leşkerên wî pergî berxwedanek bi ser û ber, ji rex kurdên serhildayî hat wî biryarda ku Mele efendî nehênî amadekirina êrîşê ji wan re xwiya kiriye. Mele efendî bersiv ji Bedir-xan Bek anî û ji ber êrîşa li ser Cezîrê, nerazîbûna xwe ji Osman Paşa re diyar kir. Êdî Osman Paşa ew girt û di bin qeyd û merbetê de ew

¹⁶⁸ H. g, r. 8.

¹⁶⁹ Ji nameya A. Jaba ya ji P. Lerch re ya di 10/22 îlona 1857an de şandiye, bnr. Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 255.

¹⁷⁰ Mela Mehmûdê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, amd. Ziya Avcî, Lîs, Diyarbekir, 2010, r. 11.

¹⁷¹ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 201, 202.

şand Stenbolê. Di nama ku ji hunkar re şandibû, Osman Paşa nivisandibû: ‘Ev merov hevalbendê Bedirxan Bek e û xayinê dewletê ye.’ Xunkar, Mele efendî sergunê Wanê kir.”¹⁷²

Wekî ji vê neqlê jî tê fehmkirin Mela Mehmûd kesekî bi nav û deng e, him li Kurdistanê di nav gel û mîrên kurdan de tê nasîn û him jî dewleta Osmanî wî nas dike. Dema dewleta Osmanî Xan Mehmûdê birayê Bedirxan gazî dikin tînin Erziromê Mela Mehmûd wergêrî û şewirmendiya wî dike, lewra wî ji bilî kurdî zimanekî din nizanibû. Ji hêla din ve Mela Mehmûd çend caran di navbera dewleta Osmanî û Bedirxan Begê ku di sala 1848an de li Botanê serî hildabû û her wiha Nurullah Begê mezinê kurdên Hekariyê de navçîtî kiribû, ji bo sulhê hewl dabû, lê dewletê ew bi hevkarîya îsyane tewambar kiribû, avêtibû hepsê û sirgûn kiribû.¹⁷³ Ji ber van egeran Mela Mehmûd êdî xwe ji wan dûr girt. Lewra ji ber van karûbarên xwe yê qenc hatibû tewambarkirin. Ewî jî têkiliya xwe ji wan birîbû û bi ilim re mijûl bibû.

Gava mirov bala xwe dide jiyana û berhemên wî tê fehmkirin Mela Mehmûd merivekî xwendî û dinyadîtî bû. Ji bilî zimanê kurdî, erebî, farisî û tirkî jî baş dizanibû û bi vî awayî bi hêsanî tevdigeriya. Her wiha di jiyana xwe ya rojane de merivekî çalak bûye, bi karê bazirganiyê re jî mijûl bûye. Lewma li gelek deveran geriyaye, civaka xwe gelekî baş nas kiriye, çavkaniyên edet, folklor û baweriyên kurdan qenc zanibûye. Em vê yekê di “‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye” de bi awayekî eşkere dibînin. Çawa ku me li jor jî qala wê kir Mela Mehmûd merivekî çalak bû, loma li cem dewleta Osmanî jî merivekî serpêsekinî bû. Di serhildana Mîr Bedirxan de ji hêla dewleta Osmanî ve ji bo navbeynkariyê bike hatibû wezîfedarkirin. Wekî din meriv gava “‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye”yê dixwîne pê derdixe ku navbera wî û Siltan ‘Ebdulmecîd xweş e. Lewra jê re dua dike û dibêje edaleta wî berdeyam bike:

“Lakin di eyyamê xilafeta Siltan ‘Ebdulmecîd Xan dame ‘edluhû wekû îcada ‘Esakirî Nizamiye bûyî êdî roj bi rojê ekrad berteref bûyn û zîlm û te‘daya wan zayil bûyî.”¹⁷⁴

Ji vê jî tê xuyanê Mela Mehmûd kesekî çavgirtî nîne. Ji ber zulma axayên ekradan bêzar e, rexneya li wan dike û ji ber ku Siltan ‘Ebdulmecîd (1823-1861) di sala 1834an

¹⁷² *Rojnameya Kurdistan*, 1898, j. 13, r. 3-4, vgz. K. K. Kurdo û J. S. Musaeliyan, *Xebat û Jiyana Mela Mehmûdê Beyazîdî*, wer. Bavê Nazê, *Kurdistan Press*, j. 54, 26 Çile, 1989, r. 9.

¹⁷³ Celîlê Celîl, *XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu’nda Kürtler*, ji rûsî wer. Mehmet Demir, *Weşanên Özge*, Enqere, 1992, r. 145, 146.

¹⁷⁴ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 102

de artêşa bi navê Esakîrî Nizamiye¹⁷⁵ damezirandiye -ev ji leşkerên bi meaş û rêkûpêk bûn-, loma êdî kurdan mîna berê nikaribû neheqiyê li xwecih û kesên bêhêz bikin. Mela Mehmûd jî seba berdewamkirina vê rewşê dua dike. Her wiha di dawiya temenê xwe de gava emrê wî ji 70 salî mezintir e, ji ber desttengiyê tevî kurê xwe yê 12 salî diçe paytext Stenbolê û daxwaznameyan dide da ku meaşekî bidinê. Ji naveroka nameyên wî meriv têkiliya wî ya bi dewletê re dibîne û ji bersivên nameyan jî tê dîtîn ku rêveberiya dewletê jî wî nas dike û ji bo daxwaza wî pêk bînin fermanê dide rayedarên herêmî.¹⁷⁶

Ji hêla din ve hin kes jî ber vê tevgera wî û zimanê wî yê li hember dewleta osmanî û siltan bi kar aniyê wî rexne dikin. Lêbelê ji bo nirxandinên rast û bi bingehe divê şert û mercên demê rind bînin zanîn û li gor wê rexne bînin kirin da ku şaşiyên anakronîk neyên kirin.

1.5. Xebatên Mela Mehmûdê Bazîdî yê li Erziromê

Mela Mehmûdê Bazîdî di sala 1854an de tê Erziromê û piştî ku karûbarê wî bi dilê wî nameşin dixwaze di wê heyamê de mala xwe ji wir bar bike vegera Bazîdê. A di wê heyamê de Jaba û Bazîdî hevdu nas dikin. Bazîdî dibe mamosteyê taybet yê Jaba. Jixwe wê heyamê Bazîdî li wir di nav gel de wekî seydayekî bi navûdeng tê zanîn. Çar zimanên li herêmê di rewacê de ne kurdî, erebî, farisî û tirkî di asta herî bilind de dizane. Dikare bi wan zimanan binivîse, wergerê bike û berhevkarîyê bike. Gava A. Jaba ji Mela Mehmûdê Bazîdî fêrî kurdî dibe, berêka dibe çavnasê wêjeya kurdî jî. Loma seba berhevkirina berhemên kurdî helanan dide Bazîdî, ji hêla aboriyê de jî alîkariya wî dike û di encama vê têkiliyê de gelek berhemên ku îro bingeha klasîkên wêjeya kurdî pêk tînin ji windabûnê xelas bûne û gihîştine navendên kurdolojîyê.¹⁷⁷ Îro kê di warê kurdolojîyê de xebatekê bike, miheqeq dê pêrgî wan berheman bê û ji wan sûd werbigire.

Heke karê Mela Mehmûd û A. Jaba bi hevkarî kirine xal bi xal bînin diyarkirin ev wêne derdikeve pêş:

a- Jinûve nivîsandin

¹⁷⁵ Abdülkadir Özcan, “Asâkir-i Mansûre-i Muhammediye”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. III, İstanbul, 1991, r. 457, 458.

¹⁷⁶ Gültekin, “Di arşîva Osmanî de Mela Mehmûd Bazîdî”, r. 9, 12.

¹⁷⁷ Hassanpour, *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, r. 162.

Mela Mehmûd ji bo Jaba hinek berhemên berê yên kêr peyda dibin ji nû ve nivîsandine. Bo nimûne rêzimana Teremaxî, alfabeya kurdî ya zarokan Sefheyê Sibyan, Mewlûda Şerîf, gotinên pêşyan.

b- Nivîsîn

Mela Mehmûd li ser pêşniyaza Jaba hinek berhem bi xwe nivîsîne. Bo nimûne ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye, Çîroka Mem û Zîn, Cami’eyê Risaleyan û Hikayetan*. Bazîdî ev bi destxeta xwe wekî berhemên serbixwe nivîsîne.

c- Werger

Mela Mehmûd karê wergerê jî kiriye. Ji vê ya herî sereke wergera *Şerefnameyê* ye ku ji farisî wergerandiye kurmancî û navê Tewarîxî Qedîmî Kurdistan lê kiriye. Her wiha beşeke *Îskendernameya Nizamiyê Gencewî* ya ji 87 malikan pêk tê wergerandiye kurmancî. Ji bilî van li gor gotinan *Gulistana Se’diyê Şîrazî* û 84 çîrokên farisî jî wergerandine kurdî.¹⁷⁸ Ji hêla de dema Jaba metnek werdigerande fransî an rûsî Mela Mehmûd alîkariya wî dikir. Her wiha di karê amadekirina ferhengan de jî ev hevkarîya wan çêbûye.¹⁷⁹

1.6. Berhemên Wî

Di encama vê hevkarî û hevgeliyê de Mela Mehmûdê Bazîdî *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî ya bi nav û deng, *Yûsif û Zuleyxaya Selîmê Silêman* (1586-?), *Leyla û Mecnûna* Harîsê Bedlîsî, *Şêxê Sen’anê* Feqiyê Teyran (1590-1660), *Bersîsê Abid û Qewlê Hespê Reş* ji nûve bi çîrokî nivîsandine.¹⁸⁰ Hevkarê wî A. Jabayê ku ji gulana sala 1848an heya sala 1866an li Erziromê Konsolosiya Rûsyayê kiriye, ew berhemana derbasî alfabeya latinî kirine, wergerandine Fransî, pêşgotinek ji wan re nivîsandiye û ew ji Akademiya Zanistî ya Petersburgê re şandine.¹⁸¹

Ji xencî van Mela Mehmûd ji pey xwe re gelek xebatên din jî hîştine û lewma îro jî kurd minetdarê wî ne. Ya rastî Mela Mehmûd zanayekî piralî ye û di warê ziman, zargotin, tarîx, bawerî û edebiyatê de gelek xebat kirine. Ew bi piralîbûna xwe ve derdikeve pêş. Loma ji bo Mela Mehmûd mirov dikare bibêje ji bo kurdan civaknasê pêşîn e, lewra bi pirtûka xwe ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* ve ew vî nasnavî heq dike. Heke mirov ji aliyê teşeyê nivîsê ve binirxîne peşxannivîsê pêşîn û

¹⁷⁸ Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, r. 22.

¹⁷⁹ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 4.

¹⁸⁰ Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 342.

¹⁸¹ Ziya Avci, *Mele Mehmûdê Bazîdî*, <http://www.kovarabir.com/mele-mehmude-bazidi-1799-1867> (10.05.2013)

her wiha çîroknivîsê pêşîn e jî. Lewra bi xwe ji bûyerên dîrokî çîrok pêk anîne û berhev kirine. Mesnewî wekî pexşan jinûve vesazkirine, bo mînak *Mem û Zîn*. Dîroknasê ewil e ku bi kurmancî nivîsiye, *Tewarîxî Cedîdî Kurdistan* û wergerê pêşîn e, wergera *Şerefnameyê Tewarî Qedîmî Kurdistan*. Bi kurtasî alimekî deryabîr û hezarfen e. Ji hêla din ve ev berhemên wî ji bo gelek qadên lêkolîn û disiplînan çavkanî ne û hinek ji wan ji bo çend qadên lêkolînê dibine çavkanî. Bo mînak *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan* him ji bo wêjeyê çavkanî ye û him jî ji ber naveroka çîrokan, mijarên xwe dibe çavkaniyeke dîrokî, her wiha bi şîrove û tehlîlên nivîskar ji bo tesbîtîkirina kodên civaka kurdan berhemeke qîmetdar e. Heke berhemên wî bèn dabeşkirin bi gelemperî ev sernavên sereke derdikevin pêş:

- a) Dîrok; *Tewarîxî Cedîdî Kurdistan*, *Tewarîxî Qedîmî Kurdistan* (wergera *Şerefnameyê*).
- b) Ferheng; Devoka Hekarî-Rewendî, Ferhengê din ên li gel Jaba.
- c) Rêziman; Rêzimana Teremaxî, Tuhfe en-Nehlan.
- d) Wêje; *Mem û Zîn*, *Yûsif û Zuleyxa*, *Leyla û Mecnûn*, *Şêxê Sen'an*, *Bersîsê Abid û Qewlê Hespê Reş*, *Kela Dimdim*, *Siyamend û Şemsê*, *Îskendernameya Gencewî* (ji farisî werger).
- e) Folklor; Berhevoka *Şîret û Gotinên Pêşîyan*, *Berîte*, *Lawij û Kilamên Kurmancî*.
- f) Civaknasî; 'Adat û Rusûmatname'ê *Tewayifê Ekradiye*, *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan*.

Li vir divê meseleyek bê eşkerekirin. Mela Mehmûd dema li gel Jaba vî karê nivîsandin, berhevkirin, wergerandin û edîtoriyal dike naxwaze navê xwe yê rastî û tam li ser van xebatan binivîse. Loma li ser piraniya xebatên wî navê wî tuneye yan jî nasnavên wî hene û nasnavên Mela Mehmûd ev in: Mehmûd Efendî, Feqîr Mehmûd Efendî, Xoce Mehmûd, Hecî Mehmûd, Hacî Mehmûd û hwd.¹⁸² Ev yeka jî dibe sedema tevliheviya, lewra gava em qala xebatên wî û Jaba dikin meriv ji hinek berheman bi awayekî vebir nikare bibêje ev ji binî ve ya Bazîdî ye û eva din jî ya Jaba ye. Ji ber vê hindê hinek xebat li ser navê herduyan jî tên hesabkirin û ev jî xwe dispêre vê helwesta Mela Mehmûd.

Li gor baweriya tê qebûlkirin Mela Mehmûd ji ber berteka gel nexwestiye navê xwe li ser van xebatan qeyd bike da ku dernekeve holê seydayekî li medreseyan muderrisî kiriye alîkariya merivekî nemislîman dike. Jixwe Jaba bi xwe jî di pêşgotina

¹⁸² Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 3.

xwe ya fransî ya ji bo “‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye*” nivîsiye de egera vê helwesta Mela Mehmûd bi vê fikarê rawe dike, ji vê şûnda jî kesên wekî Musaeliyan, Rudenko û hwd. jî ev wisa qebûl kirine. Lê bi baweriya min ev bi tena serê xwe nabe bersiva vê yekê. Lewra dema mirov bala xwe dide jiyana Mela Mehmûd, têkiliya wî ya bi kesên biyanî re hê ji dema Bazîdê vir ve heye¹⁸³ û navçîtiya wî di navbera serhildêrên kurd û dewleta Osmanî de tê dîtin ku hêzên serdest ew bi sîxurî û piştgiriya serhildêran tewanbar kirine. Li gor vê îhtimaleke mezin Mela Mehmûd ji ber vê rewşa heyî nexwestiye têkeve bin zext û zora dewletê. Jixwe Mela Mehmûd bi hin nasnavên din mora xwe li hinek xebatan xistiye. Emê li vir bi kurtasî qala hinek berhemên wî yên sereke bikin.

1.6.1. Dîrok

1.6.1.1. Şerefnameya Şerefxan Bedlîsî

Mela Mehmûdê Bazîdî cara pêşîn pirtûka Şerefxan Bedlîsî *Şerefnameya* ku qala mîrektiyên kurdan dike bi navê *Tewarîxî Qedîmî Kurdistan* ji farisî wergerandiye kurdî. Lê wekî ku Ziya Avcî jî di nivîsa xwe de dibêje,¹⁸⁴ zimanê wê pir baş e û ji bo mirov bikaribe di derheq kurmanciya wê demê de bibe xwedî fikrekê derfeteke gelekî baş e. Lê di hinek ciyan de di ser mijaran re qeviziye, wernegerandiye û hinek cih jî bi kurtasî wergerandiye. Rojhilatnasa Rûs Rudenkoyê ev wergera Mela Mehmûdê Bazîdî ya *Şerefnameyê* amade kiriye û bi pêşgotina Qanadê Kurdo û Jaklîna Surenovna Musaelyanê ve wekî destxet di sala 1986an de li Moskovayê hatiye çapkirin. Di sala 2007an de jî ew destxet ji aliyê Seîd Dêreşî ve hatiye transkrîbekirin û ji aliyê Weşanxaneyê Spîrêzê ve li Duhokê hatiye weşandin.¹⁸⁵ Dêreşî dema ev werger ji bo çapê amade kiriye, daye ber eslê wê û cihên nehatine wergerandin û yan jî kêr hatine wergerandin yekoyeko nîşan daye.

1.6.1.2. Kitêba Tewarîxî Cedîdî Kurdistan

Li gor agahiyên heyî, Mela Mehmûdê Bazîdî di vê pirtûka xwe ya ji yanzdeh beşan pêk tê de li ser mîrektiyên kurdan rawestiyaye û qala wan bûyerên di navbera salên 1785 û 1857an de qewimîne kiriye. Jixwe Mela Mehmûd *Şerefname* jî

¹⁸³ Gültekin, “Derheqê Mela Mehmûd de agahiyên nû”, r. 5-8.

¹⁸⁴ Ziya Avcî, Mele Mehmûdê Bazîdî, <http://www.kovarabir.com/mele-mehmude-bazidi-1799-1867> (10.05.2013)

¹⁸⁵ *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî, Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî*, Twijandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007. Ev wergera *Şerefnameyê* nika ji hêla weşanên Nûbiharê ve ji bo çapê tê amadekirin.

wergerandiye û ji vê jî derdikeve holê ku ji bo dîrokeke qala bûyerên ji heyama Şerefxan şûnda heya serdema xwe dike amade bike hewl daye. Ev jî piralîbûna ilme Bazîdî nîşan dide. Lewra bi ziman, dîrok, bawerî, civak, etnografya, çand û gelek hêmanên din re eleqedar bûye. Lê mixabin ev pirtûka ku di sala 1857an de hatiye nivîsîn wînda bûye. Tenê pêşgotina wê ya ji pêncî rûpelî pêk tê ji teref Jaba bi bal fransî ve hatiye wergerandin û em jî bi xêra wê di heqê naveroka wê de dibine xwedî agahî. Jaba ev beş şandiye Akademiya Zanistan ya Rûsyayê da ku binirxînin. Lerch li ser nameya Jaba ji bo wan şandiye nirxandinekê dike¹⁸⁶ lê mixabin heya îro ev pirtûk nehatiye dîtin. Li gor ku Rohat Alakom qal dike neviyên Jaba îro jî li Îzmirê dijîn û dibe ku ev pirtûk li cem wan be.¹⁸⁷ Hêviya me ew e ku ev pirtûka bi qasî hezar rûpelî were peydakirin û em jê îstifade bikin.

1.6.2. Ferheng

1.6.2.1. Ferhenga Kurdî-Fransî (Dictionnaire Kurde Francais)

Ev *Ferhenga Kurdî-Fransî (Dictionnaire Kurde Francais)* wekî ji navê wê jî diyar e ferhengeke kurdî û fransî ye. Mela Mehmûdê Bazîdî û A. Jaba ev berhema bi tevayî amade kirine û di sala 1879an de li Petersburgê çap bûye. Wekî pirtûkên Mela Mehmûd yê din, kurdiya vê jî bi tîpên erebî ye.¹⁸⁸

1.6.2.2. Ferhenga Rûsî-Fransî-Kurdî û Kurdî-Rûsî-Fransî

Mela Mehmûdê Bazîdî ji bo amadekirina vê ferhenga *Rûsî-Fransî-Kurdî û Kurdî-Rûsî-Fransî* alîkariya A. Jaba kiriye. Beşa pêşîn ya ferhenga *Rûsî-Fransî-Kurdî* ji 15.000 kelîman pêk tê û 721 rûpel e û tevî 100 diyalagên kurdî û wergera wan a fransî Jaba di sala 1865an de ji Akamedemiya Împaratoriyê re dişîne û ya rastî ev bingeha ferhenga *Kurdî-Fransî (Dictionnaire Kurde Francais)* ye ku Akademiya barê xebata li ser vê ferhengê sparte Îrannasê alman Ferdinand Justi (1837-1907) û ew jî li ser vê van destxetan xebitî û ji hêla tîpguhêzî, etîmolojiya peyvan kar kir û sala 1879an li Petersburgê da çapê. Beşa duduyan *Kurdî-Rûsî-Fransî* di navbera salên 1869-1882an de hatiye amadekirin, 700 rûpel e, lê mixabin heya îro çap nebûye. Jaba ji bo weşandina vê ferhengê gelekî hewl daye û ji gelek rojhilatnasan re name şandiye.¹⁸⁹ Lê tiştê hêviyê

¹⁸⁶ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 215.

¹⁸⁷ Alakom, “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 53, 55.

¹⁸⁸ *Dictionnaire kurde-français* par M. August Jaba, publiée par M. Ferdinand Just, Petersburgê, 1879.

¹⁸⁹ Alakom, “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 55.

dide meriv ew e ku ev pirtûk li Akademiya Zanistî ya Petersburgê hatiye parastin. Tê hêvîkirin ku di demeke nêz de were weşandin.

1.6.2.3. Ferhenga Kurdî ya Devoka Hekarî-Rewendî

Mela Mehmûd ji bo ferqa di navbera devoka hekarî û rewendî diyar bike bi alîkariya Jaba ferhengeke piçûk jî amade kiriye; *Ferhenga Hekarî-Rewendî-Fransî*. Sernavê vê ferhengokê wiha ye: “Eva risaleyêke di behsa hinek ferq û cudayî di nav lûxatêd ekradan hindû beyanî be‘zî qewa‘îdî ‘umûmî yêd lazim e.¹⁹⁰ Li gor danasîna Pîrbal ev pirtûka piçûk ji 49 rûpelan pêk tê. Mezinahiya rûpelan 34x22 ye, di her rûpelî de 13 rêz hene. Mijara wê ew e hinek taybetî û cihêtiyên di navbera devokên kurmanciya Hekariyê û devoka rewendî de diyar bike. Destxeta wê di sala 1858an de bi destê merivekî navê wî Şehnezer¹⁹¹ e hatiye nivîsîn. Bi xetê rîqayê reş li ser kartonê ewropî hatiye nivîsîn. Koda wê ya li pirtûkxaneya Akademiya Rojhilatnasiyê ya Lenîngradê D448 e. Di sala 1858an de fransiya wê jî hatiye weşandin. Her wiha di sala 1984an de bi destê Maruf Xeznedar hatiye serastkirin û ji nû ve çap bûye.¹⁹²

1.6.3. Rêziman

1.6.3.1. Rêzimana Erebi bi Zimanê Kurdî

Navê wê yê rastî ‘*Serf û Be‘dê Usûl Lazimeye Te‘lîma Bi Zimanê Kurmancî*’ ye. Elî Teremaxî di destpêka sedsala XVIIan de ev berhema nivîsiye. Teremaxî ji gundê Teremaxa di navbera Hekarî û Miksê de ye. Ji bo ku telebeyên kurd erebî hêsan hîn bibin ev rêzimana erebî bi kurmancî nivîsiye. Reşîd Findî ji ber vê wî wekî yekemîn rêzimannivîs û pexşannivîs qebûl dike.¹⁹³ Ev rêziman di sala 1981an de li Bexdayê li gel pêşgotina wî bi destê Maruf Xeznedar hatiye çakkirin.¹⁹⁴

Mela Mehmûdê Bazîdî ew pirtûk li cem melayekî xelkê Hekariyê peyda kiriye, ji nû ve rêkûpêk kiriye, nivîsandiye û pêşgotinek jî jê re amade kiriye. Bi vê pirtûkê em pê

¹⁹⁰ *Vocabulaire kurde des dialectes de Hekari et Revendi*, par A. Jaba, Consul de Russie q Erzeroum, Erzeroum le 15 Mars 1858.

¹⁹¹ Dibe ku ev Şehnezer, ew Şêx Nazarê xelkê Urumiyê be û nusxeya di “*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*” daye A. Jaba.

¹⁹² Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 6.

¹⁹³ Reşîd Findî, “*Eliyê Teremaxî Yekemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e*”, Bexda, 1985, vgz. Qedri, “*Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê "Destura Zimanê Erebi bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî"*”, r. 193.

¹⁹⁴ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 7.

dihesin ku Mela Mehmûd di warê rêzimanê de jî xizmeta zimanê kurdî kiriye. Jaba kurtasiya wê li gel wergera wê ya fransî di pirtûka “*Cami‘eyê Risaleyan û Hikayetan*” de diweşîne. Nusxeya orijînal ya bi destê Mela Mehmûd hatiye nivîsîn li Lenîngradê li pirtûkxaneyê Akademiya Zanistên Rojhilatnasiyê tê parastin.¹⁹⁵

Jaba di derheq vê rêzimanê de ji Durn re du nameyên dîroka wan 17/6/1858 û 2/4/1859 e dişîne û qala wê dike. Jaba bi wan nameyan re kurtasiyeke rêzimana Teremaxî û wergera fransî ya pêşgotina Mela Mehmûd û tevî beşek destxeta Mela Mehmûd dişîne. Li gor wê Jaba destnivîsa vê rêzimana degme 1857an de li cem melayekî xelkê Hekariyê dibîne û jê dixwaze yan bide wî û yan jî bifroşê. Lê ew mela van herdu pêşniyazan jî qebûl nake û wê destnivîsa li bal xwe nade Jaba. Di sala 1858an de Mela Mehmûd vê destnivîsê bi destê xwe jinûve dinivîse, her wiha di derheq jiyana dînî û rewşenbîrî ya li Kurdistanê ya wê heyamê nivîsekê lê zêde dike. Di wê nivîsê de qala usûla ilimxwendina li mizgeftan dike û bi kurtasî jiyana Elî Teremaxî dinivîse.¹⁹⁶

1.6.3.2. Risaleyî Tuhfe en-Nehlan fî ez-Zimanî Kurdan

Li gor agahiya ku Rudenko di pêşgotina “*‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye*” ya rûsî de dibêje Mela Mehmûd tenê jinûve nivîsîna berhemên dîrokî yên kurdî re eleqedar nebûye, her wiha bi xwe jî berhem nivîsiye. Ji wan yek jî *Risaleyî Tuhfe en-Nehlan fî ez-Zimanî Kurdan* e.¹⁹⁷ Mela Mehmûd ev kitêba rêzimanê di sala 1866an nivîsiye.¹⁹⁸ Li gor agahiyên di destê me de li ser vê risaleyê heya niha tu xebat nehatiye kirin.

¹⁹⁵ Gramaire kurde par Ali Teramakhi offert a l’Academie Imperial des Sciences a St Petersburg, par A. Jaba.

¹⁹⁶ Bnr. Qedrî, “Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê “Destura Zimanê Erebi bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî”, r. 192, 198.

¹⁹⁷ Di pêşgotina Rudenkoyê ya ji bo *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* nivîsiye de wiha derbas dibe, lê Dost wê wekî Tuhfetul Xillan fî Zimanî Kurdan, dinivîse bnr. Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 18, 206.

¹⁹⁸ Ewrehmanî Hacî Maruf, “Çend Wuşeyek Derbarey Komelêy Destnuwîse Kurdiyekanî Aleksander Jaba”, *Beyan*, j. 10, Bexda, 1973, r. 8, 10, vgz. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 6.

1.6.4. Wêje

1.6.4.1. Çîroka Mem û Zîn

Mela Mehmûd *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî manzûm nivîsiye di sala 1856an de wekî pexşan jinûve hûnaye, loma dema di dîroka wêjeya kurdî de qala çîroka kurdî ya klasîk tê kirin Mela Mehmûd wekî çîroknûsê ewil ê kurd tê qebûlkirin.¹⁹⁹ Mela Mehmûd ev bi destxeta xwe nivîsiye, Jaba ji tîpên erebî veguheztiye ser tîpên latinî û bi tevî pêşgotinekê wergerandiye fransî²⁰⁰ û şandiye Petersburgê. Di sala 1858an de meha Rebendanê roja 8an di civîna beşa Zanistên Rojhilatê de P. Lerch raporeke li ser vê kurteya Mem û Zînê pêşkêşî lijneyê kir. Lerch di derheq reseniya vê beşa hatibû şandin de şikdar bû ka beşa hatiye şandin çiqasî li gor eslê wê ye. Sala 1859an meha gulanê roja 4an di civîna beşê de nameya Jaba tê xwendin û ew beşa bi sernavê “*Recueil des etudes kourdes avec transcription du texte et traduction française*” hinek xebatên kurdî û transkrîpsiyona farisî pêk dihat hat nirxandin, guhdariya rapora Dorn û pêşkêşiya Lerch hat kirin. Di encamê de ji bo weşandina van wesîqayan lijneyeke ji Dorn, Böhntlingk, Wiedemann û Véliaminof-Zernof pêk tê hat damezirandin. 14 roj şûnda lijneyê raporek amade kir. Li gor vê raporê biryar dan ku orijîna *Mem û Zînê* ji Jaba bixwazin da ku hemûyê bê kêmasî biweşînin. Lewra wan dizanibû du nusxeyên wê li cem wî hene.²⁰¹ Jixwe bi şewirmendiya Qanadê Kurdo Rudenko li ser Mem û Zînê dixebite û di sala 1954an de teza xwe ya ewil ya doktorayê amade dike.²⁰² Piştî vê xebatê Rudenko Mem û Zînê werdigerîne rûsî, tevî destxeta wê ya orijînal, bi pêşgotinekê di sala 1962an de li Moskovayê dide weşandin.²⁰³

Nusxeyeke vê destxetê li Parîsê li pirtûkaneya Enstitûya Welat ya Ziman û Şaristaniyên Rojhilat Inalco ye. Li Rûsyayê arşîva Petersburgê jî nusxeyeke wê tê parastin.²⁰⁴ Ev çîrok bi tîpên latinî bi tîpguhêziya Xelîl Duhokî pêşiyê di kovara

¹⁹⁹ H. b, r. 9-23; Reşîd Findî, *Êkemîn Çîroka Kurdî Çîroka Mem û Zîna ya Mela Mehmûdê Bayezîdî*, Hewlêr, 2010.

²⁰⁰ A. Jaba, Resume de l'ouvrage d'Ahmed Effendi Khani, Tr. par A. Jaba, in Bulletin Hist. Philologique, LXV, j. 11, 1858, r. 161, 171.

²⁰¹ Reychman, “Ji Rûpelên Nenaskirî Yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, r. 130.

²⁰² Tosinê Reşîd, “Stêrkeke Geş Li Esmânên Kurdnasiyê; Margarîte Rûdenko”, <http://www.kovarabir.com/2015/11/tosine-resid-sterkeke-ges-li-esmanen-kurdnasiye-margarita-rudenko/> (13.11.2015)

²⁰³ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 7.

²⁰⁴ H. b. r. 5.

Gulistanê de hat weşandin²⁰⁵, ji dû wê re di *Antolojiya Çîrokên Kurdî* ya Firat Cewerî²⁰⁶ amade kiriye de cih girt û peyra jî wekî pirtûk di nav weşanên Lîsê de hat çapkirin.²⁰⁷ Lêbelê her çendî tîpguhêziya van hersê weşanan ya Duhokî be jî di navbera wan de cudahî heye. Lewra di herdu weşanên pêşîn de çîrok -şaşiyên tîpguhêziyê û rastnivîsê ne tê de- li gor eslê wê hatiye weşandin, di ya sisyan de mixabin li ser navê serastkirinê midaxeleyî berhemê kirine û hin guherînên keyfî kirine. Ev jî dibe sedem ku kesê vê çapa sisyan bixwîne derheqê zimanê Mela Mehmûd de nikare bibe xwedî agahî.

1.6.4.2. Çîroka Leyla û Mecnûn

Mela Mehmûd ev çîroka manzûm ya bi navûdeng *Leyla û Mecnûn* ya Harisê Bedlîsî bi destê xwe di sala 1859an de nivîsiye, Jaba ji tîpên erebî veguheztiye ser tîpên latinî û bi tevî pêşgotinekê wergerandiye fransî. Nusxeyeke vê destxetê li Parîsê li pirtûkxaneyê Inalco ye. Li Rûsyayê arşîva Petersburgê jî nusxeyeke wê tê parastin.²⁰⁸ Rudenkoyê ev berhem tevî pêşgotinekê di sala 1965an de li Moskovayê daye çapkirin.²⁰⁹

1.6.4.3. Çîroka Siyamend û Şemsê

Yek ji wan çîrokên Mela Mehmûd bi destxeta xwe nivîsandiye jî çîroka *Siyamend û Şemsê* ye.²¹⁰ Bazîdî ev çîrok wekî pexşan nivîsiye û di *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan* de wekî çîroka 13an hatiye weşandin.²¹¹ Rojhilatnasê Rûs M. de Tchihatcheff (1808-1890) di sala 1859an de ev destnivîsa kurmancî li gel tîpguhêziya wê ya latinî, wergera fransî û pêşgotineke fransî ya Jaba daye çapkirin.²¹²

²⁰⁵ Xelîl Duhokî, "Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867)", *Kovara Gulistan*, j. 1, Stenbol, 2002, r. 75-83.

²⁰⁶ Cewerî, *Antolojiya Çîrokên Kurdî*, c. 1, r. 41, 53.

²⁰⁷ Mela Mehmûdê Bazîdî, *Mem û Zîn*, ji tîpên erebî vgz. Xelîl Duhokî, Lîs, Diyarbekir, 2007.

²⁰⁸ Pîrbal, *Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 5.

²⁰⁹ H. b, r. 7.

²¹⁰ Gültekin navê vê çîrokê wekî "Siyahmed û Xemsî" dide. Bnr. Mehmet Gültekin, "Di arşîva Prof. Ferdînannd Justî de nameyên Aleksandre Jaba", *Fritillaria Kurdica*, j. 9, Kraków, 2015, r. 130.

²¹¹ Îskender Jaba, *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan*, Petersburg, 1860, r. 44, 46; A. D. Jaba, *Racueil de notices et récits kourdes*, St. Petersburg, 1860, r. 36, 39; Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan*, r. 76, 77.

²¹² A. Jaba, Ballade kurde recueillie et traduite par A. Jaba et communiquee par M. de Tchihatcheff, *Journal Asiatique*, j. 5, 1859, r. 153, 166.

1.6.4.4. Hikayeta Şêxê Sen'an

Mela Mehmûd *Hikayeta Şêxê Sen'an* ya Feqiyê Teyran di sala 1865an de bi destê xwe nivîsiye û Rudenkoyê sala 1965an li Moskovayê tevî pêşgotinekê daye weşandin.²¹³

1.6.4.5. Yûsif û Zuleyxaya Selîmê Silêman

Selîmê Silêman ev mesnewiya xwe di sala 1759an de nivîsiye. Ji 2325 malikan pêk tê. Rudenkoyê teza xwe ya doktorayê li ser vê mesnewiyê amade kiriye û çavkaniya wê jî destxeta Mela Mehmûd e.²¹⁴ Rudenkoyê ev xebata xwe ya doktorayê ya duduyan - doktora wê ya pêşîn li ser Mem û Zînê ye- di sala 1973an de kiriye û di sala 1985an de jî piştî mirina wê hatiye weşandin.²¹⁵ Li ser Yûsif û Zuleyxayê Ayhan Geverî jî lêkolîneke berfireh kir û ev xebata xwe da weşandin.²¹⁶

1.6.4.6. Kela Dimdimê

Di nav koleksiyona ku destxetên kurdî ya Jaba de destana helbestkî ya Kela Dimdimê jî heye. Li pirtûkxaneyê Saltîkof Şedrîn ya Lenîngradê bi jimara "Kurd 36" destnivîsek heye û di navbera rûpelên 64-69an de qala Dimdimê tê kirin û navê wê "Hikaya Şerê li ser Kela Dimdimê Digel Qizilbaşan, gotin Feqiyê Teyran" e.²¹⁷ Li gor gotina Rudenkoyê nusxeyeke wê ya bi jimara "Kurd 26" jî heye lê nayê zanîn ka kê nivîsiye.²¹⁸ Li gor texmînan di sedsala XVIIan yan jî serê sedsala XVIIIan hatiye nivîsîn.²¹⁹ Jaba bi xwe jî ev destana bi fransî daye weşandin,²²⁰ li ser roman,²²¹ hatine nivîsîn û gelek lêkolîn hatine kirin.²²²

²¹³ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 7.

²¹⁴ Margaret Rudenko, "Edebî Kurdî Sedey Hevdehem", *Ronakbîrî*, j. 1, Stocholm, 1992, r. 75.

²¹⁵ Pîrbal dibêje Rudenkoyê ev teza xwe ya doktorayê di sala 1985an de daye çapê. Lê diyar e li vir şaşiyek heye, lewra Rudenkoyê di sala 1976an wefat kiriye. Bnr. *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 7.

²¹⁶ Ayhan Geverî, *Yûsuf û Zuleyxaya Selîmiyê Hîzanî*, Nûbihar, Stenbol, 2013.

²¹⁷ Casimê Celîl - Emerê Celalî, *Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn*, Nûbihar, Stenbol, 2011, r. 24.

²¹⁸ H. b, r. 24.

²¹⁹ Rudenko, "Edebî Kurdî Sedey Hevdehem", r. 78.

²²⁰ M. Alexandre Jaba, *Recueil de notices et récits kourdes*, St. Pétersbourg, 1860, r. 87-90.

²²¹ Erebe Şemo, *Dimdim*, Yêrîvan, 1966; Erebe Şemo, *Dimdim*, Lîs, Diyarbekir, 2007.

²²² Ordîxanê Celîl, *Kurdskiy Geroyişeskiy Epos "Zlatorukiy Xan"*, *Destana Qehremaniya Xanê Çengzêrîn ê Kurd (Dimdim)*, Moskova, 1967, bi rûsî; Ordîxanê Celîl, *Kürt Kahramanlık Destanı Dimdim*, wer.

1.6.4.7. Wergera Îskendernameya Gencewî

Li gor ku Peter Lerch neqil dike sala 1856an meha Cotmehê Jaba destxeteke ku ji 118 rûpelan pêk tê dişîne Akademiyê. Li aliyê çepê yê destxeta orijînal û wergera Xoce (Mela Mehmûd) heye û li aliyê rastê jî tîpguhêziya metnê kurdî ya Jaba ya bi tîpên latinî nivîsiye heye. Di navbera rûpelên 1-46an de wergera 3 beşên ji *Îskendernameya Nîzamiyê Gencewî* hene. Beşa pêşîn ji 7 malikan pêk tê, ya duduyan ji 70 malikan pêk tê û ya sisyan jî ji 10 malikan pêk tê. Di navbera rûpelên 47-118an de wergera 224 biwêj û metelokên tirkî yên ji rûpelên 1-107 û 109-245an rêzimana tirkî ya oryantalîstê fransî Pierre-Amédée Jaubert hatine wergerandin heye. Dost vê wergera Bazîdî ya 7 malikan pêk tê neqil dike:

“Xeberzanîna Îskender ji ajotina Êris û Xerabkirina Berde’ê û birina Nûşabe bi êsîrî

Ji bo dinyageran ra di dinyayê ajotîn
Xoş tê seferê di nav seferê kirin

Di her bajêrekî dîtî zînet û xeml
Di her qonaxekî hêsayî kirin

Ji tiştê dizî xeber hilanîn
Ji nedîtîyan pay hilanîn

Lakin bibînî paşîya şuxulî
Di bajêrê xo da ye mirov xundkar

Xeyrî mayin di bajêrê xo da digel mûnan
Çêtir e ji xundkariya bajêrê merivan

Di bajêrê merivan eger çî dibe qenc e
Dil nabe ji evîna malî vala

Îskender digel wî mirazî ku hebû

İbrahim Kale, Avesta, İstanbul, 2001; Casimê Celîl - Emerê Celalî, *Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrin*, Nûbihar, Stenbol, 2011.

1.6.5. Folklor

1.6.5.1 Berhevoka Şîret û Gotinên Pêşyan

Mela Mehmûd dema tevî Jaba dest bi xebatê dike, merivekî rispî ye û li gelek deverên Kurdistanê, Îranê û dewleta Osmanî geriyaye. Ji ber vê hindê kesekî dinyadîti ye û gava karê berhevkarîyê dike di nav wan de komkirina gotinên pêşyan, şîret û pendên bav û kalan jî hene.²²⁴

1.6.5.2. Berîte, Lawij û Kilamên Kurmancî

Mela Mehmûd hinek berîte, lawij û kilamên di nav kurmancan de li şîn û şahiyên de gelekî tên gotin jî berhev kirine. Bo mînak *Der Mecalis, Kilamê Keçan, Gewrê û Xelîl Beg, Stranêd Kurmancî, Zenbîlfiroş, Qewlê Hespê Reş*²²⁵ ji wan yên sereke ne. Ji van berhevkerinên li ser stranên yeka herî girîng jî Kilama Gewrêya keça kurda êzdî ye. Ev kilam behsa hezkirina Gewrê û Xelîl Begê kurê Ebdî Paşayê ku di sedsala XVIIIan de ji pêştahatiyên Eleşgirê ye dike. Kilam û çîroka wê bi destê Mela Mehmûd hatiye berhevkerin.

Mela Mehmûd di dîroka xwe *Tewarîxî Cedîdî Kurdistanê* de qala vê çîrokê kiriyê û Jaba ev beşa bi navê “Beşek (Destxet) ji Dîroka Modern ya Kurdistanê: Gewrê û Kilamên Wê” daye weşandin.²²⁶

1.6.6. Civaknasî

1.6.6.1. Cami‘eyê Risaleyan û Hikayetan

Ev berhema hêja ya Mela Mehmûdê Bazîdî, ji sê gotar û çil çîrokan pêk hatiye û wekî kitêb bi hev re hatine çapkirin. Ev antolojiya çîrokên gelêrî yên kurdî ya yekemîn e bi destê Mela Mehmûd hatiye amadekirin û Jaba wergerandiye fransî û di sala 1860î de

²²³ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 18.

²²⁴ Mohammad Mokri, *Kurdologie et enseignement de la langue Kurde en URSS*, in “*Recherche de Kurdologie, Contribution aux etudes iraniennes 1956-1964*”, Paris, 1970, r. 65, 95, vgz. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 7.

²²⁵ Maruf, “Çend Wuşeyek Derbarey Komelêy Destnuwîse Kurdiyekanî Aleksander Jaba”, r. 8, 10, vgz. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 7.

²²⁶ “Ghevri et ses chansons, extrait de l’histoire de Kurdistan par Mahmoud Bazidi”, *Bulletin de l’Athéené oriental*, j. 3, 1881, r. 145-158, vgz. Alakom, “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba”, r. 53, 55.

li Petersburgê bi pêşkêşeke P. Lerch hatiye weşandin.²²⁷ Li gor ku Jaba di nameyeke xwe ya ji rojhilatnas Dorn re dişîne de diyar dike ev çîrokên kurmançî ji deverên cihên yên wekî Mûş, Bedlîs, Wan, Bazîd, Qers, Erzirom û Erzincanê ne.²²⁸

Ji van hersê gotaran ya ewil bi navê “Risale di Behsa Be‘dê ‘Eşayîr û Qebayîl û Tayifeyê di Kurdistanê Beyan Dike” ye. Ev gotar bi kurtasî qala eşîrên kurdan yên li Bazîd, Agirî, Diyadîn, Xamur, Eleşkerd, Wan, Erdîş, Mûş, Bedlîs, Hekarî, Botan, Cizîr û Diyarbekirê dike û der heqê warê wan, navê mîr û axayê wan û jimara xaneyên wan de agahiyên dide. Ji hêla din ve beşeke vê gotarê jî li ser wê edeta kurdan e ku çawa navan kurt dikin û nivîskar li vir nav bi nav mînakên dide û nîşan dide çawa navê jin û mêran nivîsandin û xirab dikin.

Di gotara duduyan de ya bi navê “Risaleyê di Behsa Şa‘ir û Musennefên di Kurdistanê ku bi Zimanê Kurmanciye Cih û Kitêb û Şi‘r û Hikaye û Qiseyêd Wan Beyan Dike” ye. Ev gotara qala heşt şairên kurd Elî Herîrî (1010-1078), Melayê Cizîrî (1570-1640), Feqiyê Teyran, Melayê Bateyî (1417-1491), Ehmedê Xanî, Îsmailê Bazîdî (1654-1709), Şerefîxanê Hekarî (1689?-1748?), Muradxanê Bazîdî (1736-1778) dike. Celadet Alî Berdirxan (1893-1951) di kovara *Hawarê* de bi navê xwe yê mustear Herekol Azîzan gotareke bi sernavê “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” weşandiye û di vê gotara xwe de xwe sipariye vê nivîsa Mela Mehmûd, lê navê wî nade û dibêje melayekî kurmanç ev agahî ji Jaba re nivîsîne û li gelek cihan dema qala wî dike bi navê ‘Melayê Jaba’ balê dikşîne ser wî. Celadet car carna rexneyan jî dike û şaşiyên wî nîşan dide, lê di destpêkê de wiha qala hêjahiya vî karê Mela Mehmûd dike: “...Ji milê din di kitêba kurdîzanê ûris Eleksandr Jaba de der heqê edebiyeta kurdî hin not hene. Jaba ji melakî kurmanç re di heqê edebiyata me de bendek da bû nivîsandin. Melayê kurmanç, ji xêra Xwedê re, benda xwe ne bi erebî, ne bi farisî û ne jî bi tirkî, lê bi kurmançî nivîsandiye.”²²⁹ Bi vî awayî em dibînin ku ev nivîs ji bo dîroka edebiyata kurdî bûye jêder û wekî xebata biyografîk ya ewil hatiye qebûl kirin. Li gel piçûktî û kêmasiyên wê jî ber awayê nivîsê, serdema wê ya klasîk wekî tezkîreyeke piçûka

²²⁷ *Recueil des notices et recits kourdes servant a la connaissance de la langue, de la litterature et des tribus du Kourdistan, reunis et traduits en français par M. Alexandre Jaba, consul de Russie a Erzerum, St. Petersburgê, 1860.*

²²⁸ Musaelyan, “A. Jaba û Kurdnasî”, r. 29, 45; vgz. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 5.

²²⁹ Herekol Azîzan, “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” *Hawar*, j. 33, Şam, 1941, r. 9.

rojhilatî ya li ser şa'irên kurd jî tê hesabkirin.²³⁰ Gotara sisêyan jî danasîna pirtûka Elî Teremaxî ya der heqê rêzimana erebî ya bi navê “Muqeddîma ‘Ilmê Serf û Be‘dê Usûl Lazimeye Te‘lîmiye Bi Zimanê Kurmancî” de ye.

Beşa bingehîn ya pirtûkê jî ji çil çîrokên biîbret pêk tê. Lê divê bê zanîn ku ev çîrokana jêdera xwe ji bûyerên rastî hildidin, ango ne çêkirî ne. Ji ber vê xususiyeta xwe mirov dikare wan jî wekî çavkaniyeke dîrokî qebûl bike. Heke em bi kurtasî behsa naveroka wan çîrokan bikin; di çîroka yekê, duduyan û sisyan de qala timatiya kesên xwendî û melayan tê kirin. Ango bal tê kişandin ku çawa li pey malê dinyayê dikevin, çavçil û dexes in. Bazîdî gava qala van xesletên nebaş dike, ji çavdêriyên xwe jî îstifade dike û dibêje ev ne tenê ji bo xwenda û zanayên kurdan wiha, piraniya civakan welê ye. Li vir tê nîşanda ka çawa ji bo malê dinyayê, menfaet û weylnefsîtiyê çî dek û dolaban dikin. Ev yek jî nîşan dide ku Mela Mehmûd nabêje ez jî mela me û wekî rexnegirekî bêalî ji bo serastkirina şaşîyan van derdixe pêş. Di çîroka çaran de qala talan û rêbirîya li Kurdistanê tê kirin û her wiha tê xuyan ka ev yeka çî bandorê li ser civak û tîkiliyên wan dike. Wekî ya yekê di çîroka pênc û şeşan de jî behsa timatî, pere, malê dinyayê tê kirin. Di çîroka nehan de çîroka Şêxî Begê mîrê Miksê û Adîle Xanima jina Mîr Şeref e ku seroka Kela Şaxê ye. Di çîroka danzdehan de jî qala çîroka hezkirina Hesên Axa û Lalîxana Goveyî tê kirin. Ji çîrokên pirtûkê ya sî û heyştan gelekî balkêş e, lewra qala oryantalistê fransî Pierre-Amédée Jaubert (1779-1847) dike. Li vir divê bi kurtî em qala Jaubert jî bikin, lewra ew jî li herêma Kurdistanê geriyaye. Ji bo nameyeke Napolyon bibe Îranê bigihîne Feth Elî Şah sala 1805an derdikeve rêwîtiyê lê piştî gelek tengasiyan dema digihêje Bazîdê, Mehmûd Paşayê begê herêmê û yê li Qesra Îshaq Paşa rûdinê ji wî dikeve şike ku sîxur e²³¹, loma wî diavêje hepsê. Gava Mehmûd Paşa ji ber nexweşîya webayê dimre û ew jî wisa ji hepsê derdikeve û diçe Tehranê û encax 1806an de vedigere Parîsê.²³² Di sala 1826an de nivîseka Jaubert ya bi sernavê “Kurdistan” tê weşandin. Di nivîsa xwe de qala mêvanheziya kurdan dike.²³³ Lêbelê Mela Mehmûd

²³⁰ Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 53, 54.

²³¹ Lê konsolosê Ingiltereyê yê Erziromê James Brant dibêje Mehmûd Paşa çav berdaye wan xelatên ku Jaubert ji bo Şah dibe û loma ew avêtiye zindanê, bnr. James Brant, *1838 Yazında Kürdistan*, wer. A. Celil Kaya, Rûpel, İstanbul, 2014, r. 158, 159.

²³² Semavi Eyice, “Pierre-Amédée Jaubert”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. 23, İstanbul, 2001, r. 576.

²³³ Pierre Amédée Jaubert, “Kurdistan”, *Kovara Severniy Arhiv*, j. 14, 1826. <http://www.ajansafirat.com/news/guncel/19-yuzyylda-rus-basynynda-kurtler-anjelika-pobedonosteva-kaya.htm> (26.01.2015)

çîroka wî bi awayekî din neqil dike. Ji aliyekî ve neheqîya rêvebiran û di aliyê din de jî mirovheziya kesên di qesra paşê de dijîn û alîkariya vî kesê xerîb dikin tê dîtin.²³⁴

Bi rastî ev çil çîrok ji serî heya binî, ji qencî û xirabiyê, şer û lihevkerinê, paşa û xulaman, diz û qencîkaran, paşayên osmanî, şahên îranî, mîrên kurdan, êzdî, elewî, misliman bi giştî qala civaka kurdan dike.

Cankurd ev berhem veguhaztiye latinî û li gel ferhenga jê re amade kiriye daye weşanê.²³⁵ Reşîd Findî jî ev pirtûka li gor rênivîsa nû ya tîpên erebî amade kiriye û ji bo her çîrokê ferhengok çêkiriye û daye çapê.²³⁶ Lê di vê weşanê de tenê ji gotarên wê ya bi navê “Risaleyêke di Behsa Şa‘ir û Musennefên di Kurdistanê ku bi Zimanê Kurmanciye Cih û Kitêb û Şi‘r û Hikaye û Qiseyêd Wan Beyan Dike” heye. Findî vê gotarê bi tevî şîrovaya xwe ya li ser agahiyên Bazîdî dide. Ji hêla din ve bi tevî Fransiya wê bi amadekirina Ziya Avcî bi tîpên latinî hatiye weşandin.²³⁷ Wekî din Evin Bilgeyê li ser çîrokên Mela Mehmûd tezeke lîsansa bilind amade kiriye. Di vê tezê de naveroka çîrokên Bazîdî hatiye dahûrandin.²³⁸ Her wiha van axiriyan jî wergera wê ya polonî di kovara *Fritillaria Kurdica* de derçû.²³⁹ Joanna Bocheńska ev pirtûk wergerandiye polonî balê dikşîne ser xwediyê vê xebatê û dibêje di sernavê wergera vê pirtûkê ya fransî de du şaşî hene. Ango div ê wergerê de xwediyê vê kitêbê Jaba tê xuyanê, lê em dizanin ku kesê ev berhev kiriye û nivîsiye Bazîdî ye û yê wergerandiye fransî û belavî dunyayê kiriye Jaba ye. Ji ber vê şaş e Jaba bi tena serê xwe wekî xwediyê vê xebatê bê zanîn.²⁴⁰ Loma di wergera polonî de Bazîdî û Jaba gel hev wekî danerên vê berhemê hatine diyarkirin. Şaşiya din jî ew e ku navê Jaba ne August lê wekî Aleksander hatiye nivîsîn. Ev şaşiya di vê wergerê de hatine serastkirin.²⁴¹

²³⁴ Avcî di pêşgotina *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan* de dema qala vê bûyerê dike di rûpelê 8an de dibêje ev çîroka 39an e û rûpelê 21an de jî dibêje ev çîroka 38an e ya rast jî 38 e. Bnr. Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan*, r. 8, 21.

²³⁵ Aleksander Jaba, *Çîrokên Kurmancî*, amd. Cankurd, Weşanên Çanda Nûjen, Stockholm, 2000.

²³⁶ Reşîd Findî, *Çil Çîrokêd Mela Mehmûdê Bayezîdî*, Aras, Hewlêr, 2004.

²³⁷ Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, amd. Ziya Avcî, Lîs, Diyarbekir, 2010.

²³⁸ Bilge, *Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî*, Mêrdîn, 2013.

²³⁹ Bocheńska, “Zbiór uwag i opowieści kurdyjskich”, r. 6-128.

²⁴⁰ Bi rastî ev şaşî bûye sebeb ku agahiyên di vê kitêbê de bêtî Bazîdî tenê nîsbetî Jaba bikin û wisa bê zanîn. Ji bo nimûneyeke balkêş bnr. Mehmet Sait Çakar û yên din, *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Tarih Vakfı, İstanbul, 2010, r. 100, 101, 102, 124, 127, 132.

²⁴¹ Bocheńska, “Zbiór uwag i opowieści kurdyjskich”, r. 3.

1.6.6.2. ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye

Mela Mehmûd di sala 1858-1859an de *‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* de bi xeta xwe nivîsiye û her wiha di sala 1868an bi destê kesekî navê wî Şah Nezer e jinûve hatiye nivîsîn û sala 1963an M. B. Rudenkoyê li Moskovayê çap kiriye. Mela Mehmûd bi vê berhemê û yên din wekî damezrênerê pexşana kurdî tê qebûlkirin.

Ev berhem him ji ber mijara xwe ve -ku edet, bawerî, xûy, kevneşopî, xwarin, vexwarin, rabûn û rûniştin bi kurtasî hemû jiyana rojane di xwe de dihebîne- pir giranbiha ye, di babeta xwe de serekaniyeke tekane ye. Ev pirtûk li ser jiyana kurdan ya civakî û etnolojiya wan berhema herî pêşîn e ku bi destê kurdekî hatiye nivîsîn. Jixwe ji pirtûkên Mela Mehmûd ya musteqîl, bi serê xwe ev e. Ango ev xebata wî ya herî orijinal e. Lewra bêyî xwe bispêre jêdereke, -ku wekî yên li jor me qala wan kirin bingehê wana berê heye- di derheqê jiyana ekrad, anga kurdan de bi kurtasî lê têrûtijî agahiyan dide û wan dide nasîn.

BEŞA SÊYEM

‘ADAT Û RUSÛMATNAME’Ê TEWAYIFÊ EKRADIYE

1. Nirxandinek li Ser ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye

Mela Mehmûd di vê pirtûka xwe de wekî civaknasekî pispor, bi gelemperî ji dîrok, ziman, bawerî, çand û kelepura wan dest pê kiriye qala hebûn û nirxên kurdan kiriye. Dema mirov vê berhemê dixwîne ev hest li mirov çêdibe ku Bazîdî dixwaze kurdan -bi taybetî jî kurdên koçer- bide nasîn. Ev jî derdixe holê ku li ser pêşniyaza Jaba, Bazîdî seba gelê xwe bide nasîn dest bi nivîsîna vê pirtûkê kiriye. Bi vê xebata xwe ve Mela Mehmûd bûye Îbn Xaldûnê kurdan. Çawa ku Îbn Xaldûn (1332-1406) bi kitêba xwe *Muqaddîmeyê*²⁴² ve di alema Îslamê de û di nav ereban de wekî civaknasê pêşîn û dîroknasê tê qebûl kirin, bi ked û xebatên xwe yê cihêreng ve Mela Mehmûd jî di nav kurdan de li gel taybetiyên xwe yê din civaknas û dîroknasê ewil e. Lewra Mela Mehmûd bi vê kitêba xwe him kurd bi hemû aliyan ve dane nasîn, him li cihên bî rexnekirin rexne kiriye, kêmasiyên wan veneşartîye. Her wiha li gor fikra hakim a dema xwe di hin mijaran de -wekî dîrok û zimanê kurdî- xwedî qenaetên ecêb e jî. Loma ji ber fikra xwe ya di derheqê esil û zimanê kurdan de hatiye rexnekirin.

1.2. Li Gor Mela Mehmûdê Bazîdî Eslê Kurdan

Mela Mehmûd wekî dîroknasê pispor beriya her tiştî bi eslê kurdan dest bi kitêba xwe ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* dike. Nivîskar di destpêka kitêba xwe de kurdan ne wekî miletekî bi serê xwe, lê wekî milekî ji ereban dihesibîne û destnîşan dike ku hinek eşîrên ereb ji warên xwe koç kirine û hatine ser sînorên Îran, Xorosanê û bi vî awayî kurd derketine holê.

“Emma be‘d, me‘lûmê cenabêd talib û naziran bibitin ku ev tewayifêd ekradan ji tewayifêd e‘rabêd bedewiyêd berê ne ku zemanê ma‘diyê da ji wan tayifêd e‘raban miqdarek cida bûyine û bi van kenaran da be ‘iyal û eţfal hatîne û hemû qebîleyek bûne. Û berê lîsanê wanî jî bil‘umûm zimanê

²⁴² *Muqaddîme* destpêka kitêba dîrokê ya heft cildî ye û navê wê yê tam ev e: “*Kitabul-Îber we Dîwanul-Mubtede' wel-Xeber fi Eyyamîl-Erab wel-Ecem wel-Berber we men 'Asarahum min Zewiyiyî's-Sultanil-Ekber.*”

‘erebî bûne û yek tayîfe bûne. Heta wî zemanî lefzê Kurdistan tunebûye.
Paşê wekû hatîne van etrafêd xalî û sînored Îran û Xoresanê.”²⁴³

1.2.1. Îtirazên li vê Nêrîna Bazîdî

Dema kurd îro di sedsala XXIyan de van hevokan dixwînin bi tu awayî bawer nakin û ji bo pûçderxistina vê nêrînê ji gelek lêkolînan delîlan tînin. Heta hinek ji ber ku naxwazîna Mela Mehmûdê ewqasî xizmeta ziman û dîroka kurdan kiriye, li ber çavê xwe reş bikin, dibêjin dibe ku ev ne nêrîna wî be û paşê li vê kitêbê hatibe zêdekirin. Delîlo Îzolî dema qala vê mijarê dike diyar dike ku zimanê destxeta vê risaleyê ji serî heya rûpelên 13-14an, bi awayekî cuda û ji wê şûnda jî bi awayekî din hatiye nivîsîn, ango li gor wî ne ya kesekî tenê ye. Li gor vê dibe ku têde tehrîfat û guherandin hatibin kirin.²⁴⁴

Lêbelê dema mirov li xebatên Mela Mehmûd yê din dinihêre jî tê xuyanê ku ev fikra wî bi xwe ye û li gor wî ev rastî tu tiştî ji milletê kurd kêma nake. Loma di destpêka çîroka xwe Mem û Zînê de îfadeyeke wekî “kurmancêd ereb” bi kar tîne û dibêje Mîr Zeyneddîn yek ji kurmancêd ereb e û ji nesla Hezretê Xalid e.

“Di zemanê pêşîn, di weqtê tayîfa el milûkan da, di tarîxa şeş sed û çend salekê hîcretê da ji tayîfeya kurmancêd ereban ji silsîla Hezretê Xalid, bi xoser ne di bin hukmê kesekî da hesêb ke gora zemanê xo di cezîre û etrafê wê da herçî tayîfeyê kurmancan ku hebû di nêv wan da wekû qiralekî bi xoser; Mîr Zeyneddîn nav mîrekî bi nav û şan û mêrxas el e’nan xwuyê meqsed û meram hebû.”²⁴⁵

Nirxandina xebat û agahiyên dîrokî divê anakronîk nebin, ango ya durist ew e ku dema agahî, angaş û bawerîya di berhem û wesîqayekê de tê nirxandin lazim e ku paşxaneyê wan a di dîrokê de baş bê zanîn. Heke ev rastiya esasî neyê hesabkirin, nirxandin û şîroveyên li ser berhemên ji berîya me hatine nivîsîn dê bêbingeh bin û xêra wan jî nagihêje me. Wekî tê zanîn meriv; ango dîrokzan, wêjekar, siyasetmedar û hwd kurê dema xwe ye. Li gor perwerdeya xwe ya li mala xwe, li ber destê mamosteyên xwe, di nav civaka xwe de hildaye dikemile, ji xwe re bawerî û ramanekê diyar dike û di heyama jiyana xwe de jî li gor wan hêmanan nirxandinan dike.²⁴⁶ Wekî tê zanîn Mela Mehmûd di dawîya sedsala XVIIIyan hatiye dinyayê û heya nivê duduyan ê sedsala

²⁴³ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 202.

²⁴⁴ Beyazîdî, *Adetên Kurdîstanê*, r. 8, 9 (pêşkêşî).

²⁴⁵ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 16; Cewerî, *Antolojiya Çîrokên Kurdî*, c. 1, r. 42; Bazîdî, *Mem û Zîn*, r. 23, 24.

²⁴⁶ Reşîd Findî, *Pertûka Adat û Rusûmatnameê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867*, Dezgeyî Spîrêz, Duhok, 2006, r. 13.

XIXan jiyaye. Civaka lê mezin bûye, kurd in, dînê Îslamê dihebînin, nirxandinên wanê di derheqê dinyayê de, eslê wan û zimanê wan jî xwe dispêrin çavkaniyên dînî û tarîxî yên bi destê wan hatine nivîsîn. Li gor Qur'anê ku kitêba mislimanan a pîroz e, bavê hemû mirovan pêxemberê pêşîn Hz. Adem e û hemû mirovahî ji nesla wî ye. Her wiha li gor Tewratê mirovahî ji piştî tofanê ji sê lawên Nûh; Sam, Ham û Yafes zêde bûye. Jixwe li gor vê baweriyê divê mirovahî eqrebayê hevdu bin. Ji hêla din ve ji ber ku dînê Îslamê di nav ereban de belav bûye û peyra hatiye nav kurdan, gelek êl û eşîrên kurdan ji bo prestîj û statuyeke bilind xwe nîsbetî ereban dikan. Bo mînak mîrên Behdînanê digotin em Ebbasî ne, yên Hekariyê digotin em ji nesla Xalid bîn Welîd in. Lê gava ku îro ev nêrîna bi perspektîfa netewebûnê tê xwendin şaş tê dîtin. Loma gava îtiraz li vê nêrîna Mela Mehmûd tê kirin tê gotin ku ereb ji Sam in û Samî tînen qebûlkin, lê kurd qewmekî arî, ango îranî ye û ew jî li gor vê nêrînê ji Yasef in. Ango eleqeya kurd û ereban bi hevdu tune. Îro di nav kurdan de ev fikra tê qebûlkin.

Ji bo ku em bizanibin di pirtûkên dîrokê de çawa li vê meseleyê nihêrîne *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî û Dîroka Kurd û Kurdistanê* ya M. Zekî Beg ku herdu nivîskar jî kurd in girîng in û em li wan binihêrin.

1.2.2. Di Şerefnameyê de Kurd

Ji bo him zimanê Mela Mehmûd ya wergera *Şerefnameyê* bê dîtin him jî agahiyên Şerefxan derheqê eslê kurdan de dane bînin dîtin emê wergera kurmancî ya bi destê Mela Mehmûd hatiye kirin û Seîd Dêreşî transkrîbe kiriye neqil bikin, lê Dêreşî ji bo wergerê hin jêrenot danîne em wan neqil nakin:

“Derheqê zikra ensabêd tewayîfêd Ekradan e û beyana terz û etwarêd wan e muherrîrêd nameya tedbîrê sûreta vê muqeddîmeyê li ser lewha beyanê weha ‘eyan kirîne ku derheqê nesebêd Ekradan eqwalêd muxtelife zaf in. Ji wan cumleyan gotine ku di weqtê Dehhak Maran ku selatinê pêncê ye ji selatinê Şeddadiyan ku paşî Cemşîd li ser textê Îranê û Tûranê mutemekkin bûye. Emma wesanê zalim û bêdîn bûye ku qederekî muerrixan ji wî ra jî Şeddad gotine.

Sebeb zulma wî du reg ji serêd herdu milêd wî wekû du maran ser bideranîn ku di îstîlaha hukeman danê Seretan dibêjin û ji ber vê ‘illetê derd û êşê li Zehhakî xalib wesanê ku ewî taqeta sebrê nemayî, her çi qeder hekimêd haziq derheqê def’a wê merezê û ‘illetê se’î û cehd kirîn fayde nebûy, eser nekirîn, heta ku Îblîs (*‘eylehille’ne*) di sûretê hekîman peyda bûy, gote Zehhakî: Ku ‘îlaca vî derdê te her ew e ku her rojê zirava du mirovêd ciwan biderînin û li serê wan seretanan bisûn.

Îttifaqa wekû bi qewlê wî le‘înî bi vî emrê şenî’ ‘emel kirîn, muwafiq hatî, ew derd

û eş sakin bûyî, rahetê peyda bû. Îcarê li ser vê xeberê bûye resm, her rojê du nefer ciwanê mezlûm be şîrê zilmê qetil dikirîn û mêjûyê serêd wan dibûne dermanê wî derdê bê 'ilac. Çend mudeyekê eve 'adetê zulmê û qewa'idê cebrî namibarek di nêva xas û 'amê carî bûyî. Ew mirovê ku me'mûrê ber serê meqtûlan bû, zêde mirovekî kerîm'ut-tebî' û xweyîrehm bûyî, ji vî emrê qebîh bê hed melûl û mehzûn bûyî, her rojê ciwanek dikuşt û yek azad dikirîn û mejûyê serê pezekê tevî wî mejûyê benîademî dikir, mirovê dinê berdida bi şertekê ewî mirovî terkweten dikirîn. Êdî li serê çiyar ku esla avahî nebûya sakin dibûn, hêdî hêdî cem'ekî zaf ji mirovêd her diyarekê bi zemanêd muxtelîfe li cihekî berhev bûyn, zimanekî cuda ji boy xwe peyda kirîn û zewicîn û ewlad û etba' hasil bûyn, roj bi roj zuriyeta {wan} zêde bûyî, ji boy wê tayifeyê Kurd leqeb kirîn. Wekî mudeyekê medîde û zimanekê be'îde ji misahibeta nasan û gerryana welatan dûr mayîn, wehşî bûyn, ji boy xwe zimanekî cuda û terz etwarne beşqe peyda kirîn, di cengel û bîşe û çiyar danî ji boy xwe xanî û çandinî û avahî peyda kirîn, be'zek ji wan xweyîmal û pez bûyî, bi çiyar û deştan belav bûyn û bi riwayetekê ku eve tayifeya qewî zêde xweyîşeca'et û tehewwirîn, lewranê ew tayife muleqqeb kirîn be Kurd."²⁴⁷

Li gor vê çîrokê ew kesên bi destê berdestiyê Dehaq hatine berdan derketine ciya û baniyan, li wan deran zêde bûne û bi derbasbûna demê re ziman û çandê wan a taybet çêbûye û ji wan re kurd gotine. Çîrokeke din jî wiha ye:

"Be'zek jî hukeman gotine: Ku "el-ekrad taîfetun mîn'el-cinni keşefellah'ul-'xita'e 'enhum", bi riwayetekê muerrixan tayifeyekî cinnan îzdiwac kirîne digel tayifa Benî Ademiyan, eve Kurdane ji wan peyda bûne. Ê qenc Xudê tea'la pê dizanî."²⁴⁸

Ev çîroka jî dibêje kurd tayifeke ji cinan e û perdeya li ser hatiye rakirin û bi vî awayî wekî merivan dijîn. Her wiha li gor yeka din di navbera meriv û cinan de zewaç çêbûye û kurd ji wan zêde bûne. Tiştê ecêb ew e ku Şerefxan fikra xwe nabêje û dibêje ya qenc Xwedê dizane. Lê diyar e ev çîrokên mîtolojik in.

Wekî li vir jî tê dîtin ev riwayeta di nav gelek pirtûkan de tînin dîtin, ji bo mînak Mesûdî di *Murûcu Zeheba* xwe de çend riwayetan dide û li gor wan kurd ji ereban qetiyane û hatine welatên xwe yê vêga. Li gor van riwayetan kurd ji nesla Rebîa bîn Nîzar bîn Ma'dê hikûmdarê ereban tînin. Kurdên ji nesla Rebîa bîn Nîzar bîn Ma'dê di demên berê ji erebên din diqetin, ji ber dubendiya di navbera wan û Xessaniyan de û

²⁴⁷ *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî, Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Twîjandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007; Şerefxanê Bedlîsî, Şerefname, kurmancî wer. Ziya Avcî, Weşanên Azad, Mersîn, 2014, r. 61, 62.*

²⁴⁸ H. b. r. 62.

dijwariya şert û mercan xwe avêtine çiya û geliyan. Di vê heyamê de bi farisan re bûne cînar. Zimanê xwe terikandin û bi vî awayî zimanê wan ket bin bandora zimanê farisî. Her eşîrê bi kurdiyeke cuda xeberda. Li gor rîwayeteke din jî kurd ji Mudar bîn Nîzar tên. Ew kurdên derketine çiyayên ji Kurd bîn Merd bîn Sa'sa'a bîn Hewazîn hatine. Dîsa li gor rîwayeteke din kurd ji eşîrên ereb Rebîa û Mudarê tên.²⁴⁹

Mela Mehmûd di pêşgotina kitêba xwe ya winda *Tewarîxî Cedîdî Kurdistanê* û tenê beşa naverokê li ber dest e de di derheqê eslê kurdan de sê rîwayetan neqil dike û emê wê ji nivîsa Y. Vasîlyêva neqil bikin ku Seîd Dêreşî di destpêka wergera Mela Mehmûd ya *Şerefnameyê* de weşandiye:

“Ji nav hemû hakimên Kurdan tenê sê reh (regez) herî kevnar in: Reha hakimên Bedlîsê, reha hakimên Botan ku eslê xwe digihînin Xalid û yê dawî reha hakimên Hekarê. (...)

Derheqa eslê Kurdan sê bawerî hene, kevnariya eslê wan (Kurdan) îsbat dikin.

Raya yekê: Dibêjin dema padişah Zehak, -Zehak jî wekû nas e- derdek pêketibû û her rojê ferman dida xortekî û qîzekê bikujin, jin û mêr ji ber zulma wî reviyay ser çiyayan û nav daristanan.

(...) Kurdan ji wan çêbûne. Êlên Heyderî, Zilî, Hesenî û gelek êlên mayî jî ku ji wan çêbûne, bi vî rengî bûn. Zarok û neviyên Heyder, bûn Heyderî; zarok û neviyên Zilo û Hesen, Zilî û Hesenî, yanî ew ji malbatên Zilo û Hesen in. (...)

Raya dudan: Li gorî *Şerefnameyê* nivîsiye, çaxa Pêxember Muhemed (*silav û aferînên Xwedê lê bibin*) Kurdan qasidek şandine cem wî. Qasidê wan gelekî bi saw û heybet bûye: Kibkibeyek serçavbipirç bû, şiklê wî nayab bû, mirov jê ditirsiyan. Ne Pêxember, ne jî sehabyên (hevrêyên) wî tu carî ecêbek wiha nedîbûn (...) Ji neviyên vî qasidî re gotine Kurd. (...)

Raya sisyan: Li gora vê çîroka pîrî nêzîkî rastiyê, dema Nûh, yek ji kurên Yafit piştî tofanê li cîhanê digeriya, keçek sêhrbaz dîtîye û ew mehr kiriye, zarokên wan ne mîna zarokên mayî bûne. Li çolekê xwe xewle kirine û bi tena xwe jiyane, nizanîbûn xaniyan ava bikin, di konan de dijîyan û kesî ji wan pêve zimanê wan fêhm nedikir. Jimara wan pîrî bûye û bi her alî ve bela bûne. Hinekan jiyana koçerî li Îranê, Tûranê û Şamê cî girtin. Li wan deran jimara wan pîrî bû û ji malbatên wan taîfe û eşîrên ku em îro dibînin peyda bûn. (...)²⁵⁰

Wekî tê zanîn Mela Mehmûd alimekî berhemdar e û çend berhemên wî jî li ser dîrokê ne, dîrok jî bi taybetî li ser dîroka kurdan e. Ji bo vê dema mirov îtirazê lê dike

²⁴⁹ Mesudî, *Müruc ez-Zeheb*, ç. 2., wer. D. Ahsen Batur, Selenge Yayınları, İstanbul 2011, r. 194, 195, 196; Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, r. 66.

²⁵⁰ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 220, 221.

divê neyê ji bîrkirin ku ew dîroknasekî kurd e, cara ewil wî *Şerefnameya* ku wekî dîroka kurdan tê qebûl kirin wergerandiye kurdî, navê *Tewarîxî Qedîmî Kurdistan* lê kiriye, bi xwe ji bo bibe temîmmeya wê angû wê tamam bike pirtûkeke hezar rûpelî nivîsiye û navê wê jî daniye *Tewarîxî Cedîdî Kurdistan*. Angû ew ne wekî kesên şovenîstên kurdan tune dihesibînin û yê erêb dibêjin kurd erêb in, yê fars dibêjin kurd faris in û yê tirk jî dibêjin tirk in. Lê ew li gor çavkaniyên dîrokî van agahiyan dide û ya rastî ev heqîqetê jî naguherin. Lewra bi baweriya min hemû mirov ji Adem in û peyra di pêvajoya dîrokê de mîlet, zîman û çand pêk hatine.

1.2.3. Di Dîroka Kurd û Kurdistanê ya M. Zekî Beg de Kurd

M. Emîn Zekî Beg di pirtûka xwe *Dîroka Kurd û Kurdistanê* de dema qala eslê kurdan dike di serî de dibêje ev mijara herî dijwar û tevlihev e. Lewra li gor wî di vê mijarê de bîdestxistina encameke vebir ne mîmkûn e. Di serî de jî gelek zanayên wekî Minorsky, Smith li ser vê mijarê xebitîne neqlan dike û behsa rîwayetên li jor hatin neqilkirin dike, herî dawîn dûr û dirêj qala pêvajoya dîrokê dike û dibêja çawa ku rojhilatnas ji bo tesbîtkirina eslê mîletekî hêmanên xwîn, zîman û welat esas qebûl dikin û mîletê erêb û tirk ji bo peydakirina eslê xwe herî dawîn zîman wekî hêmana bîngêhîn qebûl kirine, erêban gotine em Samî ne, tirkan gotine em Turanî ne, kurd jî gelekî ji herêma ciyayên Zagrosê ye û piştî qewmê Arî (Hind-Ewropî) ew herêma dagir kir, di encamê de wekî mîletên din di navbera wan de jî têkilî çêbû û pêşiyên kurdan jî bi wî awayî Arî tînan hesabê.²⁵¹

Bi rastî ji ber ku ev mijara me ya sereke nîne em nikarin hemû angûş û nêrînan neqil bikin, lê êdî îro diyar e ku kurd bi serê xwe mîletek in, ji bo îsbata vê hebûna wan, zîmanê wan û çanda wan bes e.

1.3. Li Gor Mela Mehmûdê Bazîdî Zîmanê Kurdan

Di *Adat û Rusûmatname'ê Ekradiye* de mijareke din ya ku tê rexnekirin ji gotinên Bazîdî yê di derheqê zîmanê kurdî de ne. Ji bo ku em bizanibin ka Mela Mehmûd di vê mijarê de çi dibêje pêşiyê em wê beşê binihêrin û li gor wê nîrxandinan bikin:

“Û lefzê kurd û ekrad eslê wê girde yanê berhev û cem‘kirîn bi wê minasebetê ku ew e‘rab bûyine cîranê Îran û Fars û Xoresanê êdî ji lîsanêd wan tayîfan yeko yeko berhev û cem‘ û exz kirîne û hêdî hêdî zîmanêd xoy qedîm ku ‘erebî ye terikandîne. Û bi mirûrê zeman û borîna eyyamê, bûyine hinde ‘eşayîr û qebayil û tayîfe.

²⁵¹ Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, r. 57, 75.

Ev navê wan ku maye kurd û ekrad, ev sebeb e ku zimanê berhev yanê meglûfî ye, yanê girdkerde ye ji faris û îraniyan. Îcarê ev tayifene ji eţrafan bi navê kurd û ekrad hatîne navdanê û bûyine miletekî me‘lûm.”²⁵²

Wekî me di beşa derbasbûyî de behs kir Mela Mehmûd çawa ku kurdan ji eşîrên ereban dihesibîne, zimanê kurdî jî wekî zimanekî têkilhev dide nasîn û li gor wî kurdî bi tevlihevbûna zimanên erebî û îranî pêk hatiye. Jixwe heke li gor angaştaya wî ya derheqê eslê kurdan de vê nebêje wê hingê ji bo wî nakokiyê derkeve holê û ev jî berdewama wê ye. Ji ber vê ew gotinên me di derheqê eslê kurdan de gotin, her wiha ji bo zimanê kurdan jî derbas dibin. Jixwe pêkhatina netewe, ziman û keleşorê di pêvajoya dîrokê de piştî heyameke dûr û dirêj hasil dibe. Vêca em li têkiliya di navbera wan zimanên ku Mela Mehmûd qalê dike bikin û bi wî awayî wê rastiyê derkeve holê.

1.3.1. Zimanê Kurdî û Farisî

Li gor nexşeya zimanên dinyayê zimanê kurdî ji malbata zimanên hind û ewropî zimanekî ji şaxa zimanên îranî ji beşa bakurê rojava ye. Ango zimanê kurdî û farisî ji hêla kokê ve ji heman malbatê ne. Her wiha xezneya wan a peyv, biwêj û pêşgotinan hevpar e. Ji ber vê hindê hevpariyên herdu zimanan asayî ye û bi tu awayî nayê wê wateyê ku ji wan zimanan yek ji yekê çêbûye. Ev yeka ji bo hemû zimanên îranî; farisî, peştunî, partî, tacikî, urdukî û ewnê din ev wisa ye. Loma gava em têkiliya zimanê kurdî û farisî dinirxînin divê ev dîroka ziman were bibîrîn.²⁵³

Farisî jî wekî zimanê kurdî di koma hind û ewropayê de ye û ji vê komê jî şaxê hind-îranî ji beşa zimanên îranî ye.²⁵⁴ Zimanê farisî/parsî jî zimanê med û persan çêbûye. Dema ku qonexên geşedana zimanê farisî tê kirin sê êwr derdikevin pêş.

1.3.1.1. Zimanê Medan-Farisiya Kevn

Farisiya kevn zimanê medan e û ji qewmê Arî yên cara pêşîn dewlet ava kirine ew in. Zimanê Avestayê yê ku heya hilweşîna Împaratoriya Axemenî (b.z. 330) dihat axaftin û îro hindik be jî hinek wesîqayên bi vî zimanî hatine nivîsîn hene, di vê heyamê de geş bûye. Ji vî zimanî re wê hingê farisî nedihat gotin, lê li gor xeta peydabûn û pêşketina ziman ya dîrokê ji vî zimanî re farisiya kevn tê gotin. Tê zanîn ku wesîqeyên ji dema dewleta Axemenî li bajarên Pasargad, Şûş, Babîl û paytextê Medan Hemedanê

²⁵² Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 200, 201.

²⁵³ Behroz Şucaî, “Zimanê Partî”, *Kurmançî*, j. 28, Parîs, Çile 2001, r. 1.

²⁵⁴ Samî Tan, *Rêzimana Kurmançî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, ç. 2., Stenbol, 2011, r. 22, 28.

tên parastin. Li gor agahiyan di sed sala VIIan Qralê Medan Deioces dema jê re nivîsên doz û mehkemeyan dihatin şandin bi nivîskî bersiva wan dida. Her wiha tê texmînkirin ku gava ji wî re bi zimanekî beyanî tiştek bihata şandin bal bi zamanê medî ve dihat wergerandin. Hinek zanyaran jî îdia kiriye ku nivîsa bizmarî ya farisiya kevn pê dihat nivîsîn ji teref medan ve hatiye emilandin û awayê nivîsa farisiya kevn ji medan hatiye hildan. Lê ji ber ku Dariûs di kîtabeyên Bîsutun yê li ser riya Kirmanşah û Hemedanê de dibêje ku kesê cara ewil bi zamane îranî nivîsiye ez im, ev îdia pûç tê qebûlkirin. Ji hêla din ve li gor tasnîfên dawîn farisiya kevn di heyama serdestiya dewleta Axemenî (b.z. 559-330) zimanê Îranê yê fermî bûye. Farisiya kevn bi zimanê sanskirîtî û avestayî re ji heman malbatê ye û wesîqayên bi vî zimanî hatine nivîsîn û heya roja me hatine jî kîtabeyên Qralên Axemenî ne. Ji van kîtabeyan ya herî kevn ya Ariyarnayê bavê kalkê Dariûsê Mezin (b.z. (610-570) ya herî nû jî ya Erdeşêrê Sêyem (b.z. 358-338) e û li kîtabeya Dariûs ya li çiyayê Bîsutunê li ser zindarekî mezin hatiye kolîn e. Ev kîtabe bi nivîsa bizmarî hatine nivîsîn û tê de bi qasî 500 peyvên farisiya kevn hene.

Zimanê avestayî yê ku ji zimanên îranî yê kevn e û li bakurê îranê dihat axaftin. Pirtûka pîroz ya îraniyan Avesta bi vî zimanî hatiye nivîsîn, loma wekî zimanê avestayê hatiye zanîn. Ji vî zimanî û awayê nivîsa wê re avestayî tê gotin. Avesta ji pênc kitêban pêk tê: Yasna, Yaşt, Vîspered, Vendîdad û Xurde Avesta. Ji van pirtûkan Yasna ji îlahiyan pêk tê û zimanê hevde îlahiyan ji zimanê pirtûkên din yê Avestayê cudatir e. Ji van îlahiyan re Gata û yan jî Gah hatiye gotin. Hinek zimanê Gatayan wekî zimanê Zerdeşt qebûl dikin. Jixwe Avesta bi destê zanayên zerdeştî gihiştîye heya dema Sasaniyan (p.z. 226-651).

1.3.1.2. Zimanê Partî-Farisiya Navîn

Zimanê partî ji peydabûna xanedana partiyan (b.z. 250) heya hilweşîna dewleta Sasanî derketiye û li gel farisiya navîn, soxdkî, xotenî û xwarezmî koma zimanên îranî yê dema navîn pek tînin.

Qewmê part beriya zayînê di sed sala IIIyan de dewleta Eşkaniyan damezirandine û nivîsa xwe ji aramî hildane. Berhemên bi zimanê partî hatine nivîsîn ji nivîsa partkî û puryanîkî û ji nivîsa manîkî hatine hildan. Ji kîtabeyên şahên beriya Sasaniyan beşeke girîng bi partkî hatine nivîsîn û li Kurdistanê herêma Hewraman in û dîroka wan jî beriya zayînê salên 21-22yê ne. Zimanê partî bi wesîleya zimanê pehlewî (farisiya navîn) tesir li ser farisiya îro kiriye. Di kolînen dawîn ên li Turfanê yê li Asyaya Navîn hatine kirin de nivîsên kesên li ser dîne manî yê bi nivîsa suryanîkî lê bi zimanê partî

hatine nivîsîn derketine. Ev zimanê farisiya navîn di navbera farisiya kevn û nû de pireyek e û zimanê fermî yê sasaniyan bû. Ji zimanên farisiya navîn yek jî soxdkî ye û ev ziman li Semerkand û Buxarayê dihat axaftin.

1.3.1.3.Zimanên Îranî Yên Nû

Zimanên Îranî yên nû ji farisiya nû (dêrî), osetkî, peştunkî, beluckî û kurdî pêk tên.

1.3.1.3.1. Farisiya Nû

Ji ziman û zaravayên îranî yê herî girîng farisiya nû ye. Farisiya nû ji şaxê rojavayê başûr e, wekî berdewama farisiya kevn û farisiya nû tê qebûlkirin. Ji sedsalên IX-Xan mêj ve li dewlet û hikûmetên li rojhilatê Îranê hatine damezirandin wekî zimanê fermî hatiye qebûlkirin û bi navên dêrî, parsî dêrî, parsî û farisî hatiye zanîn. Piştî ku farisiya nû bû zimanê fermî, li koşk û serayên dewletan hat axaftin helbestkarên wekî Rûdekî, Daqîqî, Firdewsî û Kisaiyî Merwezî bi vî zimanî helbest nivîsîne. Piştî ku Îslam li Îranê belav bû farisiya nû kete bin tesîra wê û bi wî awayî ji erebî gelek terkîb û peyv ketine nav zimanê farisî, piştî demekê şûnda zaravayên farisiya nû derketin holê.

1.3.1.3.2. Osetkî

Ji zimanên îranî yek jî osetkî ye û piranî li Qefqasyayê li herêmên çiyayî tê axaftin û du zaravayên wê hene; iron û digoron. Li gor çavkaniyên dîrokê gelê oset/alan ji rojhilatê behra Xezarê koçî Qefqasyayê kiriye.

1.3.1.3.3. Peştunkî

Zimanê peştunkî îro li rojhilatê Efxanistanê û herêmên sînor ên bakurê rojava yê Pakistanê tê axaftin. Ji nav zimanên îranî yê herî zêde dişibe farisiya kevn peştunkî ye. Di van salên dawiyê de bi vî zimanî berhemên edebî tên nivîsîn û gelek zaravayên wê yê wekî wezîrî, aferîdî, peşawerî, qendeharî û benuçî hene.

1.3.1.3.4. Beluckî

Zimanê beluckî li Belucistanê û hin herêmên Tirkistanê tê axaftin. Her çendî gelek zaravayên wê hebin jî bi giştî wekî beluckiya rojhilat û beluckiya rojava tê tesnîfkirin. Lê di navbera zaravayên wê de ferqeke mezin tune.

1.3.1.3.5. Kurdî

Li gor nexşeya zimanên dinyayê zimanê kurdî ji malbata zimanên hind û ewropî zimanekî ji şaxa zimanên îranî ji beşa bakurê rojava ye.²⁵⁵

Çend zaravayên kurdî hene; kurmancî li bakur, başûr, rojhilat û rojavayê Kurdistanê, soranî li başûr û rojhilat tê axaftin. Kurmancî bi îro piranî bi tîpên latinî tê nivîsîn û soranî bi tîpên erebî. Piraniya kurdan li seranserê cîhanê bi kurmancî diaxivin.

Li gor belavbûna erdnîgarî, zimanê kurdî ji bilî welatên Ewropa û yên biyanî bi taybetî li hemû erdnîgariya xwe yanî li hemû herêmên Kurdistanê zindî ye. Li gor *Şerefnameyê*, zaravayên kurdî çar in: Kurmancî, Lorî, Kelhûrî, Goranî.²⁵⁶ Mela Mehmûd jî bi binavkirineke cuda kurdî vediqetîne çar şaxan:

“Zimanê Kurdan, Zimanê li Kurdistanê pê dixwînin û dinivîsînin yek e, forma wî ya gotinan yek e û alîfbêya wî heye. Lê di zimanê devkî de çar zaravên tên dîtîn:

Zaravê pêşîn, zaravê Rawendî ê Kurdên çeldêranê, Qersê, Bayezîdê, Mûşê, Bedlîsê û Wanê ye. Zimanê re‘ayên Kurdan ên li Xarpûtê, Diyarbekrê, Mêrdînê û hawêrdora wê heta Erzeromê dijîn, ser vî zaravî tê hesabkirin. Êlên koçeran ên giran li van herêmên me gotî, mîna Zilan, Heyderan, Cîmadînan, Keskan, Savîdanan, Memana, Celaliya, Cûnakanan, Hesenan, Cibran, Sîpikan, Eltoran,²⁵⁷ Birokan, Şikakan, Şawiyên, Şikeftelû, Erbanan, Baraviyan, Şilan û êlên Kurdan ên mayî, mezin û biçûk, koçer û bajarî (medenî), li dora Qersê, Çeldêranê, Yêrîvanê, Wanê, Mûşê, Diyarbekirê û Xarpûtê, ew jî hemû bi zaravê Rawendî dipeyivin.

Zaravê dudan, zaravê li wîlayetên Hekariyê, Mehmûdî, Şêrwanê, Botanê, Hîzanê, Miksê, Sipayirtê, Şinoyê, Somayê, Biradostê, Şemdînanê, bi kar tê, êlên Mizûrî, Zêbarî, Herkî jî bi zaravê Hekariyê dipeyivin. Hemû pirtûk û şê‘rên Kurdî bi vî zimanî nivîsandî ne, belê ferqa vî zaravî bi xwe ji zaravê Rawendî hindik e.

Zaravê sisîyan, ê Sulêmaniyê ye. Ev zimanê êlên Baban, Bilbas, Zerzan û Şukriyan e ku li nêzîkî Silêmanî û Şarezorê rûdinên, ew jî ji zaravên mayî bi derecak wek hev ferq dike.

Zaravê çaran, zaravê Zaza ye, ew jî zimanekî Kurdî ye, ji êla Ducik re dibêjin êla Zaza. Ew li êrdimên, ji qeza Tercanê (bi Erzeromê ve girêdayî ye) û heya Dêrsimê û Çiyayê Acê rûdinên. Zaravê wê êlê gelekî dûr bûye ji yên mayî. Tu eşîrên dinê (...) wesa li tevaya Kurdistanê nînin. Kurd wan gundî (şûnmayî) hesab dikin. Ew bi zaravê Hekarî dinivîsînin lê bi zaravê xwe dipeyîvin, belê gotinan ji zaravên

²⁵⁵ Minorsky, “Kürtler”, *İslam Ansiklopedisi*, c. VI, MEB Yayınları, İstanbul 1997, r. 1111; Minorsky, *Kürtler*, Weşanên Helepçe, Köln, 1998, 72.

²⁵⁶ Bedlîsî, *Şerefname*, r. 63.

²⁵⁷ Dibe ku ev Gelturan be.

Kurdî yê nabe mayî tevê dîkin. Çiqasî ev zarav cuda ye jî, ji zimanê Kurdî cuda nabe.²⁵⁸

Kurmanciya bakur (kurmancî) û kurmanciya başûr (sorani) du zaravayên sereke ne. Ev her du zarava wekî zaravayên ku xwediyê wêjeyeke nivîskî ne, têne pejirandin. Van demên dawîn, zaravayê kirmanckî (dimilkî-zazakî) jî hêdî hêdî ber bi nivîskîbûnê ve gavan diavêje. Di nav zaravayên kurdî de zaravayê ku herî zêde pê tê axaftin kurmancî ye. Kurmancî li hemû deverên ku kurd lê dijîn pê tê axaftin. Piraniya kurdên ku kurmancî û zazakî diaxivin li Kurdistanê Bakur dijîn.

Lê li gor tasnîfeke din mirov dikare kurdî wiha dabeş bike: Zaravayê kurdî yê herî berbelav kurmancî ango kurmanciya jor (bakur) Amed, Riha, Agirî, Wan Bedlîs, Urumiye, Qers, Erzirom, Hekarî, Sêrt, Yêrîvan, Duhok, Zaxo, Semsur, Elih, Rojava û li Bakurê Xoresanê, Qefqasya, Asyaya Navîn û hwd. tê axaftin. Kurdiya sorani, ango kurmanciya xwarê (navîn) Silêman, Hewlêr, Sinê, Mehabad, Sinê/Senendec û hwd. tê axaftin. Kurdiya Goranî-Dimilkî Bîngol, Dêrsim, Erzîngan, Amed û Hewramanê tê axaftin. Kurdiya başûr jî li herêmên Kirmanşah û Bextiyarî tê axaftin.²⁵⁹

Heke em îdiaya Mela Mehmûd di vê çarçoveyê de binirxînin, bê bingeheke û wekî encama çîrok û rîwayetên dîrokî xwe dispêre bingeheke pûç. Lê divê bê zanîn ku Mela Mehmûd tenê li çavkaniyên dema xwe nêrîneke ji teref hin zanayan ve hatiye qebûl kirin, neqil dike û ew jî wisa dizane. Ango ew wekî hêzên înkarker tevnagere û armanca wî tenê neqil kirina rîwayetan e. Her wiha di navbera nêrîna li ziman û miletan ya wê deme û îro de ferqeke gelekî mezin heye.

1.3.2. Zimanê Kurdî û Erebi

Piştî ku dîna Îslamê li Erebiistanê belav dibe û ber bi welatê kurdan ve tê kurd jî mîna gelek miletên herêmê di serî de li hember artêşên mislimanan şer dîkin, lê demekê şûnda ew jî Îslamê qebûl dîkin. Heta li gor agahiyan hê di dema Hz. Mihemed de kesên bibûn misliman hebûn. Ji wan yê tîn zanîn Caban-Gavan el-Kurdî û kurê wî Meymun e kunya wî jî Ebû Busayr e.²⁶⁰ Jixwe piştî wê di heyama Hz. Emer de Riha û Amed bi

²⁵⁸ E. Î. Vasîlyeva, "Pirtûka Wenda ya Dîroka Kurdistanê", *Almanaxa Kurdî*, Weşanên Roja Nû, Gulan 1997, r. 78, 79; vgz. *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî*, Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Twijandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007, (pêşgotin).

²⁵⁹ Bnr. Abdurrahim Alkiş, *Farça -Dilbigisi, Pratik, Klasik Metinler-* Kent Işıkları Yayınları, İstanbul, 2014, r. 11, 15.

²⁶⁰ Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, r. 124.

destê artêşên Îslamê hatine fetihkirin. Pey vê re piraniya kurdan xwe nîsbetî Îslamê kirine.

Medreseyên kurdan li ser esasê hînkirina şerîeta Îslamê û zimanê erebî hatine avakirin. Ango armanca sereke ya medreseyên Kurdistanê hînkirina Îslamê ye û ew jî tenê bi hînbûn û hînkirina zimanê erebî mimkûn bûye. Loma alimên kurdan gelekî baş erebî hîn bûne, berhemên li ser zimanê ereb, tefsîra Qur'anê, hedîsên Hz. Pêxember, fîqha Îslamê nivîsîne. Lê ji ber ku seyda û feqî kurd bûne zimanê medreseyên Kurdistanê kurdî û erebî bûye. Lewma têkiliya van herdu zimanan ne ji ber kok û eslê wê ye, lê ji ber fonksiyona wan e ku di warê perwerdeyê de li gel hevdu hatine bikaranîn. Di encama vê pêvajoyê de ji erebî peyv û têgeh derbasî zimanê kurdî bûne, çawa ku derbasî farisî, tirk, urdukî û zimanên din bûye. Jixwe zimanên yewnanî, aramî, keldanî, hebeşî û hwd jî peyv derbasî zimanê erebî bûne. Ev di dîroka ziman û geşedena wan de tiştekî tebiî ye. Bi danûstandina di navbera ziman û çandan de şaristanî û keleşorên dewlemend derketine holê. Gava em ji vî alî ve meseleyê binihêrin tu pîrsgirêk xuya nake. Lê heke wekî gotina Mela Mehmûd bibêjin zimanê kurdî zimanekî ji erebî û farisî pêk hatiye, wê hingê li gor agahî û daneyên rêzimanî û dîrokê derdikeve holê ku ev nêrîneke şaş e û di dîrokê de maye. Îro êdî di nexşeya zimanên dinyayê de cihê zimanê kurdî, farisî, erebî û zimanên din bi awayekî eşkere diyar e. Zimanê kurdî di koma hind û ewropî de ye û erebî jî di koma zimanên samî de ye.

2. Navê Berhemê

2.1. 'Adat û Rusûmatname'ê Ekradiye an 'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye?

Gelo navê vê berhemê yê resen ku Mela Mehmûd daniye çi ye? Ji van navên ku nika di pirtûkan de derbas dibin kîjan rast e? Wekî *'Adat û Rusûmatnameyê Tewayifê Ekradiye* û *'Adat û Rusûmatname'ê Ekradiye!* Ev herdu navana jî di lêkolîn û berhevkerinên li Kurdistana Bakur hatine weşandin de derdikevine pêş. Ji van du mînak; yek lêkolîna Jan Dost e²⁶¹, di vê xebatê de him navê pirtûkê û him jî di nava pirtûkê de *Ekradiye* û *'Adat û Rusûmatname'ê Ekradiye* hatiye bikaranîn. Her wiha di xebata Ziya Avci²⁶² amade kiriye de jî nav wiha ye: *'Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, lê di nava pirtûkê de ev nav diguhere dibe *'Adat û Rusûmatnameyê Tewayifê Ekradiye*.²⁶³

²⁶¹ Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, lêkolîn: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, 2010.

²⁶² Mela Mehmûdê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, amd. Ziya Avci, Lîs, Diyarbekir, 2010.

²⁶³ H. b, r. 17.

Gelo ji van hersê nav û şewenivîsan kîjan ya herî rast e? Çima ev aloziya derketiye holê? Bi baweriya min sebebê vê ew e ku di destxetan de bi awayekî eşkere navek nayê xuyanê, yan jî daner navek ji bo vê xebatê kifş nekiriye, lewma ev nakokî derdikevine holê. Lê ji bo çareserkirina vê qet nebe divê mirov ya herî zêde nêzîkî rastiye ye kifş bike. Ji ber vê gotî em vegerine nusxeyên destxet.

Ji bo vê gava meriv li qeydên li Kitêbxaneya Lenîgradê dinihêre -ji bo vê em xebata Rudenkoyê ya rûsî bi kar tînin û weşanên Lîsê weşandiye- mirov rastî vê tê ku ev xebat wiha hatiye qeydkirin: “Kitab ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye we Usûlê Nizamatê Kurmancî.”²⁶⁴ Loma hinek lêkolîneran ev ji xwe re jêder girtine. Lê Rudenkoyê di pêşgotina wergera xwe de beriya qala qeyda vê berhemê bike, wê çaxê jî navê wê wekî “‘Adat û Rusûmatname’ê Ekradiye”²⁶⁵ dide û hin kesan jî di xebatên xwe de ev şewe bi kar anîne.

Bi qasî ku ji vê tê xuyanê ji ber ku divê xebatê ev herdu nav û şewenivîs hatine emilandin, hema hemû xebatên li ser vê berhemê jî xwe dispêrine wê, loma ev cihêti derketiye holê. Bi raya min divê ev navê nusxeya pêşîn wekî esas were qebûlkirin. Lewra nusxeya herî kevn ev e û tarîxa nivîsîna wê jî hîcrî 1274 mîladî 1858-59 e.²⁶⁶

2.2. Dema Nivîsandina Berhemê

Mela Mehmûd ev berhema xwe ya kurmancî hîcrî di sala 1274an (1858-1859) de nivîsiye, peyra di salên 1868an de Şah Nezer ev bi destxeta xwe nivîsiye. Destxeta wê li arşivxaneya Saltîkof Şedrînê bi jimara “Kurd 7” tê parastin.²⁶⁷

2.3. Nusxeyên Berhemê

2.3.1. Nusxeya Nivîskar

Li gor agahiya ku Rudenko dide du nusxeyên wê li pirtûkxaneya Lenîgrad/Petersburgê hene. Ji wan ya pêşîn bi jimara “Kurd 34”an e û di salên hîcrî 1274 û mîladî 1858-59an de hatiye nivîsîn û bi tîpên erebî ye. Bi destê nivîskar hatiye nivîsîn. Lê A. Jaba li hinek cihan di nav hevokan notên bi tîpên latinî kok/masdara lêkeran nivîsiye û wergera hinek beşan ya fransî lê zêde kiriye. Navê kitêbê ya berfireh wiha ye: “‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye û Usûlê Nizamatê Kurmanciye.”

²⁶⁴ Avcî, Beşa Rûsî, *Wegera Rudenkoyê*, Lîs, Diyarbekir, 2010, r. 7.

²⁶⁵ H. b, r. 3.

²⁶⁶ H. b, r. 7.

²⁶⁷ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 5.

Pîvana destxetê 125x71: 192 wereq e. Rûpelên 133b û 134a vala ne. Metnê kurmancî li hêla rastê ya rûpelê hatiye nivîsîn, li aliyê çepê bi tîpên latinî tîpguhêziya metnê heye, jimara rûpelan jî bi rêbaza rojhilatê wereq wereq hatiye nivîsîn. Di jimara rûpelên destxetê de xeletî pir in û piştî wereqê 79an bi şaşî jimara 90î hatiye danîn û hwd heya 112an, peyra jî 103 hatiye nivîsîn. Piştî wereqê 136an jî 138 hatiye nivîsîn û hwd. Di rûpelekî de 7-9 rêz hene, mezinahiya metin 16,5x11,5 e, kaxiz ya Ewropayê ye, nivîs bi hibra reş hatiye nivîsîn, rîqa ye, cild bi usûla Ewropa ye, karton e, rengê wê hêşîn e.²⁶⁸

Li gor tesbîta me di vê nusxeyê du rûpelên vala hene û ew jî rûpelên 135 û 143yê ne. Navê pirtûkê yê dirêj bi hibra sor û di pênc rêzan de hatiye nivîsîn. Dîroka dema nivîsê li ser heye, lêbelê navê nivîskar li ser tuneye. Di rûpel herî dawîn yê 191ê de şeş rêzên kurt hene.

2.3.2. Nusxeya Duduyan

Dîsa anegorî nivîsîna Rudenkoyê nusxeya duduyan jî di sala 1868an de li Smirmayê (Îzmir) bi destxeta Şah Nezer hatiye nivîsîn û jimara wê ya li pirtûkxaneya Lenîngradê jî “Kurd 35” e. Di vê destxetê de wergera fransî ya A. D. Jaba jî heye. Werger bi serastkirin hatiye çêkirin, lê hin cih li gor eslê wê tam nehatine wergerandin. Di pêşgotina ku tê de agahî tê dayîn fransî ye. Navê Mela Mehmûdê Bazîdî nayê dayîn. Di daxuyaniyê de qala nêrîna alimên misliman yê derbarê xeyrîmisliman (kafir) de tê kirin. Ji bilî metin di listeyê teswîra tilsimên erebî û farisî jî hene (239a-262a). Pîvan 25x18, wereq (pîvana wereq 239-362-5x16), jimara rûpelan bi usûla rojhilat e (di navbera jimarên 1a-5byê de bi usûla Ewropayê), di rûpelekî de 8-10 rêz hene; meziniya metin 19x8; metnê kurdî li ser rûpelê rastê li stuna rastê ye, tîpguhêziya bi tîpên latinî ya metin jî li stuna çepê ye, li rûpelê çepê jî wergera fransî heye. Di nav hevokên metnê kurdî yê bi tîpên erebî de kok/masdara lêkeran heye (nivîs ne bi awayê rojhilatê ye, bi îhtimal ya A. D. Jaba ye); kaxiz ya Ewropayê ye, metin bi hubra reş hatiye nivîsîn, rîqa, cild yê Ewropayê ye, karton, rengê kesk e.²⁶⁹

Li gor tesbîta me ev metnê bi tîpên erebî hatiye nivîsîn ji 130 rûpelan pêk tê, ji bilî rûpelê pêşîn û her sê rûpelên dawîn di hemû rûpelan de 14 rêz hene. Di rûpelê destpêkê yê ku bi bismillahê dest pê dike de 11 rêz hene, di rûpelê herî dawîn de 3 rêz û herdu

²⁶⁸ Avcî, Beşa Rûsî, *Wergera Rudenkoyê*, r. 7; Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 210, di wergera vê beşê ya di xebata Dost de kême û şaşî hene.

²⁶⁹ H. b. r. 8; H. b. r. 210, 211, di wergera vê beşê ya di xebata Dost de kême û şaşî hene. Ji bo wergera ji rûsî mala Mikail Cengiz ava be.

rûpelên beriya wê de jî 13 rêz nivîs hene. Ji rûpelê serî pê ve bi dor bi tîpên latinî reqem hatine danîn û ji 90î şûnda îcar êdî du reqem li gel hevdu hatine nivîsand û 90 normal hatiye nivîsandin û li bin wê de jî di nav kevanokê de reqema (80) heye. Ev awanivîs heya 95an diçe û 96 tenê hatiye nivîsîn û peyra cotnivîs dewam dike heya tê 112 (102)an û ji wê şûnda yek jimar 103an dest pê dike û heya 136an wiha berdewam dike. Ji vir şûnda bi awayê 138 (137)an dest pê dike û herî dawiyê bi reqema 190 û 191 (190)î ve diqede. Lê di metnê de li rûpela ku reqema 102 (92) ser e jêrenotek heye. Ev reqeman jî ji bo jimara rûpelê nusxeya nivîskar nîşan bide hatine nivîsîn. Gava mirov herdu nusxeyan dide ber hevdu, bi saya wan reqeman mirov metin bi hêsanî kontrol dike. Her wiha di nusxeya duduyan de destpêk û dawiya rûpelên nusxeya nivîskar bi du xêzên tîk (/) hatine kifş kirin.

Ev nusxe jî ji kitêbxaneya Şah Nezer ketiye destê A. Jaba. Jaba jî wergera xwe ya fransî ji vê nusxeya duduyan kiriye.²⁷⁰ Lewra ev nusxeya ji ya din baştir tê xwendin. Ji ber vê Rudenkoyê jî ji bo xebata xwe ya rûsî wekî jêder girtiye. Êdî wê şûnda hemû werger û xebatên li ser vê berhemê li ser vê nusxeya Şah Nezer çêbûne. Li gor agahiyên Delîlo Îzolî yê ku tîpguhêziya wê kiriye û di salên 80yan de li dîasporayê weşandiye, di pêşgotina xwe de dibêje Şêx Nazar kurdekî xelkê Urmîyeyê bûye. Li wê demê di pirtûkxaneya wî ya dewlemend de bi hezaran pirtûk hebûne û wî ev destxet daye A. Jaba.²⁷¹

3. Taybetiyên Berhemê

3.1. Zimanê Berhemê

Zimanê *'Adat û Rusûmatname'*ê *Tewayîfê Ekradiye* kurmancî ye û li gor heyema xwe bi zimanê medreseyê hatiye nivîsîn, dema tê xwendin bi rihetî tê fehmkirin. Ji bo mirov bikaribe di derheq zimanê sedsala XIXan yê kurdan de bibe xwedî fikr derfeteke baş e. Lewra pexşan e, tê de hunerên edebî tunene, rasterast meqsed çî be tê fehmkirin. Lê ji ber ku li medreseyan zimanê erebî di perwerdeyê de dihat bikaranîn, tê de têgeh û peyvên erebî û farisî hinekî zêde ne. Ev jî tiştêkî siruştî ye, çimkî xwendekar piştî demekê şûnda bi zimanê perwerdeyê difikirin, dinivîsîn. Mela Mehmûd jî him ji medreseyê îcazeta xwe hildabû û him jî seydayê medreseyê bû. Ev yek jî tesîrê li ser zimanê xebata wî dike.

²⁷⁰ Mela Mahmut Beyazîdî, *Adetên Kurdistan*, "Ji pêşgotina Rudenkoyê" wer. Delîlo Îzolî, Holland, Tarîx tune, r. 3.

²⁷¹ H. b. r. 5.

Li gel ku zimanê wê bê fehmkirin jî Reşîd Findî berhem bi rastnivîsa nû ya kurdî bi tîpên erebî ve ji nû ve amade kiriye.²⁷² Her wiha peyvên kêmtên zanîn yê di pirtûkê de rawe kirine. Bi vî awayî ev weşan ji bo kesên bixwazin bi îmlaya nû ya bi tîpên erebî bixwînin bûye xebateke baş. Ji bilî vê Jan Dost jî ev risale bi kurmanciya îro bi tîpên latinî amade kiriye, bi jêrenotan agahiyên dîrokî, çandî û wêjeyî şîrove kiriye.²⁷³

3.1.1. Devoka Berhemê

Devoka ku '*Adat û Rusûmatname*'ê *Tewayîfê Ekradiye* pê hatiye nivîsîn Hekarî-Rewendî ye. Ango di berhemê de devoka Hekariyê û devoka rewendî hatiye bikaranîn. Zaravayê rewendî angoyê kurdên koçerê Çildêran, Qers, Bazîd, Mûş, Bedlîs û Wanê ye. Zimanê re'ayayên kurdên Xarpût, Diyarbekir, Mêrdîn û hawirdorê wê hetanî Erzîromê dijîn jî li ser vî zaravayî tê hesabkirin. Jixwe mirov dikare vê tradîsyonê ji bo hemû berhemên klasîk qebûl bike. Lewra wekî Mela Mehmûdê Bazîdî ku xelkê Serhedê ye, li gel devoka xwe bi devoka Hekariyê nivîsiye, Ehmedê Xanî jî beriya wî li Bazîdê bi heman devokê berhemên xwe nivîsîbûn.²⁷⁴

Li gor ku Bazîdî bi xwe jî di pêşgotina pirtûka xwe ya bi navê *Tewarîxî Cedîdî Kurdistanê* de qalê dike li herêma Serhed û Hekariyê ev devokana dihatin axaftin, alimên kurdan dema berhemek dinivîsandin wekî edet ev devoka ji bo xwe bingeh hildidan û loma wî bi xwe jî wisa kiriye.²⁷⁵

3.1.2. Zimanê Wê Demê û Îro

Bi qasî ku ji zimanê berhemê tê derxistin di navbera 150-200 salî de zimanê kurdî zêde neguheriye. Esas û bingeh wekî xwe maye, tenê bi derbasbûna demê re hinek têgehên bi rêveberiyê re eleqedar guherîne, ji bilî wê têgehên di nav civakê de, di têkiliyên rojane de hatine emilandin wekî xwe mane. Bo nimûne peyvên ji bo şîn û şahiyên, dawet û dîlanên, dîn û baweriyê, dostî û neyariyê, şer û dewan, pez û dewaran, jin û mêran, keç û bûkan û hwd heman rengî ne. Wekî li jor jî hat got tenê hin têgehên usûlî ên ji ber tesîra perwerdeyê bi erebî, farisî û tirkî hatine bikaranîn.

²⁷² Findî, *Pertûka Adat û Rusûmatnameê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867*, Dezgeyî Spîrêz, Duhok, 2006.

²⁷³ Mela Mehmûdê Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, ç. 2., Lêkolîn: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, 2012.

²⁷⁴ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, Nûbihar, Stenbol, 2010.

²⁷⁵ Beyazîdî, *Adetên Kurdistanê*, r. 6 (pêşkêşî).

4. Di Berhemê de Peyvên Biyanî

4.1. Peyvên Farisî

Di *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* de zimanekî dewlemend hatiye bikaranîn, lewma nivîskar çaxê qala bûyer, bawerî û edetan kiriye xwe ji peyvên ji zimanên biyanî nedaye alî, heke hewce bike bi kar aniye. Lê gava em qala peyvên farisî dikin divê bê zanîn ku gelek peyvên kurdî û farisî hevpar in û malê herdu zimanên eqreba ne. Lê li vir ji niqandina çend peyvên armanc diyarkirina çawaniya zimanê berhemê ye. Jixwe em nikarin bi hûrgilî li ser etîmolojiya peyvên bisekinin, ev ne mijara vê xebatê ye. Heke em çend nimûneyan bidin; koşe, gerdek, tîfing, koç, کنار, xalî, perde, xoşnûd, efsûn, xewxa, dost, çirax, çîwal derdikevin pêş. Her wiha hinek peyvên hevedudanî jî hene ku ji farisî-erebî-tirkî pêk hatine: hefteliq, cû'meliq, qeweçî û hwd. Ev peyva yên kurdî-farisî ne û di herdu zimanan de her wiha di zimanên milletên din yên ne ji vê malbatê ne -wekî tirkî- jî tên bikaranîn.

4.1. Peyvên Erebi

Di *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* de peyv û têgehên erebî li gor farisî zêde ne. Heta navê kurdan jî bi forma erebî wekî ekrad tê bikaranîn. Ji ber pîrbûna hejmara peyvên erebî ku em wana îro jî bi kar tînin emê ji bo bibe nimûne tenê çendekan bidin: Ekser, hesab, hakim, ders, medrese, lakin, meclis, suret, resm, mîqdar, muteber, midde, huzn, munasebet, cem', lisan, tayife, umum, lefz, mexsus, libas, kefen, qîsim, qebûl, îtiraz, cem'îyet, xewf, weqt, quwet, xulesa, riba, fîncan, qehwe, qesebe, şemate, hediye, tabut, qumar, tilsim, cirîd, îtaet û hwd.

Çawa ku me li jor jî behs kir ji ber ku li medreseyên Kurdistanê zimanê erebî di perwerdeyê de dihat bikaranîn, di vê risaleyê de têgeh û peyvên erebî zêde ne. Ev jî tiştêkî siruştî ye, lewra Mela Mehmûd jî him ji medreseyê îcazeta xwe hildabû û him jî seydayê medreseyê bû. Ev yek jî tesîrê li ser zimanê xebata wî dike.

4.3. Peyvên Tirkî

Di *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* de hindik be jî hinek peyv û biwêjên tirkî an jî ji ber ku demeke dirêj di nav tirkan de hatiye bikaranîn û êdî tirkî tên qebûlkirin hene. Bo mînak Mela Mehmûd peyvên beşikkertme, kopek, eynegoz, çît, çaqmaqçî, eylem, qışlax, qışlaq, qûşliq, toypayî, ote, ode, qûş, qiran, ocax, bekçî, begen, soz, yerlû, yoldaş, oldaş, dol û qoş di nav pirtûka xwe de emilandine.

Sedema wê jî ew e ku Kurdistan di bin hakimiyeta dewleta Osmanî de bû û zimanê rêveberiyê tirkî bû û Bazîd jî navenda sançaxê bû. Ji hêla din ve Bazîdî kesekî pêştahatî bû û zimanê tirkî baş dizanibû, di dema serhildana mîrên Kurdistanê de wekî qasîdê dewletê hatibû wezîfedarkirin. Her wiha wî ji bo Jaba ji tirkî jî werger kiribû. Wekî din ev peyvên hatine bikaranîn di nav kurmancan de berbelav in.

4.4. Peyvên Ermenîkî

Kurd û ermenî di navbera hevdu de bi sedsalan jiyana, li gundan û bajaran bûne kirîv, pîgar û xinamiyê hevdu. Ji ber vê hindê çawa ku peyvên kurdî derbasî zimanê wan bûne peyvên ji zimanê wan jî derbasî zimanê kurdî bûne. Mela Mehmûd dema edetên kurdan dike bi peyva file/fille qala wan jî dike û her wiha peyvên ermenîkî xars, axç û axçik jî bi kar tîne. Ji hêla din ve hinek peyvên almanî, fransî û yê ji zimanên din û di nav civakê de dihatin bikaranîn jî kê mînak be jî tê de hene. Ji bo mînak peyvên ewropa, efrenc, tebançe, qolera, qurîş, qaput û kurk car caran tên bikaranîn.

5. Cureyê Berhemê

Di dîroka zimanên dinyayê de berhemên pêşîn şî'r in. Ango metnên bi aheng in. Ev jî ji ber hêsaniya jiberkirina wan pêk tê. Lewra di dîrokê de her çendî herdem axaftin, jiberkirin hebe jî nivîsandin û zêdekirina nivîsê di nav şert û mercên zehmet de hatine kirin. Ji ber wê wesîqayên beriya çêkirina kaxizan mirovan li ser kevir, hestî, çerm, parşumen, belg û tiştên din nivîsîne. Ew nivîs jî di forma helbestan de ne û heya bibêjî hejmara peyvan kê mînak in û bi pîranî jî sembol û resm in. Li gor vê yekê derdikeve holê ku ji bo hêsaniya jiberkirinê mirovan wêjeya xwe bi riya helbestê îcra kiriye. Her wiha ji ber taybetiya helbestê -ku ew jî wezn, qafiye û kêmbûna peyvan e- karê jiberkirinê hêsan e. Wekî helbestê biwêj, metelok, gotinên pêşiyên jî bi qafiye û kurt in. Loma heya derfetên nivîsandinê û zêdekirina nivîsan zêde nebû, li ser rûyê dinyayê ji cureyên edebiyatê helbest serdest e. Piştî ku kaxiz derket, peyra nivîsandin berbelav bû êdî cureyên din jî derketin holê. Lê belavbûna nesrê/pexşanê bi taybetî piştî çêbûna aletên çapê/çapxaneyê ye. Ango piştî sedsala XVan êdî ew karê nivîsê yê ku xetatan bi destan dikir bi çapxaneyê hate kirin û ev ji bo pexşanê jî bû derfet. Lewra beriya wê kesekî dema tiştê binivîsa, qala bûyerekê, şerekî, evînekê, çîrokekê, destanekê bikira bi helbestkî digot da ku hêsan bê jiberkirin, dema bê nivîsandin karê wê hêsan be. Piştî vê heyamê êdî alavên nivîsê zêde bûn, hewcedariya jiberkirinê nema û di vê heyamê de

pexşan derket holê. Di dîroka wêjeya dinyayê de pêvajoya pexşanê bi giştî bi vî awayî ye.

Bazîdî dema dest bi nivîsîna vê berhemê dike ji bo hemû helan ve kurdan bide nasîn tevdiqere. Ji ber vê hindê cureyê pexşanê bi kar tîne, ji eslê wan dest pê dike û hema hemû hurgiliyên derheqê wan de bi zimanekî rewan dinivîse. Loma ev berhema him bi şêweya nivîsînê ve, him ji hêla naverokê ve û him jî ji hola ziman ve mînaka pêşîn e.

a- Ev berhem wekî metnên beriya wê hatine nivîsîn qala mijareke dînî nake. Ango bi serê xwe ji bo hînkirina baweriyê nehatiye nivîsîn.

b- Ev berhem wekî metnên beriya wê hatine nivîsîn qala mijareke rêzimanî nake. Ango bi serê xwe ji bo hînkirina rêzimanê nehatiye nivîsîn.

c- Ev berhem ne werger e, bi serê xwe ji binî ve bi zimanê kurdî hatiye nivîsîn.

d- Ev berhem pexşan e, sînor û astengiyên şî'rê jê re nebûne berbend.

Bi vî qaydî *'Adat û Rûsumatname'*ê *Ekradiye* bi awayê nivîsîna xwe ve pexşan e. Ji hêla naveroka xwe ve jî mijar bi giştî şeklê jiyana civaka kurd e. Loma heke em Mela Mehmûd wekî damezrênerê civaknasiya kurdî qebûl bikin, bi vê xebata xwe ya têr û tije ve di dîroka civaknasiyê de xîmê bingehîn e. Lewra Mela Mehmûd di berhema xwe de tenê neqilkariyê nake, li gel neqlê şîrove, rexne û pêşniyazan jî dike. Ev taybetiya wî jî dibê destpêk. Ev berhema giranbiha him bi naverok û him jî bi cureyê nivîsa xwe ve nimûneya pêşîn a pexşanê ye. Jixwe gelek berhemên Mela Mehmûd yên ji çîrok, dîrok, rêziman û ferhengnûsiya ku cureyên pexşanê ne jî hene. Wekî di beşa pey vê re de dê bê diyarkirin beriya Mela Mehmûd hinek metnên kurt ên dînî, rêziman û ferhengê hatine nivîsandin. Lê xebatên Mela Mehmûd ji wêje, dîrok, civkanasî, etnografiya û ziman pêk tên. Ango Mela Mehmûd ji gelek aliyan ve divê wekî kesê pêşîn ê ku ev kara kiriye bê hesabandin.

6. Di Dîroka Edebiyata Kurdî de Cihê Wê

Di wêjeya kurdî de berhemên herî pêşîn ên ku wekî destpêk tên qebûlkirin helbestkî ne. Ji bo vê jî Baba Tahirê Hemedanî (938?-1010/1020?) bigre heya Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî berhemên kurdî nezm in. Loma wekî wêjeya dinyayê ya kurdan jî bi nezmê dest pê kiriye. Heta ji ber statuya kurdan ya bêdewletbûnê û her wiha nebûna sazî û dezgehên çandî, wêjeyî û tomarkariyê berhemên bi nezm ên kurdî jî bi piranî nehatine qeydkirin û winda bûne. Lê dîsa jî kurdî ji hêla edebiyata devkî ve pêş ketiye, bûyerên dîrokî, şer, eşq û çîrok bi saya kilamên

dengbêjan hatine parastin. Ji ber vê taybetiyê di dîroka wêjeya kurdî de cureyên berhemana pir girîng e û dîroka nivîsîna berhemên peşxan û lêkolînên di vî warî de girîng in.

Her çendî di derheq kesê ku cara pêşîn bi kurdî peşxan nivîsiye û berhema wî de fikreke vebir tunebe jî ji nav berhem û kesên ev kara kirine de Mela Mehmûd ji yên sereke ye. Lewra Mela Mehmûd bi gelek berhemana û mijarên girîng ve di vê qadê de derdikeve pêş. Lê beriya ku em cihê *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* ya di dîroka wêjeya kurdî de binirxînin, divê em bi kurtasî behsa wan metnên din ên mijara dîroka peşxanên kurdî ne bikin.

Heke berhemên kurdî yên peşxan hatine nivîsîn bîr rêzkirin li gor kronolojiyê di serî de kitêba bi navê *'Serf û Be'dê Usûl Lazimeye Te'lîma Bi Zimanê Kurmancî'* tê. Elî Teremaxî (1592-1655)²⁷⁶ di destpêka sedsala XVIIan de ev berhema nivîsiye. Ev kitêb bi kurdiya kurmancî rêzimana zimanê erebî rawe dike û bi usûla peşxanê hatiye nivîsîn.²⁷⁷ Nivîskar ji bo telebeyên kurd erebî hêsan hîn bibin rêzimana erebî bi kurmancî nivîsiye. Reşîd Findî ji ber vê Elî Teremaxî wekî yekemîn rêzimannivîs û peşxannivîs qebûl dike.²⁷⁸

Mela Mehmûdê Bazîdî ew pirtûk li cem melayekî xelkê Hekariyê peyda kiriye, ji nû ve rêkûpêk kiriye, nivîsandiye û pêşgotinek jî jê re amade kiriye. Bi vê pirtûkê em pê dihesin ku Mela Mehmûd di warê rêzimanê de jî xizmeta zimanê kurdî kiriye. Jaba kurtasiya wê li gel wergera wê ya fransî di pirtûka *"Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan"* de weşandiye. Nusxeya orijînal ya bi destê Mela Mehmûd hatiye nivîsîn li Lenîngradê li pirtûkxaneya Akademiya Zanistên Rojhilatnasiyê tê parastin.²⁷⁹

Kurtenivîseke bi navê *"Eqîda Îmanê"* li saziya destxetan ya Sedam tê parastin. Ev

²⁷⁶ Ev tarîx li gor Feqî Huseyn Sağniç e, bnr. *Dîroka Wêjeya Kurd*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002, r. 389. Lê ev tarîxa hîcrî 1000/mîladî 1592 li gor hinekan sala nivîsîna rêzimanê ye. Bnr. Qedrî, "Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê Destura Zimane Erebi bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî", r. 192.

²⁷⁷ Marûf Xeznedar, *Destûrî Zimanî 'Erebî be Kurdî*, Elî Teremaxî, Çapxana Dar el-Zeman, Bexda 1971; Reşîd Findî, *Elî Teremaxî Êkemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e*, Emîndariya rewşenbîrî û lawan, Bexda, 1985, vgz. *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî*, Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Twîjandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007, (pêşgotin).

²⁷⁸ Findî, *Eliyi Teremaxî Êkemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e*, Bexda, 1985, vgz. Qedrî, "Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê "Destura Zimane Erebi bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî", r. 192.

²⁷⁹ Gramaire kurde par Ali Teramakhi offert a l'Academie Imperial des Sciences a St Petersburg, par A. Jaba.

13 rûpel e, bi kurdiya kurmancî hatiye nivîsiye, lê navê nivîskar û dîroka wê ne diyar e, tenê sala jinûvenivîsandina wê wekî 1230 mîladî hatiye diyarkirin.²⁸⁰

Ji bo nimûneya pexşanê yek jî qamûseka destxet ya Tirkî-Kurdî ye û li saziya destxetan ya Sedam tê parastin. Li gor Seîd Dêreşî neqil dike Mihemed Elî Qeredaxî derbarê dîroka wê de dibêje: “Li dîv kaxez û awayê nivîsînê û xetê wê temenê destnivîsê ji 300-400 salan kêmtir nîne.”²⁸¹ Lê navê nivîskar û dîroka wê jî ne diyar e.

Her wiha destxeta qamûseka piçûk ya Farisî-Kurdî jî heye û mixabin navê amadekar û dîroka nivîsîna wê jî ne diyar e û li gor M. Elî Qeredaxî dibe ku 200 dused sal berê hatibe nivîsîn.²⁸²

Ji bo dîroka wêjeya kurdî ya pexşan kitêba rêzimana erebî ya bi zimanê kurdiya kurmancî û bi navê *Terkîb û Zirûf* ku Mela Yûnisê Helqetînî (mirin 1785) nivîsiye jî çavkaniyeke girîng e. Ev kitêb li ser rêzimana erebî ye û bi zimanê kurdiya kurmancî hatiye nivîsîn. *Zirûf* bi tevahî 10 rûpel e û *Terkîb* jî 40 rûpel e. Li hin medreseyên Kurdistanê ev pirtûk wekî ders dihat xwendin.²⁸³ Emîn Narozi ev *Terkîb û Zirûfa* Mela Yûnisê Helqetînî, di nav Weşanên Sarayê de Stockholmê di sala 1996an de daye çapkirin.

Kitêba Tibê ya Mela Mihemedê Erwasî û wekî *Tiba Melayê Erwasî* tê nasîn. Ev kitêb jî pexşan e û ji dused sal beriya îro hatiye nivîsîn.²⁸⁴ Lê ji ber ku bi teqezî dema jidayikbûn û wefata wî nayê zanîn bi awayekî zelal nayê tesbîtkirin ka ev kitêb çi çaxê telîf bûye. Lê li gor texmînan Erwasî di navbera dawiya sedsala XVIIIan û despêka XIXan li heyatê bûye.²⁸⁵ Kadri Yildirim ev kitêba tibê ji bo çapê amade kir û bi kurdî û tirkî da çapkirin.²⁸⁶

Seîd Dêreşî qala destxeteka piçûk ya bi navê *Tiba Kurdî* dike û destnîşan dike ku

²⁸⁰ Mihemed Elî Qeredaxî, *Bûjandinewey Mêjûyî Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe*, Bergî Çwarem, Çapî Yekem, Çapxaney Elxensa, Bexda 2002, r. 106, 111, vgz. *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî*, Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Twîjandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007, (pêşgotin).

²⁸¹ Mihemed Elî Qeredaxî, *Bûjandinewey Mêjûyî Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe*, Bergî Siyem, r. 170, 174.

²⁸² Qeredaxî, *Bûjandinewey Mêjûyî Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe*, r. 223, 226.

²⁸³ Zeynelabîdîn Zinar, *Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexekirî*, Stockholm, 1991, r. 121; Mela Yûnisê Helqetînî, *Terkîb we Zirûf*, amd. Emîn Narozi, Weşanên Sarayê, Stockholm, 1996.

²⁸⁴ Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Li Dor Edebê Kirmancî Di Sedsala Nozdê û Bîstê Zayînî*, (Deq û Vekolîn) Weşanê Kura Zaniyariya Kurdistanê, Hewlêr, 2004, r. 15.

²⁸⁵ Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 308.

²⁸⁶ Melayê Erwasî, *Tiba Melaye Erwasî: Ji Sedsala 18. Pirtûkeke Kurdî ya Bijîşkiya Gelêrî*, Dahûrîn û wer. Kadri Yildirim, Weşanên Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Stenbol, 2013.

Mela Mehmûdê Behdîni amade kiriye. Li gor wî Mihemed Sîraceddîn el-Xelîlî el-Torî ev ji destnivîseka sala 1212 mîladî hatiye nivîsîn, wergirtiye.²⁸⁷

Mewlûdnameya Şêx Huseynê Qazî (1791-1870) ya di sala 1860î de bi kurdiya soranî nivîsiye. Ev metna li ser jidayikbûna Hz. Pêxember bi nezm û nesir hatiye nivîsîn.²⁸⁸

Eqîdenameya Kurdî ya Mewlana Xalidê Neqşebendî (1779-1827) di sala 1877an de bi destê melayekî jinûve hatiye nivîsîn û derbarê pênc ferzan de ye.²⁸⁹

Berhemeke piçûk ya din jî bi navê *Cewahir Eqîdet el-Îslam wel-Îman* e. Mela Xelîlê Sêrtî (1753-1843) ev rîsaleya piçûk 180 sal beriya niha li ser îman û bîr û baweriyê nivîsiye.²⁹⁰

Her wiha ji bilî van çend destxetên piçûk yê bi destê kesên nekurd hatine nivîsîn hene. Bo mînak li gor Thomas Bois qalê dike li arşîva dîrokî ya ermeniyana ya li bajarê Etchmiadzinê destxetê di salên 1400î de bi alfabeya ermeniyana ya T. Metsop (mirin 1446) hatiye nivîsîn peyda kiriye û wekî din çendîn alfabeyên din jî tê de hene. Di wê destxetê de bi heft zimanan çend duayên xaçparêzan hene, ji wan zimanan yek jî kurdî ye.²⁹¹

Wekî din hinek kurtenivîsên kurdî yê di *Seyahetnameya*²⁹² Ewliya Çelebî (1611-1682) de û hinek metnên di Gramera Garzonî de ji bo pexşanê nimûne tên nîşandan.

Mela Mehmûdê Bazîdî cara pêşîn di sala 1858an de pirtûka Şerefxan Bedlîsî *Şerefnameya* ku qala mîrekiyên kurdan dike bi navê *Tewarîxî Qedîmî Kurdistan* ji farisî wergerandiye kurdî. Rojhilatnasa Rûs Rudenkoyê ev wergera Mela Mehmûdê Bazîdî ya *Şerefnameyê* amade kiriye û bi destxet di sala 1986an de li Moskovayê hatiye çapkirin. Di sala 2007an de jî ew destxet ji aliyê Seîd Dêreşî ve hatiye transkrîbekirin û li Duhokê hatiye weşandin.²⁹³

²⁸⁷ *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî*, Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Twîjandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007, (pêşgotin)

²⁸⁸ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 9.

²⁸⁹ H. b. r. 9, 10.

²⁹⁰ Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Li Dor Edebê Kirmancî*, r. 39, 46.

²⁹¹ Thomas Bois, Bulletin Raisonné d'Etudes Kurdes, *Imprimerie Catholique*, Beyrouth, 1964. r. 551.

²⁹² Martin van Bruinessen, "Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebinin Notları", *Studia Kurdica*, j. 1-3, 1985, Paris.

²⁹³ *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî*, Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Twîjandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007.

Li gor agahiyên heyî, Mela Mehmûdê Bazîdî di vê pirtûka xwe *Kitêba Tewarîxî Cedîdî Kurdistan* ya ji yazdeh beşan pêk tê de li ser mîrektiyên kurdan rawestiyaye û qala wan bûyerên di navbera salên 1785 û 1857an de qewimîne kiriye. Jixwe Mela Mehmûd *Şerefname* jî wergerandiye û ji vê jî derdikeve holê ku ji bo dîrokeke qala bûyerên ji Şerefxan şûnda heya serdema xwe amade bike hewl daye. Lê mixabin ev pirtûka ku di sala 1857an de hatiye nivîsîn winda bûye. Tenê pêşgotina wê ya ji pêncî rûpelî pêk tê ji teref Jaba bi bal fransî ve hatiye wergerandin û em wisa di heqê naveroka wê de dibine xwedî agahî. Jaba ev beş şandiyê Akademiya Zanistan ya Rûsyayê da ku binirxînin. Lerch li ser nameya Jaba ji bo wan şandiyê nirxandinekê dike, lê mixabin heya îro ev pirtûk nehatiye dîtin.

Çaxê qala dîroka pexşana kurdî tê kirin ferheng jî tên jimartin. Ji wan yek Ferhenga Kurdî-Fransî (*Dictionnaire Kurde Francais*) ye. Ev jî ferhengeke Kurdî-Fransî ye. Mela Mehmûdê Bazîdî û A. Jaba ev berhema bi tevayî amade kirine û di sala 1879an de li Petersburgê çap bûye.²⁹⁴

Mela Mehmûdê Bazîdî, ji bo amadekirina vê ferhenga *Rûsî-Fransî-Kurdî û Kurdî-Rûsî-Fransî* alîkariya A. Jaba kiriye. Beşa pêşîn ya ferhenga *Rûsî-Fransî-Kurdî* ji 15.000 kelîman pêk tê û 721 rûpel e û tevî 100 diyalagên kurdî û wergera wan a fransî Jaba di sala 1865an de ji Akamedemiya Împaratoriye re dişîne û ya rastî ev bingeha ferhenga *Kurdî-Fransî (Dictionnaire Kurde Francais)* ye ku Akademiye barê xebata li ser vê ferhengê sparte Îrannasê alman Ferdinand Justi (1837-1907) û ew jî li ser vê van destxetan xebitî û ji hêla tîpguhêzî, etîmolojiya peyvvan kar kir û sala 1879an de li Petersburgê da çapê.²⁹⁵ Beşa duduyan *Kurdî-Rûsî-Fransî* di navbera salên 1869-1882an de hatiye amadekirin, 700 rûpel e, lê mixabin heya îro çap nebûye.

Mela Mehmûd ji bo ferqa di navbera devoka Hekarî û Rewendî diyar bike bi alîkariya Jaba ferhengeke piçûk jî amade kiriye; Hekarî-Rewendî-Fransî. Navê vê ferhengokê wiha ye: “Eva risaleyêke di behsa hinek ferq û cudayî di nav lûxatêd ekradan hindû beyanî be‘zî qewa‘îdî ‘umûmî yêd lazim e.”²⁹⁶ Di sala 1984an de ji teref Maruf Xeznedar ve hatiye serastkirin û ji nû ve çap bûye.²⁹⁷

Li gor agahiya ku Rudenko di pêşgotina “*‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayîfê Ekradiye*” ya rûsî de dibêje Mela Mehmûd tenê jinûve nivîsîna berhemên dîrokî yên

²⁹⁴ Dictionnaire kurde-français par M. August Jaba, publiée par M. Ferdinand Just, Petersburg, 1879.

²⁹⁵ H. b.

²⁹⁶ Vocabulaire kurde des dialectes de Hekari et Revendi, par A. Jaba, Consul de Russie q Erzeroum, Erzeroum le 15 Mars 1858.

²⁹⁷ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 6.

kurdî re eleqedar nebûye, her wiha bi xwe jî berhem nivîsiye. Ji wan yek jî *Risaleyî Tuhfe en-Nehlan fî ez-Zimanî Kurdan* e. Mela Mehmûd ev kitêba di sala 1866an nivîsiye.²⁹⁸

Di nav pexşanan de berhema hêja *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan* ya Mela Mehmûdê Bazîdî heye. Ev pirtûk ji sê maqale û çil çîrokan pêk hatiye û wekî kitêb bi hev re hatine çapkirin. Ev antolojiya çîrokên gelêrî yên kurdî ya yekemîn e bi destê Mela Mehmûd ve hatiye amadekirin û Jaba wergerandiye fransî û di sala 1860î de li Petersburgê bi pêşkêşeke P. Lerch hatiye weşandin. Ev pirtûka bi tevî li Fransiya wê bi amadekirina Ziya Avci Amedê jî hat weşandin.

Ji bilî van çil çîrokan Mela Mehmûd hin mesnewiyên kurmancî jî wekî pexşan jinûve nivîsîne. Ji wan yek *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî manzûm nivîsiye di sala 1856an de wekî pexşan jinûve hûnaye, loma dema di dîroka wêjeya kurdî de qala çîroka kurdî ya klasîk tê kirin Mela Mehmûd wekî çîroknûsê ewil ê kurd tê qebûlkirin.²⁹⁹ Mela Mehmûd ev bi destxeta xwe nivîsiye, Jaba ji tîpên erebî veguheztiye ser tîpên latinî û bi tevî pêşgotinekê wergerandiye fransî.³⁰⁰ Nusxeyeke vê destxetê li Parîsê li pirtûkaneya Enstitûya Welat ya Ziman û Şaristaniyên Rojhilat Inalco ye. Li Rûsyayê arşîva Petersburgê jî nusxeyeke wê tê parastin.³⁰¹

Mela Mehmûd ev çîroka navûdeng Leyla û Mecnûn bi destê xwe di sala 1859an de nivîsiye, Jaba ji tîpên erebî veguheztiye ser tîpên latinî û bi tevî pêşgotinekê wergerandiye fransî. Nusxeyeke vê destxetê li Parîsê li pirtûkaneya Inalco ye. Li Rûsyayê arşîva Petersburgê jî nusxeyeke wê tê parastin.³⁰²

Yek ji wan çîrokên Mela Mehmûd bi destxeta xwe nivîsandiye jî çîroka Siyamend û Şemsê ye. Mela ev çîrok wekî pexşan nivîsiye û di *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan* de wekî çîroka 13an hatiye weşandin.³⁰³ Rojhilatnasê Rûs M. de Tchihatcheff di sala

²⁹⁸ Maruf, “Çend Wuşeyek Derbarey Komelêy Destnuwîse Kurdiyekanî Aleksander Jaba”, r. 8, 10, vgz. Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 6.

²⁹⁹ Ferhad Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Weşanên Aras, Arbil, 2000; Reşîd Findî, *Êkemîn Çîroka Kurdî Çîroka Mem û Zîna ya Mela Mehmûdê Bayezîdî*, Hewlêr, 2010.

³⁰⁰ A. Jaba, Resume de l'ouvrage d'Ahmed Effendi Khani, Tr. par A. Jaba, in Bulletin Hist. Philologique, LXV, 1858, No 11, r. 161, 171.

³⁰¹ Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 5.

³⁰² H. b. r. 5.

³⁰³ Îskender Jaba, *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan*, Petersburg, 1860, r. 44, 46; A. D. Jaba, *Racueil de notices et récits kourdes*, St. Petersburg, 1860, r. 36, 39; Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan*, r. 76, 77.

1859an de ev destnivîsa kurmacî li gel tîpguhêziya wê ya latîni, wergera fransî û pêşgotîneke fransî daye çapkirin.³⁰⁴

Lê ji van berhemana ya herî girînga ku Mela Mehmûd di sala 1858-1859an de bi xeta xwe nivîsiye *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye* ye û her wiha di sala 1868an bi destê kesekî navê wî Şah Nezer e jinûve hatiye nivîsîn û sala 1963an M. B. Rudenkoyê li Moskovayê çap kiriye. Mehmûd him bi vê berhemê û him jî bi gelek berhemên xwe yên din ve divê wekî damezrênerê pexşana kurdî bê qebûlkirin.

7. Xebatên li Ser 'Adat û Rûsmatname'ê Ekradiye Hatine Kirin

7.1. Gotara Maria Paradowskayê

Bi qasî me tesbît kir her çendî li ser Mela Mehmûd û berhemên wî sempozyum û festîval hatibin lidarxistin,³⁰⁵ xebatên akademîk hatibin kirin jî ev xebat zehf zêde nînin. Her wiha li ser *'Adat û Rûsmatnameê Ekradiye* heya nika hinek xebatên curbecur hatine kirin. Ji van xebatan hinek şîrove ne û ji wan xebatan yek jî ya Maria Paradowska ya bi navê "Lêkolînek li ser Destxeteka Mela Mehmûd Bayezîdî, Destnivîseka Kurdî ji Koleksiyonên August Kościesz Jabayî û Girîngiya Wê bo Etnografîya Polonî" ye.³⁰⁶ Sidqî Hîrorî ev xebata 25 rûpelî ji polonî wergerandiye kurmacî û li ser malpera www.kulturname.comê weşandiye. Di vê nivîsa xwe de nivîskar di derheq kurdnasiya li Polonyayê de agahiyan dide û balê dikêşîne ku him kurd, Kurdistan û him jî Jaba li welatê xwe baş nayê nasîn. Peyra behsa malbat û kurtejiyana Jaba dike û her wiha pişt re qala xebatên Akademiya Rûs ya Zanistan ya li ser kurd û Kurdistanê dike û wê prosesa berhevkirin, şandin û li akademiya nîrxandina wan bi kurtebirî radixe ber çavan. Derbarê weşandina wan berhemên destxet de, kesên li ser xebitîne agahiyan dide û di dawiyê de li ser taybetiyên destxetên 'Adatê, naveroka wê sekiniye û taybetiyên wê yên ji hêla folklor, etnografî û civaknasiyê ve bi mînak û îqtîbasan destnîşan dike. Gava li ser vê nîrxandinan dike li gel hêjahiyana qala kêmasiyên nivîskar û berhemê jî dike.

³⁰⁴ A. Jaba, Ballade kurde recueillie et traduite par A. Jaba et communiquee par M. de Tchihatcheff, *Journal Asiatique*, j. 5, 1859, r. 153, 166.

³⁰⁵ Evro festîvala Mela Mehmûdê Bayezîdî li Dihokê dest pê kir <http://www.kulturname.com/?p=549> (25.05.2015)

³⁰⁶ Maria Paradowska, "Rękopis kurdyjski ze zbiorów Augusta Kościesz Żaby i jego znaczenie dla etnografii polskiej", *Etnografia Polska* 15/2/1971, r. 225, 250), berg 15, defter 2, sal 1971; Maria Paradowska, "Destnivîseka Kurdî ji Koleksiyonên August Kościesz Jabayî û Girîngiya Wê bo Etnografîya Polonî", ji polonî wer. Sidqî Hîrorî <http://www.kulturname.com/?p=10321> (10.04.2015)

7.2. Ferhengoka ku Hemîd Kiliçaslan Amade Kiriye

Di hejmara 10an ya rojnameya Kurmancî³⁰⁷ ya ku Enstîtuya Kurdî ya Parîsê diweşîne de ferhengoka *'Adat û Rûsmatnameê Ekradiye* ya Hemîd Kiliçaslan amade kiriye hatiye weşandin.³⁰⁸ Navê ferhengokê wekî “Peyvên Adet û Rusûmatê el Ekrad” şaş hatiye nivîsîn û tê de 85 peyv û komepeyv hene. Di ferhengokê de wateya peyvên ji bilî kurmancî bi tirkî, fransî û inglîzî jî hatiye dayîn û di du rûpelên rojnameyê de hatiye weşandin.

Her wiha Ziya Avcî jî di dawiya tîpguhêziya xwe ya *'Adat û Rûsmatnameyê Ekradiyeyê* de ferhengokeke piçûka ji 55 peyvên pêk tê daye.³⁰⁹

7.3. Ravekirin, Tîpguhêzî û Lêkolîna Jan Dost

Jan Dost li ser ravekirin, tîpguhêziya *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiyeya Mela Mehmûdê Bazîdî* xebatek kir û sala 2010an ji nav weşanên Nûbiharê derçû. Ev pirtûk 390 rûpel e, ji bilî pêşgotinê, wekî sê beşan û beşa dawîn a orijînal a metnê ya bi tîpên erebî cih bigire hatiye amadekirin. Di pêşgotinê de (r. 9-33) Jan Dost qala xebatê û lêkolînên rojhilatnasan yê di derbarê kurdan û zimanê kurdî de dike. Piştî wê behsa jiyanê û berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî dike û di derbarê A. Jaba û tîkiliya wî ya bi Mela Mehmûdê Bazîdî re de agahiyan dide. Peyvê re li ser xebatên wê berhemê radiweste. Herî dawîn jî qala rêbazê û xebatê xwe ya li ser wê berhemê dike. Di beşa pêşîn ya bi navê “Destpêk”ê de (35-136) tîpguhêziya metnê eslî cih digire û nivîskar jî bo beşê û mijarê ji hevdu veqetin û baş bînin fehmkirin jî bo her beşekê sernavek daniye û bi vî awayî 139 sernav û gelek mijar destnîşan kiriye. Her wiha li cîyên pêwîst jî di jêrenotan de şîrove kirine û agahî dane. Seba bingeha van tiştên qala wan tê kirin werine peyitandin jî şairên kurd mînak daye. Ev jî bo fehmkirina metnê eslî pir bi kêrî mirov tê. Piştî wê jî di beşa duduyan ya bi sernavê “Adetên Kurdan bi Kurdiya Îro” de jî kurmanciya wê ya îro tê pêşkêşkirin. Di beşa sisyan de jî lêkolîn û xebatên cihê yê li ser *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiyeyê* yê bi destê kesên cuda hatine amadekirin hene. Her wiha jî berhemên Mela Mehmûdê Bazîdî hinek beş jî bo nimûne

³⁰⁷ Her çendî *Kurmancî* xwe wekî rojname bide nasîn jî ji navê rojnameyê bêtir navê kovara demsalî lê tê. Lewra jî sala 1987an vir ve jî bilî îstisnayan salê du caran, wekî zivistan-havîn û bihar-payîz hatiye weşandin.

³⁰⁸ Mela Mahmud Beyazîdî, “Peyvên Adet û Rusûmatê el Ekrad”, amd. Hemîd Kiliçaslan, *Kurmancî*, j. 10, Zivistan, 1992, Parîs, r. 88, 89.

³⁰⁹ Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyeyê*, r. 91, 92.

hatine dayîn. Ev beşa dîroka vê xebatê, girîngiya wê ya di dîroka wêje û pirtûkxaneya kurdî de nîşan dide. Di beşa dawîn de bi tîpên erebî eslê pirtûkê heye. Bi rastî ev beş ji bo kesên dikarin tîpên erebî bixwînin baş e û ji bo meriv muqayesa di navbera metnê bi tîpên latinî û erebî de bike derfeteke baş e.

Di xebata Dost de navê kesê ev metnê bi tîpên erebî nivîsiye nehatiye diyarkirin û ne kifş e ka di çî demê de hatiye nivîsîn. Lê diyar e ev nusxeya duduyan ya Petersburgê ye û Rudenkoyê xebata xwe li ser wê kiriye û li gel wergera wê ya rûsî weşandiye.

Bi baweriya min di vê xebatê de ew metnê ku tîpguhêziya wê hatiye kirin bêyî şîrove, jêrenot û kevanokên di nav hevokan de bi xurî bihata weşandin, ew şîrove û agahiyên pêwîst di wê beşa ku metin bi kurdiya îro hatiye pêşkêşkirin bihatana dayîn dê baştir bibûya. Lewra bi vî qaydî xwendekarê bi tena serê xwe metin bixwenda û ji bo wî derfeta muqayeseya kurmanciya wê demê û îro derketa holê.

Beriya vê jî me got, jêrenot û şîrove kêrhatî ne. Lê mixabin di hinek ciyan de zimanê hatiye bikaranîn lê nehatiye û bi baweriya min bi vî zimanê bêhurmetiyek li muxateb bûye. Bo mînak dema qala jêdera peyva kurd tê kirin ka gelo ji ku hatiye, wateya wê çî ye, nivîskar wê çîroka bêbingeh a der heqê Hz. Suleyman û qerwaşên wî de neqil dîke û wiha dinivîse: "...di dema Hz. Suleyman de, komek cin bazdane ser kinîze cêriyên Hz. Suleyman..."³¹⁰ Her wiha ev peyv di rûpela 107an de dîsa tê bikaranîn. Bi baweriya min divê ev rîwayeta bêbingeh –ya rastî baweriya Mela Mehmûdê Bazîdî ya di derheqê esl û zimanê kurdî de ji binî ve xelet e- bi zimanekî minasib bihata neqilkirin. Lewra ev berhemeke cidî û ilmî ye, divê li gor rê û rêbaza wê bihata nivîsîn. Jixwe wekî di vê kitêbê de jî derbas dibe û nivîskar jî ji bavê xwe mînak dide, di civakê de ji bo xeberdan û şêwr bi edeb be, peyvên minasib tînan bikaranîn.³¹¹ Lê wekî îdiaya nivîskar ev ne ku ji bo di civakê de neyê fehmkirin, berevajî vê ev yeka wekî pêwîstiyêke exlaqekî bilind tê kirin.

Di rûpelê 121an de dema qala zikatê dibe Jan Dost di derheqê zikatê de agahiyê dide û mixabin di wê de xeletiyek kiriye û wiha dibêje: "Li gor şerî'etê, zekata mal, yanî ya pereyan ji sedî bîst û pênc e, ango ji çilî yek e, weke ku Beyazîdî dibêje." Lê ka hûn hesab bikin, ma "ji çilî yek" û ji "sedî bîst û pênc" eynî tişt in? Di hevokê bi xwe de

³¹⁰ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 37.

³¹¹ H. b. r. 83.

nakokî heye. Ya rast divê ji sedî didu û niv bûya. Ev xeletiyêke maddî ye.³¹² Dîsa di vê jêrenotê de ji bo çêlekan/dewaran dibêje pezê reş. Bi qasî ez dizanim ji bo dewaran ango ga, gamêş û çêlekan pez nayê gotin û her wiha ji bo pêz jî peyva reş nayê bikaranîn, ji bo wê peyva qer tê gotin.

Di vê pirtûkê de çend tişt balê dikşînin, ji wan yek peyva urtê ye ku -wekî orta hatiye nivîsîn- tê wateya esl, malbat, ocax û sulaleyê. Lê di vê lêkolînê de wekî nirx û îtibarê hatiye manekirin. Mîna vê tiştêkî din jî di heqê tewilandina hespan de derketiyê holê. Nivîskar dibêje “*Tewîle jî axura hespan e.*” Gava meriv vê dixwîne, peyv di hişê meriv de baş rûnanê. Lewra tewl, tewilandin ji bo li derva, li çolê nav mêrg û çayiran tèn bikaranîn. Bo mînak dibêjin: Ka vê sika hespê hilde bibe di nav wê hêşînahiya han de bitewilîne. Divê hinekî din jî zelal û berfireh bihata diyarkirin.

Her wekî din di pirtûkê de hinek kêmasî û xeletiyên nivîsê jî hene. Navên taybet, hinek caran bi tîpên mezin dest pê dikin û carna bi yên piçûk. Navek bi çend awayan hatiye nivîsîn. Bo minak navê Minorsky di rûpela 7an de wekî Minorsky, 8an de wekî Mînskî û di 99an de jî Mînskî hatiye nivîsîn. Di jêrenotan de ji hinek peyvan tîp ketine, lewma xelet derketine.

8. Wergerên Berhemê

8.1. Fransî

Jaba piştî ku di sala 1866an de teqawit dibe diçe li Îzmirê bi cih dibe û xebatên xwe yê li ser kurdî li wir berdewam dike û sala 1868an li ser destxeta ‘*Adat û Rusûmatname*’ê ya bi destê Şah Nezer hatiye nivîsîn dixebite û werdigerîne fransî. Di vê nusxeyê de ji bilî metnê kurdî ya orijînal wergera wê ya fransî tevî pêşgotina fransî heye. Metnê kurdî û transkrîpsiyona wê ya latinî li ser rûpelên destê rastê ne û li ser du stunan hatine dabeşkirin û li ser rûpelên destê çepê jî wergera fransî heye. Di bin metnê kurdî de û bi nivîseka erebî lêker û mesderên di tekstê de hatine destnîşankirin.³¹³

³¹² Ev xeletiya ku di çapa pêşîn de piştî ku Murad Celalî nivîsa “Adat û Rusûmatnameê Ekradiye û Çend Gotin”, r. 50-54, weşand di çapa duduyan de hat serastkirin. Bnr. Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 123.

³¹³ Bnr. Di van herdu metnên jêdera wan pêşgotina Rudenkoyê ne de nakokî hene: Maria Paradowska, “Destnivîseka Kurdî ji Koleksiyonên August Kościesz Jabayî û Girîngiya Wê bo Etnografiya Polonî”, ji polonî wer. Sidqî Hirorî <http://www.kulturname.com/?p=10321> (10/04/2015); Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 211.

Rudenko jî dibêje Jaba wergera xwe ya fransî ji nusxeya duduyan ya di sala 1868an de li Îzmirê bi destê Şah Nezer hatiye nivîsîn kiriye û di wergerê de gelek şaşî hene, bi ya min sedemên vê ew in ku hinekan ji Jaba re gotiye û wî jî wergerandiye.³¹⁴

8.2. Rûsî

Rojhilatnasa rûs M. B. Rudenkoya ku li ser gelek kilasîkên kurdî xebat kiriye³¹⁵ û *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* wergerandiye rûsî, li gel pêşgotin û gelek şîroveyên li jêrenotan bi sernavê *"Puavy i Obyaj Kurdov"* di sala 1963an de li Moskovayê daye çapkirin.³¹⁶ Rudenkoyê di vê xebata xwe de ew destnivîsa di sala 1868an bi destê kesekî navê Şah Nezer hatiye nivîsîn bingeh hildaye û li gel wergera rûsî orijînalê wê jî weşandiye. Ev xebata Rudenkoyê ya rûsî di sala 2010an de li Amedê li gel tîpguhêza metnê kurmancî ya Ziya Avcî ji nûve hat weşandin.

8.3. Erebi

'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye bi destê çend kesan ve bal bi erebî ve hatiye wergerandin. Ehmed Osman Ebûbekir li Bexdayê di sala 1972an de bi sernavê *"'Adat we Teqalîd Ekrad"* jê qismek wekî çar beşan di rojnemaya *el-Teaxiyê* de daye weşandin.³¹⁷ Ev wergera jî wekî wergera soranî ji ber ya rûsî ya Rudenkoyê bo erebî hatiye wergerandin.³¹⁸

Her wiha Jan Dost *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayifê Ekradiye* ji eslê wê kurmancî wergerandiye erebî û beş bi beş li ser înternetê weşandiye. Peyra li gel Mihsin Seyda jê re hinek şîrove û jêrenot jî çêkiriye û sala 2003an daye weşandin û herî dawîn

³¹⁴ Her çendî Rudenko wisa bibêje jî li gor gotina Jaba wî kurdiya xwe gelekî pêşve biriye û bi tena serê xwe dikare wergerê bike.

³¹⁵ Ji tekstên ku Jaba berhev kirin û M. Rudenkoyê weşandin: Mela Mehmûd Bayezîdlî, *Rewîşt û Titalên Kurdan*, Moskova 1963 (di wergera rûsî de); Harisê Bedlîsî, *Leyla û Mecnûn* (tekst, werger û bilêvkirina filologî ya tirkî), Moskova 1965; Ehmedê Xanî, *Çiroka Mem û Zînê*, Moskova, 1965; Feqiyê Teyran, *Çiroka Şêxê Sena'an*, Moskova, 1965; Selîmê Silêman, *Yûsif û Zûleyxa*, (Teza Doktorayê ya Rudenkoyê, 1973) Moskova, 1985; vgz. Reyçman, "Ji Rûpelên Nenaskirî Yê Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan", r. 134 û Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çiroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 7.

³¹⁶ Blau û nd, *Kürtler ve Kürdistan*, r. 45.

³¹⁷ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 25; Pîrbal, *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çiroknûs û Pexşannûsî Kurd*, r. 5-8.

³¹⁸ Blau û nd, *Kürtler ve Kürdistan*, r. 45.

di sala 2010an de li Abû Dabiyê bi navê “*Risale fî ‘Adatul-Ekrad we Teqalîdihîm*” daye weşandin.³¹⁹

Reşîd Findî jî ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* wergerandiye erebî û di sala 2006an de bi sernavê ‘*Adat we Teqalîd el-Ekradiye lîl Mela Mehmûd el-Bayezîdî 1799-1867*’ di nav rûpelên 107-208an de wekî beşa duduyan ya pirtûka bi navê *Pertûka Adat û Rusûmatname’ê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867* li Duhokê di nav weşanên dezgeyî Spîrêzê de derçûye. Di vê wergerê de bi jêrenotan şîrove û îzahata hin peyv û mijaran jî heye.

8.4. Soranî

Şukriye Resûlê ji wergera rûsî ya Rudenkoyê ya bi sernavê “*Puavy i Obyaj Kurdov*” ku di sala 1963an de li Moskovayê hatiye weşandin ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* wergerandiye kurdiya soranî û bi sernavê “*Dab û Nêritî Kurdekan; Nûsînî Mela Mehmûdî Bayezîdî*”³²⁰ li Bexdayê di sala 1982an de di nav weşanên Dezgeha Rewşenbîrî û Ragihandina Kurdî ya Wezaretê Rewşenbîrî û Ragihandinê ya Komara Iraqê de hatiye neşirkirin û 98 rûpel e.³²¹ Resûlê di wergera soranî de li gel pêşgotinê jêrenotên rûsî jî wergerandine. Ev werger wekî diyar e ji eslê wê nehatiye wergerandin û hinek şaşiyên wê yên wergerê hene.³²²

8.5. Farisî

‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* bi destê Ezîz Mihemedpûr Daşbendî bi sernavê “*Adab û Rusûmê Kurdan*” bal bi farisî ve hatiye wergerandin û li gel pêşgotinê û paşgotina Ebdurehman Şerefkendî “Hejar” sala 1990î hatiye weşandin û 279 rûpel e. Li gor ku Jan Dost qalê dike ev wergera ne baş e. Lewra şîrove û wergera eslê pirtûkê tevlihev bûye, ji ber hindê ji bo kesê eslê pirtûkê nizane diyar nabe ka eslê pirtûkê kîjan beş e û şîrove kîjan e.³²³

8.6. Tirkî

Abdullah Babek Pişderî ev pirtûka bi navê “*Kürtlerin Örf ve Adetleri*” wergerandiye tirkî û di sala 1998an de li Stenbolê hatiye weşandin û 72 rûpel e. Navê

³¹⁹ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 25.

³²⁰ Mela Mehmûdî Bayezîdî, *Dab û Nêritî Kurdekan*, wergeranî le rûsiyewe: Şukriye Resûl, Bexda, 1982.

³²¹ Blau û nd, *Kürtler ve Kürdistan*, r. 45.

³²² Bnr. Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 210.

³²³ H. b. r. 25.

nivîskar wekî Mella Mahmudê Beyazidî hatiye nivîsîn. Her çendî di pirtûkê de derheqê wergerê de agahî nehatibe dayîn jî diyar e ku ji wergera soranî bal bi tirkî ve hatiye wergerandin. Di gel pêşeka weşanxaneyê, pêşgotina Şukriye Resûlê ya ji bo soranî û pêşgotina Rudenkoyê ya ji bo wergera rûsî û her wiha jêrenotên wê yên rûsî jî hatine wergerandin.

9. Di Berhemê de Folklor

Zanista folklorê li gor rêbazên xwe li ser çanda madî û menewî ya gelêrî lêkolînê dike, çavkaniyan berhev dike, dabeş dike, şîrove dike û dinirxîne. Peyva folklorê peyveke hevedudanî ye. Ango ji du bêjeyan pêk tê ku folk di wateya gel de û lore jî di wateya zanist an jî lêkolînê de ye.³²⁴ Bi kurdî tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel. Di zaravayên kurdî de ji bo zanista folklorê bi kurmancî “zargotin/zanista gel”, bi soranî “xelknasî” û bi zazakî “zanistiya şarî” tê gotin. Bi osmaniya berê jî wek “xalqiyat” û “hikmetî awam” dihat binavkirin. Ev têgeh di nivê duduyan ê sedsala XIXan pê ve wek têgeheke navneteweyî kete nav gelek zimanan. Bi almanî “die folklore”, bi fransî “le folklore”, bi îtalyanî “il folklore”, bi îspanyolî “el folklore” û hwd e. Ev têgeh di serî de tenê ji bo navê materyalan dihate bikaranîn, piştra ji bo navê vê disiplînê hate bikaranîn.³²⁵

Bi kurtasî folklor ji zayinê heta mirinê, hemû hêmanên çanda maddî-menewî yên di jiyana mirovan de, bi awayekî zanistî berhev dike, li ser wan lêkolînan dike, wan dinirxîne, şîrove dike û bi vî rengî pêşketina çanda gel nîşan dide û cudahî û hevbeşiyên di navbera vê çandê û yên din de dibîne.³²⁶

‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye jî bi naveroka xwe ve ji serî heya binî hemû jiyana kurdan anga ji zayinê heta mirinê, ji şahî heta şînê, ji şer heta silhê, ji leyistikê heya alav û hacetên di nav malê de hemû hêl û babetên jiyana kurdan di xwe de dihebîne. Loma ji bo folklorê kurdî berhemeke dewlemend e. Nivîskar dema qala meseleyekê dike ji biwêj, gotinên pêşiyar, çîrokan, serpêhatiyar gelekî îstifade dike. Lewra bi wan îfadeyan mirov bi hêsanî dikare merema dilê xwe bîne ziman.

³²⁴ Arnold van Gennep, *Folklor*, wer. Pertev N. Boratav, Weşanên Tarih Vakfî, İstanbul, 2011, r. 151.

³²⁵ Kadri Yıldırım - Ramazan Pertev - Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2013, r. 11.

³²⁶ Erman Artun, *Türk Halkbilimi*, ç. 6., Kitabevi Yayınları, İstanbul, 2010, r. 16.

10. Naveroka Berhemê

Mela Mehmûd risaleya xwe *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye* li ser edet û kevneşopiyên kurdan nivîsandiye. Bi kurtasî qala edet, bawerî, xûy, kevneşopî, dawet, leyistik, dengbêjî, şîn, şayî, şer, dew, xwarin, vexwarin, rabûn, rûniştin, mêvandarî, rêwîti, axa, eşîr, kurmanc, goran, nimêj, zikat, mizgeft ango hemû jiyana rojane kiriye. Lê Mela Mehmûd bi piranî li ser kurdên koçer, eşîran sekiniye, lê carna ji bo berawirdkirinê behsa kurdên xwecih jî dike. Mela Mehmûd wekî dîrokzanekî pispor beriya her tiştî bi eslê kurdan dest bi kitêba xwe dike, lê di vê beşê de kurdan –peyva kurmanc 2 caran, kurd 3 caran û pirjimara wê ya di forma erebî de ekrad jî 209 caran derbas dibe- ne wekî miletekî bi serê xwe wekî milekî ji ereban dihesibîne û destnîşan dike ku hinek eşîrên ereb ji warên xwe koç kirine hatine ser sînorên Îran, Xorosanê. Bi rastî ev fikr divê bê nirxandin û rexnekirin, li ser vê fikra wî gelek rexne hatine kirin û loma em jî bi taybetî li ser vê babetê rawestiyan. Peyra qala navê Kurdistanê dike –peyva Kurdistanê 8 caran derbas dibe- ka di pêvajoya dîrokê de çawa derketiye holê. Her wiha behsa zimanê kurdî dike –ku peyva kurdî û kurmancî her yek carekê derbas dibin-, helbet li vir jî Mela Mehmûd zimanê kurdî wekî zimanekî têkilhev dide nasîn û li gor wî kurdî bi tevlihevbûna zimanên erebî û îranî pêk hatiye. Jixwe heke li gor angaştaya wî ya derheqê eslê kurdan vê nebêje wê hingê nakokiyê derkeve holê. Lê ev angaştên wî hemû divê li gor demê û nêrîna zanayên wê heyamê ya li ser millet, ziman û dîrokê bîn nirxandin. Lewra ev nêrîn di nav piraniya çavkaniyên dîrokî de ji bo gelek miletan tê dîtîn. Milletê ereb, tirk, fars jî ji wan miletan in. Piştî wê behsa pergala eşîran dike û balê dikşîne çawa têkiliyeke xurt di navbera efradên eşîran de hene, heya heft bavên kesên ji eşîrekê zef nêzîkî hevdu ne, di dew û dozên şer û kuştinê de piştgirîya hevdu dikin û li hember neyarên xwe bi baldarî tevdigerin. Jixwe ev edet îro jî pir girîng e û divê kurd navê heft bavên xwe bizanibin. Lêbelê kêmasiya pirtûkê ew e ku mijar bi pergala di cihekî de nehatine dayîn, di pirtûkê de di gelek cihan de qala jinên kurd tê kirin, ango nivîskar li cihekî tenê behsa rola wana di civakê de, tesîra wan a di malê de nake, lê li cihekî behsa jêhatîbûna wan dike, tu lê dinihêrî deh rûpel şûnda dîsa qala alîkariya wan ji bo mêran dike. Her wiha di gelek cihan de berbelav qala şervanî û şerê kurdan dike. Ev yeka kêmasiya berhemê ye, wisa tê xuyanê ku nivîskar dema berhema xwe amade kiriye ji bo pergala û rêkûpêkiya berhemê nexebitiye, lê di kîjan hevok û paragrafê de hatibe bîrê bêyî ku li mijar û peywendê binihêre qala kurdan kiriye. Loma di tertîba

mijaran de tevlihevî û dubarekirin hene. Lêbelê ev kêmasiya rêzkirina mijaran tu tiştî ji girîngiya naveroka wê kêm nake.

Ji hêla din ve heke em mijarên di pirtûkê de hatine nirxandin rêz bikin, naverokeke bi vî rengî derdikeve pêşberî me: Eslê kurdan û ji ku hatine warê xwe yê niha, peyva Kurdistanê, bingeha peyva kurd çî ye û tê çî meneyê, zimanê kurdî di kîjan pêvajoyê de derketiye holê, ji kîjan zimanan derketiye, têkiliya di navbera eşîrên kurdan de û sinifên gel ku wekî axa, beg, kurmanc, goran tasnîfbûna wan, mijara xweavêtina ber bextê kesekî, bi piçûkî zewicandina zarokan, berdêlî, wextê dewetan, çûyîna warkoz û zomê, kar û barên ji bo şer tên kirin, defa hewarê, şer û rêbazên wê, şervaniya jinan, namûs û serbestiya jinan, keda wan ya di malê de, şeklê barkirina malan ya ji zozanan, parastina zomê, mêvandarî, dîwanxaneyên wan, melayên kurdan, karê wanê di nav civakê de, mirîşûştin, reşgirêdan, şîn, neyartiya kurdan, di heyama şer de navçîtiya jin û melayan, keçrevandin, neheqîya li jinan, baweriya kurdan, merhemeta kurdan, tîrsa ji nexweşiyê, nezer, mêrxasiya kurdan, mirina di şer de û şerma mezin ku mirov ji şer bireve, di nav civakê de qiymeta jinan, hin edetên wanê balkêş, nezer, şopgerîn, jina tê ser pîrekên nûwelidî, şîretên kal û pîran, li ber serdestan serîtewandina kurdan, şêkirandina qenciyan, mêraniya kurdan, hespên kurdan, qiymeta hespan ya di nav wan de, çekên wan ên şer, li cem wan pere, perwerdeya qîzan û hinek bîr û baweriyên jinên kurdan, dermanê nezerê, baweriya wan a bi Xwedê, zarokên nûbûyî, jin, dayîna mewlûd û ziyafetê, keçxwestin, qelend, xelatên dawetê, şahî û xwarinên dawetan, bûk, berbûk, gerdek, kirîvatî, sinnetkirina zarokan, perwerdeya zarokan, medreseyan kurdan, pergala û mufredata derse, hurmeta ji seyda û melayan re, mêvanhebîniya koçeran, mizgeft û fonksiyonên wê, mêvandariya kurmancên herêma Serhedê; Wan, Mûş û Bazîdê, şefqeta wan, baweriya bêyomiya hin tiştan, diyarkirina dem û danên salê; pîrê, xidirnebî, xwarinên wan, poxîn, eyd û erefatên wan, têkiliya wan ya bi fileyan re, hêksor, kafirkûr, çûyîna li ser ciyên wekî ziyaret û bi teberik tên zanîn, çîrokeke balkêş Rabo û kurê wê Kelho, xisusiyetên kurdan, pisporên mak û berxên wan, se, hesp, serdestiya axayan, şerê di navbera wan de, sondxwarin, jinên kurdan, sertiya kurdên Botan, Hekariyê û heyfhistandina wan, qaydên şerên wan, girîngiya çek û sîlahên wan, mercgirtin, lîstikên di nav wan de; setrenc, tame, çînaq, asta zanînan zimanên farisî, tirkî, bazirganî, selef, awayê bazarkirinan, kirîn û firotina hogeçan, rêveberiya axayan, perwerdeya leşkerî, hesabên wan ên tarîxê, beranberdan, serêpêz, zayîna pêz, mektûbnivîsîna wan, tiştên bêoxir û bioxir, edetên zewacê û melayên wan, binavkirina merivan, navikbirîna zarokan, welidîn û bûyîn, heyfhistandin, xweparastin, şêxên kurdan, ji bo bav, bira û

lawan xwequrbandkirina jinan, nezr û ehdên ji bo şifaya nexweşan, jin û jiyana û azadiya wan ya di civakê de, malê weqfan û tevgera kurdan ya di vî warî de, namûs, baweriyên betal, karên xirab yê wekî lîwatayê, çêr, hin awayên xwexemilandinê, hinne û kil, halêhevpirsîna wan û bawerîya bi hekîman, bi nan sondxwarin, jiyana wan ya demasala zivistanê, têkiliya kurd û fileyan, neheqîya ku koçer li gundî û xwecihan dikan, ji dîroka rojane serdema Siltan 'Ebdulmecîd, têkiliya koçer û xweciyana, cudahiya di navbera jinên koçer û jinên xwecih, li xeribiyê kurd, hîle, dek û rêbirîya koçeran, zikatdayîna kurdan, konên wan, sinnetkirin, berber û cerahên kurdan, alavên ronîkirinê şemal û çira, girêdana zava, hostatiya cilên şer, hînkirina çekbikaranînê, lawîjbêjî, cirîd, teşîrêsi, bindarûk, şevbihêrk, dawet, mezhebê kurdan, cindar, pîldar, jinên tasnêr, efsûnger, kevirî, begzade, êzdî û stêrknasiya kurdan.

Li gor vê listeya naverokê çend xalên sereke yê ku nivîskar di gelek cihan de dubare kirine hene û ev jî evna ne:

a) Şervaniya jinan, namûs û serbestiya jinan, keda wan ya di malê de, di heyama şer de navçîtiya jin û melayan, keçrevandin, neheqîya li jinan, di nav civakê de qiymeta jinan, jina tê ser pîrekên nûwelidî, şîretên kal û pîran, perwerdeya qîzan û hinek bîr û baweriyên jinên kurdan, nezr û ehdên ji bo şifaya nexweşan, jin û jiyana û azadiya wan ya di civakê de, cudahiya di navbera jinên koçer û jinên xwecih, jinên tasnêr, efsûnger.

b) Kar û barên ji bo şer tînin kirin, defa hewarê, şer û rêbazên wê, şervaniya jinan, di heyama şer de navçîtiya jin û melayan, mirina di şer de û şerma mezin ku mirov ji şer bireve, çekên wan ên şer, şerê di navbera wan de, qaydên şerên wan, girîngiya çek û sîlahên wan, hostatiya cilên şer, hînkirina çekbikaranînê.

Wekî tê xuyan di pirtûkê de ev herdu mijar jin û şer û her wiha bûyer, edet, bawerî û karên bi wan re eleqedar seranserê xebatê bi awayekî ji hevdu cuda hatine nirxandin. Loma gava meriv pirtûkê dixwîne hesta bêpergaliya nirxandina mijaran çêdibe. Sedema wê jî dubarebûna ev mijarê û çend mijarên din e. Li vir emê qala mijarên sereke yê kitêbê bikin.

10.1. Eslê Kurdan

Mela Mehmûd beriya her tiştî bi eslê kurdan dest bi kitêba xwe dike. Nivîskar di vê beşê de kurdan ne wekî miletekî bi serê xwe, lê wekî milekî ji ereban dihesibîne û destnîşan dike ku hinek eşîrên ereb ji warên xwe koç kirine û hatine ser sînorên Îran, Xorosanê û bi vî awayî kurd derketine holê.

“Emma be‘d, me‘lûmê cenabêd talib û naziran bibitin ku ev tewayifêd ekradan ji tewayifêd e‘rabêd bedewiyêd berê ne ku zemanê mađiyê da ji wan tayifêd e‘raban miqdarek cida bûyine û bi van kenaran da be ‘iyal û eţfal hatîne û hemû qebîleyek bûne. Ê berê lisanê wanî jî bil‘umûm zimanê ‘erebî bûne û yek tayife bûne. Heta wî zemanî lefzê Kurdîstan tunebûye. Paşê wekû hatîne van eţrafêd xalî û sînorêd Îran û Xoresanê.”³²⁷

10.2. Zimanê Kurdan

Di *Adat û Rusûmatname‘ê Ekradiye* de Bazîdî zimanê kurdî wekî zimanekî têkilhev dide nîşan. Ji ber ku beşên borî de em li ser vê nêrîna nivîskar sekinin, emê mijarê kurt bibirin:

“Ê lefzê kurd û ekrad eslê wê girde yanê berhev û cem‘kirîn bi wê minasebetê ku ew e‘rab bûyine cîranê Îran û Fars û Xoresanê êdî ji lisanêd wan tayifan yeko yeko berhev û cem‘ û exz kirîne û hêdî hêdî zimanêd xoy qedîm ku ‘erebî ye terikandîne. Ê bi mirûrê zeman û borîna eyyamê, bûyine hinde ‘eşayir û qebayil û tayife.

Ev navê wan ku maye kurd û ekrad, ev sebeb e ku zimanê berhev yanê meglûtî ye, yanê girdkerde ye ji faris û îraniyan. Îcarê ev tayifene ji eţrafan bi navê kurd û ekrad hatîne navdanê û bûyine miletekî me‘lûm.”³²⁸

Wekî me di beşa derbasbûyî de behs kir Mela Mehmûd çawa ku kurdan ji eşîrên ereban dihesibîne, zimanê kurdî jî wekî zimanekî têkilhev dide nasîn û li gor wî kurdî bi tevlihevbûna zimanên erebî û îranî pêk hatiye.

10.3. Biwêjên Kurdî û Çîrokên Wan

Di zanista ziman de ji gotin û komegotinên bi awayekî wêjeyî û bi aheng qala tişteki dikin re biwêj/îdyom tê gotin. Biwêj ji bilî wateya xwe ya rastî bi mecazî meseleyan rave dikin. Loma di nav hemû hêlên civakê de bi awayekî berbelav tèn emilandin.

Mela Mehmûd qala hin bawerî û edetên kurdan dike, hinek kirin û tevgerên kurdan neqil dike, lê gava mirov îro li wan meseleyan dinihêre derdikeve holê ku îro ew wekî biwêj tèn bikaranîn û pîraniya civakê jî bêtî ku li ser paşxaneyê wan bifikire, li wateya wan a ferhengî binihêre di meneya mecazî de fehm dike. Lêbelê ya rastî wekî di

³²⁷ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 202.

³²⁸ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 200, 201.

vê pirtûkê de jî derdikeve holê ji wan hinek paşmayiyên erf û edetên kurdan in û emê divê beşê de behsa wan bikin.

10.3.1. Li Dorê Gerîn

Bi rastî di vê berhemê de jêder û çîroka çend biwêjên îro jî li herêma Serhedê tên bikaranîn bi awayekî eşkere tê peydakirin. Li hêla Serhedê, dema mezin li ber zarokên xwe digerin, bi wan re şa dibin, dê û xwîşkên ku ji bo zarok û birayên xwe yên nexweş dua û lavayan dikin, li ber dilê wan ve tî dibêjin: “Ez li dora te bigerim.” Di *‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* de jêdera vê gotinê û tiştên ji vê baweriyê re bûne bingeş derdikeve holê.

“Û ‘adetekî dinê jî li nik ekradan heye meşela wekû mirofêkî ciwan ‘ezîzê wan wekû nexweş dibitin û nexweşiya wî zêde şiddet dikitin yanê di dereca mirinê dibitin û ji xo bêxeber dibitin ku her kes goya hêviya jînê ji wî mirofî dibirîn, meşela eger jîn weyaxo xoh û keçekî wî mirofî ciwan hebe weyaxo da hebe ev jinine ku xo û keç û da û jîn bitin yek ji wan ku zêde meyla wî nexweşî heye, îcarê ew jinik radibitin di nêva wê meclisê da sê caran li dora wî nexweşî diziviritin û dibêjîtin ku min canê xo fedayî vî filankesî kir, hûn şahid bin ku bilanî Xudê te‘ala heyatê bidite vî nexweşî, herçî qeda û belaya wî heye bilanî bête min. Eger ‘emrê min hebe min bi riça xo bexşî vî mirofî. Eger merga wî hebe bilanî ew merg bête min. Ew jinik sê caran li dora wî nexweşî dizivire wiha dibêjîtin. Carnan teşadif dikitin ku bi emrê Xudê te‘ala ew mirofê nexweş ecel nehatiye paşê şifayê dibînitin û ew jinik ku wiha ev ‘ehde kiriye bi emrê Xudê nexweş dikevitin û fewt dibitin. Lakin ev ‘adete mexşûş e bi jinan ku der heqê mêr û bira û kurêd xo da nî dikin, lakin jîn ji boy jinan û mêr ji boy mêran nakin.”³²⁹

Li gor vê baweriyê gava ew dayik û yan xwîşk li dora wî kesî bigere –ku tu carê ev ne jin û keç e; kur, bira, bav û yan jî mêr e- ji Xwedê re lava û dua bike, ew nexweşî diçe wê kesa li dora wî digere û kesê nexweş ji wê nexweşiyê difilite. Lê ev bawerî û kirin îro di nav gel de bûye biwêj, wateya jêhezkirin û berketinê dide. Dê û xwîşk, ango jin ji bo mêran dibêjin ‘ez li dora te bigerim’.

10.3.2. Ketina Çînaqê

Wekî din gava du meriv li ser meseleyekê li hevdu nekin, têkevîne nîqaşê û yan bibezine hevdu, ji wan re tê gotin: “Hûn çima dikevîne çînaqê?” Di *‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiyeyê* de jêdera vê biwêjê jî heye.

³²⁹ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 117, 118, 119.

“Dibe ku bê leyz şert digirîn ew jî şertê me‘lûme dibitin meşela hesp û diyafet û fillan tişt û dilxwaz jî dibitin. Ev şerta jî wisan e ku di sîngê meşela kew û dîk û teyran da cinaq heye, tînin ewê cinaqê du mirof dikêşîn û dişkênîn.”³³⁰

Ev biwêj ji lîstikeke ku berê di nav kurdan de hebûye maye. Di vê lîstikê de du meriv hestiyekî sîngê kewa, dîkan yan jî teyran yê du nikul heye tînin, ango ew hestî mîna heçî ye û du çetel e, her yek bi aliyekî wê de digre ber bi xwe ve kaş dike. Hestî di destê kê de bişkê ewê din jê dibe. A ev gotina li ser vê lîstikê îro di nav kurmancan de bûye biwêj û ji bo bigirveş û nakokiyên bi mecazî tê bikaranîn.

10.3.3. Li Pîl Nihêrîn

Di nav gel de dema merivek hay ji tişteki tunebe, di heqê meseleyekê de bibêje xebera min pê tune ye, ez mezûr im, bêguneh im, ji bo parastina xwe dibêje: “Çima min pîlê xwe bîn kiriye û min destê xwe bîn kiriye û yan jî min li pîlê xwe nihêriye?” Bingeha vê gotinê ev kirin û bawerî ye; dema zarokê dibe hê beriya dayika wî bimêjîne, pîlê karekê tînin kun/qul dikin û serê çîçîkê dayikê ji wê kunê re derdixin û zarok wisa şîr dimêje. Vê yekê heya ku zarok şîrvedibe berdewam dikin. Dema zarok mezin dibe jî wî pîlê herdem bi xwe re digirîne. Gava hewcedariya wî bi tişteki veşartî, xeybî hebe di wê qulê de dinihêre û qaşo rastiyê dibîne. Di *‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayîfê Ekradiyeyê* de wiha qala vê tê kirin:

“Li nik ekradan pîldar dibin. Lakin ev pîldarî ji zarotiyê da goya îcad dikin. Meşela wekû jinekî hamile meram dikitin ku ewe hemla ku dibitin bilanî pîldar bîtin, weqtê ku ew zarok diwelide filhal karekê tînin. Serjê dikin û goştê wê belav dikin. Lakin pîlê wê bidertînin û tînin kun dikin bi qederê serê çîçîkê dayê û serê çîçîkê ji wî pîlê bidertînin û memikê ji wî kunê didine wî zarokî. Da’îm wiha nî çîçîkê di wê kuna pîlê da nî didine wî zarokî. Eşla bê pîlê çîçîkê nadine wî zarokî heta ku ew zarok ji çîçîkê tête birîn. Wekû ew zarok ji çîçîkê hate birîn êdî rojê du caran şubeh û êvaran tînin û ewî pîlê didine destê wî zarokî li wî pîlê nezer dikitin. Wiha heta ew zarok digihite dereca ‘eql û kemalê. Wekû ew zarok gihaye derk û îdrakê îcarê goya ew zarok li wî pîlê nezer dikitin herçî mirad û hewadiş li dinyayê peyda bibin ew mirof li wî pîlê da dibîne û neql dikitin. Lakin ew şert heye ku qeş rojekê ew pîl nehatibe terikandîn.”³³¹

Ev yeka îro di nav kurdan de tenê wekî gotin heye. Lê sebebê wê hatiye jibîrkirin, tenê peyv maye. Ev jî bingeha wê gotinê ye îro wekî biwêj tê emilandin.

³³⁰ H. b. r. 132.

³³¹ H. b. r. 77, 78.

10.4. Gotinên Pêşiyay

Gotinên pêşiyay wekî ji wateya wê jî tê fehmkirin ew gotin in ku di demên borî de piştî tecrûbeyeke dûr û dirêj di nav gel de hatine gotin, pê şîret li mirovan tê kirin, bi hevokên kurtê bi aheng agahî tê dayîn. Ji ber vê hindê gotinên pêşiyay seba naskirina civakê, tecrûbeyan, ji bûyer û meseleyan ders hildanê nîrxên hêja ne.

Mela Mehmûd di kitêba xwe de pir hindik be jî carna gotinên pêşiyay bi kar anîne. Lewra hinek caran hin tiştên divê mirov bi axaftin an jî nivîsên dûr û dirêj qala wê bike bi gotineke pêşiyay bi rehetî vedibêje û armanc hasil dibe û hevdu serwext dike. Emê di vê beşê de li ser wan bisekinin.

10.4.1. Şerê Kopekan li Ser Dêlan in

Di *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye* ji gotinên pêşiyay “Şerê kopekan li ser dêlan in” dema qala şerên kurdan tê kirin derbas dibe. Nivîskar li vir çaxê qala şerê kurdan dike balê dikşîne ser awayê şerê wan dike û dibêje dema neyar li ser zomeyên wan de digrin ewna mêr û jin bi tevayî çî bikeve destan hildidin û bi wan re şer dikin, her wiha jin jî histûnên kona ji ber dikşînin û piştî zilaman dikin û wiha dibêje:

“Yanê wekû şerekî wiha li ser malêd ekradan biqewimîn, jîn û mêr şerî dikin. Û eger şayed hezar siwarêd dijminan bêne ser çil pence malêd ekradan dîsanê qadir nabin ku ewan belav bikin. Lewranê di nêva ekradan eve meşelekî meşhûr e ku şerê kopekan li ser dêlan in.”³³²

Bi vê gotina pêşiyay balê dikşîne ku ji sedemên şer yek jî jin in. Lê divê ev wekî teşbîhekê were qebûlkirin û rasterast wateya wê neyê hildan. Lewra heke wisa bê kirin meseleyê ji mijara xwe ya esasî dûr bikeve. Ji hêla din ve dema meriv cihê lê ev gotina pêşiyay hatiye bikaranîn dinihêre derdikeve holê ku ev gotin li cihê wê nehatiye bicihkirin. Lewra li vir qala sedema şer nayê kirin, tenê tê gotin ku jin jî li gel mêran tevî şer dibin, tên kuştin û birîndar dibin. Heke li vir gotineke pêşiyay bê gotin divê gotina “Şêr şêr e, çî jin e çî mêr e” bihata gotin.

10.4.2. Mirîn Riya Me Hemûyan e

Nivîskar dema qala mirinê dike behsa edetên kurdan yên di vî warî de jî dike. Li gor wê çaxê merivek dimre heke ciwan be şîn zêde tê girtin, çekên reş tên lixwekirin û reş tê girêdidin û jin, keç û xwîşk kezî û guliyên xwe kur dikin. Heke kesê mirî mêr be û

³³² H. b. r. 192.

xweyîhesp, çek û taxim be hespê wî dixemilînin çek û sîlahên wî li ser hespê girêdidin û hespê li pêşiya cenaze destkêş dikin. Jin, keç, dayik û xwîşkên wî dilok û lawijan dibêjin û bi şîn û girî wî dibin çal dikin. Wan jinên ku guliyên xwe birîne, wan guliyên li ser qebra wî miriyî li kêlên wî dialînin. Heta panzde rojan sibeh û êvaran jin û mêr û cîran têne ziyareta qebra wî, li ser dixwînin û digrîn, sedeqe û xêran didin. Heke kesê mirî mêr be, kinceka wî ya beqîmet mesela qapût û kurk yan jî şalê biha hebe wê diavêjine ser cenazeyê wî. Lê heke jin be, dîsa kinceka wê ya biqîmet diavêjine ser cenazeyê wê û dibine qebrê.

Piştî wê heta sê rojan zad û xwarin li mala mirî nayê çêkirin, cîran xwarinê tînin. Dema heft roj ku tamam bûn, cîran kincên mirî dişon û didine jar û feqîran. Gava bîst rojên mirî tamam bûn mala wî helaw û zad çêdikin gazî cîran û gundiyan dikin û bi xêra mirî didine xwarin û belav dikin. Malbata mirî heta şeş mehan yan salekê reş li xwe dikin û heta ji şînê dernekevin naçine dawet û şahiyên. Gava dema hiznê tamam bû, axayên wan yan jî cîran û xizmekî wan ji bo her kesekî mirî li gorî halê xwe tişteki tîne û reşên wan hildigre û ji şînê derdikevin. Mela Mehmûd piştî ku bi hûrgilî qala van merasim û edetan dike wiha dinivîse:

“Lakin eger ew meyit begzade weyaxo ağa û mirofeki kivş bûya, elbette paşî panzde rojan hakimê wî welatî xelatek hadir dikirîn û dişande pey warişê meyitî û tînane hiqûra xo û digotîne: “Emrê Xudê ye, bilanî tu xweş bî, mirîn riya me hemûyan e!” Ew xelat li wî warişî dikirîn û ji reşê biderdanîn.”³³³

Bi vê gotinê ve li ber dilê malbata kesê mirî de tîn û rastiyeke heyatê dixine bîra wan ku evê bê serê her kesî û ew jî rêwiyên riya mirinê ne. Vê jî bi vê gotina pêşiyên “Mirîn riya me hemûyan e” tînin ziman.

10.4.3. Hekîm Xudê ye, Derd û Derman Herdu jî ji Nik Wî ne

Nivîskar di pirtûka xwe de behsa baweriyên kurdan yên betal û bêbingeh dike û dibêje bi fal, minecim û hinek tiştan wekî wan bawer dikin û hinekan qenc/se‘d û hinekan jî şom/bêoxir dizanin. Her wiha bi nusxe û nivîştan bawer dikin. Li gor nivîskar ecnebî çawa ku bê hekîm nabin, ew jî bê nusxe û nivîşt nabin. Herçî îllet, derd dibe bila bibe nivîştan dikin. Ji bo bawerîya wan a di warê nexweşiyên de diyar bike wiha dinivîse û vê gotinê neqil dike: “Lakin î‘tiqada wan bi hekîman nînin û guhdariya hekîman nakin. Ew dibêjin hekîm Xudê ye, derd û derman herdu jî ji nik wî ne.”³³⁴

³³³ H. b. r. 183.

³³⁴ H. b. r. 178.

Ev tiştên nivîskar qal dike bi giştî rast in, lê ew nayê wê meneyê ku kurd bi hekîman bawer nakin, heta gelek hekîm û dermanên kurancî di nav kurdan de hene. Heta ew bi xwe jî di heman pirtûkê de qala vê yeke dike:

“Lakin ekrad guh nadine hekîman ew dibêjin eger bi rastî hekîm e bilanî berê nî çareyê li xo bikitin ku ew nexweş nebitin. Mereqî Xudê te‘ala diditin şafi û hekîm mutleq her cenab Xudê te‘ala ye. Lakin dîsanê hindêk pîrejîn li nav wan dibin ku dermanin cuzwî li wan nexweşan dikan.”³³⁵

Wekî vê li hin cihên din jî qala perjinên hekîm, yê jinan didine welidandin û efsûnger jî dike. Jixwe hekîmiya di nav kurdan de ji ber zêdebûna şerên wan jî pêwîstiyê sereke bû û wan cerahên wan bi xwe birîndar û nexweş derman dikirin. “Lakin cerrahîne qewî qenc ji wan peyda dibin lewranê dayim şolêd wan birîndarbûn e.”³³⁶

10.5. Dua û Nifir

Wekî hêmaneke folklorê di ‘*Adat û Rusûmatnaeê Ekradiye* de dua û nifir jî hene. Dua ew gotin in ku ji bo qencî û xêra kes û koman tê kirin, nifir jî ew dua ye ku ji bo xirabî bê sere merivan tê kirin. Ev cure peyv di hemû civakan de pir û yan jî hindik hene. Lê tiştêkî balkêş e di vê risaleyê de nifir tunene, loma emê çend duayan neqil bikin.

10.5.1. Bismillahirrehmanirrehîm

Mela Mehmûd wekî uslûbeke Îslamî dema dest bi risaleya xwe dike bi navê Xwedê “Bismillahirrehmanirrehîm”ê dest pê dike ku jê re “besmele” tê gotin û ev ji duayên sereke ye gava ku misliman dest bi karekî qenc dikan bi vî duayî dest pê dikan. Lewra Hz. Mihemmed di hedîseke xwe de dibêje: “Çi karê bi xêr yê bi bismillahirrehmanirrehîmê dest pê neke bê bereket/bê encam e.”³³⁷ Jixwe gelek klasîkên kurdî jî bi navê Xwedê dest pê dikan, bo mînak *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî wiha dest pê dike:

“Sernameê name namê Ellah
Bê namê wî natemam e wellah”³³⁸

³³⁵ H. b. r. 109.

³³⁶ H. b. r. 88.

³³⁷ İbrahim Canan, *Hadis Ansiklopedisi -Kütüb-i Sitte-*, c. 8, Zaman, İstanbul, tarîx tune, r. 362.

³³⁸ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, Nûbihar, Stenbol, 2010, r. 15.

Her wiha Ehmedê Xasî (1867-1951) wiha dest bi *Mewlûdê Nebî* ya zazakî dike:

“Ez bi bîsmîllahî îbtîda kena,
Raziqê ‘aman û xasan pîya kena.

Rebbî, hemd û şukrî ancax to rê bê.
Kîbr û medh û fexrî pêro to rê bê.”³³⁹

Jixwe Qur’an jî bi navê Xwedê dest pê dike û ji bilî sûretê Tewbeyê hemû sûreyên Qur’anê ku bi vê hevokê dest pê dikin.

10.5.2. Elhemdu Lîllahî Rebbîl ‘Alemîn

Wekî duayê besmeleyê hevoka pey wê re duayê hemda ji Xwedê re ye “elhemdu lîllahî rebbîl ‘alemîn” e û di lîteratura Îslamê de jê re temhîd tê gotin. Ev uslûb jî di berhemên klasîk de hatiye bikaranîn. Bi taybetî mewlûdên hatine nivîsîn bi vê duayê dest pê dikin û bo mînak Mela Huseynê Bateyî wiha dest bi mewlûda xwe ya meşhûr dike:

“Hemdê bêhed bo Xwedayê ‘alemîn
Ew Xwedayê daye me dînê mubîn”³⁴⁰

10.5.3. Wesselatu ‘Ela Muhammedîn We Alîhî Ecme‘în

Hevoka sisyan ya wekî dua bê qebûlkirin jî ev hevoka “weşşelatu ‘ela Muhammedîn we alîhî ecme‘în.”³⁴¹ e û jê re di lîteratura Îslamî de selewat tê gotin û bi wî awayî selam ji Hz. Mihemmed, malbata wî û eshabên wî re tê şandin. Wekî li jor jî hat qalkirin ev hersê hevokên duayê yên erebî di berhemên klasîk de tînan bikaranîn û bi niyeta dua û lavayê tînan gotin. Şerefyanê Bedlîsî jî dema dest bi *Şerefnameyê* dike bi van

³³⁹ Ehmedê Xasî, *Mewlidê Kirdî*, Amadekar û Tadayîş: Roşan Lezgîn, Nûbihar, Stenbol, 2013, r. 11.

³⁴⁰ M. Xalid Sadînî, *Mela Huseynê Bateyî -Jiyan, Berhem û Helbestên Wî-*, Nûbihar, Stenbol, 2010, r. 175.

³⁴¹ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 202.

hersî hevokan dest pê dike: “Bismîllahîrrehmanîrrehîm. Hemdê bêhed û pesnê bê‘eded ji boy Xudayê bêheval. Û selat û selamêd bêhejmar li zatê Resûlê Muxtar.”³⁴²

Nivîskar Mela Mehmûd jî bi wê perwerdeyê gihîştîye û ev berhema xwe wisa daye destpêkirin.

10.5.4. Dame ‘Edluhû

Bi rastî ev gotin wekî duayeke tam nebe jî gava Mela Mehmûd qala Siltan ‘Ebdulmecîd Xanê Osmanî dike dibêje bi saya artêşa wî ava kiriye, ew neheqî û zilma ekradan li merivên belengaz fikir nema û wiha dibêje: “Lakin di eyyamê xilafeta Siltan ‘Ebdulmecîd Xan dame ‘edluhû wekû îcada ‘Esakirî Nizamiye bûyî êdî roj bi rojê ekrad bertêref bûyn û zîlm û te‘daya wan zayil bûyî.”³⁴³

Bi vê îfadeya erebî jê re dua dike û dibêje bila edaleta wî dewam bike, her hebe. Wekî tê xuyanê Mela Mehmûd di vê risaleya xwe de cih nedaye duayên kurmancî tenê evnê erebî bi kar anîne.

10.6. Bîr û Baweriya Kurdan

10.6.1. Dîn û Mezheb

Nivîskar çawa ku bi giştî qala hemû hêlên civaka kurdan dike her wisa qala bîr û baweriya wan jî dike. Li gor wî kurd misliman in, bi mezheb jî şafiî ne, heta wisa bi îdia ye ku dibêje di nav wan de ji mezhebên henefî, malikî û henbelî jî kes tune, jixwe qet behsa mezhebê şîî û elewiyan nake. “Ekrad herçî heyin rewend û xwecihî hemû jî şafi‘î el mezheb in. Di nêva wan da nî ferdekî jî xenefî û malikî û henbelî tunîn.”³⁴⁴

Lêbelê di pêşgotina pirtûka wî ya *Bazîdî Tewarîxî Cedîdî Kurdistanê* de qala elewiyan jî tê kirin û derheqê cih û warê wan de agahî tê dayîn.

“Xeyset û adetên hemû êlên Kurdan ne mîna hev in, nexasim Kurdên Dêrsimê ku bi mezhebê xwe Qizilbaş û Elewî ne, cuda ne. Kurdên li herêmên nêzikî sînûr, ji Qersê û Çaldêranê heya Diyarbekirê, Mûsilê, Şarezorê û Bexdê dimînin -bajarî jî, koçer jî- hemû li ser mezhebê şafi‘î ne û tu mezhebên din caran nas nekirine.”³⁴⁵

Ji hêla din ve Bazîdî bi taybetî qala êzdiyan dike, dibêje li Kurdistanê ji îblîs re îbadet dikin, zimanê wan kurdî ye, lê urf û edetên wan jî yên kurdan cuda ye.

³⁴² *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî, Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Twijandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007.*

³⁴³ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 102

³⁴⁴ H. b. r. 79.

³⁴⁵ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 222, 223.

“Û li Kurdistanê ji ekra dan tayifa êzîdyan jî heyin ku misilman nînin yezîdî ne. Resm û ayin û erkanêd wan jî cida ne. Ew tayife be iblîsî diperisin û dibêjin şeytanî Melek Ƨawûs. Lakin zimanêd wan jî kurdî ne. Eger behsa wan jî temama bikim êdî ev rîsale dirêj dibitin ev qeder jî bes e.”³⁴⁶

Bi rastî her çendî Bazîdî wisa bibêje jî edetên hemû kurdan dişibin hevdu, lê ji hêla îtîqadê ve di navbera wan de ferq heye.

10.6.2. Îbadet û Taet

Çawa ku Bazîdî li ser baweriya wan disekine –ev pir hindik e- her wisa çaxê gotin tê ser gotinê qala nimêja wan, zikatdayîna wan û rojiya wan jî dike. Lê ev agahiyên sethî ne, bêyî hûrgilî dibêje û derbas dibe. Wisa tê xuyanê naxwaze risaleya wî dirêj bibe. Lewra dema qala baweriya êzîdyan dike vê dibêje: “Ew tayife be iblîsî diperisin û dibêjin şeytanî Melek Ƨawûs. Lakin zimanêd wan jî kurdî ne. Eger behsa wan jî temama bikim êdî ev risale dirêj dibitin ev qeder jî bes e.”³⁴⁷

Diyar e vê ji bo bawerî, resm, ayîn û erkanên Îslamê jî difikire û bi taybetî jî qala îbadet û taetên wan nake, lê dema qala tiştekî dike di wê navberê de behsa wan dike: “...Û ew mirofêd jar û feqîr in qeweta maliye tunînin, ew jî di riya Xudê da rojî û nimêjê û xitma Qur’anê nezr û ‘ehd dîkin paşê ‘ehda xo bi cih tînin.”³⁴⁸ Li vê derê behsa nezra wan dike û dibêje kesên xwedî mal gava nexweşên wan pak dibin mal din, yên feqîr jî nimêj dîkin û Qur’anê dixwînin. Tiştekî balkêş e dibêje jinên wan zêde şixûl dîkin û nimêj nakin: “Û jinêd wan kêr nimêjê dîkin, da’im dixebitîn û şola malê dîkin.”³⁴⁹

Piştî qala şerê wan dike wiha dibêje ehlê selat in, rojiyê digrin û zikatê didin: “Lakin dîsanê ehlşelat û misilman in: Rojî digrîn û zikatê didîn. Herçî kesê xuyîdewlet in ji dextlê dehan yek zikat diditin û ji dirafî çil zêran û çil qurîşan yekî diditin û ji pezan ji şedî yekî diditin û ji dewarê reşe ji sihî yekî zikat didîn. Elbette bê zikat nabitin. Eger mirofek şayed zikatê bi riça xo neditin, bi re’ya hakim û qađî û melan sa’î heyin yanê me’mûrê exza zikatê hene. Ew mirof diçin û qederê zikatê ji wî mirofî cebrî distînin û tînine ‘enbara beytilmalê û hîfz dîkin. Paşê herçî kesê

³⁴⁶ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 74.

³⁴⁷ H. b. r. 74.

³⁴⁸ H. b. r. 117.

³⁴⁹ H. b. r. 165.

ku mihtac e û misteheq e ji boy zikatê deftera wan heyin, hâkim û qađî tenbîh dikin ew mirofêd ehlîstîhqaq hemû vêdikevin.”³⁵⁰

Nivîskar her çendî ji bo nimêj û rojiyê agahiyan zêde nede jî ji bo zikatê qala mîqdarê wê dike. Em bi vî awayî pê dihesin heke kesek zikatê nede rêveberî bi zorê zikatê jê distîne.

10.6.3. Baweriya Wan ya bi Ziyaret û Ocaxan

Ji baweriyên kurdan yeka pûça berbelav jî ya derheqê ziyaretan de ye. Li gor wan hin dever, dar û kevir ji ber gora şehîdekî, ewliyayekî û yan jî ji ber sedemeke din bimbarek e. Li wan deran serjêkirina qurbanan, dayîna sedeqeyan, li wir bi daran ve girêdana pîne û paçikan, vêxistina şemalan ji bo merema dilê wan û daxwaza wan hasil bibe dibe wesîle.

“Û ekrad zaf î‘tîbar bi ziyaret û belkû bi dar û beran heyin. Darekî weyaxo berekî ziyaret dizanin û qurbanan dibin û serjê dikin û şemalan dibin vêdixînin. Wekû nexweşekî wan dibitin ‘ehd dikin ku bilanî şîfa bibîne ez pêxwasin biçime filan ziyaretê û qurban û şemalan bebim. Wekû ew nexweş şîfayê dibînitin elbette wî ‘ehdî dê bi cih bînin.”³⁵¹

Diyar e ev edet ji gelên cînar hildane, lewra fille li dêrên xwe şemalan vêdixin û wan jî ji wan hildaye. Wekî din mala şêxên xwe jî wekî ocax, ango cihê şîfayê dizanin û li gor wê tevdigerin.

“...Wekû naxoş û dîn û harêd wan ekrađan dibin ewan tînine malêd şêxan ocağê û pez û dewaran qurban ji boy ocağê tînin. Û ewî ‘elîlî du sê rojan mala şêxî goya li ocağê dihêlîn. Û ew şêx we bi daran ewî ‘elîlî diquştin û benan ji boy wî ‘elîlî girê didîn goya şîfa dibînin. Eger muqedder bûye ew mirofê ‘elîlî fewt bû xilaş dibe û diçite şola xo. Û îlla eger ecel nehatiye û ji wê ‘illetî xilaş dibitin. Êdî ew mirof goya çirağê wî şêxî ye û li ber benê wê ocağê sal bi sal elbette dewarekî dê ji boy wê ocağê hediye bibitin. Û kur û ewladêd wî mirofî jî dîsanê li ber benê wî şêxî ye. Êdî ew mirof naçine nik şêxek dinê. Wiha bi vî tîrî ekrađan her tayîfeyekê şêxêd wan û zêde pê î‘tîbarê dikin.”³⁵²

Ji îfadeyên Bazîdî jî tê fehmkirin ev baweriyeke pûç e û lê gel wisa bawer dike, ev malên şêxan jî ji vê rewşê sîd werdigerin. Heta ev ji bav derbasî law dibe û wekî wesîleya payebilindiyê tê qebûlkirin. Her çendî zarokên wan şêxan nezan û bêkêr bin jî ji ber ku malbata wan ocax tê zanîn li ser postê bav û kalên xwe rudinin.

³⁵⁰ H. b. r. 92, 93.

³⁵¹ H. b. r. 147, 148.

³⁵² H. b. r. 119, 120.

“...Û ekrad nêzûkî malêd mela û şêxan nabin û nadizîn û xirabiya wan nakin. Dibêjîn ku ew ocağ in, paşê bi me ve didîn. Î‘tiqada wan eve ye. Lakin ekşerêd şêxêd wan cahil û nexundî ne. Goya berê ecdadê³⁵³ şêx bûne.”³⁵⁴

Li gor vê î‘tiqada xwe dest nadine mal û milkên wan û dibêjin dê xenîmî me bibin, ango li me bidin. Hê mîna vê derheq wan de gelek bîr û baweriyên wanê bêbingeh hene.

10.6.4. Baweriya Wan ya bi Fal, Minecim û Efsûnê

Li vir tiştên di vê qala wê bê kirin jî ew baweriyên pûç in ku di nav kurdan de hene. Her çendî ev baweriyên pûç bi dînê wan ve hev nekin, hatibin qedexekirin jî hene. Ev jî nîşan dide ku esasên Îslamê di nav wan de cih nebûne. Bo mînak baweriya wan a bi fal, mineciman û Bazîdî dema qala wan dike van baweriyên pûç wekî “cahiliye” bi nav dike û gelek caran jî rexne dike û wiha dibêje:

“Û ekrad tebî‘et cahilîn heyin, bi fal û minecim û hindek tiştan bawer dikin û hindekan se‘d û hindekan şom dizanin. Û bi nusxeyan bawerî dikin. Bi wê dereceyê ku çewanî millet efrenc bê hekim nabin, ew jî bê nusxe nabin. Herçî ‘illet û derd dibî, bilanî bibe, elbette niwişt dikin.”³⁵⁵

Wekî li vir jî tê dîtin di gelek cihan de bawerî û kirinên bi vî rengî terîf dike. Jixwe di lîteratora Îslamî de têgeha cahiliyeyê ji bo serdema beriya hatina Hz. Mihemmed tê bikaranîn û li ser vê bingehê jî ji bo hemû bawerî, kirin û nêrînên ji derveyî pîvanên esasên Îslamî îfade bike tê emilandin.³⁵⁶ Nivîskar jî bi heman mebestê vê têgehê bi kar tîne. Di nav kurdan de efsûnkarî jî heye û gelekî bi wan kesên remildar û bi sêhrê re mijûl dibin bawer dikin. Bazîdî wiha balê dikşîne ser vê baweriya kurdan:

“Û hindek jîn jî di nêva wan da heyin ku li falê difekirîn. Tasê tijî av dikitin û datînite pêşiya xo û li wê ava tasê nezerî dikitin, îcarê goya ew mirofêd ku hadîr bûyine niyeta wan yek bi yek dibêjitîn û ekrad jî bawer dikin. Ji xebera pîldar û tasnihêrî bidernakevin. Lakin ji van goya ew pîldarî micerreb û rast dibitin dibêjîn. Û efsûncî jî di nêva wan da heyin lakin pîrejîn dibin. Ew jî wekû mirofek nexweş dibitin ewê efsûngerê tînin, kerekî nanî hindekî xoy dikite nêva nanî û dipêçe û li dor eţrafêd serê wî nexweşî çend barekan digerîne û goya tişteki dixune. Paşê ewî nanî û xoy davête ber seyî dixutin. Ew mirof goya şifa dibînitin.”³⁵⁷

³⁵³ Ji bo ev hevoka bê fêmkirin divê cînavka “wan” li vir hebûya.

³⁵⁴ H. b. r. 181.

³⁵⁵ H. b. r. 178, 179.

³⁵⁶ Murad Celalî, *Têgehên Bingehîn*, Weşanên Hinariya Quran, Tarîx û Cihê Weşanê Tune, r. 147-152.

³⁵⁷ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 75, 76.

10.6.5. Baweriya Wan ya bi Şomî û Oxirê

10.6.5.1. Şomiya Rêwîtiyê

Çawa ku di nav hemû civakan de hin kirin, hin tişt şom tèn zanîn ev yek di nav kurdan de jî hene.³⁵⁸ Ji wan baweriyên kurdan yek jî di warê derketina rêwîtiyê de ye. Li gor agahîdayina Bazîdî kurd rojên îna dernakevin seferê, rojên sêşeman nehs/nebaş dibînin û wiha qala vê dike:

“Ektrad rojêd înan seferê nakin, şom dizanin û roja sêşenbe jî nehs dizanin, wekû mirofek li ser şolekî be, bebêhnije, eger carek bî şebr dibêjin, elbette wî şolê weyaxo wê seferê nakin. Eger du caran bebêhnije te‘cîl dibêjin, ewê çerer nîne, ewî şolî dikin. Wekî mirofek biçite seferê îbtida ku ji mala xo biderdikeve, eger jîn bête oğura wan, weyaxo cêrê vala bête oğura wan, zaf şom hesêb dikin...”³⁵⁹

Wekî li vir jî tê dîtin ji van baweriyên piraniya wan pûç in. Helbet çîroka her baweriyê heye, lê piştî demeke dirêj ji ser re dibûhire mirov egera heqîqî jibîra dikin, tenê encam dimînin. Heta îro di nav kurdan de ev baweriyana hê jî hene, mesela du caran, sê caran bêtîjî bi wate ne. Dibe ku roja îne jî ji ber xutbeyê be. Lê mirov tu meneyê nadê ka çima ji ber rêwîkirina jinan wisa difikirin û cêrê vala xirab qebûl dikin.

10.6.5.2. Şomiya Hin Tiştên Curbecur

Di nav kurdan de xerab e ku mirov avê li ser agir de birêjîne, şev neynikên xwe hilde û hwd û dibêjin evna dibin baîsê tiştên xirab. Bazîdî jî qala hinek tiştan dike:

“Û jinêd wan bi şev malê gêzî nakin û paqij nakin, dibêjin ku şom e. Û bi şev piv nakin çirayê û bi şev neynûkê nafekirîn. Evne goya li nîk wan şom e. Û bi şev aman ji malê bi dernaînin û ziblî ronakin. Û nêzûkî êvarê û rojêd çarşenbê serêd xo û serê zarokan naşon ku naxoşî peyda dibî.”³⁶⁰

10.6.5.3. Nezer

Nezerîkirin, di nav ekraan de pir belav e, hema bêje piraniya wan pê bawer dikin û ji bo xwe jê biparêzin tevdîran hildidin. Bi piranî kesbik, moriya nezerê û nivîştî çêdikin da ku xwe ji nezera/çavîniya kesên bed biparêzin. Bi vê fikarê tiştê xwe nîşanî hevdu nadin, mesela ev gotinên pêşiyên jî qala vê dikin: “Mala Xwedê jî bi perde ye”,

³⁵⁸ Mustafa Gazî - Ahmed Bengîn, *Baweriyên batil ên kurdan*, Enstîtuya Kelepura Kurdî, Stenbol, 2006.

³⁵⁹ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 174.

³⁶⁰ H. b. r. 165.

“Nezer meriva dike mezêl” û hê gelek gotinên din jî hene. Bazîdî jî qala vê baweriya wan dike:

“...Û nezer heye, ekrad nezerê rast dizanin û gelek jî îhtirazê dikin. Goya mirofê ku kose û mûzer û çavheşîn bibe, ji nezerê wî mirofî elbette dişirsin. Wekû mirofê bi vî şûretî bibînin ji wî zaf îhtirazê dikin.”³⁶¹

Meriv bi vê jî pê dihesê ku kurd ji merivên kose, çavhêşîn, çavsût ditirsin ku dê zarokên wan, pezên wan yan jî zexîre û kulîna wan -ev bi piranî di nav jinan de heye- nezerî bikin û loma dikin ku xwe ji wan biparêzin.

Li vir divê qala nezer/nihêrîna kesê xwarinê dixwe jî bê kirin lewra li cem kurdan dema kesek, xwarin, fêkî an jî tiştêkî din bixwe, nede kesên lê nezer dikin, wê hingê gunehê wî kesî dikeve histuyê mirov. Ji bo vê dibêjin marê wî dê bê te. Nivîskar wiha behsa vê baweriya wan dike:

“Ekrad di malêd xê da zêde mikerrem in. Mîmkun nabit ku meşela wekû milelêd mayî ekrad li cihekî zadî û fêkî û tiştêkî bixun û mirofek ji dûr ve bifekire û li wan nezer bikitin, ew qederekî ji wî zadî û fêkiyî nedine wî mirofî ku nezer dikitin. Lewranê îtîqada wan ew e ku nefsa wî mirofî dibe mar û bi şev têtê xewna wî. Û ew goya di nêva wan da mucerreb e, îhtirazê ji nefsa geyran dikin. Elbette zaf û hindik dê tiştêkî ji zad û fêkiyî bidine mirofê ku lê nezer kiriye weyaxo nezerê dikitin. Wekû dinê ew para geyran naxun. Meşela sêvekê bi du keran bikî, yekî bideyî wî û yekî bideyî mirofekî dinê paşê ew mirof jî para xo ewê kerê sêvê nexutin û bidite wî mirofî ewê naxun goya wekû bixutin pizikek li serê zimanê wî têtin û zehmet diditin. Gelek caran dibe ku pizik li serê zimanê yekî peyda dibî ew mirof dibêje ku ‘ecêb parî li zimanî peyda bûye ez nizanî ku min kengî parî xuriye.’”³⁶²

10.6.5.4. Wateya Hin Bûyeran

Kurd ji bo gelek bûyer, tişt û tevgeran meneyekê pê dixin û li gor wê texmînan dikin. Loma ji bo wan hema hemû tişt meneyeke wê heye. Bazîdî qala wan jî dike:

“Wekû teyrik bête derê malê û bike gazî ew dizanîn ku dê ji musafirî xeber û cewab bêtin. Wekû kîtik bi destê xo, ruwê xo bimalin ew dizanin ku dê mêwan bêtin. Wekû parî di destan bifiritin weyaxo ji hêvîrê wekû jîn dibirîn kerek bifire, ew dizanîn ku dê mêwan betin û eger li dora şemalê pirtik peyda bibin, ew dizanin ku dê ji boy wan ji dûr ve kağiz bêtin. Û eger şolêd wan yekûdu siwar bibin, goya

³⁶¹ H. b. r. 173, 174.

³⁶² H. b. r. 151, 152.

sefer waqî‘ dibê. Eger nêva destê rastê bixure goya ji boy wan ji cihekî diraf têtin, eger nêva destê çepê bixure, elbette dê şerek peyda bebî û ji boy şerî hadîr dibin, eger qapağa çavê rastê bavêje, ji boy wan goya mizgîn têtin û şa dibin. Eger qapağa çavê çepê bavêje, bela nazil dibitin û mehzûn dibin, xulaşe ji boy hereketa tamarêd bedenî hemûyan her yekî tecribeyek li nik wan heye. Eger keskeşor li kenarekî peyda bebî, goya li wî kenarî dibitin erzani. Û eger êvarê û şubeyê şefqekî şor li damena ‘esmanan peyda bitin, goya li wî kenarî şer û ceng peyda dibitin. Eger navê yekî bi geletî bi mirinê biderkeve goya ew mirof paşê zaf dijî. Wekû keçek dayîne bi şû, lakin hêj nebirî, mêrê wê bi emrê Xudê mîr, ewê jinê şom hesêb dikin û serxure dibêjîn û zaf kes êdî nabine talibê wê jinê. Îlla eger du caran waqî‘ bibe, êdî me‘azellah, kesek ewê jinê naxozitîn. Lakin eger jîn bemre û mêr bimîne, ewî şom hesêb nakin, bilanî deh caran jî waqî‘ bibe.”³⁶³

Wekî bi vê jî tê xuyanê ji bo hemû bûyer û tiştên siruştî navek û meneyek danê û li gor wê derheqê pêşerojê de texmîn kirine. Diyar e ku ev baweriyên pûç û bêbingeh di nav gel de gelekî berbelav in û îro jî hene. Em nikarin hemûyan neqil bikin û hinek ji wan jî ev in:

“Wekû dinê eger mirofêkî şayed parî li gewrûyê bimîne destê xo ji zadî dikêşitin ku wax qerînekî min ji dûr ve birsî maye lewrane parî ji dest min ket dibêjîn.

Wekû serê çirayê pilîte belav bibitin ew dibêjîn geybeta min dikitin. Wekû rûnê wan şayed ji destêd jinan ro be tenûrê agir bibite alawî ewî zaf şûm digirîn ku mala me dê biçite mîratan. Eger rûn nebite alawî dîsanê şûm hesêb dikin ku goya mezinê malê fewt dibî. Wekû dinê weqtê berdil‘ecûzê ew zîp dibêjîn ewan rojan nehs dizanin û ji malêd xo bidernakevin û di wan rojan da naçine seferê.

Û panzde roj wekû dimîne parêza fillanî dirêj ekrad Xidirnebî dibêjîn. Ciwanêd ekradan bêkar keç û lawêd wan sê rojan rojî digrîn şeva çarê fîtarê dikin û avê venaxun radizên. Goya herçî kesê di xewnê da avê bidite wê keçê ew dibe neşîbê wê dibe weyaxo herçî keça avê bidite wî lawî ew law dibite neşîbê wê keçê. Goya eva li nik ekradan bê şubhe ye.

Wekû dinê wê şevê pögîn çêdikin û di şikevê da datînin nêva malê. Goya dewsa hespê heçret Xizir li ser wê pögînê peyda dibe û ew xuyêd malê şa dibin ku mibarekî ye û xêr û bereket e heçretî Xizir îşeve hatiye mala me. Paşê wê rojê ji wê pögînê helawê çêdikin û li malêd cîran û xizman belav dikin û ji wê pögînê hildigirin vedişêrin. Goya ji boy bereket.”³⁶⁴

³⁶³ H. b. r. 171, 172.

³⁶⁴ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 149, 150, 151.

10.7. Jina Kurd

Bazîdî di kitêba xwe de herî zêde li ser mijara jina disekine û ji gelek hêlan ve qala wan dike, fonsksiyon û rola wan a di civakê derdixe holê, muqayesa wan bi gelên herêmê û jinên rojavayî re dike. Bi baweriya min ji ber wî wêneyê Mela Mehmûd derxistiye holê piştî wî kê di derheq jina kurd de axiviye pir û yan hindik ketiye bin tesîra wî.³⁶⁵ Lêbelê ev nayê wê meneyê ku bi van şîrovevên xwe ji rastiyê dûr ketiye û ev rewş bi şahidiya seyahên li Kurdistanê geriyane jî hatiye piştrastkirin.³⁶⁶ Lewra li gor wî ji jinên gelên cînar azadtir e, di nav civakê de çalak e, rûyê xwe venaşêre, xizmeta mêvanan dike çî xerîb çî jî nas, rêvebiriya malê di destê wê de ye, di şer û aştîyê de kesayetiyeke girîng e, ji hêla namus û îfetê ve jî damenpaqij e. Loma mêrê kurd ne kumreş e û ji jina xwe nakeve şikê, lê heke karekî xirab kir jî êdî xelasbûna wê tune ye, îlla tê kuştin. Bi kurtasî Bazîdî jina kurd ya koçer wiha dide nasîn: "...Lakin fîlwaqî‘ jinêd ekra dan nadire el zeman in lewrane him jin e û him gulam e û him pawan e û him di şerî da iqtîda bikitin li derê malê yar û yoldaş e..."³⁶⁷

10.7.1. Di Malê de Jin

Li gor Bazîdî jina kurd pir jêhatî ye, di malê de yekane rêvebir jin e, mêr tevî karê malê nabe, lewra ew tenê bi kar û barên derve de dikeve. Ev jî cihê jina kurd ya di malê de nîşan dide û wiha dibêje:

“Û jîn, keçêd wan qewî şolker û cesûr û xuyîhuner in. Kulav û berr û xalî û têran çêdikin. Û malêd ku gulam tunînin, hesêbke gulamê malê jin in. Herçî şola malê bibe, jîn dikan. Heta hespêd mêrêd xo jî jîn xuyî dikan. Mêr bi geyrê şerî tev şolekî qewî nabin. Bazar û dayin û istandin jî bi jinan dibin. Û tene meclisê û iqtîda bikitin tevî şêwr û umûrî dibin û kerem û îkrama xelqê dikan.”³⁶⁸

Her wiha jin tenê bi karê malê re jî mijûl nabe, ger hewce bike ji bo biryardayina di derheq karekî de tevî şêwrê dibe û ew jî xwedî biryar e. Heta jin şexsen xwedîpez û dirav in û vî kare xwe jî bi xwe rêve dibin.

“Wekû dinê jinêd ekra dan jî malêd wanê bi xo dibin meşela pez û dewar û diraf ku ji malêd baban înane weyaxo mêrî dayine. Ji wî malêd jinan re şikêrt dibêjin.

³⁶⁵ Nikitin, *Kürtler -Sosyolojik ve Tarihi İnceleme- 1-2*, r. 176, 187.

³⁶⁶ Brant, *1838 Yazında Kürdistan*, r. 145.

³⁶⁷ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 98, 99.

³⁶⁸ H. b. r. 189, 190.

Mêrêd wan tevî wan malêd jinan nabin û naxun belkû ew jîn pê kirîn û firotinê dikin û zêde dibitin.”³⁶⁹

Li gor vê rewşa jina kurd baş e û bi rastî ev yeka hê vêga jî digel hinek guherînan waqî‘ e, tê dîtîn. Loma ev ne mubalexaya ye û heqîqet e, lê çawa ku di hemû tiştan de îstisna hene -ev tebieta eşya ye- di vî warî de jî îstisna hene.

10.7.2. Di Nav Civakê de Jin

Jinên kurdan -di vê xebatê de ev îfade ji bo koçeran tê emiland- serbest in, ango ne piştperde ne û xwe ji zilaman venaşêrên û ji wan narevin. Ev yek bi taybetî jî ji ber awayê jiyana wan jixwe ne mimkûn e. Lewra koçer in, herdem ji warekî koçî warekî din dikin, divê hergav li derva di nav karûbarên rojane de bin ku ew jî dotina pez û dewar, şûştina firaq û fol, girtina hasil/xwarin/zexîra zivistanê penêr, rûn, toraq û karên din in. Çêkirana xwerek û pehtina nan û hê gelek şixûlên malê li derva li qadeke vekirî di bin kon/reşmal, li zome û zozanên çiyê tên kirin. Loma jin bixwazin jî nikarin perdenişîn bin û Bazîdî wan dişibîne keç û jinên rojavayî û wiha qala vî halê wan dike:

“Waqî‘a revîna jinan ji mêran, di nêv wan da ‘adet nînin. Jîn û keçêd wan ji kes narevîn, wekû milletê efrenciye ew jî serbest in. Lakin bi wê î‘tiqadê ku ew xirabiyê nakin, îlla eger yekê ji wan şola xirab kirîn, çare nînin, elbette ewê dikujîn.”³⁷⁰

Li vir jî çawa di gelek cihan de behs dike qala îffet û damenpakiya jina kurd dike û bale dikşîne pir jêhatî ne û hemû şixûlan dikin:

“Û jinêd wan bi xo serbitenê diçine aşî û karwanan. Û di malê da eger xanî bibe û eger kon bibe deh û panzde mêr û jîn bab û bira û xo û da û jîn û bûk û zava hemû li nik yekûdu bi cihekî radizên şerm û heya nakin. Lakin eve derûrî ye, lewrane cî tunîne hemû di xanî û konekî da nin, çare nabitin.

Jîn û bûkêd wan eşla rûyêd xo ji kesî setir nakin û narevin û digel hemû kesan jî xeber didîn. Lakin dîsanê ehledeb û ‘îşmet in.”³⁷¹

10.7.3. Di Şer û Silhê de Jin

Bazîdî balê dikşîne ku jinên kurdan ger hewce bike tevî zilaman li hember neyar şer dikin³⁷², wêrek û bicul‘et in. Tu carê ji şer narevin, ev taybetî û xeysetê jinên kurdên

³⁶⁹ H. b. r. 115.

³⁷⁰ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 190.

³⁷¹ H. b. r. 115, 116.

³⁷² Ji bo vê nimûneyeke balkêş bnr. Brant, *1838 Yazında Kürdistan*, r. 40.

koçer e. Lewra di nav wan de şer û dew pir in û ew jî wê wekî parçeyekî jiyana xwe qebûl dikin û xwe ji lihevexistinê nadine alî, birîndar dikevin heta tîn kuştin jî.

“Û jinêd wan malan jî her yek kon istûnkê digrîn destêd xo û haçir dibin. Guhê jinan jî li şerî ye, dîtin ku şer hate nêzûka malan, ew jîn jî bi wan istûnkonan diçine şerî û yariya mêran dikin. Dibêjîn jî tîne birîndarkirîn û kuştin. Yanê wekû şerekî wiha li ser malêd ekradan biqewimîn, jîn û mêr şerî dikin...”³⁷³

Jin çawa ku di şer de çalak in wekî wê ji bo silhê jî dikevîne navbera du birên li hevdu re şer dikin û laçika xwe diavêjine nava wan û lava û gazî dikin da ku şer nekin. Ev edetke binecih e û gelekî jî girîng e.

“Ekşerî jîn weya mela weya şêx dikevîne nêva wan neyaran û li hevdu tînin, lewrane tayifeyêd ekradan qewî zêde qedrê mela û şêxan û jinan digrîn. Ew hersê tayife herçî ricaya bikin ewan mayûs nakin. Zaf dibe du tayife li meydanê dikine şer û ji herdu kenaran jî telefîyat bûye. Wekû jin bê û laçika xo raxîne nêva wan, elbette ew du tayife ji yekûdu dibin...”³⁷⁴

Di nav kurdan de jin muhterem e û ew jî li gor wê statuya xwe tevdigere û heta di şer de jî zîlam li jinan naxin û ji bo hevhatinê gava têkevîne navberê û herine ricayê xatirê wan digrin.

“Lakin jîn di nêv wan da mureş in, ew destê xo li jinan hilnagirîn û ‘edawetê digel jinan nakin û qewî zêde xatira jinan çavra dikin. Jîn biçe rica xûnê jî dibexşinin...”³⁷⁵

10.7.4. Di Şîn û Şahiyan de Jin

Bazîdî qala rola jinan ya di şîn û şahiyan de jî dike û li gor wê dema ji kurdan yek bimre jin, keç û xwîşkên wan kincên reş xwe dikin, reş girêdin, guliyên xwe dibirin û heya demeke dirêj şînê dikin. Kîlama diavêjine ser kesê mirî û xeml û xişrên xwe li xwe nakin.

“Li mewta ciwanan zêde şîn û matem digirîn, libasêd reş werdigirîn û serêd xo reş girê didîn. Û jîn û keç û xoh guliyêd xo jê dikin. Qewî zêde matem û şînê dikin eger ew mirî mêr e³⁷⁶ û xuyîhesp û çek û taxum hespêd wî dixemilînin û çek û sîlahêd wî³⁷⁷ li ser hespan girê didîn, ewan hespan li berayikê cinazeyî dikêşin. Û ew jîn û keç û da û xohêd wî, dilo û lawijk dibêjîn, wey li min babo, wey li min

³⁷³ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 192, 193.

³⁷⁴ H. b. r. 181, 182.

³⁷⁵ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 175, 176.

³⁷⁶ Dibe ku ev peyv wekî “mîr” jî bê xwendin.

³⁷⁷ Di (N)yê de tuneeye.

birra, wey li min pismam dibêjîn û digrîn û deng û sedaya bavobavoya wan diçite felekê. Yanê mirofekî biyanî jî rast şîna wan bêtin, elbette dilê wî disoje û digirîn. Bi vî terzî bi ihtîşam dibin çal dikin. Û ew jinêd ku guliyêd xo birrîne, ewan guliyên li ser qebra wî meytî, li kêlêd wî dilawisîn. Heta panzde rojan şubeh û êvaran jîn û mêr û cîran têne ziyareta qebra wî dixunin û digrîn, şedeqe û xêran dikin. Ew mirî eger mêr e, libasekî wî beqîmet meşela qapût û kurk weyaxo şalê bibiha davêjîne ser cinazeya wî. Û eger jîn e, dîsanê libasekî wê zîqîmet davêjîne ser cinazeyî û dibine qebrê. Ew libasê ku avêtine ser cinazeyî, ew jî boy melan in. Ew dibin û mela difiroşin û li yekûdu parî vedikin.”³⁷⁸

Wekî tê dîtîn di şîna û matemê de jin çalak e, rola sereke ya wê ye û ew mohra xwe li vê merasima diltezîn dixê. Kincên wan rewşa civakê nîşan didin, dema kesek jî derva bê nav civakê xwekirina jinan nîşan dide ka kêfxweş in an xemgîn in. Li vir jî wekî kesayetiyeka girîng xuya dibe. Lê di dema şahî û dawetan de jin kincên rengîn li xwe dikin, xwe dixemilînin, destên xwe hine dikin û çavên xwe jî kil dikin. Her wiha deqkirin jî di nav wan de heye.

“Lakin ew mirofêd ku hiznî ne ew libasêd şor û qirmiz û cilêd faxire ber nakin û destêd xo hîne nakin û çavêd xo kil nadin û naçîne dawetan û kêfxweşiyên. Û li nik wan jinên bî jî şerm e, xo naxemilînin û libasêd şor û qirmiz wernagirîn û naçîne dawet û kêfxweşiyên.”³⁷⁹

“Jîn û keçêd ekradan ekşerî wekû jinêd ‘ereban rûyêd xo û dest û ‘enî û lêvêd xo deq didîn.”³⁸⁰

10.7.5. Cudahiya Jinên Koçer û Xwecih

Di kitêba Bazîdî de beşa herî balkêş ew e ku qala ferq û cudahiya di navbera jinên koçber û xwecih de dike. Ya rastî ev ferq ne tenê di nav jinan de ye, di nav mêran de jî heye, lê herî bêtir behsa cudatiya jinan tê kirin û ji bo vê ferqê jî wekî sedem şert û mercên jiyanê, awayê perwerde û mezinbûnê tê nîşandan. Ev sedem jî wekî ku îro jî tê qebûlkirin him aliyê derûnî ve him jî aliyê civakî ve bi bandor in û seba teşegirtina kesayetiyê mirov girîng in. Loma Bazîdî diyar dike ku ji ber van ferqan têkiliya koçber û xwecihan bi sînor e.

“Ekrad û yerlû kê mî xizminayiyê digel yekûdu dikin û keçan kê didîn û distînin.

Lewranê ekrad dibêjîne xwecihan goran û ewan laşey’ û bêcesaret ‘ed dikin û

³⁷⁸ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 184, 185, 186.

³⁷⁹ H. b. r. 110.

³⁸⁰ H. b. r. 116.

dibêjîn ku herçî zarokêd ku ji jinêd goranan biwelidîn ew zarok bêwec û ‘eware û tîrsonek dibin. Seb vê xeberê ekrad keçêd xwecihan naxwezîn. Û xwecihî jî dibêjîn ku herçî zarokên ku ji jinêd ekradan biwelidîn bêedeb û diz û serkeş dibin. Ev herdu qîsim rewend û yerlû yek bi yekê xweş nabin û ekşerî jî yekûdu narađî ne û gelek bi yekûdu î‘tîbarê nakin. Eger meşela biqewimetin li şerekî da ekrad û yerlû heyin ekrad nabine oldaşêd yerlûyan dibêjîn ew zû direvin. Lakin filwaqi‘ du sê neferêd ekradan iqtîda bikitin digel deh neferêd yerlûyan miqawemetê dikin û ji wan narevîn. Lakin yerlû we nînin. Yerlû li ber wan zebûn in. Lakin eve xebera derheq rewend û yerlûyêd Wan û Mûş û Bazîd û Qers û Îranê ne. Lakin rewend û xwecih û yerlûyêd Hekarî û Bohtan û ‘Emadî û Şohran we nînin. Îcarê emr bi ‘eks e, li wan etrafan rewend li ber yerlûyan zebûn in. Û du sê neferêd xwecihan iqtîda bikitin digel deh neferêd rewendan şerî dikin û ji wana naşîrsin. Û li nik yerlûyêd Hekariyan rewend laşey’ mehsûb dibin...’’³⁸¹

Ji ber ku herdu alî jî yê li hember xwe xirab, nebaş dihesibîne têkiliyên wan ne baş in, koçer dibêjin xwecih newêrek in, xwecih dibêjin koçer diz û bêexlaq in. Loma ji hevdu hez nakin û ji hev xweş nînin. Lê tişteki balkêş jî ew e ku ev rewş di nav herêma serhedê ku Wan, Mûş, Bazîd, Qers û Îran e wiha ye, lê li herêma Hekarî, Botan, Îmadiye û Soranê rewş berevajî wê dibe.

“...Lewranê mimkun nabitin ku ekrad jinêd xwecihî bistînin. Jinêd ekradan iqtîda bikitin bi şev diçine cihê tîrsê û diçine şolan û şer peyda bitin jinêd ekradan şerî dikin û yarîkariyan ji boy mêrêd xo dikin. Lakin jinêd yerlûyan zêde tîrsonek dibin ji mal bidernakevin. Lakin filwaqi‘ jinêd ekradan nadire el zeman in lewranê him jin e û him gulam e û him pawan e û him di şerî da iqtîda bikitin li derê malê yar û yoldaş e. Lakin jinêd yerlûyan bi geyr ji jinaniyê êdî kêrî tişteki nayên. Wekû fecir dibitîn jinêd ekradan ji cih radibin hespan dişewilînin û dewar û rizkî bere garanê didîn û malê û derê malê dimalin û meşkê dikilên û şîrî germ dikin û haveyn dikin. Xulase eger şewate tunebitin diçin û şewatê berhev dikitin û tînitin û nanî û zadî dipêjîn hêjam mêrêd razane. Eşla mêr ji şola malê tişteki nakin. Kullî qîşûra şolêd malê li ser jinêd ekradan in. Lakin jinêd kurmancêd yerlû bi ‘eksa wan in herçî şolêd malê heyin hemû mêrêd wan dikin, îlla nan û zadpatinê û cilşûştinê jîn dikin. Belkû heta taştê bê radizên û ‘eware ne.

Ekşerî jinêd ekradan feqîr el hâl in bihar û havîn û payîzan pêxwaş digerin û şolan dikin. Zivistanan ew jinêd bêçare çarogê pê dikin û libasêd wan jî cawê şor û cawê reş û heşîn û çît e. Lakin dîsanê bi vî hâlêd xo rađî û qani‘ in û zêde di emrêd mêrêd xo da ne. Wekû mêrêd ewan iqtîda bikitin ewan biqutîn eşla dest hilnagirîn

³⁸¹ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 99, 100, 101.

û xeyidîn nizanin. Û herçî qeder libas û cilêd wê malê heyin hemû jîn didûrîn û nadine xeyaftî.”³⁸²

Li vir jî Bazîdî behsa jêhatîbûna jinên koçera dike, karê wanê rojane yek bi yek dihejmêre û li hember hevserê xwe çawa tevdigerin bi bîr dixê. Ji van îfadeyan jî mirov fehm dike ku erdnîgarî li ser xeyset, exlaq û reftarên kes û her wiha civakê tesir dike, bi van egeran civak ji hevdu cuda ne. Her çendî ew endamên heman gelî bin jî.

10.8. Mêvanperweriya Kurdan

Kurd bi mêvanperweriya xwe navdar in³⁸³, ev wekî xaleke sereke ya nasnameya wan derdikeve pêş û dost û dijmin herkes vê qebûl dike. Ji bo wan mêvan dayîna Xwedê ye. Loma gava kesek tê dibe mêvanê wan gelekî hurmeta wî digrin, îzet û îkramê jê re dikin. Seba rehetî û xweşîya mêvan çî ji destê wan bê teksîr nakin û tu carê mêvan ji derê malê venagerînin. Bazîdî jî vê di nav edetên kurda de hesab dike û di vê risaleya xwe ya piçûk de 33 caran peyva mêwan/mêvan bi kar tîne.

“Wekû bi şev şayed dost û mêwan bêne zomeyê, ew nobedar diçine berayikê gazî dikin wekû qirawilêd orduyan. Paşê ewan tînine nêva zomeyê. Çî qeder mêwan bêne zomeyê, mêwanê ağayî û rispî ne. Îlla eger zaf mêwan heyin, îcarê serê konî du û sê û zêde siwaran belav dikin.

Û ağayêd wan û maqûl û dewletlûyêd wan hemû xuyîqehwe û taxum in. Eger şayed mêwanî jî qehwe û taxum hebî, nahêlîn ku taxuma mêwanan biderkevin û bidne şolê. Belkû qehwe û taxuma xuyê malê dixebîte. Û ağa û rispiyan çît û perde heyin. Yanê nêva konî birîne û çît û perde kêşane û kirîne yalê mêran û dîwanxane, mêwan li wê derê sakin dibin. Elbette ji boy mêwanan berx û pez ser jê dikin û îkram dikin.”³⁸⁴

Gava mêvanê kurdan tînin, ew pêş wan ve diçin, tînin nav malan heke hejmara mêwanan pir be di nav malan de bela dikin û dikine mêvan. Ji bo xwarin û vexwarinê gelek îkramê ji wan re dikin, ji wan re pez û berxan serjê dikin, qehwe û cixareyê didin wan. Heta heke cihê razanê tunebe dîsa jî wan dikin mêvan, paştî naşînin.

“...Eger qe cî tune bijîn li yalê malê li kenarekî xuyê malê digel jina xo û li kenare dinê mêwan radizên. Nabê cî jî tunebin dîsanê mêwanan ji derê malê venagerînin. Lewra li nik wan mêwan neêwirandîn û ji derê malê veğerandîn qewî şerm û ‘eybekî mezin e. Û hurmeta mêwanan dikin. Bilanê millet axir jî bitin.”³⁸⁵

³⁸² H. b. r. 97, 98, 99.

³⁸³ Brant, *1838 Yazında Kürdistan*, r. 38, 57, 58.

³⁸⁴ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 186, 187.

³⁸⁵ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 152.

Heke mêr li mal nebin jî îcarê jin mêwanan pêşwazî dikin û diezimînin. Ango îmkân tune ye îlla mêvan dihebînin. Lewra nehebandina mêvan ji bo kurdan şermeke pir giran e.

“Ektrad herçî ku xeymenişîn in, wekû mêwan bêtin rast dajon derê konî. Xuyê malê jî radibe û pêş ve tîn û hespêd wan digirîn û girê didîn. Eger şayed xuyê malê mêr hadir nebin, jinêd wan biderdikevin pêşiya mêwanan. Ê hespêd wan digirîn û girê didîn. Ê ewan mêwanan dibine konî. Êdî zêde ji mêrêd xo îkram û î‘tirazê dikin.”³⁸⁶

Ev yek di nav kurdên serhedê de bi vî rengî ye, lê li cem kurdên Hekarî, Botan û Soranê ode û mêvanxaneyên wan tune ye, loma ew mêwanan di mizgeftan de diêwirînin.

“Ektradêd xwecihê Bohtan û Hekarî û Şoran, ewan oçeyêd mêran tunînin, belkû mihmanxana wan mizgeft e. Herçî mêwanî têtin, eger siwar eger peya eger maqûl eger jar rast diçite mizgeftê. Eger siwar in, gundî diçin û hespêd wan tînin û li mala xo girê didîn û alif didinê û xuyî dikin. Ew mêwan jî li mizgeftê diêwirîn. Wekû bûye êvarî, ehlê gundî mezîn û biçûk heryekî amanekî zadê herçî Xudê dayî digel du sê nanan li ser destî tînin mizgeftê. Wekû nimêja êvarê dikin, destexanê radixînin, ewan amanêd zadan datînin, digel mêwanan te‘amî dixun. Ê paşê ji malêd xo ji boy mêwanan nivînêd razanê jî tînin. Lakin mizgeftêd wan kuçik tê heyin. Agirî hil dikin qewî germ dibitin. Ê raxistî ye wekû oçeyan bi tedarik in...”³⁸⁷

Li gor vê kurdên xwecih ên herêma başûr; Hekarî, Soran û Botanê mêvanhebîn in û mizgeftê ne tenê ji bo nimêjê, lê ji bo ezimandina mêwanan jî dixebitînin. Bi rastî meriv bi van agahiyan dibîne ku Bazîdî Kurdistanê yekrû nas dike û di kîjan hal û wextî de çawa dikin, edet û usûla wan çawa ye, ferq û cudahiya di navbera wan de çito ye, bi awayekî berfireh û zelal rawe û şîrove dike.

10.9. Mêrxasiya Kurdan

Gelê kurd bi şervaniya xwe navdar e, tu carê şer û dewên wan naqedin, carna ji tiştên pir piçûkê bêqîmet jî şer dikin û hevdu dikijin. Loma şerkirin, wêrekî û mêrxasî di axaftinên wan de, jiyana wan a rojane de zêde tîn bihîstin. “Lakin cerrahîne qewî qenc ji wan peyda dibin lewrane dayim şolêd wan birîndarbûn e.”³⁸⁸ Ango şer, birîndarî û

³⁸⁶ H. b. r. 154.

³⁸⁷ H. b. r. 153.

³⁸⁸ H. b. r. 88.

kuştin ji bo wan bûye awayê jiyane. Qîmeta merivan li gor şervanî, mêrxasî û wêrakiya wan derdikeve holê.

“Wekû dinê ekşerêd wan mirina di muharebe û şerî da temennî dikin, eger mirofêk bi ecela xo fewt bibe, dibêjîn, mixabin, xuzya di şerî da fewt bibûya. Wekû dinê ekrad di şerî da ji yekûdu şerm dikin. Eger di dil da jî cesaret tunebin, elbette ji şerma oldaşan dê şerî bike û yanê bête kuştin. Ekrad di şerî da gazî yekûdu dikin û gîret didine yekûdu, eger mirofêk bireve, paşê êdî qedrê wî namîne û jîn, mêtir tiv dikin rûyêd wî û mesxere pê dikin û di meclisan da qaweyê di qûna fincanê da didine wî mirofê revî. Ê midyekî jina wî jî ewî nadite xeberdan û her rojê ewî pîs dikin, yanê di ekradan da di şerî da revîn, ji mirinê bedtir e, mirof bi mirinê raqî ye, lakin bi wan rezaletan raqî nîne, ji boy vê xeberê narevîn.”³⁸⁹

Wekî diyar e ji bo kurdan ji bilî cesaret û mêrxasiyê rêyeke din tune. Lewra ger ji şer birevin, ev şer li ser stûyê wan dibe bar, êdî nikarin di nav civakê de serbilind û rûspî bigerin. Loma kurd mêrxas in.

10.10. Xwendina Kurdan

10.10.1. Perwerde û Medrese

Perwerde hewcedariyeke sereke ye û civakeke bê perwerde tune, lewra perwerde jiyana mirov rêkûpêk dike û rê û resmê civakî hînî ferdan dike. Ev perwerde ne formel e, ji bûyînî heya mirinê, li her dem û derê berdewam bike. Lê yek jî hîndekarî heye, ew jî li gor bernameyekê, bi rêbaz û rêzeke diyar tê meşandin. Di nav kurdan de heya ragihandina komarê li mizgeft û medreseyan Kurdistanê perwerde dihate kirin û ew li ber destê seyda û melayên xwe dihatine hêvotin. Bazîdî bi xwe jî him ji medreseyê mezun bûye û him jî gelek salan li Bazîdî li medreseyê muderrisî kiriye. Loma li gor qebareya risaleya xwe bi hûrgilî qala perwerdeya medreseyê û usûla wê kiriye.

“Ji boy xundina zarokan dayina seydayî wekû romiyan rismekî mu‘eyyen tunînin, cum‘eliq û me‘aş û hefteliq tunînin. Berê wekû zarok verê kirîn seydayî anegora hâlê xo hediyeyekê didine zarokê ji boy seydayî dibin. Êdî tiştêk tunînin heta ew zarok xitma Quranê bikitin. Wekû ewî zarokî xitim kir, îcarê bab û dayêd wî zarokî rojekê gazî seydayî dikin, anegora hâlêd xo du û sê û pênc pez weyaxo çêlekekê didine seydayî, ew jî raqî dibe. Wekû dinê dersêd kitêb û meşq ku dikin ewan seyda mehdâ bi xêra xo te‘lîm didîn. Ucret nastînin îlla ku muderrisê medresan ucureta wan ji malê weqfê heyin, distînin. Ê muderrisê suban zû têne medreseyê û dersan dibêjîn, heta nêzûkê êvarê, paşê diçîne malêd xo. Îlla rojêd in û sêşenban

³⁸⁹ H. b. r. 176, 177.

te‘îl e, muderris nayête medreseyê û feqeh dersan naxunin. Di wan rojêd te‘îlan da dewr û dersêd berê xundî tekrar dikin. ‘Adet e ku her kesek ji mala xo her rojê ser êvarê sê nanan û amanekî zadê herçî Xudê dayî ratib didine feqehed medresan.”³⁹⁰

Bi vî şeklê nivîskar qala wê dike bi tevkariya gel li seranserê Kurdistanê perwerdeya zarokên kurdan dihate kirin. Medrese û hucreyên wê cihê xwendinê bûn û melayên wan jî muderris û seydayên wan bûn. Mesref û heqê seydayan bi destê gel dihatine dayîn, xwarina feqîyan jî di bin navê ratibê de bi dor li serê malên gund û bajêr dihate dabeşkirin û wan jî bi vî qaydî ratiba wan dida. Bi vî awayî hema bêje li hemû deverên kurdan piçûk û mezin hemû gund û bajaran perwerde dihate dayîn. Lê wekî nivîskar jî dibêje ev ne tenê ji bo zarokên kurî bû keçên wan jî dixwendin.

“Û keçêd wan jî dixunin û mela jî heyin, dersa wan dibêjin. Û ekşere jinêd wanê navser qelûnê dikêşin. Û qelûna tijî dikitin û tete meclisê, nêva mêran. Û jinêd wan kê nîmêjê dikin, daîm dixebitîn û şola malê dikin.”³⁹¹

10.10.2. Mela, Şêx û Mizgeft

10.10.2.1. Mela

Têgehên mela, şêx û mizgeftê ji bo kurdan rasterast bi perwerdeyê re eleqedar e. Lewra mela li medrese û mizgeftê derse dibêje û şêx jî bi statuya xwe ya menewî ya di nav gel ve rêberiya wan dike û pêşîkêşê wan e.

Mela di nav kurdan de banga nîmêjê didin, li pêşiya wan nîmêja cemaetî dikin, Qur’anê dixwînin, miriyên wan dişon û defîn dikin, di şer û dewên wan de navçîtiyê dikin, mara wan dibirin, mewlûdê dixwînin. Ji ber vê gel hurmeta wan digre û qedrê wan dizane. Her wiha ji bo debara xwe bikin kurd fitir, zikata xwe didine wan, dema zarokên wan da xwendinê her malbat bi qasî taqeta xwe heqê wî dide, kinc û eşyayên miriyan didine wan. Ewna jî bi vî awayî debara xwe dikin.

“Û qewî qedrê melan dizanin û îkrama wan dikin. Eger melayek cahilekî biqutê weyaxo çêr bikitin ew cahil destê xo li melayî hîlnagirîn û xeberan li melan wernagerînin. Û li semtê Bohtan û Hekarî û Behdîn û Şoran wekû cahil bi rê ve rastî melan bèn ji dewara xo peya dibin û destêd melayî radimûsin û paşê siwar dibin û diçine riya xo.”³⁹²

³⁹⁰ H. b. r. 155, 156, 157.

³⁹¹ H. b. r. 165.

³⁹² H. b. r. 154.

10.10.2.2. Şêx

Wekî melayan şêx jî li cem kurdan qedirbilind in û her çendî nexwendî û nezan bin jî qîmetê didin wan. Lewra ji her kom û eşîrê şêxek heye û ew jî li gor xebera wî hereket dikan. Bazîdî wiha balê dikşîne statuya wan.

“Ektrad bi î‘tiqad cahiliye qewî bawerî bi şêxêd xo dikan. Her millet û tayifeyekî ji wan mexşûş şêx heyin. Goya aba û ecdadêd wan mirofne şaliş û şêx bûne lakin niha eve ewladêd wan cahil û bêedeb û nezan dibin. Lakin î‘tibara wan li nik ekradan qewî zêde zaf heye. Malêd şêxan li çolê jî bemîne nadizîn û nêzûk nabin û ji xeberêd şêxan bidernakevin. Wekû naxoş û dîn û harêd wan ekradan dibin ewan tînine malêd şêxan ocağê û pez û dewaran qurban ji boy ocağê tînin. Ê ewî ‘elîlî du sê rojan mala şêxî goya li ocağê dihêlîn. Ê ew şêx we bi daran ewî ‘elîlî diquştin û benan ji boy wî ‘elîlî girê didîn goya şifa dibînin. Eger muqedder bûye ew mirofê ‘elîlî fewt bû xilaş dibe û diçite şola xo. Ê îlla eger ecel nehatiye û ji wê ‘illetî xilaş dibitin. Êdî ew mirof goya çirağê wî şêxî ye û li ber benê wê ocağê sal bi sal elbette dewarekî dê ji boy wê ocağê hediye bibitin. Ê kur û ewladêd wî mirofî jî dîsanê li ber benê wî şêxî ye. Êdî ew mirof naçine nik şêxek dinê. Wiha bi vî terzî ekradan her tayifeyekê şêxêd wan û zêde pê î‘tîbarê dikan.”³⁹³

Nivîskar vê hurmeta wana zêde ya ji bo şêxan, bi taybetî jî şêxên nezan rexne dike, wekî baweriya cahiliyeyê bi nav dike. Lewra ew şêxan wekî cîgeha çareseriyê dizanin, nexweş, dîn û harên xwe dibin ser wan û ew jî li gor hişê xwe qaşo wan derman dikan.

10.10.2.3. Mizgeft

Di civaka Îslamê de avakirina mizgeftan pir girîng e. Loma ji wan re mala Xwedê tê gotin. Lewra ew der cihê civîn, şêwr û îrşada mislimana ye. Her wiha ciyê perwerdeyê ye.³⁹⁴ Ew der ciyê pêşwazîkirina mêvanan e. Bazîdî jî dema qala mizgeftan dike, bi taybetî jî behsa mizgeftên herêma Hekarî, Botan û Soranê dike û dibêje li wan deran ji bo mêvanan ode û mêvanxaneyên taybet tunene, lê gel mêvanên xwe li mizgeftan diezimînin.

“Ektradêd xwecihê Bohtan û Hekarî û Şoran, ewan oçeyêd mêran tunînin, belkû mihmanxana wan mizgeft e. Herçî mêwanî têtin, eger siwar eger peya eger maqûl eger jar rast diçite mizgeftê. Eger siwar in, gundî diçin û hespêd wan tînin û li mala xo girê didîn û alif didinê û xuyî dikan. Ew mêwan jî li mizgeftê diêwirîn. Wekû bûye êvarî, ehlê gundî mezîn û biçûk heryekî amanekî zadê herçî Xudê dayî digel

³⁹³ H. b. r. 119, 120.

³⁹⁴ Hüseyin Yılmaz, *Camilerin Eğitim Fonksiyonu*, Dem Yayınları, İstanbul, 2013.

du sê nanan li ser destî tînin mizgeftê. Wekû nimêja êvarê dikin, destexanê radixînin, ewan amanêd zadan datînin, digel mêwanan teşamî dixun. Ê paşê ji malêd xo ji boy mêwanan nivînêd razanê jî tînin. Lakin mizgeftêd wan kuçik tê heyin. Agirî hil dikin qewî germ dibitin. Ê raxistî ye wekû oşeyan bi tedarik in...”³⁹⁵

Bi vî awayî em pê dihesin ku wê demê mizgeft wekî ku di dîroka Îslamê de jî wisa bûye fonksiyonel dihatin bikaranîn, lewra êdî îro mizgeft tenê ji bo nimêjkirinê hene, car carna jî li mizgeftê hinek mela havînan Qur’anxwendinê hînî zarokan dikin û hew.

10.11. Xwarin û Vexwarinên Kurdan

Çanda xwarinê li gor civakan diguhere û li ser rûyê dinyayê ev çand wekî diyardeyeke bi bandor tê qebûlkirin û beşek ji nasnameya gelan e. Ji ber ku Bazîdî piranî li ser kurdên koçer disekine gava behsa xwarinan dike her çendî cureyên xawrinên kurdan zehf e û sifreya wan dewlemend e³⁹⁶ jî dibêje cureyên xwarinên wan kêr in.

“Ê dawet û diyaftêd ekra dan zad û teşamêd wan birinc û goşt e, êdî zêde ew zadê enwa’ û cins cins çêkirîn nizanin û ‘adet nekirîne. Belkû zafî qeş enwa’ û cinsêd zadan nedîtine û nizanin. Êwan cinsê zadî û teşamî ye. Lakin zaf simaşan radixînin û tijî zadê goştî û birincî dikin. Ew cem‘iyet dest bi dest rûtînin û dixun û radibin, destekî dinê têtin û dîsanê zadê wekû kêr dibitin tînin, heta ku nas hemû zadî dixun.”³⁹⁷

Lê helbet her çendî cureyên xwarinên wan zêde nebin jî ji bilî van hinek xwarinên wanê din jî hene.

“...Paşê wê rojê ji wê poşînê hêlawê çêdikin û li malêd cîran û xizman belav dikin û ji wê poşînê hildigirin vedişêrin. Goya ji boy bereket.

...Rojêd ‘eydan ‘adet e, mezîn û biçûkêd wan elbette hêlise çêdikin...”³⁹⁸

“...Îcarê ewan kadan belav dikin û dixun dikine şayî. Îcarê paşê beranan tevî keriyêd xo dikin. Weqtê ku şed rojê beranan tamam dibitin dîsanê kade û xurinê çêdikin û şayî dikin ji boy silametiya pezêd xo.”³⁹⁹

³⁹⁵ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 153.

³⁹⁶ Fuad Rahman - Mirella Galetti, *Kürt Yemek Kültürü*, wer. Fuat Serdaroğlu, Avesta, İstanbul, 2010.

³⁹⁷ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 158, 159.

³⁹⁸ H. b. r. 149.

³⁹⁹ H. b. r. 126.

Wekî tê dîtî Bazîdî qala zêde xwarinan nake û vê jî li ser nezanîna wan hesab dike. Lê tiştêkî balkêşê ku Bazîdî qalê dike qelûn û qehweya kurdan e û heta dibêje kurd piçûk û mezin hemû qelûnê dikşînin.

“Ektrad mezîn û biçûk mecbûrî qelûnê ne û herçî mêwanî bêtin elbette ji boy her yekî qelûnekî tijî dikin.”⁴⁰⁰

Bi taybetî dema behsa mêvanan tê kirin navê qehweyê derbas dibe. Her wiha ev nîşana mêvanperwerî û malmeziniyê ye jî.

“Û aqayêd wan û maqûl û dewletlûyêd wan hemû xuyîqehwe û taxum in. Eger şayed mêwanî jî qehwe û taxum hebî, nahêlîn ku taxuma mêwanan biderkevin û bidne şolê. Belkû qehwe û taxuma xuyê malê dixebîte...”⁴⁰¹

10.12. Cil û Bergên Kurdan

Hêmaneke girîng ya ku dewlendiya çanda gelekî nîşan dide jî xwekirina wan e. Şekl û cîsnê xwekirinan derheqê bîr û bawerî, dewlemendî û xizanî, şahî û şînê, şer û aştiya gelekî de agahiyê dide. Lewra di hemû dem û xêlên jiyandê de li gor rewşê kinc tî xwekirin û ev wekî neynikeke ragihandinê ye.

Bazîdî bi taybetî qala kinc û xwekirina kurdan nekiriye, lê dema qala şînkirin, mirin û şerê wan dike di wê navberê de qala hinek reng, cîns û cureyên cil û bergên wan dike.

“Lakin ew mirofêd ku hiznî ne ew libasêd şor û qirmiz û cilêd faxire ber nakin û destêd xo hîne nakin û çavêd xo kil nadin û naçîne dawetan û kêfxweşîyan. Û li nik wan jinên bî jî şerm e, xo naxemilînin û libasêd şor û qirmiz wernagirîn û naçîne dawet û kêfxweşîyan.”⁴⁰²

Wekî tê dîtî kurd di şahî û dewetan de cil û bergên xemilandî, reng bi reng li xwe dikin, destê xwe hine dikin û çavên xwe jî kil dikin. Her wiha kurd bi destê xwe kincên xwe didurin û li gor gotina nivîskar malê pirtiyê cil û bergên wan jî caw e. Solên jinên wan jî kêm in, heke hebe çarixan pê dikin.

“Ekşerî jinêd ekradan feqîr el hâl in bihar û havîn û payîzan pêxwaş digerin û şolan dikin. Zivistanan ew jinêd bêçare çarogê pê dikin û libasêd wan jî cawê şor û cawê reş û heşîn û çît e...”⁴⁰³

⁴⁰⁰ H. b. r. 90.

⁴⁰¹ H. b. r. 187.

⁴⁰² H. b. r. 110.

⁴⁰³ H. b. r. 97, 98.

Lê ji wan kesên dewlemend xwedî cil û bergên biha ne, bo mînak qapût û kurkên wan hene.

“...Ew mirî eger mêr e, libasekî wî beqîmet meşela qapût û kurk weyaxo şalê bibiha davêjîne ser cinazeya wî. Û eger jîn e, dîsanê libasekî wê zîqîmet davêjîne ser cinazeyî û dibine qebrê. Ew libasê ku avêtine ser cinazeyî, ew ji boy melan in. Ew dibin û mela difiroşin û li yekûdu parî vedikin.”⁴⁰⁴

10.13. Xirabiyên Kurdan

Xirabiyên di nav kurdan de yên ku em ji vê pirtûkê hîn dibin şerkirin, mêrkujî, talan, dizî, xundarî, bi derewî sondxawrin, şixûla xirab ya jin û mêran e. Bi giştî ev karên nebaş di nav wan de çêdibin.

Kurd ji bo mêrkujiyê îlla pey heyfa xwe diçin, li ku derê û çî demê firsend bikeve dest wan tola xwe hildidin. Her wiha heke jinek şixula xirab bike ewê dikujin, mêr bike wî jî dikujin, tu kes xwîna wan jî naxwaze.

“...Eger çî jinêd ekra dan perdenişin nînin lakin xirab jî tê da kê m heyin. Ew jî ji tîrsan lewrane wekû me ‘azellah jinekê xirabî kir elbette warişêd wê ew jinê dikujin eşla îmkana xweşiyê nîne îlla xirabî wê kuştine. Eger ew jîna xirab û ew mêrê ku digel wê bûye bi cihekî bi hev ra dîtin mêrî û jinê herdukan jî dikujin û xûna wan tunînin. Û kesek li qahban nabite xuyî. Li nik wan xuyîbiderketina li qahban qewî zêde ‘eyb e, lakin li qebahetêd mayî dibine xuyî. Xûndarî û dizî di van da rica û hêvî û xuyîbiderketin dibitin lakin ji boy şola xirab rica û şefa‘et nabitin. Îlla xuyêd jinê herdukan jî filhal qetl dikin. Û paşê diyet û xûnxwastin jî tunîne...”⁴⁰⁵

Karê xirab ê herî zêde dikin dizî û talan e, lê beyî destura axayên xwe vî şixûlî nakin.

“Ew êlat jî bê îzn û emrê aqayî naçine dizî û xirabiyê. Eger dizî û xirabiyê bikin tèn û dibêjine aqayî. Eger paşê xuyî biderket û nekarîn ku ewî malî bixun aqa ewî malî ji dizan distîne û didine xuyê malî. Û îlla eger xuyê malî bi derneketin û kivş nebû îcarê nîva wî malî ji boy aqayî ye û nîvê dinê ji boy dizan in...”⁴⁰⁶

Lê ev kar bi destê kasib û feqîrên wan tê kirin. Yên din tu carê destê xwe dirêjî malê haram nakin û heramiyê naxine nav mal û milkê xwe.

⁴⁰⁴ H. b. r. 186, 187.

⁴⁰⁵ H. b. r. 113.

⁴⁰⁶ H. b. r. 140.

“Ew taxumêd ku me‘azellah dizî û xirabiyê dikin, ew jarêd ekradanê bê‘îlac in. Lakin xuyîmalêd dewletlû eşla heramê nêzûkî xo nakin û xêr û şedeqan didine jaran...”⁴⁰⁷

Heta axayên wan kesên karên xirab dikin digrin hepis dikin, li zincîrê dixin û berdidinê ji nav êl û zomeya xwe diqewirînin.

“Û aqayêd wan zencîr jî heyin ji ekradan xuyî qebaşetan digrînin û hebs dikin û talan dikin û dibe ku mala wî mirofî ji nêva êla xo diqewirînin û îxrac dikin.”⁴⁰⁸

Ji karên xirab yê bêperwa dikin yek jî bi derewî sondxwarin e. Ev xuyê xirab di nav wan de gelekî zêde belav bûye.

“Û ekrad zaf bi cihê derewî şondê dixun lewrane cahil in me‘azellah şond çî ye nizanin. Û ekşerê şondêd wan bi qebra babî û birayî û kurî ye weyaxo bi serê babî û birayî û kurî ye. Lakin şonda wanî rast ku ew jê dişirsin û bi cihê derewî ewê şondê naxun. Şonda wanî ku naxun ew e ku tînin mista wî mirofî tijî xulî dikin û dibêjînin ku ewê xuliyê li ber bayê belav bike û bide bayê û bebêje ku bilanî urta min jî wiha ber ba bibe. Ekrad evê şondê bi cihê derewî naxun. Goya î‘tiqada wan ew e ku eger evê şondê bi derewî bixutin mala wî diçite mîratan.”⁴⁰⁹

10.14. Zewac û Dawetên Kurdan

Mijareke balkêş ya risaleya Bazîdî jî dawet û zewacên kurdan e. Ji bo qala vê mijarê bike nivîskar behsa berdêl, bêşikkertme, dawet, gerdek û gelek tiştên din kiriye. Ji bo wêneyekî zelal derkeve holê emê di bin çend sernavan de qala van bikin.

10.14.1. Bêşikkertme

Ev edet li Kurdistanê di nav kurdan de her wiha gelên cînar tirk, azerî û hwd de jî heye. Jixwe ji navê wê jî diyar e –tirkî ye- ev ji cînarên xwe yên tirk hildane. Li gor vê dema zarokên du malbatan dibin mezinê malê hê di hêlecan/bêşîkê de soz didin hevdu ku yê keç û lawên xwe bidine hevdu. Li gor vê ewê êdî vê qebûl bikin.

“Û ‘adetêd ekradan in biçikan (biçûkan) bêşikkertme dikin. Meşela wekû ji boy mirofêkî keçek welidî û ji boy mirofêkî jî kurek welidî, heman di roja wiladetê da ewê keçê didine wî kurî, bêşikkertme dibêjînin. Heta ku ew kur û keç baliğ dibin, êdî men‘ û poşmanî nabit, îcarê daweta wan herdukan dikin.”⁴¹⁰

⁴⁰⁷ H. b. r. 89.

⁴⁰⁸ H. b. r. 141.

⁴⁰⁹ H. b. r. 139.

⁴¹⁰ H. b. r. 196, 197.

Ev edet her çendî kêmbê jî îro jî di nav kurdan de heye, lê ji ber ku ne bi dilê keç û xortan e û dibe sedema pirsgirêkan.

10.14.2. Berdêl

Di nav kurdan de berdêl edetê berbelav e, li gor bêşikkertmeyê ew hê bêtir meqbûl e.⁴¹¹ Îro jî di nav gel de heye. Li gor vê edetê malbat keçên xwe di ber hevdu de diguherînin, ango herdu malbatên xinamî keça xwe di berdêla keça malbata din de didin û qelend naxwazin û ji vê re dibêjin berdêlî.

“Û di nêv ekradan berdêlî jî dikin. Meşela yek xoha xo dide yekî û xoha wî jî ji boy xo distîne. Weyaxo keça xo dide yekî û keça wî ji boy xo distîne, yanê mibadele dikin. Her kesek ji wan meşrefa daweta xo dibîne.”⁴¹²

Lê ev bi piranî dibe sedema nerazîbûna bûk û zavayê, herî zêde jî ya bûkê. Lewra carna keça didin kesên kal û ne bi dile lê keçê. Ev yek jî dibe baîsê gelek bûyerên nebaş. Lewra revîna keç û bûkên mêrkirî gelek caran ji ber van edetên xirab çêdibin. Jixwe di nav kurdan de heqê kifşkirina keçê ya zava tune ye. Heta qet fikra wê jî nayê pirsîn.

“Û keç û jinêd ekradan bi xo bi nefsa xo muxtar nînin. Belkû bab û birayê keçê wekû ew dayîne mirofêkî, keç qadirê me‘nê nabî. Elbette xwah naxwah, keçê dê wî mirofî bistîne, bilanî keç ji wî huşnûd jî nebî. Eve ‘adete şer‘îye nîne, belkû şermiye ye. Di ekradan qewî ‘eyb e ku bab û bira bidit, ew bibêjîn ku em nastînin.”⁴¹³

Bazîdî dema qala edetên kurdan dike, tenê wekî waqienivîsekî neqil nake, li gel vegotîne şîrove û rexne jî dike. Loma gava qala vê edetê dike ku neheqîyeke mezin li jin û keçan dikin, bale dikşîne ku ev rewş çawa ku ne li gor şerîeta Îslamê ye her wisa ji ber nebaşîya xwe sedema şermê ye jî.

10.14.3. Qelend û Xelat

Di zewacê de ji edetên kurdan yeka carî jî qelend e. Dema kesek keça xwe dide mêr ji bo mesrefên dawetê heqêkî jê re qelend û nexd tê gotin ji mala zavê distînin. Ev qelend û xelat li gor hal û wextê malbata zavê diguherin. Li hinek herêman li gel qelend ji bo bav, bira, ap û xizmên din jî wekî xelat, hesp, kinc û sîlah jî tên xwestin.

“Weqtê îbtida keçêkê dixwazîn wekû dan hespekî bi taxum herêkirîn distînin. Paşê şîrînî vedixun û paşê nîşan dikin. Û qalenêd wan zaf dibe şed û duşed û panşed pez.

⁴¹¹ Müslüm Yücel, *Berdêl Evlilik İttifakı*, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2008.

⁴¹² Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 196.

⁴¹³ H. b. r. 180.

Û hind çend bab û da û birayêd bûkê heyin, elbette ji boy heryekî xelatek lazim e, bê xelat nabî.”⁴¹⁴

Di dawetên kurdan de tenê malbatên bûk û zavê mesref nakin, her wiha kesên tên dawetan jî xelatan tînin, alîkariya wan dikin. Bazîdî ji bo vê peyva toypayî bi kar tîne.

“Eger xuyê dawetê aça weya dewletmend e, ew gazî kê ku bikitin, keleşekî mezîn ji boy wî verê dikin û ewan gazî dawetê dikin. Ew mirofêd ku hatine gazîkirîn, anegora halêd xo du û sê û deh pezan ji boy xuyê dawetê verê dikin û paşê jî bi xo diçin dawetê. Û ew xuyê dawetê ji meşrefa dawetê zêdetir pez û mal ji boy wî berhev dibî. Û eger xuyê dawetê feqîr û jar e, dîsanê bi wê dawetê xoşhal dibî, lewrane herkes zêde toypayî ji bo wî verê dikin, hal û malek ji boy wî peyda dibitin. Eger mirofêd gazî dawetê dikin, merifne biçûk û bê hal mal in, serê her mirofêkî keleşekîreki biçûk verê dikin û ewan mirofan gazî dikin dawetê. Elbette ew mirofêd biçûk jî labud dê pezekê toypayî ji boy xuyê dawetê verê bikitin...”⁴¹⁵

10.14.4. Dawet

Dawetên kurdan pir şên û rengîn in. Li gor rewşa wan ya aboriyê hinek çend rojan û hefteyekê jî dewata xwe dirêj dikin. Em bi saya risaleya Bazîdî pê dihesin ku ev kevneşopiyeke qedîm e.

“Dawetêd wan sê rojan, hefta heft rojan anegora halî dibitin. Bûk û zavê jî paşê tînin û dêxine govendê ew jî dileyzîn. Wekû bûk û zava dikevîne govendê her kesek pez û diraf li wan şabaş dikitin û gelek pez û diraf cem’ dibî, du hişsa wî dirafî ji boy xuyê dawetê û hişseyek ji boy mişriban in.”⁴¹⁶

Di dawetan de li gel govend û kilamên dengbêjan amûrên muzîkê hene. Ji van yên navê wan derbas dibin, kemençe, ney, def, çinger û defik in.

“...Û dawetêd wan jî zaf bi deng û istiran dibin, ew bêrite dibêjin. Dengbêjêd wan heyin, bêritan dibêjin, ew jî bi govend reqş dikin. Lakin jîn û mêt keç û law hemû têt da destêd yekûdu digirîn û reqşê dikin. Û keçêd wan û jîn di govendê da distirên û dileyzîn, lakin dibe ku daweta maqûlan da def û nay û kemançe û defik û çinger jî hebitin. Emma sazbandêd wan mişrib in...”⁴¹⁷

⁴¹⁴ H. b. r. 162.

⁴¹⁵ H. b. r. 161.

⁴¹⁶ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 159.

⁴¹⁷ H. b. r. 160.

10.14.5. Gerdek

Di dawetên kurdan de merasima şeva zavatiyê/gerdekê jî girîng e. Ji bo wê jî gelek rê û resm hene. Xelatan bi bûk û zavayê de dikin, ziyafeta didin mêvanan û Bazîdî bi berfirehî teswîra vê merasimê dike.

“Wekû bûkê tînin, jinek ji mala kurî berbûk dibêjin, diçite mala bûkê û jînek jî ji mala bûkê dîsanê berbûk dibêjin, digel bûkê ji wî kenarî têtin, bûkê siwarî dikin. Û miqdarekî siwaran li berayikê dileyzîn û bi kêf tînine mala zavayî û marê dibirîn û bi şev didine gerdekê. Paşê sê rojan ewan jinêd ku bûyine berbûkî her yekê xelatekê didinê û bi rê dikin. Paşê middeyekî mala bûk û zavê gazî hevdu diyafetê dikin, mêr û jîn digel cîran û xizman û hediye didine yekûdu.”⁴¹⁸

Hin caran dibe ku zava nikaribe gerdekê bike, ji bo vê kurd dibêjin girêdan. Ji bo çareserkirina vê jî gelekî hewl didin. Nexwe ev ji bo rûmeta bûk û zavayî pir girîng e û dibe sedema gotegot û şikê.

“Şayed eger zafa girêdayî bitin û gerdek nebitin ew lawêd dawetî ewî zavayî dibin dêxine çemî, ava sar. Paşê tînin zavayî verêdikin nik bûkê gerdekê. Wekû wê şevê ew zava gerdek nebitin qewî ‘eyb e. Û şubhe li xelqê peyda dibitin ku belkû ev bûk keç û bakire nîne. Lewranê evne aşkar nakin me‘azellah eger bûk bakire bidernekevîtin qewî riswayî dibitin. Ewê bûkê verêdikin mala babê û qelenê dayî distînin, ev xuyêd jinê ewê bûkê dikuji. Îcarê dibite neyariyekî mezîn. Lakin şayed eger iqtîda bikîtin ku bûk keç nebitin elbette ew bi ehwâlê xo dizanîtin wekû bûye tedarîka dawetê ew bûk bi xo je‘riyê dixutin û berî dawetê telef dibitin êdî namînite wê rojê.”⁴¹⁹

10.15. Eyd û Şahiyên Kurdan

10.15.1. Eyda Remezan û Qurbanê

Di *‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayîfê Ekradiye* de di mijara eyd û şahiyên de bi kurtasî be jî agahiyên sethî hene. Wisa tê xuyanê Bazîdî dema ev namilkeya xwe nivîsiye, di destpêkê de mijar diyar nekirine. Hema xwebera li ku derê li gor meseleyê çî hatibe bîra wî bêyî ku lê binihêre cihê wê ye yan ne nivîsiye. Ji ber ku mijar ne diyar e, hin edetên mirov dibêje divê qala wê kiribe, tunene. Ji van yek jî eydên kurdan in, bo mînak rasterast qala eydên qurban û remezanê nake. Lê dema qala bexşîşên di eydan de tîne belakirin dike navê rojîyê derbas dibe û qurban jî di mijara ziyaret û nezran de derbas dibe.

⁴¹⁸ H. b. r. 158.

⁴¹⁹ H. b. r. 80

“...Rojêd ‘eydan ‘adet e, mezîn û biçûkêd wan elbette helîse çêdikin. Û çî qeder ku du mirof digel yekûdu dijmin û neyar bibin, elbette rojêd ‘eydan digel hevdu şulh dikan û xeber didin. Heta sê rojan diçine zomêd yekûdu. ‘Eydanî di ‘eyd û Xidirnebiyê da mirofêd maqûl ‘eydane û bexşîşan didine biçûkan. Û zarok li malan jî boy ‘eydane û Xidirnebiyê li malan digerîn, pare weyaxo fêkî, elbette tiştêkî didine zarokan.”⁴²⁰

Li vir tiştê balkêş ew e Bazîdî girîngiya eydan ya di nav civakê de û bandora wan ya li ser têkiliyên gel bi bîr dixê. Lewra kesên neyar di eydan de li hevdu tîn, diçin dîtina meriv û xizmên xwe. Ji hêla civaknasiyê ve ev faktoreke esasî ye. Her wiha wekî şahî û bi dayîna xelat û diyariyan jî ji bo zarokan demên hêja ne eyd.

10.15.2. Zadika Hêksorê û Kafirkûr

Bazîdî qala şahiya Xidirnebî û hin şahiyên filleyên herêmê wekî hêksorê û kafirkûriyê dike û vana jî di nav eydan de hesab dike. Ev yek jî asta têkiliya herdu civakên cînar kurd û filleyan nîşan dide.

“Û roja ku file zadika hêksorê dikan, wê rojê ekradêd Hekariyan kafirkûr dibêjin. Ew jî ji mikrêd fillan bi derve derdikevin geryanê û li malêd xo zadan çêdikin û dixun. Û ekradêd semtê Wan û Mûş û Bazîdê ew jî di hêksorê da li malêd xo da jî boy zarokêd xo hêkan şor dikan û ew jî digel fillan û digel yekûdu hêk dileyzîn.”⁴²¹

Ev şahiyên gelên cînar di nav wan de bela bûne û bi navên cuda hatine zanîn û li gel hevdu hatine pîrozkirin.

10.15.3. Çarşenba Axir, Axirçarşenbe yan Qereçarşenbe

Ji şahiyên kurdan yek jî bi forma Bazîdî dinivîse çarşenba axir, axirçarşenbe û yan jî bi navê din qereçarşenbe ya meha sibatê ye wekî şahiyê balkêş tê xuyanê.

“Roja çarşenba axirî şibatê ekrad, axirçarşenbe û qereçarşenbe dibêjin. Wê rojê kêfxweşî dikan û digel kesekî de‘wa û şerî nakin. Û li malêd xo zad û te‘aman zaf çêdikin. Goya li î‘tiqada wan da ew e ku herçî kesê wê rojê çî ‘emelî bikitin heta salê di wî ‘emelî da dibitin...”⁴²²

Di nav kurdên elewî de ev eyda îro jî bi navê qereçarşembe tê pîroz kirin.⁴²³ Dema wê di navbera çarşema dawiya meha sibatê û çarşema meha adarê de ye. Di wan rojan de rojiyê digrin, diçin gelî û newalan dora çeman xwe dişon, giha û çereyên bi şifa

⁴²⁰ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 148, 149.

⁴²¹ H. b. r. 148.

⁴²² H. b. r. 149.

⁴²³ Munzur Çem, *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, Weşanên Vate, İstanbul, 2009, r. 65, 69.

berev dikin, ji bo nexweşên xwe dua û niyazan dikin. Ango ev roj îro êdî di nav kurdên din –bi gotina Bazîdî kurdên şafîî- de zêde nayê pîrozkirin.

Eydeke bi navê çarşemasor jî heye û di nav kurdên êzdî de di çarşema serê nîsanê de pîroz dikin.

10.15.4. Beranberdan û Serêpêz

Ji bilî van hinek şahiyên din jî hene kurd wekî şahî qebûl dikin û li gor wê xwarinan çêdikin, diçin dîtina hevdu. Ji van yên sereke dema beranberdanê, serêpêz anga sere zayîna mihan, berxbir, yexnax, geşt û seyranên wanê jê re bindarûk dibêjin hene.

“Û beranberdan û serê (şedî) pezêd wan jî dîsanê bi vî hesabî ye. Wekû payîz nêvî dibitin ‘adet e li nik wan kadan çêdikin û dibin diçine nik keriyêd mihan û beranan jî dixemilînin û dibine wê derê. Îcarê ewan kadan belav dikin û dixun dikine şayî. Îcarê paşê beranan tevî keriyêd xo dikin. Weqtê ku şed rojê beranan tamam dibitin dîsanê kade û xurînê çêdikin û şayî dikin ji boy silametiya pezêd xo.”⁴²⁴

10.15.5. Yexnax

Ji şahiyên kurdan yeka mirov wekî şahiyêke taybet qebûl bike yexnax e. Her çendî êdî îro di nav gel de nema be jî li gor ku nivîskar qalê dike, li ser pêkhatina hêvî û daxwazekê wekî şahiya keç û xortan tê lidarxistin.

“Û gelek caran dibe ku jîn we‘d dikin ku filan şola min bête serî weyaxo nexweşî şifayê bibînitin ez dê di riya Xudê da yeğnagekî ji boy ciwanan bikim. Paşê wekû şola wê hate serî ewê we‘dê bi cih tînin, ewî yeğnağî dikitin. Yeğnağ ew e ku bi daweta verê dikitin. Herçî keç û kurêd bêkar heyin û bûk û jinêd ciwan heyin hemûyan bi şev gazî dikitin. Û xaniyekî mezîn vala dikitin û çirağan û dengbêj û sazan hađir dikin. Îcarê bi şev herçî ciwan û keç û law di wê mehelleyê weyaxo di wî gundî da heyin hemû pêkve tene wî xaniyî. Sazan diquşin û distirên û govendan digrin û reqş dikin heta ku şubeh dibitin. Îcarê her kes belav dibin û diçine malêd xo.”⁴²⁵

Bazîdî dema qala van eyd û şahiyan dike, çawa bi taybetî navê eyda remezan û qurbanê nake qet behsa newrozê jî nake. Ev jî xaleke balkêş e. Dibe ku di wan heyaman de newroz di nav kurdan de nehatibe pîrozkirin. Jixwe qet behsa kosegelî jî nake û

⁴²⁴ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 126, 127.

⁴²⁵ H. b. r. 146, 147.

kosegelî şahiyêke rengîn e, gelek hêmanên şanoyê jî tê de hene û wekî şanoya kurdan ya ewil tê qebûlkin.

10.15.6. Kirîvatî û Sinetkirina Zarokan

Kurd gava zarokên xwe sinet dikin, vê wekî şahî pîroz û dawetê dikin. Loma ziyafetê didin û gazî merivan dikin. Di daweta sinetê de edeta kirîvatîyê derdikeve pêş. Li gor vê edetê dema kesek lawê xwe sinet bike kesekî wekî kirîv kifş dike. Kirîv jî ew kes e ku gava zarok tê sinetkirin -zarokê tê sinetkirin jî sanîgê kirîv e- zarok dikeve pêşa wî û wisa tê sinetkirin. Li gor vê têtîliyê êdî eqrebatîyêke xurt çêdibe, heta di nav hinek kurdan de wisa dibe ku êdî ew kes dibe merivekî ji malê. Lê di vê şahiyê xelat û diyarî têtî dayîn. Nivîskar wiha qala vê dike:

“Û ekrad daweta kirîwayîyê dikin û dibine kirîwêd yekûdu. Ew jî ‘adet wisan e wekû yek mirad dikitin ku mirofêkî ji boy xo bikitin kirîwa, eger ew herdu mirof jora jorîn e, tînin berê hespekî dixemilîne bi rext û taxum verê dikite mala wî mirofê ku bilanê bibite kirîwê min ew jî qebûl dikitin û bexşîşekî didine wî mirofê ku hesp birîne û cewabê dide ku belê ez dê bibime kirîw. Û eger ew herdu mirofêd ku kirîwayî dikin ji qismê ewset weyaxod edna ne ew jî beranekî dixemilînin û dişînin mala kirîwî. Îcarê ew dibine kirîw.

Xuyê kurêd ku dê bibine sinetkirîn tedarîka zad û te‘amê dikitin. Wekî rojê dê ew zarok bêne birîn xelqê gazî dikin û kirîw jî têtînin. Paşê te‘amî xelq belav dibin. Îcarê dellak têtînin ewan zarokan dibiritin. Lakin bexşîşa dellakî û xelata wî ê ku bûyî kirîwa ew mirof diditin. Û heta sê rojan rojê du danan xunçe û zad ji mala kirîwayî ji boy wan zarokan têtînin. Wekû ew zarok rabûn ew kirîwa ji boy her yekî anegora hâlê xo destekî libasî dikitin û dike ber wan. Paşî çend rojekan êdî babê zarokan ewî kirîwî mêr û jîn gazî mala xo diyafetê dikin. Û paşê mêr û jinêd kirîwan anegora hâlêd xo xelat didinê û bi rê dikin.”⁴²⁶

Çawa ku tê dîtî di daweta sinetê de hemû kes li gor rewşa xwe xelat û diyariyan verê dikin û ev di şeklê şahiyekê de dimeşe.

10.16. Lîstikên Kurdan

10.16.1. Şertlîstin

Lîstik beşek ji merasimên kêf û şahiyê ne. Piçûk û mezin her kes li gor emrê xwe, asta xwe dileyîzin. Bi van çalakî û pêşbazîyan civak şên dibe. Bazîdî lîstikên kurdan jîbîr nake û behsa wan jî dike. Ji van yên herî zêde têtî zanîn yek şertlîstin e.

⁴²⁶ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 156, 157, 158.

“Ekrad zaf mecbûr dimayin bi bal şertlîstinê. Şertêd wan meşela ji du terefan weyaxod zêde ji duyan sê û çar qederekî dirafi weyaxo tiştêkî datînin û bi siwarî diçine qoşê. Herçî kesê berê hat û gihaye menzîlê û hespê wî borî îbtida hespê wî bû, ew mirof şertê distîne. Weyaxo dîsanê şert datînin û çend mirof amac datînin û gulle davêjîn. Herçî kesê sê caran li pey yekûdu lê daye, ew şertî dibitin. Û carnan ji boy şolekî biçîrs û zehmet şertê datînin herçî kesê ji ‘ehda wî şolî bêtin ew şertê distîne. Meşela li cihekî me‘reke û şerekî ‘ezîme bûyî û ji du kenaran her yekî şed û duşed mirof hatine kuştin û herdu leşker kêşane û laşêd herdu terefan bi têkel yekûdu wîsanê li meydanê mayîne. Lakin mirofek ji wan wînda ye nîzanin ku hatiye kuştin weyaxo esîr bûye. Bi şev şert datînin herçî kesê bi tenê biçitin û bigihite cihê şerî wê meydanê û seha laşan bikitin û cewabê bînitin ku belê laşê wî mirofî li meydanê heye weyaxo tunîne. Ew mirof diçitin û seha meydanê dikitin û nîşanekê jî ji meydana şerî tînitin û çewa şubeh dibe laşê wî mirofî jî tînitin û ewî şertî distînin. Xulaşê ji boy şolêd wiha cahiliye, şert qewî zêde zaf dibin di nêva ekra dan da heyin.”⁴²⁷

Bazîdî bi berfirehî qala şertlîstina wan dike, li gor vê derdikeve holê ku ji bo şert hespê xwe didine xaran û meydanê ka di pêşbaziyê de pêşiyê dikeve, tiştêkî wekî armanc datînin û bi guleya mêş/nîşan digrin. Wekî din di şer de yan jî şev li gor şertê xwe yekî dişînin cihên dûr û bixetere. Hê mîna vê li ser gelek tiştên mîna hesp, sîlah û keçan dikevîne şert û di encamê de ji şert poşmanbûn/nîkolbûn nabe. Nivîskar van karên cureyekî qumarê ne rexne dike û dibêjê ev karên cahiliyeyê ne.

10.16.2. Setrenc, Tame û Gustîr

Setrenc, tame û kişik di nav kurdan de lîstikên bi navûbang in. Salmezînen kurdan di şevbihêrk û civînên xwe de bi rikeberî derdikeve hemberî hevdu û ji bo ji hevdu bibin li ber xwe didin.

“Û bi xeyr ji van şetrenc û tîme û gustîr evne jî heyin. Bi şertêkî me‘lûm dileyzîn weyaxo name‘lûm dilxwaz dileyzîn. Herçî kesê ew leyz birî ew herçî ku dilê wî bixweze distînin meşela hespêd qenc û tiştêd nadir distînin. Dibe ku di şertê dilxwaz keçan jî distînin. Xoha wî weya keça wî distînin. Nikûl di şertê dilxwazdanî nabitin herçî bixweze elbette dê bidinê.”⁴²⁸

Ji van lîstikan ya kêmtê zanîn gustîl e û li gor ku Jan Dost neqil dike Rudenkoyê lîstika gustîr/gustîlê wiha terîf kiriye:

⁴²⁷ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 133, 134.

⁴²⁸ H. b. r. 132.

“Divê yariyê de çend kes hevbeşiyê dikin. Ev listik wisa pêk tê: Yek tê û heşt heta deh piyaleyên dernexûnkirî anîne, di bin yekê ji wan de gustîlkek heye. Yek ji kesên listikvan derdikeve derve, paşê tê û divê nas bike ka gustîlk di bin kîjan piyaleyê de veşartiyê. Eger pê derxist, ew di lîzê de bi ser dikeve.”⁴²⁹

Di listik û pêşbirkên xwe de kurd li ser tiştên binirx dileyîzin. Bi vî rengê xwe jî ji leyîtika normal dikeve şeklê qumarê. Ev yeka jî gelek caran dibe sedema nebaşiyên. Lewra dayîna keç û xwîşkan ji ber van leyîstikan karekî kirêt e. Lê bûye edet li ser çî leyîstibin divê ew pêk bê.

10.16.3. Cînaq û Yadest

Lîstika cînaqê berê di nav kurdan de hebûye. Di vê listikê de du meriv hestiyekî sîngê kewan, dîkan yan jî teyran yê du nikul tîne û du meriv her yek bi aliyekî wê de digre ber bi xwe ve kaş dike. Hestî di destê kê de bişkê ewê din jê dibe. “...Ev şerta jî wisan e ku di sîngê meşela kew û dîk û teyran da cînaq heye, tînin ewê cînaqê du mirof dikêşîn û dişkênîn...”⁴³⁰ A ev gotina li ser vê listikê îro di nav kurmancan de bûye biwêj û ji bo bigirveş û nakokiyan bi mecazî tê bikaranîn.

Ji xêncî vê listikeke dinê ya jihevdubirinê ya bi navê yadest jî heye ku di nav kurdan gelekî tê listin, jin û mêr her kes dileyîze û Bazîdî vê listikê wiha terfîf dike:

“...Êdî ew herdu mirof herçî yek meşela qelûnê weyaxo fîncana qawê weyaxo fêkî û tişteki bidite destê mirofê dinê gerek ew şert da’im di bîra wan da bî. Ew mirofê ku meşela ewî tiştê dayî distîne dê bibêjîtin ku min li bîr e. Eger ewî mirofî şert ji bîrkirî min li bîr e negot ew mirofê ku ewî tiştî didite destê wî îcarê ew mirof dibêje ku yadest. Wekû ewî yadest got ewî şert ji oldaşê xo bîriye. Herçî şert e ew datînin eger ku di fikra oldaşî da wekû ewî tişteki dayî ê istandî min li bîr e dibêje tişteki tune. Ew şert baqî ye heta ew herdu yek yekî bixapîne û ji bîra ya dinê biçîtin û ji wî bibîtin. Wisanî mirofêd be bîr heyin ku ew şert nêzûkî salekê di nêva wan da dimîne. Paşê kanîm kî dibîtin. Ev şert zaf heyin. Jîn û keç digel yekûdu û digel mêran bi şert dileyîzin û ji yekûdu dibin ew jî dibe ku dilxwaz şert digrîn û ji yekûdu şertê distînin.”⁴³¹

⁴²⁹ Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 90.

⁴³⁰ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 132.

⁴³¹ H. b. r. 131, 132.

10.16.4. Cirîd û Hol

Cirîd leystikek e ku li ser pişta hespan tê leyîstin û siwar li ser pişta hespê darên ku jê re dibêjin cirîd diavêjine hevdu û bi vî rengî dewam dikin. Hol jî gog e û li herêma serhedê jê re hol tê gotin û hola ligan heye û ya bi daran tê leyîstin jî heye.

“Ser êvaran herçî ciwan û lawêd zomeyî heyin hemû berhev dibin, li ber malan ya hol weyaxo cirîdê dileyzîn û herçî ixtiyar in ew jî ji kenarekî da seyrê dikin. Û herçî keç û bûk û jinêd ciwan in ew jî teşiyêd xo hildigrîn li kenarekî ew darûk dibêjin li wê derê her kesek teşiya xo dirêsitin ew jî seyra wan lawêd ku dileyzîn dikin...”⁴³²

10.17. Hesp, Çek, Kuçik û Heywanên Kurdan

Jiyana kurdên koçer li ser xwedîkirina heywanan ava bûye, heta mirov dikare bibêje ji ber ku heywana xwedî dikin bûne koçer. Ango ev herdu tişt ji hevdu re him bûne sebeb û him jî encam. Helbet li gel wan çek û sîlaha wan, bêyî hevdu nabin. Loma koçer bêyî heywan nabe. Nivîskar di kitêba xwe de ji heywanên kurdan herî zêde qala hesp, se, pez, dewar û deveyan kiriye. Bi vî awayî em pê dihesin ku wê heyamê deveyên ku êdî di nav kurdan de nayên xweyîkirin hebûne. Lê ji heywanên wan yê herî li ber dile wan şîrîn helbet hespên wan in, di şahî û şeran de hesp herdem li gel xwediyê xwe nin.

10.17.1. Hesp

Ji ber şeklê jiyana wan kurd hewcedarê hespan in. Hespên wan jî cins in û Bazîdî van cinsan dijmire: “Û hespêd sipehî û cins di nêv wan da heyin, çar cins hesp heyin; ki‘êl, hed, seglawî, mi‘eng. Necdî jî peyda dibin, lakin kêm heyin.”⁴³³ Hespên kihêl, seglawî, necdî, ereb yên herî meqbûl in. Di şerê wan de hevalên wanê tekane hesp in.

“Hespêd wan qewî zêde bi dewam û şolker dibin, lewranê dibêjin şev û rojê lê siwar dibin û zaf zorê didine hespan û di şeran da jî ekrad hespêd bi eylem di‘emilînin û çiqaş ku nebûye tengî zorê li hespêd xo nakin û dihuşînin. Hespêd wanê cins şev û rojan ji tîrsa dizan revandîne bi qeyd dibin û mifte jî li nik xuyê malê dibî. Lakin daîm hespêd siwariya şev û rojê bi zîn û hadîrligab li qerpûza zîn dibin...”⁴³⁴

Hespên rewan, xurt li cem wan gelekî bi qîmet in. Loma ji bo parastina wan hemû tevdîran dibînin. Wisa tê xuyanê nivîskar ji bo hezkirina wan ya hespan nîşan bide

⁴³² H. b. r. 83.

⁴³³ H. b. r. 168.

⁴³⁴ H. b. r. 167.

hinekî jî mibalexe kiriye û dibêje hespên wan şev û roj bi zîn û pusat in. Her wiha ji bo cinsê wan xirab nebe gelekî bi ihtimam in.

Ektrad digerin û hespêd cins dikirin û tînin bere nêva revoya xo û diben ji boy dolê. Hespêd bêcins nahêline nêva revoyêd xo. Û bargîrêd wan jî wekû hespêd qazağan zivistanan jî şeva rojê ji derve ne qewî li ber sermayê muhkem in.”⁴³⁵

10.17.2. Çek

Bazîdî di *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye* de siwar bêyî sîlaha wî terîf nake û debançe, qerebîne, rim, şûr, zerg ji wan çekan hinek in. Lê wekî me li jorê qal kir nivîskar dîsa li vir jî balê dikşîne ku kurd her dem ji şer re hazir û nazir in.

“Û her siwarekî cengê pênc agirî dixebitîn. Cotek tepançe di qebûrê da û cotek tepançe li ber piştan û qerebîne û rim û şîr û sê zergan jî li ber tanga hespê da dikin. Xulaşe siwarekî deh derp heyin. Wisan siwarêd mahir heyin ku agir ji agirî nabire, qewî çapik siwar dibin.”⁴³⁶

“...Û çek û sîlahêd wan tijî û tîzkirî ye, lewranê wekû iqtîda bikitin ew ektrad filhal li ser piştan hespê lazim in. Daîm ew hespêd xuyî zînan ce didîn û qenc xuyî dikin. Yanê ew qeder î‘tîbar nakin ku hespêd xuyî zînan bibin û bi tewilînin, belkû li ber derê konî girê didîn û haqîr e dibe ku di rojekê da du sê hewarî peyda dibitin. Biharan wekû biderketine konan, çek û sîlahêd da’îm şev û rojan heta dikevîne qîşlagê xaniyan. Lakin di xaniyan da êdî raqet in, hewar û gazî nabî...”⁴³⁷

Lê çekên kurdan tenê ev nînin. Li gel şîva wana di destê her kesî de mertal û xencerên wan jî hene. Jixwe tîfîngên wan jî êdî divê neyên jîbirkirin.

“Di nêva ektradan da şîr û meţal leyiztîn qewî zêde meqbûl e. Û ekşerê lawêd wan middeyekî te‘lîm û meşq dikin û horî dibin. Yanê wisanî di ‘ilmê meţalê da mahir dibin ku ji pêşve herçî şîr û derbê ku bêtin hemûyan jî defi‘ dîkitin. Eşla dererek nagihê wicûda wî. Lewranê di cihêd wanê xo bi xoy da derbên wan xencer û şîr e, gule kême heye. Elbette şîvan û gawan û zarokêd wan jî şîr û meţal û xencer heyin, lakin eve ‘adetê ektradêd vî kenarî ne. Îlla ektrad û rewendêd Hekarî û Bohtan û Behdînan mezînan û biçûkêd xuyî şeşxane ne bê şeşxane naçîne serê avê jî. Û da’îm şolêd wan armanc û nîşan e, qewî zêde guleendaz in, teyr li hewayê perwaz dîkitin ji jêr ve berekê bi şeşxanê davêjîn û lê didîn. Lakin tîfîngêd qewal jî li nik meqbûl nînin îlla dê şeşxane bitin. Û geleke dibitin ku ji wan ektradan mexşûş ji boy

⁴³⁵ H. b. r. 142.

⁴³⁶ H. b. r. 167, 168.

⁴³⁷ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 166, 167.

şexxaneyekê diçine Istanbulê û begen dikan û ji boy xo tîfingî tînin. Û mela û fuqehayêd wan jî hemû xuyîşexxane û çek û xencer dibin.”⁴³⁸

Diyar e sîlah hewcedariyeke mezin e ji bo kurdan û ew jî li gor vê tevdigerin. Ji bo hostetiyê telîmê dikan, dikevîne pêşbazîyan, di nîşangirî û lîxistina armancê de jî zêde şaraza ne. Heke pêwîst bike ji bo peydakirina çekan heta deverên dûrê mîna Stenbolê diçin û dikirin tînin.

10.17.3. Kuçik û Heywanên Din

Ji xêncî van kelbên kurdan jî gurêx in û ji bo ji diz û neyaran parastina kerî û pezê xwe wan xwedî dikan.

“...Û kelbêd wan jî cins heyin. Kelbêd cins li nik wan zêde mu‘teber in û bi qîmet in, heta bi deh û panzde pezan dikirin û difiroşin. Lewranê pawanê mal û keriyêd wan ji derve kelb in. Kes nikare ku li kelbêd wan biditin. Eger li kelbêd wan bidin weyaxo bikujîn şer û şemate peyda dibitin.”⁴³⁹

Ji ber giranbihabûna kuçikan gelek caran li ser wan şerê derdikeve, mêr hevdu dikujin û neyartî çêdibe. Di paşxaneyê de ev rastiya heye. Ji bilî van kurd deve, pez, dewar, hêstir, ker û mirîşkan jî xwedî dikan. Heta di demê de qetarê axayên wan hebûne.

⁴³⁸ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 84, 85.

⁴³⁹ H. b. r. 142, 143.

BEŞA ÇAREM

TÎPGUHÊZÎ Û EDÎSYON-KRÎTÎK

1. Tîpguhêziyên Adat û Rusûmatname'ê Ekradiyeyê

Li ser *Adat û Rusûmatname'ê Ekradiyeya Bazîdî* ji bilî nirxandin, danasîn û wergerê xebatên tîpguhêziyê jî hatine kirin. Ev risaleya kurmancî ya bi alfabeya erebî hatiye nivîsîn bi qasî me tesbît kir beriya me 5 caran -ji wan yek nêvcî- bo latinî hatiye veguhaztin. Lê carekê jî bi tîpên erebî lê bi rastnivîsa nû -ya Reşîd Findî- hatiye weşandin. Her wiha carekê jî li gel tîpguhêziyê zimanê wê jî -ya Jan Dost- hatiye sivikkirin. Lêbelê ev hemû tîpguhêzî xwedî taybetiyên cuda ne. Emê di vê beşê de bi kurtasî qala wan bikin.

1.1. Tîpguhêziya Jaba

Cara ewil kesê ku *Adat û Rusûmatname'ê Ekradiye* transkrîbeyî li ser tîpên latinî kiriye Jaba ye. Jaba di herdu nusxeyên wê yên li Petersburgê de li gel orijînalê bi tîpên erebî latiniya wê jî daye. Lê derheqê tîpguhêziyên Jaba de hinek îtiraz hene. Bo mînak sala 1857an meha hezîranê P. Lerch di civîna dîrok-filolojiyê ya Akademiya Zanistan ya Rûsyayê de ji bo weşandîna hin textên Jaba şandine dest bi hewldanê dike. Lê wî xwest ku li ser tîpguhêziya metnan guherînan bike. Wî wisa bawer dikir ku Jaba wekî A. B. Chodzko lêkolînerê polonî nikare dirêjiya tîpên dengdar nîşan bide.⁴⁴⁰ Lewra di zimanên slavî de dirêjiya tîpên dengdar diyar nabe. Ji ber van egeran Lerch ji wan wesîqayên Jaba şandibû Akademiya beşeke *Îskendernameyê* û 25 gotinên pêşiyên li gor rêbaza tîpguhêziyê ya Lepsius li gel wergera wan a almanî jî lê zêde kir. Ev yek jî derheq çawaniya tîpguhêziya Jaba de nêrîneke balkêş e.

Mirov dikare tîpguhêziya Jaba ji bo alfabeya kurdî ya latinî mînaka ewil hesab bike. Lewra her çendî di xebatên rêziman-ferhengan⁴⁴¹ de ji bo kurdî nimûneyên alfabeya latinî hebin jî pir lokal in. Di tîpguhêziya Jaba de *Adat û Rusûmatname'ê Ekradiye* ji serî heya dawiyê hatiye guheztin û pê berhem hatiye amade kirin. Alfabeya bi kar aniye de dirêjiya tîpên dengdar nayê xuyanê, bi mînak “î” wekî “i”yê nivîsîye û ji bo “û” yê “ou” nivîsiye. Her wiha diftongên mînak gh, kh, ch û hwd bi kar anîne. Ji bo

⁴⁴⁰ A. Chodzko, “Etudes philologiques sur la langue kurde (dialecte de Soleimanie)” *Journal Asiatique*, beş 5, berg 9, 1857, r. 297, 356.

⁴⁴¹ Garzoni, *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*, r. 14, 15, 16.

tîpa “v” yê “w” û ji bo “w”yê jî “v” emilandine. Lêbelê dîsa jî di qala xwe de nimûneyeke resen e.

1.2. Tîpguhêziya Delîlo Îzolî

Delîlo Îzolî ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* ji nusxeya Rudenkoyê transkrîbe kiriye û li Holandayê weşandiye. Li gor tarîxa di bin pêşkêşiya de hatiye nivîsîn ev xebat di 16 adara 1979an de hatiye çêkirin. Îzolî navê xebatê yê orijînal bi kar neaniye û navê “Adetên Kurdîstan” lê kiriye. Navê Mela Mehmûdê Bazîdî jî carna wekî M. Mahmut Beyazîdî (li ser bergê), carna Mela Mehmût Beyazîdî (r. 3), M. Mahmût Beyazîdî (r. 4), M. M. Beyazîdî (Pêşgotin, r. 1), Mele Mehmût Beyazîdî ye (Pêşkêş, r. 1) û her wiha ev cihê nivîsîn di nav pirtûkê de jî diguhire. Di vê tîpguhêziyê de di serî de pêşgotina Rudenkoyê ya ji bo wergera rûsî bi kurtasî hatiye weşandin, lê Delîlo navê wergêr nade. Delîlo bi xwe jî 8 rûpel wekî pêşek nivîsiye û qala serdaboriya xebata xwe dike û derheqê naverok, ziman û girîngiya wê de agahiyan dide û şîroveyan dike.

Ev tîpguhêzî bi qasî em dizanin xebata ewil e, ji ber vê hindê girîng e, lewra piştî ku ev berhem di sala 1858an de bi destê Mela Mehmûd hatiye nivîsîn, bi gelek zimanan hat weşandin û her çendî berê bi destê Jaba tîpguhêziya wê hatibe kirin jî piştî 121 salan dîsa îcar bi tîpên latinî kurmancî hatiye weşandin. Loma ji bo kesên ji eslê wê îstifade nekirine bûye çavkanî.⁴⁴² Lê mixabin tîpguhêzî ne baş e, gelek peyv şaş hatine nivîsîn, bo nimûne peyva sereke ya “ekrad” ku pirjimara peyva kurd ya bi zimanê erebî ye, wekî “eqrad” hatiye nivîsîn. Ev jî pirjimara peyva “qîred” e û bi vê mene digihure dibe “meymûn”. Her wiha li hin cihan midaxaleyî metnê eslî kiriye û li dewsa peyvên pirtûkê yên wekî “edû” ku erebî ye kurmanciya wê “dijmin”, ji bo “kopek” ya ku piştî sedsala XVan ketiye zimanê tirkî ew jî guherandiye û kiriye kûçik.⁴⁴³ Lê ya rastî kurmancên serhedê vê peyvê ji bo kûçikên nêr bi kar tînin û ji bo yên mê jî dibêjin “dêl”. Ji bilî van gelek şaşî û kêmasiyên rastnivîs, tîpguhêziyê hene, hin peyvên nivîskar bi tercîh cuda nivîsîne wekî dewletmend kiriye dewlemend, sube kiriye sibe, niwişt kiriye niwişt, jîn kiriye jin, dewe kiriye deve, mezîn kiriye mezin, mêwan kiriye mêvan, bab kiriye bav. Her wiha hinek peyvên di eslê metnê de hene di tîpguhêzê de tunene, cihê hin peyvan hatiye guherandin. Loma kesên ji wî şûnda li ser vî metnê xebitîne ji wan şaşiyên hinek dubare kirine. Lê ji ber ku nimûneya pêşîn e xebateke girîng e.

⁴⁴² Mehmet Uzun, *Kürt Edebiyatına Giriş*, ç. 1., Belge, İstanbul, 1999, r. 31, 43.

⁴⁴³ Selman Dilovan, “Hin şaşiyên transkripsiyona ‘Adat û rusûmatnameyê ekradiye’”, *Kovara Çira*, j. 18, Swêd, 2000, r. 16.

1.2.1. Rexneyek li ser vê tîpguhêziyê

Di kovara *Çirayê* hejmarê 18an de di navbera rûpelên 15-35an de Selman Dilovan li ser vê tîpguhêzê nivîseke bi sernavê “Hin şaşiyên transkrîpsiyona ‘Adat û rusûmatnameyê ekradiye” weşand û li ser çawaniya vê xebatê rexne û pêşniyazên xwe diyar kir. Di vê nivîsê de Dilovan ji çar paran pareke ‘Adatê veguhêztiye ser tîpên latinî û ji vê transkrîpsiyona xwe beşek jî (r. 17-24) li ser du stûnên li rex hevdu ji bo berawirdkirinê daye. Li milê rastê transkrîpsiyona Îzolî û li milê çepê jî ya Dilovan cih digre. Ji bo ferqa di navbera herdu xebatan de bê dîtîna peyvên ji hevdu cuda hatine guheztin bold in. Ji rûpel 24an şûnda heya 35an jî tenê tîpguhêziya Dilovan heye. Heke em rexneyên Dilovan rêz bikin wiha dibêje:

- a) Îzolî hinek peyv şaş xwendine, bo mînak “Eger ew merî mîr e” (r. 6, Îzolî) lê divê wiha be “Eger ew mirî mîr e” (r. 15, Dilovan) û dibêje Bazîdî ji bo “meriv” “merî” bi kar neaniye, lê “mirof” û “mirov” bi kar aniye.
- b) Îzolî hinek peyv guherandine, bo mînak peyva “edû” kiriye “dijmin”; “kopek” kiriye “kûçik” (r. 16, Dilovan).
- c) Îzolî hinek peyv ne li gor nivîsa metin, lê li gor xwe xwendiyê, bo mînak peyva “nêzûkî” kiriye “nêzîkî” (r. 4, Îzolî) “xûndarî” kiriye “xwîndarî” (r. 4, Îzolî), “xo” kiriye “xwe”, hinek daçek “da” kiriye “de”, “be” kiriye “bi”.
- d) Îzolî hinek peyvên bi du awayan hatine nivîsîn bi awayekî nivîsîne, bo mînak “jin/”jîn”, “mirof/mirov”.
- e) Îzolî, peyva “ekrad” wekî “eqrad” şaş nivîsiye. Her wiha navê pirtûkê guherandiye û navê Mela Mehmûd jî şaş nivîsiye.

Bi kurtasî Dilovan qala van şaşiyên dike û pêşniyaza xwe di xebata xwe de diyar dike. Lê divê em bi xwe jî bi kurtasî çend şaşiyên Dilovan diyar bikin.

- 1) Dilovan dibêje Îzolî navê Mela Mehmûd wekî M. Mahmut Beyazîdî nivîsiye, divê wekî Mela Mehmûdê Bayezîdî binivîsiya, lê wekî me di beşên borî de diyar kir, ev jî şaş e ya rast Mela Mehmûdê Bazîdî ye.
- 2) Dilovan dema destpêka transkrîpa Îzolî dide li gor eslê wê neqil nake. Di xebata Îzolî destpêk wiha ye: “*BÎSMÎLLAHÎRAHMANIRRAHIM Elhemdulillâhî Rebbilalemîn vesselatû ala Muhammedîn ve alihî ecma’in...*” Ya ku Dilovan neqil dike jî ev e: “*Bîsmillahîrrehmanîrrehîm Elhemdu lillâhî Rebbî'l-'Alemîn. Wesseselatu ala Muhemmedîn ve alihî ecma’in.*” (r. 17, Dilovan)

Wekî li vir jî tê xuyanê kêmasî û şaşiyên orijînalê ji metnê Dilovan neqil kiriye zêdetir in. Li dewsa “Wesselatu” “Vesselatû” hatiye nivîsîn, lê tiştê ecêb ew e ku Dilovan li cihê ku wekî orijînalê neqil bike, him di ya xwe de û him jî di ya Îzolî de wiha “Wesseselatu” şaş nivîsiye. Ji bilî van di tîpguhêziya xwe de wî jî hin şaşiyên dinê yên madî kirine. Mesela wî peyva mirof li cihekî wekî mirov, tîfing wekî tiving, ewset wekî usta xwendine û hwd hin peyv şaş nivîsîne.

Ji hêla din ve di tîpguhêziya Îzolî de “we” wekî “ve”yê hatiye nivîsîn û tîpên di kurdî de tunene hatine emilandin; “â”, “î” û hwd. Bi rastî heke ev tîpguhêziya Îzolî bi hûrgilî bê nirxandin xebatele dûrûdirêj divê. Jixwe dema mirov li “Ferhenga” Îzolî dinihêre jî dibîne ku ji aliyê rastnivîsê ve gelek şaşiyên wî hene.⁴⁴⁴

1.3. Tîpguhêziya Reşîd Findî

Reşîd Findî bi mebesta ku gel ji ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* sûd werbigire bi rênivîsa nû ya kurdiya bi tîpên erebî amade kiriye û ev xebat li gel wergera wê ya li ser zimanê erebî bi navê *Pertûka Adat û Rusûmatname’ê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867* di sala 2006an de li Duhokê di nav weşanên dezgeyî Spîrêz de derçûye. Ango ev xebat ne ji hêla alfabeyê ve lê ji hêla rênivîsê ve hatiye kirin. Beşa pêşîn ya ji 104 rûpelan pêk tê kurmanciya Bazîdî ye. Findî dema ev xebata xwe kiriye xwe spartiyê nusxeya duduyan, bi rênivîsa nû ya bi tîpên erebî amade kiriye. Hin peyv û mijar bi jêrenotan şîrove kirine, bal kişandiyê ser girîngiya hin mijaran û nêrîna xwe diyar kiriye. Her wiha hin hevokên fêmkirina wan zehmet bi peyvên nû zelal kirine û ev peyvên lê zêde kirine jî di nav kevanê de diyar kirine. Lê gava ev xebata hatiye kirin awayê nivîsa hin peyvên hatiye guherandin. Ango Findî midaxeleyî zimanê wê kiriye, bo mînak Bazîdî peyva “jin”ê gelek caran wekî “jîn”, “kirîv” wekî “kirîw”, “dikin” wekî “dikîn” û “mîrov” wekî “mîrof” nivîsîne, ev hatine guherandin. Her weha pergala paragrafên nusxeyê jî jinûve hatiye danîn. Ligel van guherînan xebateke kêrhatî ye. Di beşa duduyan ya vê pirtûkê de jî wergera erebî heye.

1.4. Tîpguhêziya Jan Dost

Tîpguhêziya ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* ya ku Jan Dost amade kiriye sala 2010an ji nav weşanên Nûbiharê derçû. Li gor ku Jan Dost qalê dike di sala 2000an de li Almanyayê tîpguhêziyeke nebaş ya çapkirî ya ‘*Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* dikeve destê Dost –nabêje ev xebat ya kê ye, lê dema mirov herdu

⁴⁴⁴ D. Îzolî, *Ferheng Kurdî-Tirkî Tirkî-Kurdî*, ç. 7., Weşanên Deng, Diyarbekir, 2013, r. 4.

tîpguhêziyan dide ber hevdu derdikeve holê ya Îzolî ye, lewra hin peyvên şaş hatine xwendin û hin peyv û hevokên ku Îzolî ji ser re gav kiriye û yan jî cihê wan guherandiye eynî wisa di ya Dost de jî hene- û ew jî li ser wê nusxeyê dixebite, şaşiyên sererast dike û dide weşandin. Ev pirtûk 390 rûpel e, ji bilî pêşgotinê, wekî sê beşan û beşa dawîn a orijînalê metnê bi tîpên erebî cih bigire hatiye amadekirin. Di beşa pêşîn ya bi navê “Destpêk”ê de (35-136) tîpguhêziya metnê eslî cih digire û Jan Dost ji bo beş û mijar ji hevdu veqetin û baş bîn fehmkirin ji bo her beşekê sernavek daniye û bi vî awayî 139 sernav û gelek mijar destnîşan kiriye. Her wiha li cîyên pêwîst jî di jêrenotan de şîrove kirine û agahî dane. Seba bingeha van tiştên qala wan tê kirin werine peyitandin ji şairên kurd mînak dane. Ev ji bo fehmkirina metnê eslî pir bi kêrî mirov tê. Piştî wê jî di beşa duduyan ya bi sernavê “Adetên Kurdan bi Kurdiya Îro” de jî kurmanciya wê ya îro tê pêşkêşkirin.

Divê em diyar bikin ku tîpguhêziya Dost li gel kêmasiyan baş e û bi temamî nebe jî li gor xalbendiya di metnê orijînalê hatiye bikaranîn tevgeriyaye. Heta hinek cihên ku pêwîst nake xal bîn danîn ji ber ku di eslê metnê de heye wisa veguhestiye û jixwe ev jî usûleke bingeîn ya zanistê ye. Divê bêyî desttêwerdan di tîpguhêziyê de li gor metnê eslî were karkirin. Lê Dost di xebata xwe de hin peyvên metnê wekî orijînalê nenivîsîne, bo mînak mirof kiriye mirov, dewletmend kiriye dewlemend, diraf kiriye dirav, sube kiriye sibe, nêzûk kiriye nêzîk, niwişt kiriye nivişt, jîn kiriye jin, dewe kiriye deve, mezîn kiriye mezin, mêwan kiriye mêvan, gawan kiriye gavan, bab kiriye bav, rûtinin kiriye rûdinin, weyaxo kiriye û yaxo û hwd.

Wekî usûl gotî ew metnê ku tîpguhêziya wê hatiye kirin bêyî şîrove, jêrenot û kevanokên di nav hevokan de bi xurî bihata weşandin, ew şîrove û agahiyên pêwîst di wê beşa ku metnê bi kurdiya îro hatiye pêşkêşkirin de bihatana dayîn. Bi vî qaydî xwendekarê bi tena serê xwe metnê bixwenda û ji bo wî derfeta dîtina têşeyê eslî yê metnê derketa holê, her wiha muqayeseya kurmanciya wê demê û îro derketa holê.

1.5. Tîpguhêziya Ziya Avcî

Ji kesên li ser *‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye* xebitîne û ji tîpên erebî veguherandiye tîpên latinî yek jî Ziya Avcî ye. Ev xebata bi navê “Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye” di nav weşanên Lîsê de li Amedê sala 2010an de hatiye weşandin.

Xebata Avcî ji sê beşan pêk tê û di destpêkê bi kurtasî qala berhemê dike û peyra li ser jiyana Mela Mehmûd, berhemên wî û hevkarîya wî ya bi Jaba re agahiyên dide (r.

42). Di beşa duduyan de tîpguhêziya metnê eslî heye (r. 45-88) û di dawiyê de (r. 91-92) ferhengoke ji peyvên balkêş ên di metin de cih digirin pêk tê heye. Beşa sisyan ji nusxeya pirtûkê ya wergera rûsî ya Rudenkoyê pêk tê. Di vê beşê de xebata Rudenkoyê li gor eslê wê hatiye çapkirin, ji rûsî û orijînalê wê ya bi destê Şah Nezer hatiye nivîsîn pêk tê û bi tevahî 202 rûpel e. Lê di beşa orijînalê ya bi tîpên erebî de 4 rûpelên 150-151 û 156-157 tunene, nehatine çapkirin. Tiştêkî ecêb e ev her çar rûpel di kitêba Jan Dost de jî tunene. Lê piştî me agahî da Jan Dost wî ew çar rûpelên çapnebûyî ji me re şandin û derket holê ku şaşiyêke teknîkî çêbûye, lê ya Ziya Avcî çawa bûye em nizanin.

Avcî dema tîpguhêzî kiriye, zêde guh nedaye xalbendî û awayê dabeşkirina di metnê esasî de. Dema karê xwe kiriye, hevok û peyvên erebî li gor xwendina erebî destnîşan nekirine. Di gelek cihan de hevok û paragraf gihandine hevdu. Her wiha gelek xeletiyên şaşxwendinê hene, zimanê wî jî yekrû nîne, ji hêla rastnivîs û standardê de jî kêmasiyên wî hene. Tîpguhêziya wî li gor devoka behdinî ye û wisa tê xuyanê ketiye ber bandora xebata Reşîd Findî. Lê Avcî berevajî lêkolînerên din navê Mela Mehmûdê “Bazîdî” rast nivîsiye.

2. Rê û Rêbaza Tîpguhêzî û Edîsyon-Krîtîka Me

Du nusxeyên vê risaleyê hene û li pirtûkxaneyê Lenîngradê ne. Ji wan ya pêşîn bi jimara “Kurd 34”an e û di salên hîcrî 1274 û mîladî 1858-59an de hatiye nivîsîn û bi tîpên erebî ye. Destxeta nivîskar bi xwe ye.⁴⁴⁵ Nusxeya duduyan jî di sala 1868an de li Smirnayê (Îzmir) bi destxeta Şah Nezer hatiye nivîsîn û jimara wê jî “Kurd 35” e.⁴⁴⁶

Herdu nusxe jî li ber destê me ne û em li ser xebitîn. Jixwe ev yek jî vê xebata me ji yê beriya me hatine kirin vediqetîne. Lewra Jaba bi xwe jî wergera xwe ya fransî ji vê nusxeya duduyan kiriye.⁴⁴⁷ Rudenkoyê jî ji bo xebata xwe ya rûsî wekî jêder ev nusxe girtiye. Êdî ji wê şûnda hemû werger û xebatên li ser vê berhemê li ber vê nusxeya Şah Nezer çêbûne. Lêbelê me di vê tîpguhêzî û edîsyon-krîtîka xwe de herdu nusxe bi tevayî nirxandin. Loma cudahî, kêmasî û zêdehiyên di navbera herdu destxetan de hatin tesbîtîkirin. Di encama vê xebatê de diyar bû ku hin gotinên ji ya resen cudatir hatine nivîsîn, jê kêmkirine û yan jî şaş derbasî nusxeya duduyan kirine, hene. Di vê xebatê de ew hemû hatin kifş kirin. Her wiha bi vî awayî hin gotinên di nusxeya

⁴⁴⁵ Bayezîdî, *Puavy i Obyaj Kurdov*, r. 7; Bayezîdî, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, r. 210.

⁴⁴⁶ H. b. r. 8; H. b. r. 210, 211.

⁴⁴⁷ Mela Mahmut Beyazîdî, *Adetên Kurdistan*, “Ji pêşgotina Rudenkoyê” wer. Delîlo Îzolfî, Holland, Tarîx tune, r. 3.

duduyan de ji ber şaş û kêrn nivîsînê tu mene jê dernediketî jî bi rêberiya nusxeya nivîskar rast hatin xwendin.

Dem a me tîpguhêziya metnê ‘Adat û Rusûmatname’ê Ekradiye kir me ji xebatên beriya xwe ya Delîlo Îzolî *Adetên Kurdîstanê*, ya Reşîd Findî *Pertûka Adat û Rusûmatname’ê Ekradiye* ya Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867, ya Ziya Avcî *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye* û ya Jan Dost *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* îstifade kir û bi vî awayî derfeta muqayeseyê û peydakirina cudahî, şaşî û kêmasiyan çêbû. Gava em dudil bûn ka peyvekê çawa bixwînin me li wan nihêrî. Ji bilî vê me bala xwe da rexne û nirxandinên Selman Dilovan yê di gotara wî ya bi navê “Hin şaşiyên transkripsiyona ‘Adat û rusûmatnameyê ekradiye’” de qala wan tê kirin.

Di vê xebatê de me tîpên erebî yê di alfabeya kurdî ya latinî ya îro de tunene, li ser bîngeha alfabeya navneteweyî ya ji bo transkrîpsiyona erebî-latinî tê bikaranîn nîşan dan. Li gor vê ev deng û tîpên di alfabeya latinî ya kurdî de tunene wekî di tabloyê de jî hatiye nîşandan ev in: ’-ء, s, ث-ث, h, ح-ح, z, ذ-ذ, ş, ص-ص, d, ض-ض, t, ط-ط, z, ظ-ظ, ‘-ع, g, غ-غ. Bi vî awayî kesekî vê transkrîp û edîsyon-krîtîkê bixwîne dikare bibîne ku di destxetê de kîjan tîp û deng çawa hatiye nivîsîn, di navbera herdu nusxeyan de çi cudahî hene. Ji hêla din ve ji bo diyarkirina paragrafan ji bilî çend cihan nusxeya duduyan esas hatiye girtin. Lewra di nusxeya nivîskar de, xalbendî û paragraf tunene. Di ya duduyan de hevok û paragraf hatine kifşkirin. Me jî ji bo paragrafan xwe sparte wê, lê em di xalbendiyê de serbest tevgeriyan.

2.1. Tabloya Tîpguhêziya Alfabeya Kurdî ya Erebi-Latinî

ء : ’	ر : Rr	ق : Qq
ا : Aa, Ee, Êê, Ii, Uu	ز : Zz	ك : Kk, Gg
ب : Bb	ژ : Jj	گ : Gg
پ : Pp	س : Ss	ل : Ll
ت : Tt	ش : Şş	م : Mm
ث : Şş	ص : Şş	ن : Nn
ج : Cc	ض : Dd	ه : Hh, Ee
چ : Çç	ط : Tt	ف : Vv
ح : Hh	ظ : Zz	و : Ww, Oo, Uu, Êê
خ : Xx	ع : ‘	ى : Yy, Ii, Êê, Êê
د : Dd	غ : Gg	
ذ : Zz	ف : Ff	

3. ‘Adat û Rusûmatname’ê Ekradiye

Kitab ‘Adat û Rusûmatname’ê Tewayifê Ekradiye we Usûlê Nizamatê Kurmanciye 1274⁴⁴⁸

Bismillahirrehmanirrehîm. (We Bîhîl ‘Înaye)⁴⁴⁹

Elhemdu lîllahî rebbîl ‘alemîn weşşelatu ‘ela Muḥammedîn we alîhî ecme‘în.

Emma be‘d, me‘lûmê cenabêd talib û nazîran bibitin ku ev tewayifêd ekradan ji tewayifêd e‘rabêd bedewiyêd berê ne ku zemanê maḍiyê da ji wan tayifêd e‘raban miqdarek cida bûyine û bi van kenaran da be ‘iyal û eṭfal hatîne û hemû qebîleyek bûne. Û berê lîsanê wanî jî bil‘umûm zimanê ‘erebî bûne û yek tayife bûne. Heta wî zemanî lefzê Kurdistan tunebûye. Paşê wekû hatîne van eṭrafêd xalî û sînorêd Îran û Xoresanê. Îcarê⁴⁵⁰ ew mirofêd⁴⁵¹ hatî meşela çend î, elbette her yekî navek heye. Heyder meşela navê yekî bûye, herçî ji ewladêd wî Heyderî zêde bûyine nisbet bi bal wî daye Heyderî, Heyderî⁴⁵² evne bûyine tayifeyek. Û meşela navê yekî Zîlo bûye herçî ewladêd ji wî mirovî zêde bûyine, nisbet dayine bi bal Zîlo; Zîlî, Zeylî gotine. Tayifêd may’î jî bi vî tertzî ne. Mirad ji tayifan eve ye: Her tayifeyek kurê babakî bûyine. Û bi mirûrê eyyam, her yek bûyine ev qeder mal. Îcarê ew tayife jî bi hesab nêzûkî û bira û pismamiya wî zemanî gîreta yekûdu dikêşin û eger dûr bin⁴⁵³ li yekûdu nabine xuyî. Qebîle û tayife avne ne⁴⁵⁴ ku beyan bûn.

Û lefzê kurd û ekrad eslê wê girde yanê berhev û cem‘kirîn bi wê minasebetê ku ew e‘rab bûyine cîranê Îran û Fars û Xoresanê êdî ji lîsanêd wan tayifan yeko yeko berhev û cem‘ û exz kirîne û hêdî hêdî zimanêd xoy⁴⁵⁵ qedîm ku ‘erebî ye terikandîne. Û bi mirûrê zeman û borîna eyyamê, bûyine hinde ‘eşayir û qebayil û tayife.

⁴⁴⁸ Ev sernav û dîrok di nusxeya Mela Mehmûd bi xwe nivîsiye de -ji vê şunda ev nusxeyê wekî (M) bê nişandan- heye, lê di nusxeya Şah Nezer de -ku ji vê şunda ev nusxeyê wekî (N) bê nişandan- tuneye.

⁴⁴⁹ Di (N)yê de ev hevoka di nav kevanê de tuneye.

⁴⁵⁰ Di (M)yê de li vir li jêra rêza dawiyê peyva “îcarê” heye, lê di nusxeya (N)yê de tuneye. Jaba jî di tîpguhêza xwe de nişan nedaye.

⁴⁵¹ Di (N)yê de ev peyv wekî “mirovêd” hatiye nivîsîn

⁴⁵² Di (N)yê de ev navê “Heyderî” yê duduyan tuneye. Jaba bi xwe jî di tîpguhêza xwe de nişan daye.

⁴⁵³ Di (M)yê de ev wekî “dûr bin” e, lê (N)yê de ev peyva wekî “dûr î” hatiye nivîsîn û Jaba jî wekî “dourin” transkrîbe kiriye.

⁴⁵⁴ Di (N)yê de ev “ne” tuneye.

⁴⁵⁵ Di (M)yê de ev peyva wekî “خوی/xoy” hatiye nivîsîn, lê di nusxeya (N)yê de wekî “خو/xo” hatiye nivîsîn.

Ev navê wan ku maye kurd û ekrad, ev sebeb e ku zimanê berhev yanê meglûfî ye, yanê girdkerde ye ji faris û îraniyan. Îcarê ev tayifene ji etrafan bi navê kurd û ekrad hafîne navdanê û bûyine miletekî me‘lûm.

Emma zimanêd wan jî bi hesab cih û mekan be‘dê îxtilaf tê heyin. Lewranê lîsanê ‘ereb û faris wesa’îre jî dîsanê cuzwî miğayiret heyin. Meşela lîsanê ehlê Hicazê û Mişrê û ‘erebêd bedewî naşibine yekûdu. Ê zimanê farisiya dêrî û pehlewî û ‘Iraq û Azerbaycanê⁴⁵⁶ naşibine yekûdu. Lîsanêd ekradan jî cuzwî tefawut heyin.

Ê ekrad qewî zêde nesl û neseban hesab dikîn.⁴⁵⁷ Ê umera û ağayêd wan be‘den seyid û be‘den şehbazade heyin: Weku ‘Ebbasî û Xalidî û Enesî û Merwanî, ji vane tê heyin. Wekî dinê ekşerêd ekradan heta heft baban navêd ecdadêd xo dizanin û xizm û eqrebayetî winda nakin. Meşela xizm û pismamê yekî li Şamê û Mişrê hebe,⁴⁵⁸ bab ewî xizmî û ewî pismamî ji bo kurê xo weşiyet⁴⁵⁹ dike ku li filan welatî û filan gundî, ji filan tayifeyê, navê eve xizm û pismamekî me heye, iqtîda bike. Ew jî dîsanê ewê weşiyetê ji boy ewladêd di xo dikin.

Ê eger şayed ekradan xûndarî weyaxo de‘wayekî mabe⁴⁶⁰ di welatekî da digel mirofekî hebî, dîsanê bi weqt û tarîx û bi tefşîl, dîsanê ewê de‘wayê ji boy ewladêd xo dibêjîn, weşiyet dikin. ‘Adetê wan e⁴⁶¹ ku eger yek ji wan meşela biçite gurbetê rastiya eşl û neseba xo zû bi zûrî (bi zûy’î)⁴⁶² ji boy kesekî nabêjîn. Lewranê ihtiyat dikin ku nebe xûndarî, weyaxo de‘wêdariyek kevn ji neseba wan biderkeve. Xulaşê de‘wa di nêva wan da kevn û⁴⁶³ zayî‘ nabî, heta heft baban de‘way⁴⁶⁴ dajon.

Ê ekrad qewî xuyibext dibin. Eger mirofek qebahtekî mezîn bike û biçê xo bavêje bextê yekî, elbette ji qîşûra wî diborîn. Ê be bext şondê dixun û bi cih derew tişteki naêxine bextêd xo. Wekî yekî gote yekî, meşela ev şola wiha nebûye, wekî ewî got ku di bextê min da bibe ku wiha ye, elbette pê bawerî dikin. Yanê be bext şondxurîn

⁴⁵⁶ Di (M)yê de ev peyva wekî “Aderbeycan” hatiye nivîsîn.

⁴⁵⁷ Di (M)yê de ev peyva “dikîn” bi qelemê cuda li rex hevokê paşê hatiye nivîsîn.

⁴⁵⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “heye” hatiye nivîsîn. Lê ya rast wekî di (M)yê de hatiye nivîsîn divê hebe be, li gor stanksa hevokê durist ev e. Jixwe Jaba jî wisa xwendiyê.

⁴⁵⁹ Di (N)yê de peyv wekî “weşiyet” hatiye nivîsîn.

⁴⁶⁰ Di (M)yê ev wekî “mabe” e, lê (N)yê de ev peyva wekî “maye” hatiye nivîsîn û Jaba jî wekî “maye” transkrîbe kiriye.

⁴⁶¹ Di (N)yê de tune ye.

⁴⁶² Di (M)yê de tune ye.

⁴⁶³ Di (N)yê de tune ye.

⁴⁶⁴ Di (N)yê de peyv wekî “de‘wa” hatiye nivîsîn.

di nêva⁴⁶⁵ wan da qewî mezîn e. Wekî meşela mirofekî dixwazîn bikujîn, xo avêtiye bextê yekî, elbette bi çi terzî bibe,⁴⁶⁶ dê wî mirofî ji kuştinê xilaş bikit.

‘Adetê ekradan in di şerî da wekû mirofek ji hespê ket û esîr bû, êdî mimkun nîne ewî nakujîn.

Û ‘adetêd ekradan in biçikan (biçûkan)⁴⁶⁷ bêşikertme dikin. Meşela wekû ji boy mirofekî keçek welidî û ji boy mirofekî jî kurek welidî, heman di roja wiladetê da ewê keçê didine wî kurî, bêşikertme dibêjîn. Heta ku ew kur û keç balig dibin, êdî men‘ û poşmanî nabit, îcarê daweta wan herdukan dikin.

Û di nêv ekradan berdêlî jî dikin. Meşela yek xoha xo dide yekî û xoha wî jî ji boy xo distîne. Weyaxo keça xo dide yekî û keça wî ji boy xo distîne, yanê mibadele dikin. Her kesek ji wan meşrefa daweta xo dibîne.

Ekşerê ekrad, dawetan di weqtê biharan dikin, lewrane zivistanan cihekî tenha ji boy bûk û zavay’î tunîne. Wekî dawetê dikin li goşeyekî konî weyaxo li goşeyekî malê perde girê didîn, ew bûk û zava li piştê perdeyê gerdek dibin. Wekû dinê ‘adetêd wan in wekû cih tunebin bab û kur û bira digel jinêd xo, hemû di malekê da radizên û radibin. Û keç û bûkêd wan ji kesekî narevîn.

Biharan wekû bistê (bîstê)⁴⁶⁸ meha adarê elbette biderdikevin konan. Lakin nêzûkî cihê qışlaqê, ji wê ra warê kozê dibêjîn heta ku pezêd wan ji zeyê xilaş dibin. Paşê ji wî warî bar dikin. Warê bihar û payîzan, newal û cihêd talde û deşt dibin. Lakin warê havînê zozan û çiya dibin. Her deh û bîst û sih û çil malan mexşûş warek heyin. Kesek li warên kesî naêwire û lê nabî xuyî û carnan dibe ku li ser wan, di nêva wan da nîza‘ peyda dibî.

Û ji boy birekî malan ku digel hevdu diêwirîn zome dibêjin. Û aqayê wê birê û rîspiy’ê wê cima‘etê kî ye, meşela ‘Elo û Heso. Ji boy wê zomeyê Zoma ‘Elo û Zoma Heso dibêjîn. Birêd wan jî wekû gundan nav heyin. Zoma filan kesî û zoma filan aqayî dibêjîn. Meşela iqtîda bike ku tu zomekî pirs bikî ji boy te salig didîn, diçî û dibînî.

Şayed wekû tîrsek hebî, îcarê ew êl hemû berhevê çiya weya deşteke dibin û li ser hevdu, nêzûkî yekûdu konan hêşî li hêşiyê wekû orduyan vedigirîn.⁴⁶⁹ Ji boy vê

⁴⁶⁵ Di (N)yê de wekî “nêqa” hatiye nivîsîn.

⁴⁶⁶ Di (M)yê de li vê derê bi şaşî “elbette” hatiye nivîsîn û li ser xêzek danê li fêza wê “bibe” nivîsîne.

⁴⁶⁷ Di (M)yê de tuneye.

⁴⁶⁸ Di (M)yê de tuneye.

⁴⁶⁹ Di (N)yê de li dewsa herfa “g”yê herfa “k”yê hatiye nivîsîn, ango xêza li ser herfê tuneye û wekî “vedikirîn” hatiye nivîsîn.

berheviya konan ra ‘ebr dibêjîn. Filan ‘eşîrê bi ‘ebr danîne dibêjîn. Wekû şayed tîrsa wan ji kenarekî da hebe⁴⁷⁰ ji çar kenaran riya yek se‘etê yek se‘etê⁴⁷¹ çend siwaran qirawil datînin û bi xo jî bi şev ranazên, hespêd wan hêdîr, ligabkirî û bi xo jî çekgirêdayî guhdar in. Heman ji kenarekî deng û pêjnek peyda bûyî hemû siwar dibin û bi wî kenarî da diçin. Eger yeqîna hatina dujminan kirîn, defa wanî hewarê heye, bi şev û bi roj çî weqtê dibe, ewê defa hewarê li cihekî bilind didine qutan ku deng bigihê hemû zomeyan. Wekû dengê defê peyda bûyî, êdî mimkun nîne kes bi şû ve namîne. Siwar û peya bi kenarê defê⁴⁷² da tîn.

Û jinêd wan malan jî her yek kon istûnkê digrîn destêd xo û hêdîr dibin. Guhê jinan jî li şerî ye, dîtin ku şer hate nêzûka malan, ew jîn jî bi wan istûnkonan diçine şerî û yariya mêran dikin. Dibêjîn⁴⁷³ jî têne birîndarkirîn û kuştin. Yanê wekû şerekî wiha li ser malêd ekradan biqewimîn, jîn û mêr şerî dikin. Û eger şayed hezar siwarêd dijminan bêne ser çil pence malêd ekradan dîsanê qadir nabin ku ewan belav bikin. Lewranê di nêva ekradan eve meşlekî meşhûr e ku şerê kopekan li ser dêlan in.

Ekrad di şerêd ser malan bi geyr ji mirin çare nînin elbette heta mirin şerî dikin. Û ‘adetekî dinê di şerêd ser malan da heyin wekû ekradan dibînin ku ‘edû zaf û ew bi xo hindik in, her kes siwar dibin û ji nêva malan biderdikevin û xo didine çiya û kirekî⁴⁷⁴ asê. Û malan dispêrine dijminan û bi xo ji dûr ve difekirîn û çek û alatêd xo y’î herbê durist dikin⁴⁷⁵ û digel yekûdu qewl û qîrarê dikin ku nerevîn. Yek ji wan dibêje ku eyne gozê min Miho maye di dest dijminan da û yek ji wan dibêje ku way keça minî ‘Eysê maye di dest dijminan da û wiha gîretê didine yekûdu. Îcarê dijmin jî bi talan û malhilgirtinê mijûl dibin. Bilanê zaf bin jî, ew xuyêd wan malan bi carekê hicûm û êrûşê tînine dijminan. Û jinêd wan jî di nêva malan da bi kêzman arîkariya wan dikin. Elbette dijminan perîşan dikin.

⁴⁷⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “heye” hatiye nivîsîn. Jaba jî pêşiyê “heye” nivîsiye û paşê serast kiriye “hebe” nivîsiye.

⁴⁷¹ Di (N)yê de îfadeya “yek se‘etê” ya dubare yek tenê heye.

⁴⁷² Di (M)yê de ev peyv wekî “devê” hatiye nivîsîn.

⁴⁷³ Di (N)yê de ev peyv wekî “dibe jîn” hatiye nivîsîn.

⁴⁷⁴ Di (M)yê de tîpên “k” û “g” ji hevdu nayên derxistin, mirov ji meneya hevokê pê derdike ka kîjan herf e. Diyar e ev peyv gir e, lê di (N)yê de li dewsa herfa “g”eyê herfa “k”eyê hatiye nivîsîn, ango xêza li ser herfê tune. Jixwe Jaba bi xwe jî ev peyv wekî “ghireki” nivîsiye. Lê îxtimaleke din jî heye li herêma Bazîdê ji bo cihên bilind û çiyayî peyva “kir” jî tê bikaranîn, bo mînak “îsal êl derketin kirê Gilixadê”, loma dibe ku ev form be jî.

⁴⁷⁵ Jaba tîpguhêziya xwe de “durist dikin” wekî “didest dikin” xwendiyê.

Û tayifeyêd ekradan wekû xûndarî nebitin, qewî mayilê qetlê nînin, di şerî da weya di rêbiriye da mirofan⁴⁷⁶ digirîn û dişelînin berdidîn.

Lakin ji boy şola xirab elbette mirofan⁴⁷⁷ dikujîn. Heta jinêd xo û keç û da û xohêd xo jî elbette qetlê dikin. Û jîn jî ji boy şola xirab, meşela da keça xo û xwesî bûka xo û xoh xoha xo bi şev dixeniqînî weyaxo je'rê didenê û qetlê dikin. Ji ağa û rispiyêd wan kesek pirsiyarê nakin ku te ji boy çî eve kuşt.

Waqî'a revîna⁴⁷⁸ jinan ji mêran, di nêv wan da 'adet nînin. Jîn û keçêd wan ji kes narevîn, wekû milletê efrenciye ew jî serbest in. Lakin bi wê î'tiqadê ku ew xirabiyê nakin, îlla eger yekê ji wan şola xirab kirîn, çare nînin, elbette ewê dikujîn.

Û jîn, keçêd wan qewî şolker û cesûr û xuyîhuner in. Kulav û berr û xalî û têran çêdikin. Û malêd ku gulam tunînin, hesêbke gulamê malê jin in. Herçî şola malê bibe, jîn dikin. Heta hespêd mêmêd xo jî jîn xuyî dikin. Mêm bi geyrê şerî tev şolekî qewî nabin. Bazar û dayin û istandin jî bi jinan dibin. Û tene meclisê û iqtîda bikitin tevî şewr û umûrî dibin û kerem û îkrama xelqê dikin.

Weqtê ekrad ji warekî bar dikin û diçine warê dinê, malêd xo bar dikin. Û çend siwarêd wê zomeyê heyin, hemû rimêd wan li ser milan û destvedayî li berayika koçan diçin û jîn koçan dajon û⁴⁷⁹ pez û revo û garanêd wan li pey koçan diçin. Ji wan siwaran ra pêşkoçî dibêjin. Şayed wekû dijmin ji pêş ve peyda bebî ew şerî⁴⁸⁰ li berayikê dikin. Wekû bûye şeriya⁴⁸¹ û jinêd di nêva koçan da barêd xo berhev cihekî dikin, wekû meterisan çêdikin û hewş dikin û zarokan dikine nêva wê hewşê. Û tîfing û tapançan hildigirîn û⁴⁸² mintezirê şerêd mêmêd xo dibin. Eger siwarêd wan li dijminan galib bûn, qewî qenc e, bi xo jî dîsanê koçêd xo dajon û diçin. Û eger şayed dijmin li siwarêd wan galib bûn, ew siwar direvîn û tèn dikevîne nêva koçêd xo heşarê û dîsanê şerî dikin, heta

⁴⁷⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî "mirovan" hatiye nivîsîn.

⁴⁷⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî "mirovan" hatiye nivîsîn.

⁴⁷⁸ Di (M)yê de herfta "v" û "q"yê bi heman şeklî hatine nivîsîn. Mirov ji hevokê tê derdixe kîjan herf e. Lê di (N)yê de ev tîp ji hevdu cuda "ج/v" û "ق/q" hatine nivîsîn. Diyar e ku ev revîn e, lê bi şaşî li dewsa herfa "v" herfa "q" hatiye nivîsîn ango xaleke li ser herfê kêma e. Tiştêkî balkêş jî ew e ku Jaba di tîpguhêza xwe de tîpa "ج"yê wekî "w" nîşan dide û ya "ج" jî carna wekî "v" nîşan dide û carna jî wekî "ou" nîşan dide.

⁴⁷⁹ Di (N)yê de ev "û" wekî "ew" hatiye nivîsîn.

⁴⁸⁰ Di (N)yê de ev peyva "şerî" wekî "serî" hatiye nivîsîn.

⁴⁸¹ Di herdu nusxeyan de jî wekî "شرييا" hatiye nivîsîn û Jaba jî wekî "cheriya" xwendiyê. Lê diyar e şaşiyê nivîsê ye û divê wekî "şerî" bihata nivîsîn

⁴⁸² Di (N)yê de "ج"ek zêde hatiye nivîsîn.

hewarî ji cihekî peyda dibe. Lewranê ‘adetê ekradan e, heman boy şer elbette ew mirofan ji boy hewarê bi eţrafan da belav dikin.

Û jinêd maqûlêd wan jî roja koçê li hespê çê siwar dibin û çek û sîlahan girê didîn û rim digrîne destêd xo û ew jî dikevîne pêşîya koçêd xo⁴⁸³ bixeml û serbizêr. Bi vî tîrîzî dikevîne pêşîya koçêd xo. Lakin jinêd feqîran zarok jî li goşê koçêd xo dajon û diçin.

Û her zomeyekî du nobedar heyin. Bi heq şevê her yek li kenarekî malan dipên. Wekû hisa dijminan bikin, dikine gazî û xelqê zomeyê radibin û diçine wê semtê.

Wekû bi şev şayed dost û mêwan⁴⁸⁴ bêne zomeyê, ew nobedar diçine berayikê gazî dikin wekû qirawilêd orduyan. Paşê ewan tînine nêva zomeyê. Çi qeder mêwan bêne zomeyê, mêwanê agayî û rispî ne. Îlla eger zaf mêwan heyin, îcarê serê konî du û sê û zêde siwaran belav dikin.

Û agayêd wan û maqûl û dewletlûyêd wan hemû xuyîqehwe û taxum in. Eger şayed mêwanî jî qehwe û taxum hebî, nahêlîn ku taxuma mêwanan biderkevin û bidne solê. Belkû qehwe û taxuma xuyê malê dixebîte. Û aga û rispiyan çît û perde heyin. Yanê nêva konî birîne û çît û perde kêşane û kirîne yalê mêran û dîwanxane, mêwan li wê derê sakin dibin. Elbette ji boy⁴⁸⁵ mêwanan⁴⁸⁶ berx û pez ser jê dikin û îkram dikin.

Û aga û rispiyêd her zomekê melayek di malê da dibin ku bang⁴⁸⁷ didîn û bi cima‘et nimêjan dikin û dersa zarokêd wan dibêjîn. Û iqtîda bike nikaş û birîn û mirîd (miriyêd)⁴⁸⁸ wan li ser dixunin û defn dikin. Ew zome jî herçî miqdar zikatêd pez û dirafêd wan û fitreyêd wan heyin, hemû didine wî melayî û zêde jî îkram dikin. Di salekê da melayê zomeyekê du sê hezar qiruş bi dest dikevê. Wekû di malekê da mewta hebit, cilêd wî mewtayî jî didine melayî û jaran, ewan cilêd wî nafroşin.⁴⁸⁹

Li mewta ciwanan zêde şîn û matem digirîn, libasêd reş werdigirîn û serêd xo reş girê didîn. Û jîn û keç û xoh guliyêd xo jê dikin. Qewî zêde matem û şînê dikin eger ew mirî mêr e⁴⁹⁰ û xuyîhesp û çek û taxum hespêd wî dixemilînin û çek û sîlahêd wî⁴⁹¹ li

⁴⁸³ Di (N)yê tuneye.

⁴⁸⁴ Peyva “mêvan” e, wekî “mêwan” nivîsiye.

⁴⁸⁵ Ev qismê “elbette ji boy” di (N)yê de tuneye û di (M)yê de jî di serê hevokê de peyvek hatiye reşkirin û li bintara wê hatiye nivîsîn.

⁴⁸⁶ Di (M)yê de li vir peyva “elbette”yê heye û li ser hatiye reşkirin.

⁴⁸⁷ Jaba wekî “bank” nivîsiye.

⁴⁸⁸ Di (M)yê de tuneye.

⁴⁸⁹ Di (N)yê de xala herfa “f”yê tuneye.

⁴⁹⁰ Dibe ku ev peyv wekî “mîr” jî bê xwendin.

⁴⁹¹ Di (N)yê de tuneye.

ser hespan girê didîn, ewan hespan li berayikê cinazeyî dikêşin. Û ew jîn û keç û da û xohêd wî, dilo û lawijk dibêjîn, wey li min babo, wey li min bira, wey li min pismam dibêjîn û digrîn û deng û sedaya bavobavoya wan diçite felekê. Yanê mirofekî biyanî jî rast şîna wan bêtin, elbette dilê wî disoje û digirîn. Bi vî tîzî bi ihtîşam dibin çal dikin. Û ew jinêd ku guliyêd xo birrîne, ewan guliyên li ser qebra wî meytî, li kêlêd wî dilawisîn. Heta panzde rojan şubeh û êvaran jîn û mêr û cîran têne ziyareta qebra wî dixunin û digrîn, şedeqe û xêran dikin. Ew mirî eger mêr e, libasekî wî beqîmet meşela qapût û kurk weyaxo şalê bibiha davêjîne ser cinazeya wî. Û eger jîn e, dîsanê libasekî wê zîqîmet davêjîne ser cinazeyî û dibine qebrê. Ew libasê ku avêtine ser cinazeyî, ew ji boy melan in. Ew dibin û mela difiroşin û li yekûdu parî vedikin.

Heta sê rojan zad û tî am li mala meytî nayête patin. Cîran zadî tînin û bi mêr û jinêd wê malê didine xurîn. Heft roj ku tamam bûyin, cîran diçin û libasêd meytî dişon û paşê didine jar û feqîran. Wekû bîst roj bûyî, mala meytî zaf helwa û zadan çêdikin û cîran û gundî û biyaniyan dikine gazî û bi xêra meytî didine xurîn û belav dikin. Û ew libasêd reş heta şeş mehan weyaxo salekê li ser ehlê meytî dimînin. Ew ehlê meytî heta ji şînê bidernekevin, naçîne dawet û kêfxweşiyên. Wekû mideyê hiznê tamam bûyî, aqayêd wan weyaxo cîran û xizmekî wan ji boy her yekî ehlê meytî anegora halê xo tiştêkî tîne û reşêd wan hildigire, ji şînê biderdikevin. Lakin eger ew meytî begzade weyaxo aqa û mirofekî kîvş bûya, elbette paşî panzde rojan hakimê wî welatî xelatek haqîr dikirîn û dişande pey warişê meytî û tînane hîdûra xo û digotîne: “Emrê Xudê ye, bilanî tu xweş bî, mirîn riya me hemûyan e!” Ew xelat li wî warişî dikirîn û ji reşê biderdanîn.

Mirofêd maqûl, xêvetan dibin û li ser qebra meytî vedidîn. Anegora halê wî, mehekê û panzde rojan xêvet dimîne û mela bi ucret Quranê dixunin. Û rojê du dahnan zad û tî am dibine xêvetê, ew mela dixun.

Wekû dinê ekrad zêde bi kîn û kidûret û xuyî'înad in. Eger dijminî digel yekî heyin, da'îm li çurra wî digirîn. Û qeşda xisara wî dikin û diçine riya yekûdu û hevdu birîndar (dikin)⁴⁹² weya dikujîn. Eger qeş nabî ji penî ve, bi şev ji dûr ve, ji kolikê weyaxo di xêwê⁴⁹³ da razayî bi gule li hevdu dikujîn. Ew jî nebî, bi dizî agirî bere malêd yekûdu didîn, weyaxo bi xef rastî hesp û dewe⁴⁹⁴ û dewarêd yekûdu bibin, ewan

⁴⁹² Di (M)yê de tuneye.

⁴⁹³ Di herdu nusxeyan de jî peyva “xewê” bi vî awayî hatiye nivîsîn.

⁴⁹⁴ Peyva “deve/hêştirê” bi vî awayî hatiye nivîsîn.

heywanan pê dîkin. Û eger mimkun dibe, belkû jî je‘rê jî tevî zadêd yekûdu dîkin. Xulaşê dijminayîya wan qewî bela ye.

Ekşerî jîn weya mela weya şêx dikevîne nêva wan neyaran û li hevdu tînin, lewranê tayîfeyêd ekradan qewî zêde qedrê mela û şêxan û jinan digrîn. Ew hersê tayîfe herçî ricaya bikin ewan mayûs nakin. Zaf dibe du tayîfe li meydanê dikine şer û ji herdu kenaran jî telefîyat bûye. Wekû jin bê û laçîka xo raxîne nêva wan, elbette ew du tayîfe ji yekûdu dibin. Weya mela û şêxek bê, bikeve nêva wan, def‘a şerî dibî. Û ekrad nêzûkî malêd mela û şêxan nabin û nadizîn û xirabiya wan nakin. Dibêjîn ku ew ocağ in, paşê bi me ve didîn. Î‘tiqada wan eve ye. Lakin ekşerêd şêxêd wan cahil û nexundî ne. Goya berê ecdadêd⁴⁹⁵ şêx bûne.

Wekû mirofek⁴⁹⁶ qebaşetekî bikît û bireve xo bavêje malêd şêxan, xilaş dibe.

Keçrevandîn di ekradan da ‘eyb nîne, lakin bi riça. Bê riça keçê nabî. Wekû keç û kurî hevdu hebandîn û bab da keçê nedane wî kurî, îcarê ewê keçê direvîne, dibîne mala ağayekî û yanê şêxekî. Û xuyêd keçê bi pey dikevin. Eger li rê rast hatin⁴⁹⁷, keçê û kurî herduyan jî dikujîn. Eger rast nehatê, selamet çûn, êdî xuyê keçê qadirê tiştêkî nabî. Îcarê ew ağa û ew şêx ku keç û kur çûyîne malê, dikevîne mabeynê. Eger malê wî kurî jî tunebe, ji kîsê xo û yanê ji cîranan miqdarekî malî û diraf berhev dîkin û dibin, diçîne mala xuyê keçê û rica dîkin. Elbette şilha wan dîkin û ewê keçê li wî kurî mar dîkin û dijminî radibe.

Û keç û jinêd ekradan bi xo bi nefsa xo muxtar nînin. Belkû bab û birayê keçê wekû ew dayîne mirofekî⁴⁹⁸, keç qadirê me‘nê nabî. Elbette xwah naxwah, keçê dê wî mirofî⁴⁹⁹ bistîne, bilanî keç ji wî huşnûd jî nebî. Eve ‘adete şer‘îye nîne, belkû şermiye ye. Di ekradan qewî ‘eyb e ku bab û bira bidit, ew bibêjîn ku em nastînin.

Kumreşî û bedgumanî li nik tayîfeyêd ekradan tunînin. Meşela jinêd wanê ciwan digel mêrêd biyanî xeberdîn û bikenin û rûnîn û rabin, ew bedgumanîyê nakin. Îlla ku xirabî bibînin û yeqîn bikin, elbette bîla mecal, ewê jinê dikujîn û mêrî jî. Êdî ewan xûn tune. Kesek li wan nabî xuyî.

⁴⁹⁵ Ji bo ev hevoka bê fêmkirin divê cînavka “wan” li vir hebûya.

⁴⁹⁶ Di (N)yê de ev peyv “mîrovek” e.

⁴⁹⁷ Di (N)yê de ev peyv “hatî” hatiye nivîsîn.

⁴⁹⁸ Di (N)yê de ev peyv “mîrovekî” ye.

⁴⁹⁹ Di (N)yê de ev peyv “mîrovî” ye.

Ekrad li hemû qebahetan dibine xuyî, lakin li şola xirab nabine xuyî, lewranê li nik wan qewî ‘eyb e. Û ‘adetê ekradan e⁵⁰⁰ xûndar şîrê xo davê ustuwê xo û topekî cawî didite bin çengê xo û diçit xo davêjite mala xuyê xûnê ku: Eve şîr û eve kefen yan min bikuje yan min aza bike. Îcarê xuyê xûnê elbette wî xûndarê xo aza dike.

Û ekrad tebî‘et cahilîn heyin, bi fal û minecim û hindek tîştan bawer dikin û hindekan se‘d û hindekan şom dizanin. Û bi nusxeyan bawerî dikin. Bi wê dereceyê ku çewanî millet efrenc bê hekîm nabin, ew jî bê nusxe nabin. Herçî ‘illet û derd dibî, bilanî bibe, elbette niwişt dikin.

Lakin î‘tiqada wan bi hekîman nînin û guhdariya hekîman nakin. Ew dibêjîn hekîm Xudê ye, derd û derman herdu jî ji nik wî ne.

Welakin ekrad jî wekû efrencan qewî zêde ji nexweşî û webayê û halê û ‘illetêd ku şarî ne, dişîrsin û bi dûr dikevin. Heta kur û bab û bira eger yek ji wan bi vê mereqê bimirîn, ewî miriyî diterikînin, bi xo hilnagirîn. Dirafî⁵⁰¹ didine melan, mela diçin ewî miriyî defîn dikin û eger mela jî tunebin, wisanî ewî miriyî di cihdanî dihêlîn û bar dikin direvîn. Û eger di gund û zomeyekê da weba hebit kes naçite wî gundî û zomeyê û mirofêd ku ji gundê nexweşî tê heye, nahêlin nêva xo û naçin û nabin. Ew jî wekû efrencan ihtirazê ji naxoşî dikin, lakin ne ji hemû naxoşîyan, belkû ji weba û qolêre û halê, evne ku şarî ne, êdî ji naxoşêd mayî narevin.

Û ‘adetêd jinêd wan in ku li ser zarokêd xo rûtinin û naçine şû.

Wekû dinê ekşerêd wan mirina di muharebe û şerî da temennî dikin, eger mirofêk bi ecela xo fewt bibe, dibêjîn, mixabin, xuzya di şerî da fewt bibûya. Wekû dinê ekrad di şerî da ji yekûdu şerm dikin. Eger di dil da jî cesaret tunebin, elbette ji şerma oldaşan dê şerî bike û yanê bête kuştin. Ekrad di şerî da gazî yekûdu dikin û gîret didine yekûdu, eger mirofêk bireve, paşê êdî qedrê wî namîne û jîn, mêr tiv dikin rûyêd wî û mesxere pê dikin û di meclisan da qaweyê di qûna fîncanê da didine wî mirofê revî. Û mideyekî jina wî jî ewî nadite xeberdan û her rojê ewî pîs dikin, yanê di ekradan da di şerî da revîn, ji mirinê bedtir e, mirof bi mirinê raqî ye, lakin bi wan rezaletan raqî nîne, ji boy vê xeberê narevîn.

Û zaf tayîfe heyin ku daîm digel yekûdu dijmin in û li kê derê rast yekûdu bîn, eger firşetê bebînin hevdu dikujîn. Û bixoser bi emrê hakimî leşker dikin û diçine ser malêd yekûdu û talan dikin.

⁵⁰⁰ Di (N)yê de tune ye.

⁵⁰¹ Di (N)yê de ev peyv “diravî” ye.

Lakin jîn di nêv wan da murexeş in, ew destê xo li jinan hilnagirîn û ‘edawetê digel jinan nakin û qewî zêde xatira jinan çavra⁵⁰² dikin. Jîn biçe rica xûnê jî dibexşînin.

Û di welatêd Bohtan û Hekarî û Behdînan, di nêva xwecihiyan da jî zaf neyarî dibe. Du gund weya du qeşa weyaxo di gundekî da nêvî kinarek û nivê dinê kenarek dibin û digel yekûdu rojekê û du sê şerî dikin û ji du terefan mirof telef dibin û çeperan girê didîn û şeşxanan davêne yekûdu, eşla mêrek nikare ji mala xo biderkeve. Dîsanê jîn di nava gundî digerîn û diçine malêd yekûdu, jîn murexeş in, kesek ewan nakuje. Îlla ji boy şola xirab, êdî kes rica’ê jî nakin, îlla dikuşîn, wekû wiha nebit, jinêd ekra dan ji xelqê narevîn, paşê gelek xirabî dibî, lakin ji kuştinê dişirsin. Çawanî bibe ku yek şola xirab dikin û têne kuştin, bê kuştin qet‘a mimkun nabî.

Ekrad rojêd înan seferê nakin, şom dizanin û roja sêşenbe jî nehs dizanin, wekû mirofek li ser şolekî be, bebêhnije, eger carek bî şebr dibêjîn, elbette wî şolê weyaxo wê seferê nakin. Eger du caran bebêhnije te‘cîl dibêjîn, ewê derer nîne, ewî şolî dikin. Wekî mirofek biçite seferê îbtida ku ji mala xo biderdikeve⁵⁰³, eger jîn bête oğura wan, weyaxo cêrê vala bête oğura wan, zaf şom hesêb dikin. Û nezer heye, ekra d nezerê rast dizanin û gelek jî ihtirazê dikin. Goya mirofê ku kose û mûzer û çavheşîn bibe, ji nezerê wî mirofî elbette dişirsin. Wekû mirofê bi vî şûretî bibînin ji wî zaf ihtirazê dikin.

Ekrad di reşê da jî wekû yê berfê û korê rêçê û dewse digerînin û dizanin wekû bi şev seyêd wan direyîn, ew ji reyîna seyî fehm dikin ku ev seye mirof dîtiye weyaxo dabe dîtiye. Û bi şev guhêd xo didine ‘erdê, guhdarî dikin, ji dûr ve eger siwar bîn, ew ji dengê ‘erdê fehm dikin û bi wî terefî diçin. Û gelek şolêd wan heyin goya ewan ceribandîne, ji wan ‘elametan goya fehma şolekî bûyinê dikin. Meşela wekû bizin qemçika xo ber jorê bike, ew dizanin ku wê rojê baran nabare û eger bizîn (bizin)⁵⁰⁴ qemçika⁵⁰⁵ xo ber jêrî bikitin, ew dizanin ku dê wê rojê elbette baran dê bibarît.

Wekû teryik bête derê malê û bike gazî ew dizanîn ku dê ji musafirî xeber û cewab bêtin. Wekû kîtik bi destê xo, ruwê xo bimalin ew dizanin ku dê mêwan bêtin. Wekû parî di destan bifiritin weyaxo ji hêvîrê wekû jîn dibirîn kerek bifire, ew dizanîn ku dê mêwan betin û eger li dora şemalê pirtik peyda bibin, ew dizanin ku dê ji boy wan ji dûr ve kağiz bêtin. Û eger şolêd wan yekûdu siwar bibin, goya sefer waqî‘ dibê. Eger nêva destê rastê bixure goya ji boy wan ji cihekî diraf têtin, eger nêva destê çepê bixure,

⁵⁰² Peyva “raçav” di herdu nusxeyan de jî bi şaşî wekî “çavra” hatiye nivîsîn.

⁵⁰³ Di (N)yê de ev peyv wekî “biderdikevid” hatiye nivîsîn.

⁵⁰⁴ Di (M)yê de tuneye.

⁵⁰⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî “vemcîk” hatiye nivîsîn.

elbette dê şerek peyda bebî û ji boy şerî hadîr dibin, eger qapağa⁵⁰⁶ çavê rastê bavêje, ji boy wan goya mizgîn têtin û şa dibin. Eger qapağa⁵⁰⁷ çavê çepê bavêje, bela nazil dibitin û mehzûn dibin, xulaşe ji boy herketeta tamarêd bedenî hemûyan her yekî tecribeyek li nik wan heye. Eger keskeşor li kenarekî peyda bebî, goya li wî kenarî dibitin erzani. Û eger êvarê û şubeyê şefqekî şor li damena ‘esmanan peyda bitin, goya li wî kenarî şer û ceng peyda dibitin. Eger navê yekî bi geletî bi mirinê biderkeve goya ew mirof paşê zaf⁵⁰⁸ dijî. Wekû keçek dayîne bi şû, lakin hêj nebirî, mêrê wê bi emrê Xudê mîr, ewê jinê şom hesêb dikin û serxure dibêjîn û zaf kes êdî nabine talibê wê jinê. Îlla eger du caran waqî‘ bibe, êdî me‘azellah, kesek ewê jinê naxozitîn. Lakin eger jîn bemre û mêr bimîne, ewî şom hesêb nakin, bilanî deh caran jî waqî‘ bibe.

Û ixtiyar û pîrejinêd wan ciwanan berhev dora xo dikin û şolêd dinê û umûrêd lazime ji boy wan dibêjîn û horî wan dikin û biserhatêd⁵⁰⁹ xo ji boy wan neqil dikin ku filan weqtê wiha bûye û filan bi vî terzî kiriye û li filan şerî wiha bûye. Terz û rism û ayinêd şerî ew ixtiyar ji boy lawan⁵¹⁰ neqil dikin û ehwâlêd malan û rusûmêd jinan ew pîrejîn ji boy keçan û bûkan neqil dikin û şîreta wan dikin, çewanî mela dersa suxteyêd xo diditin û ew ciwan jî şîretêd wan digirîn û ji xebera wan bidernakevin, wekû şayed şolêd dijwar û zehmet li wan peyda bebîtîn û ji wan kal û pîran tedbîra wî şolî pirsiyar dikin û digel wan şêwrê dikin û ji emrêd mezinêd xo bidernakevin.

Û ehlê ekrad eger xwecihî û eger rewend, qewî zêde hâkimperest û ağaperest in. Zêde îtaeta hâkiman û mîr û ağan dikin. Bilanî hâkimêd wan fileyek jî bibitin, êdî zêde îtaet dikin, lakin ji hemcinsêd xo dexesî dikin, bi ‘înad û kîn û kidûret in, eger ji cinsê wan yekî jê ra bibine hâkim û ağayêd wan îcarê ewî qebûl nakin û îtaeta wî nakin, elbette fesadekî peyda dikin.

Û eger ekrad îhsan û kerem û qencyê ji yekî bibînin ji bîr qe nakin, daîm ewê qencyê di nêva xelqê⁵¹¹ da, di meclisan da dibêjîn û xirabî jî kezalik. Û ji ber ‘eweđa qencyê daîm merama wan ew e ku xizmetekê bikin. Û ji ber xirabiyê jî mibadela wê bi xirabî û heyfê bikin. Ew dibêjîn ku qencî jî û xirabî jî winda nabitin. Û di xeberdan û cewabê da bêperwa dibin, hâkim bit jî elbette cewaba heq dibêjîn û naîrsin, bilanî ewî te‘zîr jî bikin, elbette wê cewabê dê bebêjîtin. Di xeberdanê xuyîcesaret in. Eger bibine

⁵⁰⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “vapağ” hatiye nivîsîn.

⁵⁰⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “vapağ” hatiye nivîsîn.

⁵⁰⁸ Di (N)yê de ev peyv tune.

⁵⁰⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “liserhatêd” hatiye nivîsîn.

⁵¹⁰ Di (M)yê de ev peyv wekî “law” hatiye nivîsîn û paşê bi qelmeke cuda “an” lê hatiye zêdekirin.

⁵¹¹ Di (N)yê de ev peyv wekî “helqê” hatiye nivîsîn.

kuştinê jî dîsanê regmê nînin. Yanê bi rastî ji kuştinê wekû milelêd mayî ji kuştinê naîrsin, dilêr in.

Û hespêd sipehî⁵¹² û cins di nêv wan da heyin, çar cins hesp heyin; ki'êl, hed, seglawî, mi'eng. Necdî jî peyda dibin, lakin kê m heyin.

Û her siwarekî cengê pênc agirî dixebitîn. Cotek tapançe di qebûrê da û cotek tapançe li ber piştan û qerebîne û rim û şîr û sê zergan jî li ber tanga hespê da dikin. Xulaş siwarekî deh derp heyin. Wisan siwarêd mahir heyin ku agir ji agirî nabire, qewî çapik siwar dibin.

Hespêd wan qewî zêde bi dewam û şolker dibin, lewrane dibêjîn şev û rojê lê siwar dibin û zaf zorê didine hespan û di şeran da jî ekrad hespêd bi eylem di'emilînin û çiqas ku nebûye tengî zorê li hespêd xo nakin û dihuşînin. Hespêd wanê cins şev û rojan ji tîrsa dizan revandîne bi⁵¹³ qeyd dibin û mifte jî li nik xuyê malê dibî. Lakin daîm hespêd siwariya şev û rojê bi zîn û haqirliqab li qerpûza zîn dibin. Û çêk⁵¹⁴ û sîlahêd wan tijî û tîzkirî ye, lewrane wekû iqtîda bikitin ew ekrad filhal li ser piştê hespê lazim in. Daîm ew hespêd xuyî zînan ce⁵¹⁵ didîn û qenc xuyî dikin. Yanê ew qeder î'tibar nakin ku hespêd xuyî zînan bibin û bi'tewilînin, belkû li ber derê konî girê didîn û haqir e dibe ku di rojekê da du sê hewarî peyda dibitin. Biharan wekû biderketine konan, çêk û sîlahêd da'im şev û rojan heta dikevîne qîşlagê xaniyan. Lakin di xaniyan da êdî raqet in, hewar û gazî nabî. Ekşerê ekradêd dewletmend diraf û giraniya malêd xo dibin û li bajêran dostêd wan heyin, bi emanet datînine nik dostêd xo. Wekû lazim dibî diçin û tînin. Lewrane î'tibara wan bi konan nabî, ji dizan û ji talan û dijminan emîn nabin. Ekrad bi xo dibêjîn ku dewleta me ya qîşliq weya qûşliq e bê î'tibar e. Yanê heyîya me, yanê eger pez û dewar e, bi zivistanekî şedîd qîr⁵¹⁶ dibî û xilaş dibe weyaxo bi tîştêkî ew mal û dewar diçine talanê û dijminek tê dibitin.

Û keçêd wan jî dixunin û mela jî heyin, darsa wan dibêjîn. Û ekşere jinêd wanê navser qelûnê dikêşin. Û qelûna tijî dikitin û tete meclisê, nêva mêran. Û jinêd wan kê nimêjê dikin, daîm⁵¹⁷ dixebitîn û şola malê dikin.

⁵¹² Di (N)yê de ev peyva wekî "sipehî" hatiye nivîsîn.

⁵¹³ Di (N)yê de ev wekî "be"yê ye.

⁵¹⁴ Peyva "çêk"ê li hin cihan wekî "çêk" hatiye nivîsîn.

⁵¹⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî "ceh" hatiye nivîsîn.

⁵¹⁶ Peyva "qîr"bûnê wekî "qîr" hatiye nivîsîn.

⁵¹⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî "da'im" hatiye nivîsîn.

Û jinêd wan bi şev malê gêzî nakin û paqij nakin, dibêjin ku şom e. Û bi şev piv⁵¹⁸ nakin çirayê⁵¹⁹ û bi şev neynûkê nafekirîn. Evne goya li nik wan şom e. Û bi şev aman ji malê bi dernaînîn û ziblî ronakin. Û nêzûkî êvarê û rojêd çarşembê serêd xo û serê zarokan naşon ku naxoşî peyda dibî.

Û haşîla xo û malê xo nîşanî kesekî nadîn ku nezer dihingive.

Û pîrejîn di nêva wan da heyin wekû zarok weyaxo mirofek naxoş bibe ewê pîrejîne tînin. Ew pîrejîn ewî naxoşî bi nan û xoy efsûn dikin. Û paşê ewî nan û xoyê didine san dixun. Goya ew seyêd xurî nexweş dibin û ew mirof û zarok şifa dibînin. Û şolêd cahîle zaf di nêva ekraan da heyin.

Û gelek malhebîn in, carekê duyan qewimiye ku yekî miqdarê hezarî pezî hebûye û zivistan şedîd bûyî, ew hezar pez hemû telef bûyî, qir bûne. Paşê xuyê wan pezan çekêd xo girêdaye û li hespê siwar bûye û daye meydana û tepançe bi kenarê ‘esmanan da agir kiriye û me‘azellah gotiye⁵²⁰ ku Xudê, te pezêd min qîr kirin, tu li ku yî were em bikine şer. Û bi xo jî ji hespê da ketiye û mirar bûye. Wiha ef‘alêd cahiliye di nêva ekraan da zaf heyin. Weqtê mirofekî wanî ‘ezîz û ciwan dimire dîsanê dibêjîn ku me‘azellah, Xudê te çi kir, filan kes kuşt. Xulaşê tiştêd bêemriya Xudê te‘ala zaf dikin. Wekû di şerî da di meydana da eger bira û kurê yekî bikeve, birayê dinê û bab diçe û xo davêje ser wî meytî ew jî tete kuştin.

Wekû zarokêd wan diwelidîn, îbtida ewî bi ava sar gûsl dikin ku goya li ber sermayê qewî û mişkem dibitin.

Ekşerêd ekraan yek jîn heye. Nadir ji aqayêd du sê jîn dibin. Û jînberdan di nêva wan danî qewî zêde kirêt û ‘eyb e, kême waqî‘ dibitin. Û jinêd wan zafê hişşe û parê ji malêd bab û dayêd xo nastînin. Belkû dibexşîne warişêd nêr. Lewranê irşiyetistandîn di nêva wan da şerm e û him bê yimn e, goya herçî mîraşê bibe, paşê malê wê jî mîraş dibî. Ji mîraşê gelek ihtirazê dikin. Û ji cilêd miriyan dûr dikevin.

Ew jî mewlûd didine xundîn. Mêr cida û jîn cida, zad û te‘aman tedarik dikin û bixûran disojîn.

Weqtê îbtida keçekê dixwazîn wekû dan hespekî bi⁵²¹ taxum herêkirîn distînin. Paşê şîrînî vedixun û paşê nîşan dikin. Û qalenêd wan zaf dibe şed û duşed û panşed

⁵¹⁸ Peyva “pîf”ê wekî “piv” hatiye nivîsîn.

⁵¹⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “çira’ê” hatiye nivîsîn.

⁵²⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “gotyêd” hatiye nivîsîn.

⁵²¹ Di (N)yê de ev wekî “be”yê ye.

pez. Û hind çend bab û da û birayêd bûkê heyin, elbette ji boy heryekî xelatek lazim e, bê xelat nabî.

Eger xuyê dawetê aça weya dewletmend e, ew gazî kê ku bikitin, keleşendekî mezîn ji boy wî verê dikin û ewan gazî dawetê dikin. Ew mirofêd⁵²² ku hatine gazîkirîn, anegora hâlêd xo du û sê û deh pezan ji boy xuyê dawetê verê dikin û paşê jî bi xo diçin dawetê. Û ew xuyê dawetê ji meşrefa dawetê zêdetir pez û mal ji boy wî berhev dibî. Û eger xuyê dawetê feqîr û jar e, dîsanê bi wê dawetê xoşhal dibî, lewranê herkes zêde toypayî ji bo wî verê dikin, hal û malek ji boy wî peyda dibitin. Eger mirofêd gazî dawetê dikin, merifne biçûk û bê hal mal in, serê her mirofekî keleşekirekî biçûk verê dikin⁵²³ û ewan mirofan gazî dikin dawetê. Elbette ew mirofêd biçûk jî labud dê pezekê toypayî ji boy xuyê dawetê verê bikitin. Xulaşê dawetê bê tîşt nabî, qaşa zaf û hindik dê tîşteki ji boy xuyê dawetê verê ketin. Jîn jî cida tîştan dibine dawetê, ji boy keçê meşela ber û kulaf û ‘eqîb û goran dibin. Û dawetêd wan jî zaf bi deng û istiran dibin, ew bêrite dibêjin. Dengbêjêd wan heyin, bêritan dibêjin, ew jî bi govend reqş dikin. Lakin jîn û mêr keç û law hemû⁵²⁴ têk da destêd yekûdu digirîn û reqşê⁵²⁵ dikin. Û keçêd wan û jîn di govendê da distirên û dileyzîn, lakin dibe ku daweta maqûlan da def û nay û kemaçe û defik û çinger jî hebitin. Emma sazbandêd wan mişrib in. Her tayfeyekî ji ekra dan cida cida mişrib heyin ku xaşê bi wan in. Ji biyaniyan mişriban nayînin.

Dawetêd wan sê rojan, hefta heft rojan anegora hâlî dibitin. Bûk û zavê jî paşê tînin û dêxine govendê ew jî dileyzîn. Wekû bûk û zava dikevîne govendê⁵²⁶ her kesek pez û diraf li wan şabaş dikitin û gelek pez û diraf cem‘ dibî, du hişsa wî dirafi ji boy xuyê dawetê û hişseyek ji boy mişriban in.

Û dawetê û diyafetêd ekra dan zad û te‘amêd wan birinc û goşt e, êdî zêde ew zadê enwa‘ û cins cins çêkirîn nizanin û ‘adet nekirîne. Belkû zafî qeş enwa‘ û cinsêd zadan nedîtine û nizanin. Êwan cinsê zadî û te‘amî ye. Lakin zaf simaştan radixînin⁵²⁷ û tijî zadê goştî û birincî dikin. Ew cem‘iyet dest bi dest rûtînin û dixun û radibin, destekî dinê têtin û dîsanê zadê wekû kê m dibitin tînin, hefta ku nas hemû zadî dixun.

Wekû bûkê tînin, jinek ji mala kurî berbûk dibêjin, diçite mala bûkê û jînek jî ji mala bûkê dîsanê berbûk dibêjin, digel bûkê ji wî kenarî têtin, bûkê siwarî dikin. Û

⁵²² Di (N)yê de ev peyv wekî “mîrovêd” hatiye nivîsîn.

⁵²³ Di (N)yê de ev peyv wekî “virê dikin” hatiye nivîsîn.

⁵²⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî “hemû” hatiye nivîsîn.

⁵²⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî “reqş” hatiye nivîsîn.

⁵²⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “goqend” hatiye nivîsîn.

⁵²⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “raxînin” hatiye nivîsîn.

miqdarekî siwaran li berayikê dileyîzîn û bi kêf tînine mala zavayî û marê dibirîn û bi şev didine gerdekê. Paşê sê rojan ewan jinêd ku bûyine⁵²⁸ berbûkî her yekê xelatekê didinê û bi rê dikin. Paşê middeyekî mala bûk û zavê gazî hevdu diyafetê dikin, mêr û jîn digel cîran û xizman û hedîye didine yekûdu.

Wekû şayed weqtê marê, baran û berf bibaritin ew dibêjîn ku ev bûka zaf binê amanan xuriye.⁵²⁹ Û bê tala ye ku di daweta wê da baran û berf dibaritin.

Û ekrad daweta kirîwayiyê⁵³⁰ dikin û dibine kirîwêd yekûdu. Ew jî ‘adet wisan e⁵³¹ wekû yek mirad dikitin ku mirofêkî ji boy xo bikitin kirîwa, eger ew herdu mirof jora jorîn e, tînin berê hespekî dixemilîne bi rext û taxum verê dikite mala wî mirofê ku bilanê bibite kirîwê min ew jî qebûl dikitin û bexşîşekî didine wî mirofê ku hesp birîne û cewabê dide ku belê ez dê bibime kirîw. Û eger ew herdu mirofêd ku kirîwayî dikin ji qismê ewset weyaxod edna ne ew jî beranekî dixemilînin û dişînin mala kirîwî. Îcarê ew dibine kirîw.

Xuyê kurêd ku dê bibine sinnetkirîn tedarika zad û te‘amê dikitin. Wekî rojê dê ew zarok bêne birîn xelqê gazî dikin û kirîw jî têtin. Paşê te‘amî xelq belav dibin. Îcarê dellak têtin ewan zarokan dibiritin. Lakin bexşîşa dellakî û xelata wî ê ku bûyî kirîwa ew mirof diditin. Û heta sê rojan rojê du danan xunçe û zad ji mala kirîwayî ji boy wan zarokan têtin. Wekû ew zarok rabûn ew kirîwa ji boy her yekî anegora hâlê xo destekî libasî dikitin û dike ber wan. Paşî çend rojekan êdî babê zarokan ewî kirîwî mêr û jîn gazî mala xo diyafetê dikin. Û paşê mêr û jinêd kirîwan anegora hâlêd xo xelat didinê û bi rê dikin.

Ji boy xundina zarokan dayîna seydayî wekû romiyan rismekî mu‘eyyen tunînin, cum‘eliq û me‘aş û hefteliq tunînin. Berê wekû zarok verê kirîn seydayî anegora hâlê xo hediyekekê didine zarokê ji boy seydayî dibin. Êdî tiştêk tunînin heta ew zarok xitma Quranê bikitin. Wekû ewî zarokî xitim kir, îcarê bab û dayêd wî zarokî rojekê gazî seydayî⁵³² dikin, anegora hâlêd xo du û sê û pênc pez weyaxo çêlekekê didine seydayî, ew jî raqî dibe. Wekû dinê dersêd kitêb û meşq ku dikin ewan seyda mehdâ bi xêra xo te‘lîm didîn. Ucret nastînin îlla ku muderrisê medresan ucreta wan ji malê weqfê heyin, distînin. Û muderrisê suban zû têne medreseyê û dersan dibêjîn, heta nêzûkê êvarê, paşê

⁵²⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “bûne” hatiye nivîsîn.

⁵²⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “xurîn” hatiye nivîsîn.

⁵³⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “kirîwayî” hatiye nivîsîn û di herdu nusxeyan de jî peyva “kirîv” wekî “kirîw” hatiye nivîsîn.

⁵³¹ Di (N)yê de tune ye.

⁵³² Di (N)yê de ev peyv wekî “seydayî” hatiye nivîsîn.

diçîne malêd xo. Îlla rojêd in û sêşanban te‘tîl e, muderris nayête medreseyê û feqeh dersan naxunin. Di wan rojêd te‘tîlan da dewr û dersêd berê xundî tekrar dikan. ‘Adet e ku her kesek ji mala xo her rojê ser êvarê sê nanan û amanekî zadê herçî Xudê dayî ratib didine feqehed medresan.

Û qewî qedrê melan dizanin û îkrama wan dikan. Eger melayek cahilekî biqûte weyaxo çêr bikitin ew cahil destê xo li melayî hilnagirîn û xeberan li melan wernagerînin. Û li semtê Bohtan û Hekarî û Behdîn û Şoran wekû cahil bi rê ve rastî melan bên ji dewara xo peya dibin û destêd melayî radimûsin û paşê siwar dibin û diçîne riya xo.

Ekrad herçî ku xeymenişîn in, wekû mêwan bêtin rast dajon derê konî. Xuyê malê jî radibe û pêş ve tîn û hespêd wan digirîn û girê didîn. Eger şayed xuyê malê mêr hadir nebin, jinêd wan biderdikevin pêşiya mêwanan. Û hespêd wan digrîn û girê didîn. Û ewan mêwanan dibine konî. Êdî zêde ji mêrêd xo îkram û î‘tirazê dikan.

Ekradêd xwecihê Bohtan û Hekarî û Şoran, ewan oşeyêd mêran tunînin, belkû mihmanxana wan mizgeft e. Herçî mêwanî têtin, eger siwar eger peya eger maqûl eger jar rast diçite mizgeftê. Eger siwar in, gundî diçin û hespêd wan tînin û li mala xo girê didîn û alif didinê û xuyî dikan. Ew mêwan jî li mizgeftê diêwirîn. Wekû bûye êvarî, ehlê gundî mezîn û biçûk heryekî amanekî zadê herçî Xudê dayî digel du sê nanan li ser destî tînin mizgeftê. Wekû nimêja êvarê dikan, destexanê radixînin, ewan amanêd zadan datînin, digel mêwanan te‘amî dixun. Û paşê ji malêd xo ji boy mêwanan nivînêd razanê jî tînin. Lakin mizgeftêd wan kuçik tê heyin. Agirî hil dikan qewî germ⁵³³ dibitin. Û raxistî ye wekû oşeyan bi tedarik in. Lakin ekradêd xwecihê Wan, Mûş û Bazîde ewan her kesekî gora halê xo yalê mêran heyin mêwanan sakin dikan. Eger qe cî⁵³⁴ tune bijîn⁵³⁵ li yalê malê li kenarekî xuyê malê digel jina xo û li kenarê dinê mêwan radizên. Nabê cî⁵³⁶ jî tunebin dîsanê mêwanan ji derê malê venagerînin. Lewra li nik wan mêwan neêwirandîn û ji derê malê veğerandîn qewî şerm û ‘eybekî mezin e. Û hürmeta mêwanan dikan. Bilanê millet axir jî bitin.

Ekrad di malêd xo da zêde mikerrem in. Mimkun nabit ku meşela wekû milelêd mayî ekrad li cihekî zadî û fêkî û tîştekî bixun û mirofek⁵³⁷ ji dûr ve bifekire û li wan

⁵³³ Jaba ev peyva wekî “kerem” xwendiyê.

⁵³⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

⁵³⁵ Li vir şaşiyêke nivîsê heye û divê wekî “tunebe jî” bihata nivîsîn.

⁵³⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

⁵³⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “mirovek” hatiye nivîsîn.

nezer bikitin, ew qederekî ji wî zadî û fêkiyî nedine wî mirofî ku nezer dikitin. Lewranê î'tiqada wan ew e ku nefsa wî mirofî⁵³⁸ dibe mar û bi şev tête xewna wî. Û eve goya di nêva⁵³⁹ wan da mucerreb e, ihtirazê ji nefsa geyran dikin. Elbette zaf û hindik dê tişteki ji zad û fêkiyî bidine mirofê ku lê nezer kiriye weyaxo nezerê dikitin. Wekû dinê ew para geyran naxun. Meşela sêvekê bi du keran bikî, yekî bideyî wî û yekî bideyî mirofekî dinê paşê ew mirof⁵⁴⁰ jî para xo ewê⁵⁴¹ kerê sêvê nexutin û bidite wî mirofî ewê naxun goya wekû bixutin pizikek li serê zimanê wî têtin û zehmet diditin. Gelek caran dibe ku pizik li serê zimanê yekî peyda dibî ew mirof dibêje ku 'ecêb parî li zimanî peyda bûye ez nizanim ku min kengî parî xuriye.

Wekû dinê eger mirofekî şayed parî li gewrûyê bimîne destê xo ji zadî dikêştin ku wax qerînekî min ji dûr ve birsî maye lewranê parî ji dest min ket dibêjîn.

Wekû serê çirayê pilîte belav bibitin ew dibêjîn geybeta min dikitin. Wekû rûnê wan şayed ji destêd jinan ro be tenûrê agir bibite alawî ewî zaf şûm digirîn ku mala me dê biçite mîratan. Eger rûn nebite alawî dîsanê şûm hesêb dikin ku goya mezinê malê fewt dibî. Wekû dinê weqtê berdil'ecûzê ew zîp⁵⁴² dibêjîn ewan rojan nehs dizanin û ji malêd xo bidernakevin û di wan rojan da naçine seferê.

Û panzde roj wekû dimîne parêza fillanî dirêj ekrad Xidirnebî dibêjîn. Ciwanêd ekradan bêkar keç û lawêd wan sê rojan rojî digrîn şeva çarê fitarê dikin û avê venaxun radizên. Goya herçî kesê di xewnê da avê bidite wê keçê ew dibe neşîbê wê dibe⁵⁴³ weyaxo herçî keça avê bidite wî lawî ew law dibite neşîbê wê keçê. Goya eva li nik ekradan bê şubhe ye.

Wekû dinê wê şevê poğîn çêdikin û di şikevê da datînin nêva malê. Goya dewsa hespê hedret Xizir li ser wê poğînê peyda dibe û ew xuyêd malê şa dibin ku mibarekî ye û xêr û bereket e hedretî Xizir îşeve hatiye mala me. Paşê wê rojê ji wê poğînê hêlawê çêdikin û li malêd cîran û xizman belav dikin û ji wê poğînê hildigirin vedişêrin. Goya ji boy bereket.

Roja çarşenba axirî şibaî ekrad, axirçarşenbe û qereçarşenbe dibêjîn. Wê rojê kêfxweşî dikin û digel kesekî de'wa û şerî nakin. Û li malêd xo zad û te'aman zaf çêdikin. Goya li î'tiqada wan da ew e ku herçî kesê wê rojê çi 'emelî bikitin heta salê di

⁵³⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî "mirovî" hatiye nivîsîn.

⁵³⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî "nêqa" hatiye nivîsîn.

⁵⁴⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî "miroq" hatiye nivîsîn.

⁵⁴¹ Di (N)yê de ev peyv wekî "ew" hatiye nivîsîn.

⁵⁴² Di (N)yê de ev peyv wekî "zîb" hatiye nivîsîn û Jaba jî wekî "zîb" xwendiyê.

⁵⁴³ Ev peyva "dibe" ya duduyan zêde ye.

wî ‘emelî da dibitin. Rojêd ‘eydan ‘adet e, mezîn û biçûkêd wan elbette helîse çêdikin. Û çî qeder ku du mirof digel yekûdu dijmin û neyar bibin, elbette rojêd ‘eydan digel hevdu şulh dikan û xeber didin. Heta sê rojan diçine zomêd yekûdu. ‘Eydanî di ‘eyd û Xidirnebiyê da mirofêd⁵⁴⁴ maqûl ‘eydane û beşîşan didine biçûkan. Û zarok li malan ji boy ‘eydane û Xidirnebiyê li malan⁵⁴⁵ digerin, pare weyaxo fêkî, elbette tiştêkî didine zarokan.

Û roja ku file zadika hêşorê dikan, wê rojê ekradêd Hekariyan kafirkûr dibêjin. Ew jî ji mikrêd fillan bi derve derdikevin geryanê û li malêd xo zadan çêdikin û dixun. Û ekradêd semtê Wan û Mûş û Bazîdê ew jî di hêşorê da li malêd xo da ji boy zarokêd xo hêkan şor dikan û ew jî digel fillan û digel yekûdu hêk dileyzîn.

Û ekrad zaf î‘tibar bi ziyaret û belkû bi dar û beran heyin. Darekî weyaxo berekî ziyaret dizanin û qurbanan dibin û serjê dikan û şemalan dibin vêdixînin. Wekû nexweşekî wan dibitin ‘ehd dikan ku bilanî şifa bibîne ez pêxwasin biçime filan ziyaretê û qurban û şemalan bebim. Wekû ew nexweş şifayê dibînitin elbette wî ‘ehdî dê bi cih bînin.

Û gelek caran dibe ku jîn we‘d dikan ku filan şola min bête serî weyaxo nexweşî şifayê bibînitin ez dê di riya Xudê da yeğnağekî ji boy ciwanan bikim. Paşê wekû şola wê hate serî ewê we‘dê bi cih tînin, ewî yeğnağî dikitin. Yeğnağ ew e ku bi daweta verê dikitin. Herçî keç û kurêd bêkar heyin û bûk û jinêd ciwan heyin hemûyan bi şev gazî dikitin. Û xaniyekî mezîn vala dikitin û çirağan û dengbêj û sazan hadîr dikan. Îcarê bi şev herçî ciwan û keç û law di wê mehelleyê weyaxo di wî gundî da heyin hemû pêkve têne wî xaniyî. Sazan diqutîn û distirên û govendan digrin û reqş dikan heta ku şubeh dibitin. Îcarê her kes belav dibin û diçine malêd xo.

Tiştêd wiha cahiliye we‘dêd wiha beçal di ekradan da zaf heyin. Carekê kurê jinekê gelek bêkêfbûyî hatibû dereceya mirinê, îcarê wisanî tete zimanî da kurî ku dibêje eger Xudê îcarê şifayê bidete kurê min bilanî wisanî nezr bibitin ku ez bi xo sağ bikevime qebrê û bê xurek sê rojan di qebrê da sakin bibim. Eger di qebr da helak bûm êdî borî û ger ne bilanî paşî sê rojan bên min biderînin. Ewê jinê wiha nezr kiribû⁵⁴⁶ bi emrê Xudê kurê wê paşî çend rojan şifa dît û xweşbûyî rabûye. Îcarê da wî kurî navî Rabû bû û navê kurî jî Kelho bû êdî Rabû iqdam kir ku ez dê we‘da xo bi cî⁵⁴⁷ bînim. Û

⁵⁴⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî “mirovêd” hatiye nivîsîn.

⁵⁴⁵ Di vê hevokê de ji herdu peyvên “malan” yek zêde ye.

⁵⁴⁶ Di (N)yê ev peyv wekî “كرىو” hatiye nivîsîn.

⁵⁴⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

çûye ji melan pirsiyar kirî, melan îzn nedayê lakin dîsanê çare li da kurikî nebûyî îlla ku ez dê ‘ehda xo bi cî⁵⁴⁸ bînim. Dîtin ku çare nîne çûn qebrek ji boy Rabû ‘adeta wekû qebra miriyan kolan. Rabû jî tobe û îstîğfar⁵⁴⁹ kirî weşiyet kir ku sê rojan ez di qebrê da dimînim, paşî sê rojan werîn qebrê vekin, eger ez helak bûm îcarê bînin min gûsl û techîz bikin û defn bikin û îlla eger ez heta sê rojan helak nebûm min biderînin ez tême mala xo, ‘ehda min bi cî⁵⁵⁰ têtin. Bi rastî îcarê înan wekû Rabû gotî qebr kolan û Rabû birin her bi cilêd⁵⁵¹ xo bê nan û av dirêj kirîne qebrê û qebra wê ‘adeta xulî kirîn û nixaftin. Heta sê rojan mayî. Îcarê jîn û mêr pêkve çûne ser qebra Rabû û qebr bişkaftin û Rabû bideranîn ku şağ e û nemiriye. Înane mala wê. Paşî vê we‘dê heft salan ‘emir kirî paşê fewt bûyî.

Ekrad di we‘dêd cahiliye da zaf qewî ne. Wekû tiştêk di ‘eqlê wan da bi cî⁵⁵² bû, êdî mimkun nîne ku tu⁵⁵³ zihna wan ji wê xeberê tedîl bikî, elbette zanîna xo dikin, ehl ‘înad î.

Birayî dikujî kur tê orteyê, ewî dikujî bab têtin, yanê ji yekûdu wekû qebayîlêd mayî ‘îbretê nagirîn.

Û derheq riyan û mirofan dîtinê, zêde bi îdrak û xuyîzihî in. Wekû ekrad carekê bi riyekê da biçitin êdî bîst sal jî li ser bibore, iqtîda bikitin bi şev di tariyê da ewê riyê bidertînin û nageliştin. Yanê ji boy rê û dirban zêde xuyîfiraset in. Wekû ekrad mirofeki⁵⁵⁴ carekê bibînin bîst salan nebîne paşê rast bêtin elbette wî mirofi⁵⁵⁵ nas dikin. Wekû ekrad li rê rast mirofeki⁵⁵⁶ bêtin⁵⁵⁷ elbette dê ji wî mirofi⁵⁵⁸ navê wî û cihê wî û ji ku têtin û bi ku ve diçitin bi ism û resm yek bi yek pirs û pirsyar dikin. Meşela eger ekrad ji derve rast mirofeki⁵⁵⁹ bên elbette pirsyar dikin, navê wî, cihê wî ji bîra wan

⁵⁴⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

⁵⁴⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “îstîğfa” hatiye nivîsîn.

⁵⁵⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

⁵⁵¹ Di (N)yê de ev peyv wekî “cilê di” hatiye nivîsîn.

⁵⁵² Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

⁵⁵³ Di (N)yê de ev peyv tuneye.

⁵⁵⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî “mirovekî” hatiye nivîsîn.

⁵⁵⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî “miroqî” hatiye nivîsîn.

⁵⁵⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “mirovekî” hatiye nivîsîn.

⁵⁵⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “tên” hatiye nivîsîn.

⁵⁵⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “mirovî” hatiye nivîsîn.

⁵⁵⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “mirovekî” hatiye nivîsîn.

naçitin. Paşî deh salan ew ekrad wekû bêne wî cihê elbette wî mirofî salîg⁵⁶⁰ dîkin û diçin dibine mêwanê wî mirofî.

Û di ekradan da jî pîspor heyin ku hezar berxan tevî hevdu dîkin, ew pîspor têtin û ewan berxan yeko yeko vediqetînin û davêne ber dayê,⁵⁶¹ yekî nagelitîn. Lakin ev pîspor nadir heyin.

Û ekşerêd ekradan ku di konan da nin, bi şev bi sîlahê heta şubeyê rûtînin, lewranê ji dizan û dijminan ihtiyatî dîkin. Û kelbêd wan jî cîns heyin. Kelbêd cîns li nik wan zêde mu‘teber in û bi qîmet in, heta bi deh û panzde pezan dikirîn û difiroşin. Lewranê pawanê mal û keriyêd wan ji derve kelb in. Kes nikare ku li kelbêd wan biditin. Eger li kelbêd wan bidin weyaxo bikujîn şer û şemate peyda dibitin.

Ekrad digêrîn û hespêd cîns dikirîn û tînin bere nêva revoya xo û diben ji boy dolê. Hespêd bêcîns nahêlîne nêva revoyêd xo. Û bargîrêd wan jî wekû hespêd qazağan zivistanan jî şeva rojê ji derve ne qewî li ber sermayê muhkem in.

Û aqayêd wan mezîn xuyîdewe dibin. Elbette qetarek û du û sê dewe lazim e ku hebitîn. Û aqayêd mezîn konêd ‘erebî heyin ew jî dîsanê konê reş e, lakin gelek mezîn û çar istûnî ye, hesêbke ew konê ‘erebî jî dîwanxana wan in. Û li eţrafêd wî konê ‘erebî miqdarê deh çadîran jî ji çadirêd spî vedidan⁵⁶² ji boy gulaman û qaweqî û şolgerî⁵⁶³ û şîrger⁵⁶⁴ û terzî û çaqmaqçî û seracî ji boy wan ew çadir vedidan û rojê du danan zad û simaşa ağan biderdikete konê ‘erebî dîsanê çarşed û panşed mirofan zadî pê didine xurin. Wisan aqayêd eşîran hebûn ku rojê barek birinc û rişîlekî qawê şerf dibe. Çi qeder êlat û cîran heyin tèn û li konê ‘erebî zadî dixun û qaweyê vedixun kesek mimane‘et nakitin.

Û aqayêd wan zencîr jî heyin ji ekradan xuyî qebahetan digrîn û hebs dîkin û talan dîkin û dibe ku mala wî mirofî ji nêva êla xo diqewirînin û îxrac dîkin.

Ew êlat jî bê îzn û emrê aqayî naçîne dizî û xirabiyê. Eger dizî û xirabiyê bikin tèn û dibêjine aqayî. Eger paşê xuyî biderket û nekarîn ku ewî malî bixun aqa ewî malî ji dizan distîne û didine xuyê malî. Û îlla eger xuyê malî bi derneketin û kivş nebû îcarê nîva wî malî ji boy aqayî ye û nivê dinê ji boy dizan in. Ekrad ekşerî cîran û xizim li yekûdu şehdeyê didîn û diçine nik xuyê malî ku hinde qeder dirafî mizgîn bide min ez

⁵⁶⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “salîgî” hatiye nivîsîn.

⁵⁶¹ Ji bo miha berxa wê heye “mak” tê gotin, lê li vir peyva “dayê” hatiye bikaranîn.

⁵⁶² Di (N)yê de ev peyv wekî “vedan” hatiye nivîsîn.

⁵⁶³ Jaba ev peyv wekî “solkerî” xwendiyê.

⁵⁶⁴ Jaba ev peyv wekî “chirkerî” xwendiyê.

saligê malê te bidim. Ji xuyê malî dirafî distînin û saligên bi xef didîn. Lakin rû bi rû şehdeyê nadîn, lakin meşela navêd dizan dibêjîn û cihê malî salig didîn û ew mal li ku ye dibêjîn. Îcarê êdî înkâr mimkun nabî. Xuyê malî diçin û malêd xo bidertînin. Ekşerê dizî di nêva ekradan star nabî biderdikeve.

Û ekrad zaf bi cihê derewî şondê dixun lewrane cahil in me‘azellah şond çî ye nizanin. Û ekşerê şondêd wan bi qebra babî û birayî û kurî ye weyaxo bi serê babî û birayî û kurî ye. Lakin şonda wanî rast ku ew jê diçirsin û bi cihê derewî ewê şondê naxun. Şonda wanî ku naxun ew e ku tînin mista wî mirofî tijî xulî dikin û dibêjîn ku ewê xuliyê li ber bayê belav bike û bide bayê û bebêje ku bilanî urta min jî wiha ber ba bibe. Ekrad evê şondê bi cihê derewî naxun. Goya î‘tiqada wan ew e ku eger evê şondê bi derewî bixutin mala wî diçite mîratan.

Jinêd ekradan zaf ji mêran bi ‘eql û kemal û îdrak û mirofayî ne. Zêde dilowan in rehîmê bi ğerîb û biyaniyan dikin. Zêde ehlqena‘et û xuyîta‘et in. Zêde di malan da sahibîxtiyar in bê mêran didîn û distînin.

Wekû ekrad îbtida rast yekûdu tên silav didîn û paşê eħwalêd yekûdu pirs û pirsyar dikin.

Ekradêd semtê Bohtan û Hekariyan kêmbi ecelêd xo dimrîn, ekşerî têne kuştin lewrane ew tayîfe gelekî şerqeda ne û tîzmeşreb in. Zû digel yekûdu şerî dikin û hemû jî xuyîxencer in. Yekûdu didîne ber xenceran û dikujîn.

Ekşerêd wan ji bab bapîran kevnedijmin in li hevdu daîm digerin, wekû feşalê dibînin elbette yekûdu dikujîn. Di nêva wan da li xûnê birîn û diyet çunîne. Belkû xûnêd wan dimînin heya weqtê firşetê.

Berê mîr û aġayêd wan jî tev mada xûnê nedibûn. Ew de‘waya xûnê dimîne heya xuyî firşet bîne û heya xo bistîne. Lakin di xûnêd ekradêd mayî⁵⁶⁵ muşlih dikevîne mabeynê û bi xûnê girê didin. Eger xûndarî hebe⁵⁶⁶ mal û qudret, nîveka xûnê xûndarî dide û nîveka dinê cîran. Her kesek miqdarekî didîn û yarîkarî dikin. Ew xûnê tamam dikin û carnar dibe ku ji pêş xûnê jîn û keçan didîn. Meşela xoh weya keçeke xûndarî bêkar hebe⁵⁶⁷ eger xuyê xûnê rađî dibitin ew mirof xoha xo weya keça xo ji ber xûnê didete xûndarî⁵⁶⁸ û şilîh dikin û li hevdu tên.⁵⁶⁹ Wekû şilîh kirîn û diyet tamam bûyî êdî

⁵⁶⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî “may’î” hatiye nivîsîn.

⁵⁶⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “heye” hatiye nivîsîn. Jaba jî wekî “hebe” xwendiyê.

⁵⁶⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “heye” hatiye nivîsîn. Jaba jî wekî “hebe” xwendiyê.

⁵⁶⁸ خوى خونى, onucka; (...) Ev jêrenot di (N)yê de heye.

⁵⁶⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “têtin” hatiye nivîsîn.

xûndar diyafetekî mezîn dikitin û gazî hemû cîranan û xuyê xûnê dikin. Îcarê xûndar û xuyê xûnê li hevdu tînin.⁵⁷⁰ Rûyêd yekûdu radimûsin û şilh dikin êdî dijminayî⁵⁷¹ ji mabeynê radibitin.

Ekradêd semtê Hekariyan ekşerî şerî û de‘wayê bi şev dikin û zaf şebîxûnê didine dijminan. Ê li cihê şerî filhal çeperan çêdikin û dikevîne bin çeperê de‘wa dikin û daîm gule û barûdê zaf digel xo hildigirîn. Mirofek ji du hoqan kêmtirî gulle barîdê hilnagirîn. Ew qeder cebxane⁵⁷² û sîlahêd xo da heml dikin ku eger iqtîda bikitin şev û rojekê cebxana wî têrî şerî bikitin.

Ekrad di umûrêd şerî da û di hesp û sîlahêd xo da zêde îhtimamê dikin û miqeyyed dibin. Ekrad hesp û çekêd xo memnû‘e eşla bi emanet nadine birayê xo jî. Ekrad dibêjîn ku mirof jina xo bi emanet biditin ne ku hesp û alatêd xo yî herbê bi emanet biditin. Li cihê emîn jî dîsanê alatêd wanî herbê li ber serê wan dibî, lehzeyekê alatan ji xo bi dûr nakin. Lewranê ekrad dibêjin ku mirof hinde qederî zehmet û giraniya çek û ratiban dikiştin ji boy rojekê hewceyî dibe ku wê rojê çek û ratib hadir nebin. Lewranê çekan qet ji xo bi dûr nakin û ihtiyatê dikin ku belkû ji nişkê ve hewce bibitin. Heta weqtê ku nimêjê jî dikin dîsanê çek û ratibêd wan hadir li piştê ne.

Ê di ekşerêd malan da cohnî û mêkut heye bi xo dermanî diqutîn û çêdikin. Ê qalib heye berikan ro dikin û fişekan bi xo girê didîn.

Lakin di nêva ekradan da eşnaf û şen‘etger tunînin, eger hebin⁵⁷³ jî ji tayifa fillan dibin. Şîrger⁵⁷⁴, hasinger û şolger û xeyyaş û zêrger û neccar evne jî ji fillan heyin ji ekradan tunenin. Îlla ji ekradan barûtpêj û şurecî û beytar heyin. Lakin ew barûtpêj û şurecî û beytarêd ekradan qewî zêde di ‘emelêd xudanê haziq û mahir in. Belkû⁵⁷⁵ nêzûk e ku wekû barûta ingilîzî jî bibitin û beytarêd bêmisil heyin û qewî mu‘teber in.

Ekrad zaf mecbûr dimayin bi bal şertlîstinê. Şertêd wan meşela ji du terefan weyaxod zêde ji duyan sê û çar qederekî dirafî weyaxo tiştêkî datînin û bi siwarî diçine qoşê. Herçî kesê berê hat û gihaye menzîlê û hespê wî borî îbtida hespê wî bû, ew mirof şertê distîne. Weyaxo dîsanê şert datînin û çend mirof amac datînin û gulle davêjîn. Herçî kesê sê caran li pey yekûdu lê daye, ew şertî dibitin. Ê carnan ji boy şolekî bitîrs

⁵⁷⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “têtin” hatiye nivîsîn.

⁵⁷¹ Di (N)yê de ev peyv wekî “dijminayî” hatiye nivîsîn.

⁵⁷² Peyva “cebilxane” wekî “cebxane” hatiye nivîsîn.

⁵⁷³ Di (N)yê de ev peyv wekî “heyin” hatiye nivîsîn.

⁵⁷⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî “şîrker” hatiye nivîsîn.

⁵⁷⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî “bellû” hatiye nivîsîn.

û zehmet şertê datînin herçî kesê ji ‘ehda wî şolî bêtin ew şertê distîne. Meşela li cihekî me‘reke û şerekî ‘ezîme bûyî û ji du kenaran her yekî şed û duşed mirof hatine kuştin û herdu leşker kêşane û laşêd herdu terefan bi têkel yekûdu wîsanê⁵⁷⁶ li meydanê mayîne. Lakin mirofek ji wan winda ye nizanin ku hatiye kuştin weyaxo esîr bûye. Bi şev şert datînin herçî kesê bi tenê biçitin û bigihite cihê şerî wê meydanê û seha laşan bikitin û cewabê bînitin ku belê laşê wî mirofî li meydanê heye weyaxo tunîne. Ew mirof diçitin û seha meydanê dicitin û nîşanekê jî ji meydana şerî tînitin û çewa⁵⁷⁷ şubeh dibe laşê wî mirofî jî tînitin û ewî şertî distînin. Xulaşê ji boy şolêd wiha cahiliye, şert qewî zêde zaf dibin di nêva ekra dan da heyin.

Û bi xeyr ji van şetrenc û tîme û gustîr evne jî heyin. Bi şertekî me‘lûm dileyzîn weyaxo name‘lûm dilxwaz dileyzîn. Herçî kesê ew leyz birî ew herçî ku dilê wî bixweze distînin meşela hespêd qenc û tiştêd nadir distînin. Dibe ku di şertê dilxwaz keçan jî distînin. Xoha wî weya keça wî distînin. Nikûl di şertê dilxwazdanî nabitin herçî bixweze elbette dê bidinê.

Dibe ku bê leyz şert digirîn ew jî şertê me‘lûme dibitin meşela hesp û diyafet û fillan tişt û dilxwaz jî dibitin. Ev şerta jî wisan e ku di sîngê meşela kew û dik û teyran da cinaq heye, tînin ewê cinaqê du mirof dikêşin û dişkênîn. Êdî ew herdu mirof herçî yek meşela qelûnê weyaxo fîncana qawê weyaxo fêkî û tişteki bidite destê mirofê dinê gerek ew şert da‘îm di bîra wan da bî. Ew mirofê ku meşela ewî tiştê dayî⁵⁷⁸ distîne dê bibêjtin ku min li bîr e. Eger ewî mirofî şert ji bîrkirî min li bîr e negot ew mirofê ku ewî tiştî didite destê wî îcarê ew mirof dibêje ku yadest. Wekû ewî yadest got ewî şert ji oldaşê xo biriye. Herçî şert e ew datînin eger ku di fikra oldaşî da wekû ewî tişteki dayî ê istandî min li bîr e dibêje tişteki tune. Ew şert baqî ye heta ew herdu yek yekî bixapîne û ji bîra ya dinê biçitin û ji wî bibitin. Wisanî mirofêd be bîr heyin ku ew şert nêzûkî salekê di nêva wan da dimîne. Paşê kanîm kî dibitin. Ev şert zaf heyin. Jîn û keç digel yekûdu û digel mêran bi şert dileyzîn û ji yekûdu dibin ew jî dibe ku dilxwaz şert digirîn û ji yekûdu şertê distînin.

Di nêv ekra dan da mektûb û kağızêd wan farisî el ‘îbare dibin, xundina tirkî û zimanê tirkî kêd dizanin, kitêbêd zimanê tirkî li nik wan mu‘teber nînin.

⁵⁷⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “dîsanê” hatiye nivîsîn.

⁵⁷⁷ Di (M)y pey vê peyvê re li ser gotinekê hatiye xêzkirin û me tu mene nedayê ka çawa bê xwendin. Di (N)yê de jî ev peyv wekî “چو” hatiye nivîsîn.

⁵⁷⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “day’î” hatiye nivîsîn.

Û fayîza dirafî li nik wan heram e, ew dirafî bi fayîz nadîn. Belkû exz û ‘eşa wan ekşerî selem e, ew jî babekî şer‘îye ye. Meşela zexîre û kavir û caw hadîren bi çend qurîşan tete firotin. Çend qurîşan ji bihayî kêm didetin û ewan li ser yekî selem dikitin. Paşî şeş mehan paşê ewan tiştêd ku selem kirîne distînin û bi kar difroşin.

Û tehwîl û temesik di nêva ekradan da kêm heyin belkû şahidan digrîn li nik wan î‘tibara xet û xatemê tunîne belkû şahid lazim in.

Ekrad ekşerê eşyayêd mewzûne be ‘erebîbazar distînin û difroşin. ‘Erebîbazar ew e ku meşela rûn û penêr û hirî herçî bibitin be texmîn difroşin wezn nakin. Îqbal zêde dibe û kêm dibe êdî poşmanî jî tunenin.

Û mêrêd ekradan dirafî li nik xo hîlnagirîn. Herçî dirafêd wan hebe li nik jinan in datînine ‘eqîbêd xo û di nêva barêd xo vedişêrîn. Zafêd ekradan xuyîdewlet be baran diraf di malê da heyin bi wî dirafî hogecan dikirîn û berhev dikin. Hezar êdî zêde. Îcarê celêd (celebêd)⁵⁷⁹ Şam û ‘Erebistanê salê carekê ji boy kirîna hogecan tene nêva ekradan. Bi baran zêr û dirafî û alace û cilêd û dirûyî tînin û ewan keriyêd hogecan bazar dikin û distînin. Û serê kerî jî ‘adet e⁵⁸⁰ bi geyr dirafî xelatekê distînin. Û resm hediyekekê jî ew celeb didine ağayê wê tayîfa ku hogecêd wan kirîne.

Lakin ağayêd mezîn ‘eşîran berê ewan jî serê kerîyan bacê bi zorê distandin û mirof verêdikirin berayîya karwan û qafilan. Her kesek ji boy xuy cebrê resm bacê distandîn.

Û ağayêd ‘eşîran berê ji êlan û tayîfeyêd xo mirof tînan û hebs û talan dikirîn û bixwasta mirofek û du û sê di malêd xo da qetil dikirîn. Hâkîman pîrsa qetla wan mirofan nedikirîn, lewrane ji tayîfa wî ne ew ağayêd ‘eşîran berê di ehkamêd êlat û cîranêd xo musteqîl bûn. Kesekî pîrsyar nedikirin ku te ji boy çi eve şola kirîye.

Ekrad zarokêd xo horî silahşoriyê⁵⁸¹ dikin. Meşela rimbazî û siwarî û tîfingendazî evne te‘lîm dikin. Zîkr û fikrêd wan da‘îm ehwalêd şerî û de‘wayî ye. Ceng û cidâlêd ku qedîm bûyine ji boy ciwanan neql dikin ku di filan şerî wiha bûye û filan talanê da nî wiha bûye. Tarîxêd şer û de‘wa qewî zêde hîfz dikin.

Û ekrad jî ‘emrêd xo bi waran û bi zozanan hesêb dikin. Tewarîxêd wan jî ew in, meşela hesêb dikin ku em du salan li filan warî û hinde qederî li filan gundî bûyine

⁵⁷⁹ Di (M)yê de tuneye.

⁵⁸⁰ Di (N)yê de tuneye.

⁵⁸¹ Di (N)yê de ev peyv wekî “silahşorî” hatiye nivîsîn.

qışlaq, bi wê hesêb dîkin û ‘emrêd xo û hewadiş wuqu‘atêd (qewa‘edatêd)⁵⁸² dinyayê çend sal e⁵⁸³ bûye dizanin.

Û ekşerê hesabêd ekradan bi hesaba şemsiye ye, qewî hesaba qemeriye na‘emilînin, meger ku ji boy remeđan û ‘eyd û mewlûdan. Wekû dinê hesabêd wan romiye ye.

Û beranberdan û serê (şedî)⁵⁸⁴ pezêd wan jî dîsanê bi vî hesabî ye. Wekû payîz nêvî dibitin ‘adet e⁵⁸⁵ li nik wan kadan çêdîkin û dibin diçine nik keriyêd mihan û beranan jî dixemilînin û dibine wê derê. Îcarê ewan kadan belav dîkin û dixun dikine şayî. Îcarê paşê beranan tevî keriyêd xo dîkin. Weqtê ku şed rojê beranan tamam dibitin dîsanê kade û xurîne çêdîkin û şayî dîkin ji boy silametiya pezêd xo.

Ekrad eger çî hinde xuyî pez û rizk⁵⁸⁶ in lakin ji boy xo mexşûşen pezan serjê nakin. Meger mêwanekî maqûl bêtin weyaxo pezekî nexweş hebitin ewî serjê dîkin. Lakin bi xo dimrîn pezekî ji boy xo serjê nakin.

Wekû ekrad meşela iqtîda bikitin şolekî ji boy yekî binwîsîn⁵⁸⁷ ewî xuşûşî şerîhan eşla di kağızêd xo da zîkr nakin, diñirsin ku belkû bi dest biyaniyan bikeve ew şola paşê me‘lûm bibe weyaxo ew kağız di dest wî mirofî da bibite sened. Îcarê di kağızê da selam û du‘an dinwîsîn û zîkr dîkin ku hâmilwêreqe baxeyr e yanê qewatîne lîsanî heye hûn bi wî î‘tibar bikin. Hinde dinwîsîn û ew cewabêd ku bi ñirs in û bi xef in ewan xeberan bi zîman dibêjîn qaşidan, ew jî diçin li wê derê ji boy wî mirofî teqrîr dîkin. Mimkun nîne ekrad şolêd bi muxatere eşla di kağızêd xo da nî zîkr û beyan nakin, ihtiyatî dîkin. Û kağızêd bêmoħr di nêva ekradan da bê î‘tibar e. Elbette dê moħr hebî.⁵⁸⁸

Wekû ekrad bi rê ve biçin eger li rê meşela ji heywanêd weħşî rastî wan bêtin herçî heywanêd ku dirinde ne meşela şêr û⁵⁸⁹ piling û gur û herçî evne oğur hesêb dîkin,

⁵⁸² Di (M)yê de ev peyva “قواعدائيد” tuneye. Di peyva “waqi‘et”ê de herfên “w” û “q” yê li dewsa hevdu hatine nivîsîn.

⁵⁸³ Di (N)yê de tuneye.

⁵⁸⁴ Di (M)yê de tuneye.

⁵⁸⁵ Di (N)yê de tuneye.

⁵⁸⁶ Peyva “rizq” wekî “rizk” hatiye nivîsîn.

⁵⁸⁷ Di peyva “nivîs”ê de li dewsa herfa “v”yê “w” hatiye nivîsîn.

⁵⁸⁸ Li vir di navbera gotinên Bazîdî de nakokî heye û dibêje qîmetê didin moħrê, lê çend paragraf beriya vê jî digot ekrad qîmetê nadine xatem/moħrê: “Û teħwîl û temesik di nêva ekradan da kêmoħ heyin belkû şahidan digrîn li nik wan î‘tibara xet û xatemê tunîne belkû şahid lazim in.”

⁵⁸⁹ Di (M)yê de tuneye.

lakîn eger wekû heywanêd bêderer wekû rovî û kew⁵⁹⁰ û kêrgû û êd mayî evne şûm hesêb dikin. Ê amanêd vala îname nêva malê û bi şev sitîl û amanêd bişênî jî malê bi deranîn, evne şûm hesêb dikin.

Wekû ekrad çûne warekî û li wê derê şayed qiran kete nêva pez û dewarêd wan weyaxo dererek li wî warî gihaye wan êdî dimrîn naçine wî warî. Eger li qışlayekê meşela zivistan şedîd bibe û rizk (rizq)⁵⁹¹ û heywanêd wan telef bibin dîsanê ewî gundî şûm dizanin, êdî nakevine wî gundî.

Ê de‘wa û nikaşêd wan wekû waqî‘ dibitin ew melayêd ku li mala aşayêd wan sakin dibin ew mela marê dibirîn û feşla de‘wayêd wan dikin. Ekrad jî boy vane naçine bajêr û qeşebe û gundan.

Ekşerêd ekradan bi navêd dayan têne gazîkirîn. Meşela ‘Eloyê Faşmê, Simoyê ‘Eyşê, Reşoyê Helê. Ê ekrad jî wekû e‘rab û efrenca bi du û sê baban têne gazîkirîn, meşela Mişoyê ‘Eliyê Hemdan, Osoyê Xidirê Temiran evne bi du û sê baban têne gotin.

Wekû dinê ku li nik ekradan wisanî meşhûr û bawer e ku wekû zarok têne dinyayê û jî dayê diwelide me‘lûm ku paşê navika wî dibirîn, goya bi çî ku navika zarokî bibirîn goya ew zark⁵⁹² wekû mezîn dibitin di wê şolê da qewî mahir dibin. Meşela wekû navika kuran bi şîrî bebirîn ew kur şûrhingêv û camêr dibî. Eger navika kuran bi qelemê bebirîn ew kur paşê ehlqelem û mela û katib dibî. Ê navika keşan jî eger bi zêr û ‘emaretê zêrîn bebirîn goya ew keşê dibite xanim û xatûn û xuyîcil û ni‘met dibe. Eger nava keşan bi keşil û wesmeyê bibirîn goya zêde spehî û rind dibin. Ev ‘adete li nik ekradan mer‘î ye û di nêva ‘eraban da jî heye.

Eger şayed jinêd ekradan bi zehmet bizên û derengî bibitin mirofêk nebitin, ber derê wî xanî weyaxo wî konî bi deng bang diditin bi emrê Xudê ew jîn dizêtin û zû xilas dibitin. Carnan dibitin ku me‘azellah zarok di⁵⁹³ rehma dayê da helakbûyî nawelidîn wisanî jinêd haşiq jî dayinan heyin ku dermanan bixur dikin, ew zarokê fewtbûyî bi xo dikevîtin û da zarokê xilas dibitin.

Ê hindek qışlaqêd ekradan heyin zivistan eşla av bi dest nakevîtin berfê tînin û di⁵⁹⁴ mencelan da dihelînin û dixun û di‘emilînin û heywanêd wan berfê dixun.

⁵⁹⁰ Di (N)yê de wekî “کۆ” hatiye nivîsîn, lê tu mene jê dernayê.

⁵⁹¹ Di (M)yê de tune.

⁵⁹² Di vê peyvê de herfa “w” ya wekî “o”yê tê xwendin nehatiye nivîsîn.

⁵⁹³ Di (N)yê de ev peyv wekî “der” hatiye nivîsîn.

⁵⁹⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî “der” hatiye nivîsîn.

Û ekrad wekû dijminayî⁵⁹⁵ digel yekî heyin û bi aşkarî qeweta heyfê nebitin îcarê bi xef ji wî mirofî li heyfê digertin yan ji kulekê bi şev gule davêjîn û lêdidîn weyaxo agirî û barûtê davêne malê weyaxo feşalê bibînin je'rê didinê. Xulaşê bi xef da'îm li wî dijminî dixebitin, elbette dê zêferê pê bînin û zaf dibitin ku dicesisînin û dijminêd xo heta li ser nimêjê jî lê didîn û dikujîn.

Û ağa û rispiyêd wan her yekî ji boy mexşûş malêd xo du nefer pawan û beqçî heyin bi şev heta şubeyê yek li yalekî malê û konî disekine û ya dinê li yalekî konî disekinin û digerîn heta ku şubeh dibitin. Û bi geyr ji van zomeyî jî du nefer pawan heyin. Her yek li kenarekî zomeyê ji dûr ve disekinin û daîm guhdar in. Û ewan guhdaran jî seyêd dijwar li nik heyin ji dûr ve reşayî û pêjnê seh dikin û direyin û diçin. Îcarê pawan jî li pey wan diçin û seha wî reşî dikin. Eger dijmin e filhal dibite şemate xelqê zomeyê jî pê da berhev dibin yanê du deqîqe nakêşe ku hemû ehlê zomeyê bi çek li wê derê haqîr dibin.

Ekrad bi î'tiqad cahiliye qewî bawerî bi şêxêd xo dikin. Her millet û tayifeyekî ji wan mexşûş şêx heyin. Goya aba û ecdadêd wan mirofne şaliş û şêx bûne lakin niha ew ewladêd wan cahil û bêedeb û nezan dibin. Lakin î'tibara wan li nik ekradan qewî zêde zaf heye. Malêd şêxan li çolê jî bemîne nadizîn û nêzûk nabin û ji xeberêd şêxan bidernakevin. Wekû naxoş û dîn û harêd wan ekradan dibin ewan tînine malêd şêxan ocağê û pez û dewaran qurban ji boy ocağê tînin. Û ewî 'elîlî du sê rojan mala şêxî goya li ocağê dihêlîn. Û ew şêx we bi daran ewî 'elîlî diquşin û benan ji boy wî 'elîlî girê didîn goya şifa dibînin. Eger muqedder bûye ew mirofê 'elîl fewt bû xilaş dibe û diçite şola xo. Û îlla eger ecel nehatiye û ji wê 'illetî xilaş dibitin. Êdî ew mirof goya çirağê wî şêxî ye û li ber benê wê ocağê sal bi sal elbette dewarekî dê ji boy wê ocağê hediye bibitin. Û kur û ewladêd wî mirofî jî dîsanê li ber benê wî şêxî ye. Êdî ew mirof naçine nik şêxek dinê. Wiha bi vî terzî ekradan her tayifeyekê şêxêd wan û zêde pê î'tibarê dikin.

Û 'adetekî dinê jî li nik ekradan heye meşela wekû mirofekî ciwan 'ezîzê wan wekû nexweş dibitin û nexweşiya wî zêde şiddet dikitin yanê di dereca mirinê dibitin û ji xo bêxeber dibitin ku her kes goya hêviya jînê ji wî mirofî dibirîn, meşela eger jîn weyaxo xoh û keçekî wî mirofî ciwan hebe⁵⁹⁶ weyaxo da hebe⁵⁹⁷ ev jinine ku xo⁵⁹⁸ û

⁵⁹⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî "dijminay'î" hatiye nivîsîn.

⁵⁹⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî "heye" hatiye nivîsîn.

⁵⁹⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî "heye" hatiye nivîsîn.

⁵⁹⁸ Di vê peyvê de herfa "h"yê nehatiye nivîsîn.

keç û da û jîn bitin yek ji wan ku zêde meyla wî nexweşî heye, îcarê ew jinik radibitin di nêva wê meclisê da sê caran li dora wî nexweşî diziviritin û dibêjîtîn ku min canê xo fedayî vî filankesî kir, hûn şahid bin ku bilanî Xudê te‘ala heyatê bidite vî nexweşî, herçî qeda û belaya wî heye bilanî bête min. Eger ‘emrê min hebe⁵⁹⁹ min bi riça xo bexşî vî mirofî. Eger merga wî hebe⁶⁰⁰ bilanî ew merg bête min. Ew jinik sê caran li dora wî nexweşî dizivire wiha dibêjîtîn. Carnan teşadif diktin ku bi emrê Xudê te‘ala ew mirofê nexweş ecel nehatiye paşê şifayê dibînitin û ew jinik ku wiha ev ‘ehde kiriye bi emrê Xudê nexweş dikevîtin û fewt dibitin. Lakin ev ‘adete mexşûş e bi jinan ku der heqê mêr û bira û kurêd xo da nî dikin, lakin jîn ji boy jinan û mêr ji boy mêran nakin.

Û carnan dibitin ku ‘ezîzê yekî zaf bêkêf dibitin û têtê dereca helakê. Ew jî derheq şifa wî nexweşî da ewêd ku xuyîmal û qudret in meşela nîva malê xo weyaxo şulus û rubu‘a malêd ji boy jaran nezr û ‘ehd dikin. Wekû ew nexweş şifa dibînitin ewê ‘ehda ku kirîne bi cî⁶⁰¹ tînin. Û ew mirofêd jar û feqîr in qeweta maliye tunînin, ew jî di riya Xudê da rojî û nimêj û xitma Qur’anê nezr û ‘ehd dikin paşê ‘ehdêd xo bi cî⁶⁰² tînin.

Û dibitin ku keçan jî di riya Xudê da ji boy şifa nexweşan nezr dikin. Meşela nezr diktin ku bilanî Xudê şifayê⁶⁰³ bidite kurê min ez dê keça xo di riya Xudê da herçî kesê dixwezîtin bê qalen bidim. Wekû ew bêkêf şifayê dibînitin ewî ‘ehdî bi cî⁶⁰⁴ tînin.

Û goya li nik wan şûm e ewî nanê îbtida dipêjîn û ji tenûrê biderdikevîtin ew naxun. Goya herçî wî nanî bixutin jina wî dimiritin. Wekû ekrad qawê dipêjîn îbtida miqdarê fîncanekê qawe direşînin kuçikê goya eve para şêxê qaweyê ye.

Jîn û keçêd ekraan ekşerî wekû jinêd ‘ereban rûyêd xo û dest û ‘enî û lêvêd xo deq didîn.

Û jinêd wan bi xo serbitenê diçîne aşî û karwanan. Û di malê da eger xanî bibe û eger kon bibe deh û panzde mêr û jîn bab û bira û xo û da û jîn û bûk û zava hemû li nik yekûdu bi cihekî radizên şerm û heya nakin. Lakin eve derûrî ye, lewranê cî⁶⁰⁵ tunîne hemû di xanî û konekî da nin, çare nabitin.

⁵⁹⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “heye” hatiye nivîsîn.

⁶⁰⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “heye” hatiye nivîsîn.

⁶⁰¹ Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

⁶⁰² Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

⁶⁰³ Di (N)yê de ev peyv wekî “şifay’ê” hatiye nivîsîn.

⁶⁰⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

⁶⁰⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî “cih” hatiye nivîsîn.

Jîn û bûkêd wan eşla rûyêd xo ji kesî setir nakin û narevin û digel hemû kesan jî xeber didîn. Lakin dîsanê ehledeb û ‘îşmet in.

Wekû dinê jinêd ekradan jî malêd wanê bi xo dibin meşela pez û dewar û diraf ku ji malêd baban înanê weyaxo mêrî dayine. Ji wî malêd jinan re şikêrt dibêjîn. Mêrêd wan tevî⁶⁰⁶ wan malêd jinan nabin û naxun belkû ew jîn pê kirîn û firotinê dikin û zêde dibitin.

Ekşerê jinêd wan mîrasê ji malêd baban nastînin belkû herçî ku heye dibexşînin bira û pismamêd xo.

Ekrad qewî zêde îctinab û hezerê⁶⁰⁷ ji malêd weqfan dikin. Bi wê dereceyê ku eger hakim û eger aqayekî zalim di nêva wan da nî peyda bibitin ew bi xef diçin û mistekê ji xuliya weqfê tînin û bi ser xanmanê wî zalimî direşînin. Di hindik weqtê da ew zalim berteref û qehr dibitin.

Çayifeyêd ekradan kumreş û bedguman nînin û zenna xirabiyê zû bi zûyî bi bal jinêd xo ve nabin. Eger jinêd wan digel biyaniyan meşela xeber didîn û bikenin û bileyzîn weyaxo iqtîda bikitin ku jinêd wan li malêd biyaniyan û ‘eynî di nêva mêran da jî razên û rabin dîsanê mêrêd wan kumreşiyê nakin û bedgumaniyê derheq wan da nî nakin. Eger çî jinêd ekradan perdenişîn nînin lakin xirab jî tê da kê m heyin. Ew jî ji tîrsan lewrane wekû me‘azellah jinekê xirabî kir elbette warişêd wê ew jinê dikujîn eşla îmkana xweşiyê nîne îlla xirabî wê kuştine. Eger ew jina xirab û ew mêrê ku digel wê bûye bi cihekî bi hev ra dîtî mêrî û jinê herdukan jî dikujîn û xûna wan tunînin. Ê kesek li qahban nabite xuyî. Li nik wan xuyîbiderketina li qahban qewî zêde ‘eyb e, lakin li qebahtêd mayî dibine xuyî. Xûndarî û dizî di van da rica û hêvî û xuyîbiderketin dibitin lakin ji boy şola xirab rica û şefa‘et nabitin. Îlla xuyêd jinê herdukan jî filhal qetl dikin. Ê paşê diyet û xûnxwastin jî tunîne. Îlla eger di weqtê xirabiyê da warişan mêr û jîn li cihekî nedîtî lakin kifş bû ku filan mêr digel filan jinê şola xirab kirine warişêd jinikê filhal ewê jinê didine ber xenceran û dikujîn û dibin defn dikin. Ji cîran û xizman eşla qeç kesek jî êdî ji wî mirofê ku kuştiye napirsitin ku te ji boy çî eve şola kir û serxweşî û te‘ziye jî ji vî şolî da nabitin. Îcarê ew warişê jinê daîm di qeşda wî mirofî da ne ku digel jinikê ew şola xirab kiriye, eger xiste feşalê ewî mirofî jî dikujîtin. Dîsanê xûn û diyet tunîne. Di hemû şolan da şilh û lihevduhatin heye⁶⁰⁸ û

⁶⁰⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “nevî” hatiye nivîsîn.

⁶⁰⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “xezerê” hatiye nivîsîn.

⁶⁰⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “hebe” hatiye nivîsîn.

dibe lakin di vî şolî da mişalehe û pevketin nabitin eve bazar'ird e, li nik wan qewî zêde 'ar e, çara wê bi geyr ji kuştinê nînin.

Wekû dinê kafêd qebahetan di ekradan da peyda dibitin îlla du şolêd qebahet ku li nik wan eşla peyda nabin û belkû nebûye 'adet jî. Yek me'azellah liwaçe yanê eşla waqî' nabitin û î'tiqada wan jî bi rastî ew e ku eger mirofek me'azellah liwaçeyê bikitin kevir li ser wan dibaritin û cinabetî⁶⁰⁹ jî êdî ji ser wan ranabitin. Û qebaheza dinê jî meyvexurîn e.⁶¹⁰ Meyvexurîn jî di berî niha eşla û qeç'a di Kurdistanê da meyvexurîn tunebû. Lakin van eyyaman be'ðan ciwanêd wan ku digel romiyan îxtilatê dikin û mey jî di nêva kubrayêd romiyan qewî zêde mu'tad bûye. Êdî ew ciwan jî ji boy teqerriba romiyan be'ðan mey vedixun. Lakin dîsanê kê m heyin ji hezarî mirofek belkû peyda bibitin. Berê heza fileyêd Kurdistanê jî mey venexurîn⁶¹¹ îlla nadir.

Ekrad wekû iqtîda bikitin du mirof bibeziñ yekûdu û gewgâyê bikin ew qewî bi ziman çêrî⁶¹² yekûdu nakin belkû bere weya pêsrêd yekûdu digrîn bi mist weyaxo bi xencer li yekûdu didîn. Çêkirin li nik wan fehêt e.⁶¹³

Û mêrêd ekradan 'eyb e hinne li destêd xo û rihêd xo da danaynin. Lakin kil li nik wan 'adet e, mêr û jîn di'emilînin û dikêşine⁶¹⁴ çavêd xo.

Lakin ew mirofêd ku hiznî ne ew libasêd şor û qirmiz û cilêd faxire ber nakin û destêd xo hinne nakin û çavêd xo kil nadin û naçine dawetan û kêfxweşiyên. Û li nik wan jinên bî jî şerm e, xo naxemilînin û libasêd şor û qirmiz wernagirîn û naçine dawet û kêfxweşiyên.

Di ekradan wekû yek bêkêf bebitin cîran û dost û xizm tiştêkî xurînê ji boy wî dibin û diçin kêfa wî pirsyar dikin û dilêmnayê didinê ku Xudê kerîm e, metîrs îñşa'ellah⁶¹⁵ kêfxweş dibî û me ji boy te niwişt daye kirîn dê qenc bebî. Lewranê milelêd mayî çewanî ku mihtacê hekîman in û baweriya tebîban dikin ev qism ekrad jî wisanî mihtacî niwiştan in û pê bawerî dikin. Lakin ekrad guh nadine hekîman, ew dibêjîn eger bi rastî hekîm e bilanî berê nî çareyê li xo bikitin ku ew nexweş nebitin.

⁶⁰⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî "ciyabetî" hatiye nivîsîn.

⁶¹⁰ Di (N)yê de tuneye.

⁶¹¹ Divê ev peyv wiha bihata nivîsîn: "venedixurîn".

⁶¹² Di (N)yê de ev peyv wekî "çêr" hatiye nivîsîn.

⁶¹³ Di (N)yê de ev peyv wekî "fehêt e" hatiye nivîsîn.

⁶¹⁴ Di (M)yê de ev peyv wekî "dikêşinîne" hatiye nivîsîn.

⁶¹⁵ Di (M)yê de ev peyv wekî "îñşa" hatiye nivîsîn.

Meređî Xudê te‘ala diditin şafî û hekim mutleq her cenab Xudê te‘ala ye. Lakin dîsanê hindek pîrejîn li nav wan dibin ku dermanin cuzwî li wan nexweşan dikin.

Wekû mirofek fewt bûyî feryad û girîn peyda dibî, îcarê ehlê mala meytî berhev cihekî dikin û jinêd dengbêj heyin lawijok û siwaro dibêjîn û dikine qurî. Îcarê herçî ku ciwan in ew diçine kolana qebrê û mela jî avê germ dicitin û tînin dişon û kefen dikin. Eger jin e elbette bê tabût nabitin. Tabûtê çêdikin û datînine tabûtê û be cima‘et nimêja cinazeyî dikin û dibin defn dikin. Eger mêr bibe xuyîdewlet e dîsanê bi tabût çal dikin. Eger feqîr e qudreta tabûtê nîne wisanî bi kefen çal dikin û mela li ser dixunin. Paşê tên li mala meytî rûtînin û serxweşiyê didine warîşêd meytî ku bilanî serê we xweş bibe û êd malî xweş bibin. Emrê Xudê ye mirîn ji boy me hemûyan e bê mirîn benîadem nabitin. Hinde nebî û padşah hatine dinyayê hemû jî fewt bûyine. Tu geman meke, bi girîn û hiznê êdî ew mirî ‘ewdet nakitin. Bi vî terzî tesellayê didine warîşêd wî miriyî. Wekû bûye weqtê ‘eşrê ew xizm û cîran digel warîşêd meytî û melayî diçine ser qebra wî meytî û dixunin û peran şedeqe belav dikine jaran û vedigerîn. Paşê wan îcarê jinêd xizm û cîranan digel ehlê meytî ew diçine ser qebra meytî û digirîn û feryad fiğanê dikin û xuliyê bi⁶¹⁶ serêd xo ve dikin û dixunin û şedeqe didîn. Ew jî vedigerîn û têne malêd xo êvarê ji malêd cîran û xizman ji boy mêrêd wan cida û ji boy jinêd wan cida zad û te‘amî dibin û lawahiya⁶¹⁷ wan dikin bi wan didine xurîn. Sê rojan û hindek jî heyin heft rojan bi vî terzî şubeh û êvaran diçine ser qebran û digirîn û xêran dikin.

Qebrkolan û şuştîn û hilgirtina meytî di Kurdistanê da eger gênî û eger feqîr tu ucret tunînin. Her kesek bi şewaba xo dicitin.

Ekşerêd cihalêd wan ekradan, me‘azellah nanî îman dizanin û bi nanî şondê dixun û goya dibêjîn wekû mirof nanî nexutin êdî dîn û îman nabitin goya dîn û îman bi nanî qayim dibitin.

Zivistanan ekrad şubeh û êvaran diçine oçeyêd ağaleran û du sê se‘etan rûtînin û hikayet û qişşeyan didine gotin weyaxo behsa şerêd borî û eħwalêd mađiye neql dikin. Wekû nivroj bûyî têne malêd xo û nanî dixun û alifêd dewarêd xo didenê. Îcarê eger hewa xweş e berhev dibin li ber rojê li cihekî rûtînin û dîsanê qelûnê dikêşîn û xeber didîn. Bi şev carnan dibitin ku eger gûz peyda bebitin, distînin û dileyzîn. Ew jî qumar e hindek didine derê.

⁶¹⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “be” hatiye nivîsîn.

⁶¹⁷ Peyva “lava” bi herfa “w”yê hatiye nivîsîn.

Û ciwanêd wan law û keç û bûk zivistanan her şevê li malekê yeğnağê li wê malê berhev dibin. Eger saz heyin sazan diqutîn. Eger saz tunînin lawêd dengbêj û bûk û keç tevî hevdu bêrete dibêjîn û distirên û govend digrîn direqîşin, heta nêzûkî şubeyê. Îcarê her kesek belav dibin û diçine malêd xo. Ekşerî du şevan û sê şevan carekê elbette yeğnağ di nêva gundêd ekradan dibitin.

Û eger li gundî file jî heyin, xars û axçêd wan jî tevî ekradan dibin û têkdanî govend digrîn û dileyzîn û gelek caran dibitin ku axçîkêd fillanî rind dibitin û kurêd ekradêd qîşlaqçiyên dihebînîn û ewê axçîkê bi riça wê direvîne û dibitin misilman dikitin û li xo mar dikitin. Lewranê ekradêd ku dikevîne ser fillan qîşlağê mal li ser malê dibin. Ewled û ‘iyalêd ekradî û filleyî hemû têkdanî di nêva xaniyekî da ne û zadî û nanî bi cihekî dixun. Ekşerî ew ekrad nanî û zadî ji kîsê re‘îyan dixun lewranê file nanî û zadî dipêjîtin. Mimkune (nîne)⁶¹⁸ ku nedine zarokê ekradan elbette nedit jî ekradê qîşlağçî bi zorê ji wan nanî û zadî distînin û dixun. Û çirağ û debar, xulaşe kullî qîşûr heta biharê heşêbke ku ew ekrad mêwanê wî re‘îyeyî ye.

Eve xaşê bi fillan nîne belkû wekû ekradêd xeymenîşîn dibine qîşlağê misilmanêd gundê xwecihê yerlû. Dîsanê ekrad evê mu‘ameleyê digel wî misilmanê yerlû jî dikitin evî zehmetî û xisaretê didine gundiyan û re‘îyan. Şayed eger zivistanê dewarekî wan bi emrê Xudê telef bibitin biharê wekû ekrad biderketin û çûne zozanan îcarê ew mirofê xweyê dewarî têtin ji bedela wê dewara telefbûyî dewarekê ji malêd wî gundî cebrî dikêşîtin û dibitin ku belê zivistanê dewarekî min li vî gundî telef bûye eve deware ji ber wê ve ye. Berê bi geyr vê jî ekradan zaf zîlm û te‘dê li xweyîcihan û re‘îyan dikirîn û bîst û sih siwar dihatin û dibûne⁶¹⁹ mêwanêd gundiyan pez û berx û mirîşk serjê dikirîn û ce⁶²⁰ zaf didane hespan û ezîyet dikirîn. Weqtê çûnê jî çend qurîş diraf û çend cot gore ‘etayî distandîn. Îcarê ji wî gundî diçûne gundekî dinê bi vî terzî li gundan dor dikirîn. Weqtê serbêderan dibû îcarê dîsanê ekrad dihatine gundan û serê gundî çend çîwal tanîn û davêtine ser gundiyan ku evne tijî genim û ce⁶²¹ bikin. Çarnaçar ew çîwal tijî genim û ce⁶²² dikirîn û dibirîne⁶²³ malêd xo. Eger nedanayê îcarê dewarêd wan dajotin dibirîn bilêderûr. Bi van terzan da’îm li cebr û zîlmê bûn heta van salan. Lakin di

⁶¹⁸ Di (M)yê de tune ye.

⁶¹⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “bûne” hatiye nivîsîn.

⁶²⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “ceh” hatiye nivîsîn.

⁶²¹ Di (N)yê de ev peyv wekî “ceh” hatiye nivîsîn.

⁶²² Di (N)yê de ev peyv wekî “ceh” hatiye nivîsîn.

⁶²³ Di (N)yê de ev peyv wekî “birîne” hatiye nivîsîn.

eyyamê xilafeta Siltan ‘Ebdulmecîd Xan dame ‘edluhû wekû îcada ‘Esakirî Nizamiye bûyî êdî roj bi rojê ekrad berteref bûyin û zîlm û te‘daya wan zayil bûyî.

Ekşerêd ağayêd wanê zorbe telef bûyin û zafêd ekradan îskan kirîn. Xulaşê ji qewet ketin. Êdî ew şewket û sewleta berê nemayîn, niha êdî ewî terz û eṭwarî qadir nînin ku îcra bikin. Lakin dîsanê carnan bi şûretine dinê dîsanê ji zîlma re‘îyan xalî nabin. Bi dizî ji boy gered lodêd wan dişewitînin weyaxo agirî bi xef davêjîne malêd wan weyaxo bi şev zevî û mêrg û ziyaneḍ wan diçêrînin û agirî davêne bêderêd wan. Xulaşê bi her wecihî re‘îye ji boy van nefretan ji ekradan diṭirsin û xewfê dikin. Çarnaçar mura‘eta xatîrêd wan dikin. Ê eger şayed ekrad bêne diziya malêd xweciha û xuyî malê jî pê hişyar bibitin dîsanê ji ṭirsan derba mirinê li wan dizan nadîn û nakujîn, belkû mudara û mudafe‘eyê dikin lewranê ji dûmahîkê diṭirsin. Eger xwecihi lê bidin û mirofeki ekradan bikujîn êdî ḥeta qiyametê ji⁶²⁴ şer û şiltagêd ekradan xilaş nabin da’îm bi xef û aşkare de‘wa wê xûnê dikin û elbette yekû deh (dû)⁶²⁵ ewê tolê distînin.

Ekrad û yerlû kêm xizminayiyê⁶²⁶ digel yekûdu dikin û keçan kêm didîn û distînin. Lewranê ekrad dibêjîne xwecihan goran⁶²⁷ û ewan laşey’ û bêcesaret ‘ed dikin û dibêjîn ku herçî zarokêd ku ji jinêd goranan biwelidîn ew zarok bêwec⁶²⁸ û ‘eware û ṭirsonêk dibin. Seb vê xeberê ekrad keçêd xwecihan naxwezîn. Ê xwecihi jî dibêjîn ku herçî zarokên ku ji jinêd ekradan biwelidîn bêdeḍ û diz û serkeş dibin. Ev herdu qisim rewend û yerlû yek bi yekê xweş nabin û ekşerî ji yekûdu naraḍî ne û gelek bi yekûdu î‘tibarê nakin. Eger meşela biqewimetin li şerekî da ekrad û yerlû heyin ekrad nabine oldaşêd yerlûyan dibêjîn ew zû direvin. Lakin filwaqi’ du sê neferêd ekradan iqtîda bikitin digel deh neferêd yerlûyan miqawemetê dikin û ji wan narevîn. Lakin yerlû we nînin. Yerlû li ber wan zebûn in. Lakin eve xebera derḥeq rewend û yerlûyêd Wan û Mûş û Bazîd û Qers û Îranê ne. Lakin rewend û xwecih û yerlûyêd Hekarî û Bohtan û ‘Emadî û Şohran we nînin. Îcarê emr bi ‘eks e, li wan eṭrafan rewend li ber yerlûyan zebûn in. Ê du sê neferêd xwecihan iqtîda bikitin digel deh neferêd rewendan şerî dikin û ji wana naṭirsin. Ê li nik yerlûyêd Hekariyan rewend laşey’ meḥsûb dibin. Lewranê ehalî û yerlû ḥemû xuyî şeşxane ne, kêm caran dibitin ku yerlû keçêd ekradan dixwazin û mar dikin. Lakin ekrad eşla ji keçêd yerlûyan naxwezîn lewranê jinêd yerlûyan

⁶²⁴ Di (N)yê de tune.

⁶²⁵ Di (M)yê de tune.

⁶²⁶ Di (N)yê de ev peyv wekî “xizminay’iyê” hatiye nivîsîn.

⁶²⁷ Peyva “goran” li herêma serhedê di meneya nezana, bêkêr û sefêk de tê bikaranîn.

⁶²⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “bêwec” hatiye nivîsîn.

hêsayîperwer in cebra şolêd ekradan tehemmul nakin û eḫwalê koçbarî û pez û rizk û girtina ḫaşilê nizanin. Lewranê mimkun nabitin ku ekrad jinêd xwecihî bistînin. Jinêd ekradan iqtîda bikitin bi şev diçine cihê tîrsê û diçine şolan û şer peyda bitin jinêd ekradan şerî dikin û yarîkariyan ji boy mêrêd xo dikin. Lakin jinêd yerlûyan zêde tîrsonek dibin ji mal bidernakevin. Lakin filwaqî‘ jinêd ekradan nadire el zeman in lewranê him jin e û him ğulam e û him pawan e û him di şerî da iqtîda bikitin li derê malê yar û yoldaş e. Lakin jinêd yerlûyan bi ğeyr ji jinaniyê⁶²⁹ êdî kêrî tîşteki nayên. Wekû⁶³⁰ fecir dibitin jinêd ekradan ji cih radibin hespan diṭewilînin û dewar û rizkî bere garanê didîn û malê û derê malê dimalin û meşkê dikilên û şîrî germ dikin û haveyn dikin. Xulaşe eger şewate tunebitin diçin û şewatê berhev dikitin û tînitin û nanî û zadî dipêjîn hêjam mêrêd razane. Eşla mêr ji şola malê tîşteki nakin. Kullî qîşûra şolêd malê li ser jinêd ekradan in. Lakin jinêd kurmancêd yerlû bi ‘eksa wan in herçî şolêd malê heyin hemû mêrêd wan dikin, îlla nan û zadpatinê û cilşuştinê jîn dikin. Belkû heta taştê bê radizên û ‘eware ne.

Ekşerî jinêd ekradan feqîr el ḫal in bihar û havîn û payîzan pêxwaş digerîn û şolan dikin. Zivistanan ew jinêd bêçare çarogê pê dikin û libasêd wan jî cawê sor û cawê reş û heşîn û çît e. Lakin dîsanê bi vî ḫalêd xo rađî û qani‘ in û zêde di emrêd mêrêd xo da ne. Wekû mêrêd ewan iqtîda bikitin ewan biqutîn eşla dest hilnagirîn û xeyidîn nizanin. Û herçî qeder libas û cilêd wê malê heyin hemû jîn didûrîn û nadine xeyaî.

Û mêrêd wan jî bi xo bi xo⁶³¹ her kesek xesînê beran û boĝe û hespêd xoyî fal dixesînin.

Ji ekradan qewî kêm diçine ğurbetê, lewranê ğurbet li nik wan zêde dijwar e. Heta meşela eger ekrad biçine leşkerekî û ew leşker tûl bikêşît û derengî bibitin zafê ji ekradan direvin û tene malêd xo. Bê şebr in di leşkerî da zaf şebrê nakin heman midde dirêj bûyî şevê du û sê jê direvin.

Ekrad di⁶³² seferêd bi dom qewî zêde mon dibin û tabê naynin.

Û ji tîfingê zêde diṭirsin. Eger li cihekî tîfing hebitin ekrad yeqîna kuştinê bikin çî qeder bilanî ekrad zaf û dijmin hindik bin jî xo nadine ser dijminan.

Ekşerê camêriya wan bi feşal û bi⁶³³ ḫîl⁶³⁴ ye. Ji dûr ve dinêrîn ew mirofê camêr û ehlê şerî nas dikin. Eger derk kirîn ku eve dijmine cesûr û ehlherb e îcarê ḫileyê digel wî

⁶²⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “jinaniy’ê” hatiye nivîsîn.

⁶³⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “û” hatiye nivîsîn.

⁶³¹ Di (N)yê de “bi xo” carekê tenê derbas dibe.

⁶³² Di (N)yê de ev peyv wekî “bi” hatiye nivîsîn.

dikin. Meşela li ser rê peya dibitin oldaşêd wî jî xo li newalekê dêxine heşarê ewî mirofê ku li ser rê peya bûye guh ra dikin. Wekû îcarê rêwî û siwar dibînin ku belê siwarek e li ser rê peya bûye ji wî hezer nakin û têne nik wî siwarî. Îcarê ew siwar dibêje wan qelûnê ji boy min têkin, titûna min xilaş bûye. Ew mirof jî rehîmê bi wî dikin û qelûna wî tijî dikin. Îcarê agirî ji wan siwaran dixwezitin. Yek ji wan rêwiyan ji boy wî agirî dijenitin û ew kurmanc jî goya serê hespê digritin. Êdî li wê navê oldaşêd dizî jî ji heşarê biderdikevin û têne nik wan û bi vî hîleyê ewan dişelînin. Wekû ekrad rêbirê dikin du mirofan qirewil datînine serêd cihêd bilind ku ew herdu qirewil li riyane nezer dikin. Eger mimkun e şelandina wan rêwiyan, îcarê ew qirawil ji dûr ve îşaretêkê meşela ‘eba û destmalekê dihêjinîn û ev siwarine jî ji heşarê biderdikevin û birêreyî⁶³⁵ dibin û ewan rêwiyan dişelînin. Wekû şelandîn çavêd wan girê didîn û dibine newalekê bê avahî, îcarê li wê derê dest û piyêd wan jî girê didîn. Heta dibite şev ew diz jî li wê newalê dimînin. Wekû bûye şev îcarê ew siwarêd dizan malî dibin û diçin lakin du sê siwarêd hespê li ser girtiyan beqçî dihêlin ku venebin û neçin hewarê nekin. Ew du sê siwar jî heta berê şubeyê dimînin paşê diçine şola xo.

Lakin wekû ekrad rêbiriyê dikin weqtê ser êvarê dikin ku şev bi ser da bêtin şayed hewar jî ji kenarekî da peyda bibitin dikevite şevê êdî evne ewî malî dibin û xilaş dikin. Wekû ekrad meşela li talana gundekî jî bidîn dîsanê nêzûkî êvarê li talanê didîn ku şev bi serdanî bêtin evne talanê xilaş bikin. Yanê da’îm qismê ekrad bi ihtiyat dibin û hezerê ji dijminan dikin bilanî dijmin hindik û ew zafî bibin jî.

Û da’îm meclis û mijûliya wan behsa şerêd borî ne dikin filan weqtê di filan şerî wiha bû û filan kesî wiha camêrî kir. Muqîm zîkr û fikra wan ehwâlêd çek û şerî ne.

Lakin dîsanê ehlşelat û misilman in: Rojî digrîn û zîkatê didîn. Herçî kesê xuyîdewlet in ji dextlê dehan yek zîkat diditin û ji dirafi çil zêran û çil qurîşan yekî diditin û ji pezan ji şedî yekî diditin û ji dewarê reşe ji sihî yekî zîkat didîn. Elbette bê zîkat nabitin. Eger mirofek şayed zîkatê bi riça xo neditin, bi re’ya hakim û qađî û melan sa’î heyin yanê me’mûrê exza zîkatê hene. Ew mirof diçin û qederê zîkatê ji wî mirofî cebrî distînin û tînine ‘enbara beytilmalê û hîfz dikin. Paşê herçî kesê ku mihtac e û misteheq e ji boy zîkatê deftera wan heyin, hakim û qađî tenbîh dikin ew mirofêd ehlîstîhqaq hemû vêdikevin. Îcarê anegora ‘iyal û ewladêd her kesekî behra wî mirofî didinê dibine mala xo. Eger ji ekradan şayed li zomakî ku malêd bêhal û mal heyin

⁶³³ Di (N)yê de ev peyv wekî “be” hatiye nivîsîn.

⁶³⁴ Li vir peyva “hîle”yê şaş hatiye nivîsîn.

⁶³⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî “birêdeyî” hatiye nivîsîn.

dewletmendê di wan elbette ewan malan nanî û zadî bi her rojê didinê. Û aqayêd zomeyî elbette xuyîsifre û şumet dibitin cîran diçin û nan û zad û qawa wî dixun. Aqatiya ekradan bi nan û bi kerem û bi qaweyê dibitin. Ağa jî ewan cîranan siwar dikin û dişîne olam û suxreyan û şolan bi wan didite kirîn. Eger şayet mêwan hatene mala aqayî û li mala aqayî meşela rûn û birinc û qawe hadir peyda nebitin û li malêd cîranan ew tiştêd ku lazim in peyda bibin dişînin û tînin.

Di nêva ekradan da teklîf tunîne, wekû tiştêk lazim bibitin û li mala cîranan ew tişt peyda bibitin bilanî xuyî malê jî hadir nebitin ew mirof bi xonserî diçitin û ewî tiştê lazim bûyî tînitin û jîn zarok jê nahewişînin û didîn. Wekû dinê Xudê nekirî eger mirofek qedayek bête serî weyaxo jar e dê dawetekê bikitin weyaxo dê hespekî ji boy xo bikirîtin, ew mirof diçite nêva êlê û ‘eşayîran recuyê. Elbette mezîn û biçûk her kesek anegora şanê xo îkram dikin, ê ku pez û dewar û diraf didinê û ji boy wî mirofî xêlek mal berhev dibitin.

Konêd ekradan jî derece derece dibin ji du istûnan heta neh istûnan kon heyin. Ji neh istûnan zêdetir kon nabitin, ê ku gelek jar e du istûnî û sê û çar, êd ewset jî pênc û şeş û heft. Ê ku ağa ne û be zêde dewlet in û konê neh istûnî dibin û ewan konêd neh istûnî çît û perde dibin yanê yalekî konê dibirîn û perde dikişînin û dikine dîwanxane ji boy yalê mêran. Û ewan konan rewaq heyin, pêşmal û piştmal dibêjîn wekû tinifêd çadiran in wekû berf û baran û serma dibitin ewan pêşmal û piştmalî mêwik dikin. Û di nîva konî da li yalê heremê û li yalê mêran li du cihan agirî hil dikin kon germ dibitin.

Ekrad mezîn û biçûk mecbûrê qelûnê ne û herçî mêwanî bêtin elbette dê⁶³⁶ ji boy her yekî qelûnekê tijî dikin.

Wekû mêwan tête zomeyê ew jî difekirîn herçî konê ku mezin e dajone derê wî konî. Mêwan naçine derê konêd biçûk lewranê ku dizanin ewan yalê mêran tune û bê hal mal in.

Ekşerî xurekê jarêd wan nanê cehî û nanê garisî û dew û mast û jajî ne.

Ew taxumêd ku me‘azellah dizî û xirabiyê dikin, ew jarêd ekradanê bê‘îlac in. Lakin xuyîmalêd dewletlû eşla heramê nêzûkî xo nakin û xêr û şedeqan didine jaran. Elbette di her zomeyekê da deh û panzde malêd jar heyin ku ew malêd ağan û dewletmendan şubeh û êvaran ratib li wan malan girêdayine nan û zad û dew herçî peyda dibitin ji boy wan verêdikin. Û ew mêrêd wan jar jî şubeh û êvaran li malêd ağa û dewletlûyan nanî û zadî dixun. Ê ku zêde dibitin berhev dikin û dibine malêd xo ji boy ‘iyal û eţfalêd xo.

⁶³⁶ Di (N)yê de tune.

Şayed wekû ağrafek weya dewletmendek kurêd xo sinnet bikin elbette ji kurêd feqîran û sêwîyan çend nefer zarokan digel kurêd xo sinnet dikin. Lakin dîsanê zaf dibitin ku ji ekraan bê sinnet dimînin. Heta ku xuyî jîn û zaro jî dibin û ixtiyar dibin paşê di wî halê pîriyê xo sinnet dikin.

Di nêva wan da nî dellak tunînin belkû bi xo bi xo serêd yekûdu kur dikin. Lakin cerraşîne qewî qenc ji wan peyda dibin lewrane daîm şolêd wan birîndarbûn e.

Di nêva wan da şemal tunînin. Malêd ağrafêd wan û maldaran pîsos heyin rûnî datînin disojîn. Lakin malêd feqîran agirî hil dikin li ber ronîya wî rûtînin.

Di nêva ekraan carî ye şayed wekû dilê lawekî di keçekê da hebitin û ewê keçê nedine wî lawî paşê bidine mirofêkî dine û ew jî dawetê bikitin. Şeva gerdekê ew lawê ku dil di keçê da hebûye û nedane wî îcarê ew law ewî zavayî bi xundinê û be nusxeyan girê didîn. Waqî‘a jî ew zava tete girêdan û qadirê gerdekê nabitin. Ê zaf middeyî wisanî girêdayî⁶³⁷ dimînitin paşê çareyekê lê dikin. Ê zaf caran dibe ku êdî eşla ew zava li wê jinê venabitin. Axirî ewê jinê naçarî talaq diditin û diçitin jinekî dinê tînin. Êdî derheq wê jinê da girêdanî nabitin.

Wekû dinê di nêva ekraan melayêd wan kirasêd herbê çêdikin ji cawî hemû diniwsîn weqf û tîlsim ewan kirasan agra û ‘egîd’⁶³⁸ (‘egîted’)⁶³⁹ ekraan be pancşed û hezar qurîşan dikirîn û roja cengê di bin cilêd xo da nî werdigirîn û diçîne herbê alatê herbiye û gule li wan mirofan dikevin lakin te’sîr nakitin şaliş û salim dibin. Ew tayîfe qewî zêde bawerî û î‘tiqadî be niwîştan dikin. Ê filwaqî‘ jî seb î‘tiqada wanî durist herçî ku ew guman dikin we miyesser dibitin. Heta carnan devê guran û dirindan⁶⁴⁰ bi xundinê girê didîn, bi rastî nêzûkî pez û dewarêd wan nabitin. Ê maran efsûn dikin û digel xo hildigirîn û dikine paşilêd xo û li istûyêd xo dialînin eşla çêrerê nakitin.

Ê hindek ji wan heyin esmayêd suryanî horî bûne dixunin û bi şîr û bi kêrê bedena xo dibirîn û birîndar dikin lakin xûn ji birînê bidernakevitin dîsanê filhal xweş dibitin û cihê birînê xuya nakitin.

Di nêva ekraan da şîr û meţal⁶⁴¹ leyiztin qewî zêde meqbûl e. Ê ekşerê lawêd wan middeyekî te‘lîm û meşq dikin û horî dibin. Yanê wisanî di ‘ilmê meţalê da mahir dibin ku ji pêşve herçî şîr û derbê ku bêtin hemûyan jî defî‘ dikitin. Eşla çêrerêk

⁶³⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “girêdayî” hatiye nivîsîn.

⁶³⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “ekîd” hatiye nivîsîn.

⁶³⁹ Di (M)yê de tune.

⁶⁴⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “durindan” hatiye nivîsîn.

⁶⁴¹ Peyva “merţal” wekî “meţal” hatiye nivîsîn.

nagihê⁶⁴² wicûda wî. Lewranê di cihêd wanê xo bi xoy da derbên wan xencer û şîr e, gule kê m heyê. Elbette şivan û gawan⁶⁴³ û zarokêd wan jî şîr û meţal û xencer heyin, lakin eve ‘adetê ekradêd vî kenarî ne. Îlla ekrad û rewendêd Hekarî û Bohtan û Behdînan mezîn û biçûkêd xuyî şeşxane ne bê şeşxane naçine serê avê jî. Ê da’îm şolêd⁶⁴⁴ wan armanc û nîşan e, qewî zêde guleendaz î, teyr li hewayê perwaz diktin ji jêr ve berekê bi şeşxanê davêjîn û lê didîn. Lakin tîfingêd qewal jî li nik meqbûl nînin îlla dê şeşxane bitin. Ê geleke dibitin ku ji wan ekradan mexşûş ji boy şeşxaneyekê diçine Istanbolê û begen dikin û ji boy xo tîfingan tînin. Ê mela û fuqehayêd wan jî hemû xuyîşeşxane û çek û xencer dibin.

‘Adetekî dinê jî ewan ekradêd xwecihî heyin zivistanan wekû dibite meclis ew dikine gerelawij. Gerelawij ew e ku her çend mirof di wê meclisê da hađir heyin maqûl û mezîn û biçûk hemû dê her yek bendekî istranê labud bebêjîtin. Ji serê meclisê dest pê dikin heta dûmahiya meclisê. Şayed wekû mêwanek di wê meclisê da peyda bebitin bêçare ye⁶⁴⁵ elbette ew mêwan jî bendekî istranê ji boy wan bebêjîtin negotî elbette nabitin. Ew ekrad ji vê benda istranê re gîsk dibêjîn. Elbette mêwan jî dê gîska meclisê biditin.

Ser êvaran herçî ciwan û lawêd zomeyî heyin hemû berhev dibin, li ber malan ya hol weyaxo cirêdê dileyzîn û herçî ixtiyar î ew jî ji kenarekî da seyrê dikin. Ê herçî keç û bûk û jinêd ciwan in ew jî teşiyêd xo hildigrîn li kenarekî ew darûk dibêjîn li wê derê her kesek teşiya xo dirêsitin ew jî seyra wan lawêd ku dileyzîn dikin. Ê herçî ku zaf pîr û ixtiyar î ew jî li derê konan rûtînin û seyra leyza ciwanan dikin. Wekû bûye êvarê her kesek şolêd xo dibînin û dewar hespêd xo diewirînin û te’amî dixun. Wekû du sa’et ji şevê çuyî li pêşiya konan dikine govend. Lawêd ciwan û keç û bûk têne govendê, mêr û jîn destêd yekûdu digrîn û keç bûk distirên û dileyzîn heta nêzûkî şubeyê îcarê belav dibin û her kesek têne malêd xo radizên.

Ekrad zêde bêgem û geşse dibin qewî fikra heyî û neyiyê nakin.

Pîr û ixtiyarêd wan jî ekşerî bi⁶⁴⁶ rêşî û bi⁶⁴⁷ kêf û çavkildayî ne û da’îm terenumê dikin yanê zû bi zûyî ji kêfa xo nakevin. Di dawetan da ew pîr û ixtiyar jî dileyzîn û dikevin govendê li nik wan ‘eyb nîne.

⁶⁴² Di (N)yê de ev peyv wekî “nakin” hatiye nivîsîn.

⁶⁴³ Peyva “gavan” wekî “gawan” hatiye nivîsîn.

⁶⁴⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî “şol’êd” hatiye nivîsîn.

⁶⁴⁵ Di (N)yê de ev peyv wekî “be” hatiye nivîsîn.

⁶⁴⁶ Di (N)yê de tune ye.

Wekû dibite dawet hînnê datînine nêva destê zavê, kurêd ‘ezeb ji destê zavê direvînin û hînneyê datînine nêva destê bûkê. Keç ji destê bûkê hînneyê direvînin goya eve nîşaniye ku îqbala wan keç û kurêd ‘ezeb jî vebitin û ew jî bi zûyî⁶⁴⁸ bizewicin.

Eger mala bûkê nêzûkê du mirof ji eqrebayêd zavayî dikevîne bin çengêd bûkê û hêdî hêdî bûkê tînin. Eger mala bûkê û zavê dîr in bûkê li hespekî bixeml siwar dikin û tînin.

Wekû bûkê hate derê malê zafa⁶⁴⁹ û çend ‘ezeb li cihekî bilind disekinin û zafa⁶⁵⁰ bi kulman peran direşîne serê bûkê û zarok û fuqera ewan peran berhev dikin. Wekû bûkê hate ber derî naçite hinduruy xanî weya konî, îcarê xuyê dawetê xelatekê didite bûkê, paşê ew bûkê diçite nêva malê. Wekû bûkê çûye nêva malê legen, misîn tînin ew bûkê dev û rûyêd xo dişotin. Şerbet û şekirî ji boy wê tînin wiha êdî dimînitin. Paşê ewê bûkê jî dibin û dixînine govendê elbette bûkê jî dê çend gerekan bileyzîtin çare nîne. Paşê wekû bi şev zava gerdek bûyî ji lawan çendek dikine şayî û tapançe agir dikin.

Şayed eger zafa⁶⁵¹ girêdayî bitin û gerdek nebitin ew lawêd dawetî ewî zavayî dibin dêxine çemî, ava sar. Paşê tînin zavayî verêdikin nik bûkê gerdekê. Wekû wê şevê ew zava gerdek nebitin qewî ‘eyb e. Û şubhe li xelqê peyda dibitin ku belkû ev bûkê⁶⁵² keç û bakire nîne. Lewranê evne aşkar nakin me‘azellah eger bûkê bakire bidernekevîtin qewî riswayî dibitin. Ewê bûkê verêdikin mala babê û qelenê dayî distînin, ev xuyêd jinê ewê bûkê dikujîn. Îcarê dibite neyariyekî mezîn. Lakin şayed eger iqtîda bikîtin ku bûkê keç nebitin elbette ew bi eħwalê xo dizanîtin wekû bûyê tedarîka dawetê ew bûkê bi xo je‘riyê dixutin û berî dawetê telef dibitin êdî namînite wê rojê.

Ekrad herçî heyin rewend û xwecihî hemû jî şafi‘î el mezheb in. Di nêva wan da nî ferdekî jî henefî⁶⁵³ û malîkî û henbelî tunînin.

Di Kurdistanê da cindar heyin ji şêxêd wan in. Wekû mirofêk dîn dibitin û bi tîban bikevîtin goya ew şêx ewî dînî dibite nik xo û tasekê tijî avê dikîtin û goya dixunitin û çî qedê ecenî heyin, goya berhev nêva tasekê dibin. Û ew şêx dijminêd wî dînî digiritin û qamûşekî tînitin goya ewî cinnetî dikite nêva wî qamûşî û derê qamûşî şima dikîtin û davête avê. Goya îcarê ew dîn şîfa dibîne û ji cinûnê xilas dibitin.

⁶⁴⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî “be” hatiye nivîsîn.

⁶⁴⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî “zûyî” hatiye nivîsîn.

⁶⁴⁹ Di (N)yê de ev peyv wekî “zava” hatiye nivîsîn.

⁶⁵⁰ Di (N)yê de ev peyv wekî “zava” hatiye nivîsîn.

⁶⁵¹ Di (N)yê de ev peyv wekî “zava” hatiye nivîsîn.

⁶⁵² Di (N)yê de ev peyv wekî “bûkê” hatiye nivîsîn.

⁶⁵³ Di (N)yê de ev peyv wekî “xenefî” hatiye nivîsîn.

Li nik ekradan pîldar dibin. Lakin ev pîldarî ji zarotiyê da goya îcad dikin. Meşela wekû jinekî hamile meram dikitin ku eve hemla ku dibitin bilanî pîldar bîtin, weqtê ku ew zarok diwelide filhal karekê tînin. Serjê dikin û goştê wê belav dikin. Lakin pîlê wê bidertînin û tînin kun dikin bi qederê serê çîçîkê dayê û serê çîçîkê ji wî pîlî bidertînin û memikê ji wî kunî didine wî zarokî. Da'îm wiha nî çîçîkê di wê kuna pîlî da nî didine wî zarokî. Eşla bê pîlî çîçîkê nadine wî zarokî heta ku ew zarok ji çîçîkê tete birîn. Wekû ew zarok ji çîçîkê hate birîn êdî rojê du caran şubeh û êvaran tînin û ewî pîlî didine destê wî zarokî li wî pîlî nezer dikitin. Wiha heta ew zarok digihite dereca 'eql û kemalê. Wekû ew zarok gihaye derk û îdrakê îcarê goya ew zarok li wî pîlî nezer dikitin herçî mirad û hewadiş li dinyayê peyda bibin ew mirof li wî pîlî da dibîne û neql dikitin. Lakin ew şert heye ku qeş rojekê ew pîl nehatibe terikandîn. 'Eleddewam şîr ji wî pîlî dê bixutin.⁶⁵⁴ Eger carekê jî biterikînin ev şola ji boy wan miyesser nabitin. Eve şola pîldariyê goya di nêva geyrî ekradan dibitin. Lewranê min bi xo bi çavêd xo paşayek ji ehlê Urmîyê dît ku navê Seyfeddîn Paşa bû ew jî pîldar bû û pîl digel hebû û li pîlî nezer dikir û hewadiş û wuqû'at⁶⁵⁵ (qewa'edat)⁶⁵⁶ neql dikirîn. Ê eve pîldarî mexşûşî qism mêr nînin belkû ji jinan jî heyin. Ê ev du qisim mirof li Kurdistanê da qewî zêde meqbûl dibin û gelek baweriyê bi wan dikin. Ê ev cindar û pîldar gelek malî û dirafî peyda dikin lewranê ekrad î'tiqada wan dikin.

Ê hindek jîn jî di nêva wan da heyin ku li falê difekirîn. Tasê tijî av dikitin û datînite pêşîya xo û li wê ava tasê nezerî dikitin, îcarê goya ew mirofêd ku hađir bûyine niyeta wan yek bi yek dibêjîtîn û ekrad jî bawer dikin. Ji xebera pîldar û tasnihêrî bidernakevin. Lakin ji van goya ew pîldarî micerreb û rast dibitin dibêjîn.

Ê efsûncî jî di nêva wan da heyin lakin pîrejîn dibin. Ew jî wekû mirofek nexweş dibitin ewê efsûngerê tînin, kerekî nanî hindekî xoy dikite⁶⁵⁷ nêva nanî û dipêçe û li dor eţrafêd serê wî nexweşî çend barekan dîgerîne û goya tîşteki dixune.⁶⁵⁸ Paşê ewî nanî û xoy davête ber seyî dixutin. Ew mirof goya şifa dibînitin.

Di Kurdistanê da lakin li kenarê Hekariyan kevirî heyin, kevirî ew in ku ew mirof wekû bizinêd kovî li beran û zinarêd asê digrîn û pê ve diçin ku çavê mirofan reşeve têtin.

⁶⁵⁴ Di (N)yê de ev peyv wekî "nexutin" hatiye nivîsîn.

⁶⁵⁵ Di (M)yê de ev peyv wekî "وقوعات" û di (N)yê de jî wekî "وقواعات" hatiye nivîsîn.

⁶⁵⁶ Di (M)yê de ev peyva "قواعادات"ê tuneye.

⁶⁵⁷ Di (N)yê de ev peyv wekî "dikitin" hatiye nivîsîn.

⁶⁵⁸ Di (N)yê de ev peyv wekî "dixun" hatiye nivîsîn.

Û ji ekradan her tayifeyekî di nêva wan da nî çend mal miṭribêd wan heyin ew begzade dibêjîn. Ew miṭrib feqîr elḥal dibin û şolêd wan saz û soz û defqûtan sazende ne. Li dawet û şayiyan saz diqûtin û mewîdetiyê dikin. Û jinêd wan jî ji malan parsê dikin. Bi vî terzî medarê dikin. Lakin ewan jî zimanekî mexşûşe heyin ku bi geyr ji miṭriban kesek ewî zimanî nizanin û malêd xo da nî bi wî zimanî xeber didîn. Lakin digel ekradan kurmançî xeber didîn. Kes ji ekradan jinan nadine wan û ji wan jî jinan naynin.

Û li Kurdistanê ji ekradan tayifa êzîdyan jî heyin ku misilman nînin yezîdî ne. Resm û ayin û erkanêd wan jî cida ne. Ew tayife be iblîsî dipêrisin û dibêjin şeytanî Melek Ṭawûs. Lakin zimanêd wan jî kurdî ne. Eger behsa wan jî temama bikim êdî ev rîsale dirêj dibitin ev qeder jî bes e.

Ekşerêd ekradan isterkan nas dikin û bi şevan iqtîda bikitin ew li isterkan difekirîn û rîyan û eṭrafan dizanin û bidertînin. Û ji seyra wan isterkan meşela bûyina berf û baranê fehm dikin.

ENCAM

Di edebiyata kurdî ya kurmancî de çend ekolên sereke yên wekî ekola Bazîdê, ekola Hawarê û ekola Qefqasyayê hene. Van hemû ekolan di heyam û herêma xwe de li gor reng û taybetiyên xwe xizmeta edebiyata kurdî kirine. Di nav ekola Bazîdê de ji Ehmedê Xanî, Îsmailê Bazîdî, Muradxanê Bazîdî, Mela Mehmûdê Bazîdî, Şêx Mihemedê Celalî (1851-1914), Xelîfe Êsiv (1885-1965) û Mela Ehmedê Heyderî (1887-1937) hene. Ev şexsiyet hemû di dîroka edebiyat û çanda kurdî de girîng in û li gor xwe hêjayî nixandinan in.

Di vê tezê de bi giştî em li ser Mela Mehmûdê Bazîdî, berhemên wî, hevkarîya wî ya li gel A. Jaba û bi taybetî jî *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiyeyê* sekinîn. Bazîdî ev berhema xwe di navbera salên 1858-1859an de nivîsiye, bi vê berhemê û yên din wekî damezrênerê pexşana kurdî tê qebûlkin.

Ev berhem him ji ber mijara xwe ve -ku edet, bawerî, xûy, kevneşopî, xwarin, vexwarin, rabûn û rûniştin bi kurtasî hemû jiyana rojane ya kurdan di xwe de dihebîne-pir giranbiha ye, di babeta xwe de serekaniyeke tekane ye. Ev pirtûk li ser jiyana kurdan ya civakî û etnolojiya wan berhema herî pêşîn e ku bi destê kurdekî hatiye nivîsîn. Jixwe ji pirtûkên Bazîdî ya musteqîl, bi serê xwe ev xebat e. Ango ev xebata wî ya herî orijînal e. Lewra nivîskar bêyî xwe bispêre jêdereke nivîskî di derheqê jiyana ekrad, anga kurdan de -bi taybetî yên koçer- bi kurtasî lê têrûtijî agahiyên dide û wan dide nasîn. Lê ya herî girîng jî ew e ku em bûne xwediyê wê qenaetê ku Bazîdî di vê namilkeya xwe ya piçûk û lê nixdar *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye* de civaka kurdan ji hemû aliyan ve dide nasîn, li ser wan şîrove, nixandî û rexneyan dike. Ji ber vê ev berhem him ji bo edebiyata kurdî, him jî ji bo çand, etnografya û civaknasiya kurdan xebateke bingehîn e.

Bazîdî di vê pirtûka xwe de wekî civaknasê pispor, bi gelemperî ji dîrok, ziman, bawerî, çand û kelepura wan dest pê kiriye qala hemû hebûn û nixandî kurdan kiriye. Dema mirov vê berhemê dixwîne ev hest li mirov çêdibe ku Bazîdî dixwaze kurdan bide nasîn. Ev jî derdixe holê ku li ser pêşniyaza Jaba, Bazîdî seba gelê xwe bide nasîn dest bi nivîsîna vê pirtûkê kiriye. Bi vê xebata xwe ve Bazîdî bûye Êbn Xaldûnê kurdan. Lewra çawa ku Êbn Xaldûn bi kitêba xwe *Muqaddîmeyê* ve di alema Îslamê de û di nav ereban de wekî civaknasê pêşîn û dîroknas tê qebûlkin, bi ked û xebatên xwe yên cihêreng ve Bazîdî jî di nav kurdan de li gel taybetiyên xwe yên din civaknas û dîroknasê ewil e. Lewra Bazîdî bi vê kitêba xwe him kurd bi hemû aliyan ve dane nasîn,

him li cihên bên rexnekirin rexne kiriye, kêmasiyên wan veneşartine. Her wiha li gor fikra hakim a dema xwe di hin mijaran de -wekî dîrok û zimanê kurdî- xwedî qenaetên cuda ye jî. Loma ji ber fikra xwe ya di derheqê esil û zimanê kurdan de hatiye rexnekirin.

Ev xebata giranbiha ji hêla rêbaz û pergala nivîsînê ve bi pirsgirêk e. Kêmasiya vê berhemê ew e ku mijar bi pergal, di cihekî de nehatine dayîn, ango mijar li nav hevdu ketine. Bo mînak di gelek cihan de qala jinên kurd tê kirin, ango nivîskar li cihekî, di beşeke taybet de behsa rola jinan ya di civakê de, tesîra wan a di malê de nake, li cihekî behsa jêhatîbûna wan dike, pey mijarên cuda îcar deh rûpel şûnda dîsa qala alîkariya wan ya ji bo mêran dike. Her wiha di gelek cihan de berbelav qala şervanî û şerê kurdan dike. Ev yeka kêmasiya berhemê ye, wisa tê xuyanê ku nivîskar dema berhema xwe amade kiriye ji bo pergal û rêkûpêkiya berhemê hewl nedaye. Di kîjan hevok û paragrafê de hatibe bîrê bêyî ku li mijar û peywendê binihêre agahî daye. Loma di tertîba mijaran de tevlihevî û dubarekirin hene. Lêbelê ev kêmasiya rêzkirina mijaran tu tiştî ji girîngiya naveroka wê kêma nake.

Di encama lêkolîna me de him cihê Bazîdî yê di dîroka kesayetiyan sereke yê kurdan de derkete holê û him jî pirrengîbûna xebatên wî diyar bû. Lewra mijarên Bazîdî li ser kar kiriye ji helbestê bigre heya çîrok, dîrok, werger, ferheng, rêziman û edebiyatê berfireh dibe. Bi kurt û kurmancî encamên di vê tezê de derketine holê ev in:

- 1) Bazîdî kesê pêşîn e ku bêyî wergerê bike, şerh û şîrove bike berhema xwe ya orijînal *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiye* ya pexşan bi kurdiya kurmancî nivîsiye. Ji hêla şekil ve bi vê xebata xwe ve Bazîdî di dîroka edebiyata kurdî de wekî pêşîkêşê pexşana kurdî tê qebûlkirin.
- 2) Bazîdî bi vê xebata xwe *'Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradiyeyê* ve ji ber naverok û mijara wê kesê pêşîn e ku li ser civaknasî û etnografya kurdan bi zimanê kurdî xebat kiriye û ew xebat gihiştîye ber destê me. Loma damezrênerê civaknasiya kurdî ye.
- 3) Bazîdî kesê pêşîn e ku mesnewiyên kurdî yê kilasîk wekî pexşan çîroka wan -bo mînak Mem û Zîn- nivîsiye û wekî çîroknivîsê yekem tê qebûlkirin.
- 4) Bazîdî kesê pêşîn e ku *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* farisî nivîsiye wergerandiye kurmancî û bi vê xebata xwe ve bûye wergerê sereke ji bo dîroka edebiyata kurdî.
- 5) Bazîdî kesê pêşîn e ku bi kurmancî dîroka kurd û Kurdistanê *Tewarîxî Cedîdî Kurdistan* nivîsiye, lê ji bilî pêşgotina wê ev pirtûk winda ye.

- 6) Bazîdî kesê pêşîn e antolojiya çîrokên kurmancî *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan* amade kiriye. Ev antolojî çima ku naveroka wê ji bûyerên qewimî pêk tê him ji bo dîroka edebiyata kurdî û him jî ji bo dîroka kurd û Kurdistanê çavkaniyeke esasî ye.
- 7) Bazîdî bi risaleya xwe ya bi navê “Şa'ir û Musennefên di Kurdistanê” ve wekî kesê pêşîn tê zanîn ku li ser şa'irên kurd xebata biyografîk ya ewil amade kiriye.
- 8) Bazîdî ji kesên pêşîn e ji bo rêziman, alfabe û ferhengê kurdî xebat kirine.
- 9) Bazîdî kesê pêşîn e bi salan bi merivekî biyanî A. Jaba re tevkarî kiriye û pirtûkxaneyêke degme -gir û hûr 54 berhem- ya ji berhemên kurdî yê kilasîk pêk tê berhev kiriye û bi saya vê kedê ew berhem ketine destê lêkolîner, rojhilatnas û kurdologan û bi vî awayî bi gelek zimanên din yê wekî rûsî, fransî, almanî û hwd hatine weşandin û ji berzebûnê xelas bûne.

Li gor van hemû daneyan tê dîtin ku Mela Mehmûdê Bazîdî bi tena serê xwe şexsiyeteke girîng yê civaknasî, dîrok û wêjeya kurdî ye û bi berhem û xebatên xwe gencîneyêke dewlemend li pey xwe hiştiye.

ÇAVKANÎ

Aboviyan, Xaçatur: “Kurdi”, *Kavkaz*, j. 46-51, Tiflis, 1848.

Aboviyan, Xaçatur: Yêrkêrî Joxovatsu, Hator 8, Êrivan, 1958.

Adak, Abdurrahman: *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, ç. 2., Nûbihar, Stenbol, 2014.

Adelson, Roger: ‘*London and the Invention of the Middle East; Money, Power, And War, 1902–1922*’, (*Londra ve Ortadoğu'nun İcadı; Para, Güç ve Savaş, 1902–1922*), New Haven ve Londra, Yale University Press, 1995.

Alakom, Rohat: “Bir İzmir Levanteni Auguste Jaba”, *Kürt Tarihi*, j. 11, İstanbul, 2014.

Alakom, Rohat: *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987)*, ç. 2., Weşanên Deng, İstanbul, 1991.

Alkiş, Abdurrahim: *Farça -Dilbigisi, Pratik, Klasik Metinler-* Kent Işıkları Yayınları, İstanbul, 2014.

Artun, Erman: *Türk Halkbilimi*, ç. 6., Weşanên Kitabevî, İstanbul, 2010.

Aytar, Osman: “Hesenkêf dê di bin avê de bimîne!”, *Kovara Çira*, j. 17, Swêd, 1999.

Azîzan, Herekol: “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” *Hawar*, j. 33, Şam, 1941.

Bakayev, Ç. X: *Dîroka Hînkirina Zimanê Kurdî li Rûsya û Yekîtiya Sovyetê, Kurtiyek li ser Dîroka Hînkirina Zimanên Îranî*, Moskova, 1962.

Barthold, Vasiliy Vilademiroviç: *Asyanın Keşfi Rusya ve Avrupada Şarkiyatçılığın Tarihi*, wer. Kaya Bayraktar-Ayşe Meral, Yöneliş Yayınları, İstanbul, 2000.

Bayezîdî, Mela Mehmûd: *Puavy i Obyaj Kurdov*, wer. M. B. Rudenko, Moskova, 1963.

Bayezîdî, Mela Mehmûdê: *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, ç. 1., Lêkolîn: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, 2010.

Bayezîdî, Mela Mehmûdê: *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, ç. 2., Lêkolîn: Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, 2012.

Bazidi, Mahmoud: “Ghevri et ses chansons, extrait de l’histoire de Kurdistan par Mahmoud Bazidi”, *Bulletin de l’Athénée oriental*, j. 3, 1881.

Bazîdî, Mela Mehmûdê: *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiye*, amd. Ziya Avcî, Lîs, Diyarbekir, 2010.

Bazîdî, Mela Mehmûdê: *Cami’eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, amd. Ziya Avcî, Lîs, Diyarbekir, 2010.

Bazîdî, Mela Mehmûdê: *Mem û Zîn*, ji tîpên erebî vgz. Xelîl Duhokî, Lîs, Diyarbekir, 2007.

Bedlîsî, Şerefxanê: *Şerefname* Tercumeya Mela Mehmûdê Bazîdî, Twîjandin: Seîd Dêreşî, Spîrêz, Duhok, 2007.

Bedlîsî, Şerefxanê: *Şerefname*, kurmancî wer. Ziya Avcî, Weşanên Azad, Mersîn, 2014.

Bedlisî, Şerefxanê: *Şerefname*, wer. M. S. Cuma, Spîrêz, Duhok, 2006.

Beg, M. Emîn Zekî: *Kurtîyek Ji Mêjûwa Kurd û Kurdistan*, wer. M. S. Cuma, Hewlêr, 1999.

Beg, M. Emîn Zekî: *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, ç. 2., wer. Heyet, Nûbihar, İstanbul, 2011.

Belxî, İbnul: *Farsname*, wer. Abdulhalik Bakır, Ortaçağ Tarihi ve Medeniyetine Dair Çeviriler, Weşana Şexsî, Ankara, 2008.

Beyazîdî, Mela Mahmut: *Adetên Kurdîstan*, wer. Delîlo İzolî, Holland, Tarîx tune.

Biçer, Bekir: Selçuklular ve Kürtler, *International Journal of Social Science*, c. 6, beş, 2, 2013.

Bidlisi, Şerefxan: *Şerefname I*, ç. 2., wer. Abdullah Yeğîn, Nûbihar, İstanbul, 2014.

Bilge, Evin: *Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Mêrdîn, 2013.

Bitlisî, Şerefxan: *Şerefname I*, ç. 1., wer. Abdullah Yegin, Nûbihar, İstanbul, 2013.

Blau, Joyce - Din, Nivîskarên: *Kürtler ve Kürdistan –eleştirel bir bibliyografya 1977-1990-*, wer. Aytekin Karaçoban, Mezopotamya Yayınları, Almanya, 1994.

Blau, Joyce: “Jiyan û Berhemên Ehmedê Xanî (1650-1707)”, ji fransî wer. M. Malmîsanij, *Kovara Çira*, j. 3, Swêd, 1995.

Bocheńska, Joanna: “Zbiór uwag i opowieści kurdyjskich - Przedmowa do wydania polskiego-”, *Fritillaria Kurdica*, j. 9, Kraków, 2015.

Bois, Thomas: “Bulletin Raisonné d’Etudes Kurdes”, *Imprimerie Catholique*, Beyrouth, 1964.

Brant, James: *1838 Yazında Kürdistan*, wer. A. Celil Kaya, Rûpel, İstanbul, 2014.

Bruinessen, Martin van: “Onyedinci Yüzyılda Kürtler ve Dilleri: Kürt Lehçeleri Üzerine Evliya Çelebinin Notları”, *Studia Kurdica*, j. 1-3, 1985, Paris.

Bruinessen, Martin van: “Türkoloji Varsa Kürdoloji de Vardır, Kürdoloji; Kürtlerle İlgili Bütün Bilimleri Kapsar”, *Kovara Bîr*, j. 1, Diyarbekir, Bihar, 2005.

Bulut, Yücel: *Oryantalizmin Kısa Tarihi*, ç. 5., Küre Yayınları, İstanbul, 2014.

Campanile, M. Guiseppe: *Kürdistan Tarihi*, wer. Heval Bucak, Avesta, İstanbul, 2009.

Canan, İbrahim: *Hadis Ansiklopedisi -Kütüb-i Sitte-*, c. 8, Zaman, İstanbul, tarîx tuneeye.

Celalî, Murad: “Adat û Rusûmatnameê Ekradiye û Çend Gotin”, *Nûbihar*, j. 112, Stenbol, 2010.

Celalî, Murad: “Jimar, War û Wargehên Kurdan”, *Nûbihar*, j. 102, Stenbol, 2007.

Celalî, Murad: “Warên Kurdan û Kurdên Sûdanê”, *Nûbihar*, j. 121, Stenbol, 2012.

Celalî, Murad: *Têgehên Bingehîn, Weşanên Hinariya Quran, Tarîx û Cihê Weşanê Tuneye*.

Celîl, Casimê - Celalî, Emerê: *Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn*, Nûbihar, Stenbol, 2011.

Celîl, Celîlê: “Avgust Jaba kî bû?” *Kurdistan Press*, j. 75, 1989.

Celîl, Celîlê: *XIX. Yüzyıl Osmanlı İmparatorluğu’nda Kürtler*, ji rûsî wer. Mehmet Demir, Weşanên Özge, Ankara, 1992.

Celîl, Ordîxanê: *Kurdskiy Geroyîçeskiy Epos "Zlatorukiy Xan", Destana Qehremaniya Xanê Çengzêrîn ê Kurd (Dimdim)*, Moskova, 1967.

Celîl, Ordîxanê: *Kürt Kahramanlık Destanı Dımdım*, wer. İbrahim Kale, Avesta, İstanbul, 2001.

Cewerî, Fırat: *Antolojiya Çîrokên Kurdî*, ç. 1., Nûdem, c. 1, Stenbol, 2003.

Chodzko, A: "Etudes philologiques sur la langue kurde (dialecte de Soleimanie)" *Journal Asiatique*, beş 5, berg 9, 1857.

Çakar, Mehmet Sait û yêrîn: *Ortaöğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Tarih Vakfı, İstanbul, 2010.

Çelebî, Evliya: *Seyahetname*, wer. Seyit Ali Kahraman-Yücel Dağlı, Weşanên Yapı Kredi, c. 4, İstanbul, 2012.

Çem, Munzur: *Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği*, Weşanên Vate, İstanbul, 2009.

Çetin, Seyfettin: *Yâkût el-Hamevî'nin Mû'cemü'l-Büldan'ında Kürtler*, Nûbihar, İstanbul, 2014.

Demir, Ahmet: *İslâm'ın Anadoluya Gelişi*, ç. 2, Kent Yayınları İstanbul, 2008.

Dilovan, Selman: "Hin şaşiyên transkripsiyona 'Adat û rusûmatnameyê ekradiye", *Kovara Çira*, j. 18, Swêd, 2000.

Dineverî, Ebû Hanife: *İslam Tarihi*, wer. Nusrettin Bolleli-İbrahim Tüfekçi, Hivda, İstanbul, 2007.

Dittel, V: "Aperçu sommaire de trois ans de voyage en Asie, dans le Caucase, la Perse, le Kurdistan, la Mésopotamie," *Nouvelles Annales de Voyages*, c. 3, Paris, 1849.

Doskî, Tehsîn İbrahîm: *Li Dor Edebê Kirmancî Di Sedsala Nozdê û Bîstê Zayînî*, (Deq û Vekolîn) Weşanê Kura Zaniyariya Kurdistanê, Hewlêr, 2004.

Dost, Jan: "Kurdnasa Polonî Dr. Joanna Bochenska", *Nûbihar*, j. 123, Stenbol, 2013.

Driver, G. R: *The Dispersion of the kurds in ancient times*, JRAS, 1921, IV; *The name "Kurde" and its philological connection*, JRAS, 1923, III; *Studies in kurdes History*, BSOS, 1922, T. II.

Duhokî, Xelîl: "Mela Mehmûdê Bayezîdî (1799-1867)", *Kovara Gulistan*, j. 1, Stenbol, 2002.

Ebdulla, Necat: *Bibliyografyayî Kurdnasî –Kurd û Kurdistan le serçawe Fransiyekanda-* Hewlêr, 2009.

Ebdulla, Necat: *Bibliyografyayî Kurdnasî –Kurd û Kurdistan le serçawe Ingilîziyekanda-* Hewlêr, 2009.

El-Belazurî: *Futûhûl-Buldan*, ç. 2., wer. Mustafa Fayda, T.C. Kültür Bakanlığı, Ankara, 2002.

Epözdemir, Şakir: *Medreseyên Kurdistanê*, Nûbihar, Stenbol, 2015.

Erwasî, Melayê: *Tiba Melaye Erwasî: Ji Sedsala 18. Pirtûkeke Kurdî ya Bijîşkiya Gelêrî*, Dahûrîn û wer. Kadri Yildirim, Weşanên Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Stenbol, 2013.

Eyice, Semavi: "Pierre-Amédée Jaubert", *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. 23, İstanbul, 2001.

Findî, Reşîd: *Çil Çîrokêd Mela Mehmûdê Bayezîdî*, Aras, Hewlêr, 2004.

Findî, Reşîd: *Êkemîn Çîroka Kurdî Çîroka Mem û Zîna ya Mela Mehmûdê Bayezîdî*, Hewlêr, 2010.

Findî, Reşîd: *Elî Teremaxî Êkemîn Rêzimannivîs û Pexşannivîsê Kurd e*, Emîndariya Rewşenbîrî û lawan, Bexda, 1985.

Findî, Reşîd: *Er-Rîhle Ewliya Çelebî Fil Kurdistan*, Duhok, 2008.

Findî, Reşîd: *Pertûka Adat û Rusûmatnameê Ekradiye ya Mela Mehmûdê Bayezîdî 1799-1867*, Dezgeyî Spîrêz, Duhok, 2006.

Fossum, Ludvig Olsen: *A practical Kurdish grammar*, The inter-Synodical Ev. Lutheran Orient-Mission Society, Augsburg Publishing House, Minneapolis, 1919.

Garzoni, Maurizio: *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda* - Rêziman û ferhenga zimanê kurdî, Roma, stamperia della Sacra Congregazione di Propaganda Fide, 1787.

Garzoni, Maurizio: *Grammatica e Vocabolario Della Lingua Kurda*, Re-edisyon, Pêşgotina ingilîzî: Mirella Galletti û wergera wê ya kurdî: Şerif Derince, Avesta, Stenbol, 2013.

Gazî, Mustafa - Bengîn, Ahmed: *Baweriyên batil ên kurdan*, Enstîtuya Kelepora Kurdî, Stenbol, 2006.

Gennep, Arnold van: *Folklor*, wer. Pertev N. Boratav, Weşanên Tarih Vakfı, İstanbul, 2011.

Geverî, Ayhan: *Yûsuf û Zuleyxaya Selîmiyê Hîzanî*, Nûbihar, Stenbol, 2013.

Gültekin, Mehmet: “Di arşîva Osmanî de Mela Mehmûd Bazîdî”, *Nûbihar*, j. 130, Stenbol, 2015.

Gültekin, Mehmet: “Di arşîva Prof. Ferdinand Justi de Mela Mehmûd Bazîdî”, *Nûbihar*, j. 131, Stenbol, 2015.

Gültekin, Mehmet: “Di arşîva Prof. Ferdînannd Justî de nameyên Aleksandre Jaba”, *Fritillaria Kurdica*, j. 9, Kraków, 2015.

Gültekin, Mehmet: “Di arşîvên Rojava û Osmanî de derheqê Mela Mehmûdê Bazîdî de agahiyên nû”, *Nûbihar*, j. 129, Stenbol, 2014.

Hamzeh'ee, M. Reza: *Yaresan (Ehl-i Hak)*, ji ingilîzî wer. Ergin Öpengin, Avesta, İstanbul, 2008.

Han, Şerafeddin: *Şerefname (5 cild)*, *Kürt Ulusunun Tarihi*, wer. Celal Kabadayı - Rıza Katı - Vedii İlmen, Yaba Yayınları, İstanbul, 2009-2010.

Hartman, Martin: Bohtân, *Eine topogr-histor Studie* (Botan, Lêkolîneke Topografîk û Dîrokî), Berlin 1897. Aus: *Mitteil der Vorderasiat, Gesellschaft* 1896, 2 und 1897, 1.

Hartman, Martin: *Der kurdische Diwan des Schēch Ahmed*, genannt Malā-i Cizrī, Berlin, 1904.

Hartman, Martin: *Zur kurdischen Literatur - Mit Tafel* (Wêjeya Kurdî – Bi wêneyan), *Wiener Zeitschrift für die Kunde des Morgenlandes* XII, 102.

Hassanpour, Amir: *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, wer. İbrahim Bingöl-Cemil Gündoğan, Avesta, İstanbul, 2005.

Helqefînî, Mela Yûnisê: *Terkîb we Zirûf*, amd. Emîn Narozi, Weşanên Sarayê, Stockholm, 1996.

Holowinski, L: *Pielgrzymka do Ziemi Swietej*, Petersburg, 1853.

Houtoum-Schindler, Albert: "Beiträge zum kurdischen Wortschatz", c. 38 ZDMG (Zeitschrift der Deutschen Morgenländischen Gesellschaft, Leipzig).

Izady, Mehrdad R: *Kürtler*, ç. 2., wer. Cemal Atila, Doz, İstanbul, 2004.

Îzolî, D: *Ferheng Kurdî-Tirkî Tirkî-Kurdî*, ç. 7., Weşanên Deng, Diyarbekir, 2013.

Jaba, A. D: *Racueil de notices et récits kourdes*, St. Petersburg, 1860.

Jaba, A: "Resume de l'ouvrage d'Ahmed Effendi Khani", Tr. par A. Jaba, in *Bulletin Hist. Philologique*, LXV, j. 11, 1858.

Jaba, A: Ballade kurde recueillie et traduite par A. Jaba et communiquee par M. de Tchihatcheff, *Journal Asiatique*, j. 5, 1859.

Jaba, A: *Dictionnaire Kurde-Français*, Pêşgotin: Salih Akin, Avesta, Stenbol, 2014.

Jaba, A: Gramaire kurde par Ali Teramakhi offert a l'Academie Imperial des Sciences a St. Petersburg, par A. Jaba.

Jaba, A: Resume de l'ouvrage kourde d'Ahmed Efendi Khani fait et traduit par A. Jaba, *Bulletin*, berg 15.

Jaba, Aleksander: *Çîrokên Kurmancî*, amd. Cankurd, Weşanên Çanda Nûjen, Stockholm, 2000.

Jaba, Îskender: *Cami'eyê Risaleyan û Hikayetan*, Petersburg, 1860.

Jaba, M. August: *Dictionnaire kurde-français* par M. August Jaba, publiée par M. Ferdinand Just, Petersburg, 1879.

Jaubert, Pierre Amédée: "Kurdistan", *Kovara Severniy Arhiv*, j. 14, 1826.

Jaubert, Pierre-Amédée: *Elements de Grammaire Turque*, Paris, 1833.

Justi, Ferdinand: *Kurdische Grammatik*, Commissionäre der Kaiserlichen akademie der wissenschaften; Eggers & C. U. J. Glasunow, 1880.

Kerman, Zeynep: “Halit Ziya Uşaklıgî”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. 42, İstanbul, 2012.

Kurdo, Qanadê: “A. D. Jaba û Rola Wî di Pêştaborina Kurdzaniyê de”, *R'ya T'eze*, j. 10, 1973.

Kurdo, Qanadê: *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, Özge Yayınları, Ankara, 1992.

Laçiner, Serdar: Ortadoğu Diye Bir Yer Var Mı? *Uluslararası Hukuk ve Politika*, c. 3, j. 10, Ankara, 2007.

Lazarev, M. S. - Mihoyan, Ş. X: *Kürdistan Tarihi*, ji rûsî wer. İbrahim Kale, Avesta, İstanbul, 2001.

Lerch, Peter: *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer - 1*, St. Petersburg, 1856; *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer - 2*, St. Petersburg, 1857; *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nordchaldäer - 3*, St. Petersburg, 1858.

Lewis, Bernard: Ortadoğu -*Hıristiyanlığın Doğuşundan Günümüze Ortadoğunun 2000 Yıllık Tarihi*-, wer. Mehmet Harmancı, Yeni Binyıl Yayınları, Çap Medya Ofset, İstanbul, tarîx tuneye.

Maalouf, Amin: *Arapların Gözünden Haçlı Seferleri*, wer. Ali Berktaş, Yapı Kredi Kültür Yayınları, İstanbul, 2006.

Makas, H: *Jaba's resume du Mem ou Zin Kurdische Texte im Kurmanji Dialecte aus der Gegend von Mardin*, Lenîngrad, 1926.

Malmîsanij, M: “Nameyên Tirkîyeyê - Çiyayên Kurdistanê”, *Kovara Tîrêjê*, j. 4, Swêd, 1981.

Marogulov - Ş.Ə. *Xə-xə hinbuna xəndəna nvisara kyrmançî*, Nəşre dəwləte Şewre Ərmənistanə, Revan, 1929.

Maruf, Ewrehmanî: Hacî Çend Wuşeyek Derbarey Komelêy Destnuwîse Kurdiyekanî Aleksander Jaba, *Beyan*, j. 10, Bexda, 1973.

May, Karl: *Vahşî Kürdistan İçlerinde*, wer. Atilla Dirim, Yurt Kitap Yayın, Ankara, 2001.

McCarus, Ernest N: *A Kurdish grammar*, American Council of Learned Societies, New York, 1958.

McCarus, Ernest N: *A Kurdish-English Dictionary: Dialect of Sulaimania, Iraq (Kurdish) Paperback*, 1967.

Mehmet Gültekin – Bahar ve Nihat Gültekin, *Salnama Ehmedê Xanî 2013*, “Arşîva Prof. Justi Derbarê Alexandre Jaba û Mela Mehmûd Bazidî”, Belge, Stenbol, 2014.

Mesudi, *Müruc ez-Zeheb*, ç. 2., wer. D. Ahsen Batur, Selenge Yayınları, İstanbul, 2011.

Mînoriskî, V. F: *Kurd, Rûnkirin û Dîtin, Kurd Nevîyên Mîdîyan*, wer. M. S. Cuma, Çapxana Rewşenbîrî, Hewlêr, 1999.

Minorsky, M. - Bois, Th. - Mac Kenzie, D. N: *Kürtler ve Kürdistan*, ç. 2., wer. Kamuran Fıratlı, Doz, İstanbul, 2004.

Minorsky, V: *Kürtler*, Weşanên Helepçe, Köln, 1998.

Minorsky, Vladimir: “Kürtler”, *İslam Ansiklopedisi*, c. VI, MEB Yayınları, İstanbul 1997.

Mokri, Mohammad: *Kurdologie et enseignement de la langue Kurde en URSS*, in “*Recherche de Kurdologie, Contribution aux etudes iraniennes 1956-1964*”, Paris, 1970.

Moltke, Helmuth Graf von: *Türkiye Mektupları*, Varlık Yayınları, 1967.

Moltke, Helmuth von: *Türkiye Mektupları*, wer. Hayrullah Ors, Remzi Kitapevi, İstanbul, 1969.

Musaelyan, J. S: “A. Jaba û Kurdnasî”, *Ronakbîrî*, wergeranî le rûsiyewe: Şîrwan Mehmûd Mihemed, j. 3-4, Stockholm, 1993.

Nebez, Cemal: “Kurtemêjûyekî Kurdnasî le Elmaniyada”, *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, c. 1, beş, 2, Bexda, 1974.

Nikitin, Bazil: *Kürtler -Sosyolojik ve Tarihi İnceleme- 1-2*, ç. 4., wer. Hüseyin Demirhan-Cemal Süreyya, Deng Yayınları, İstanbul, 1994.

Özcan, Abdülkadir: “Asâkir-i Mansûre-i Muhammediye”, *Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi*, c. III, İstanbul, 1991.

Pallas, P. S: *Reisen durch Russland und Gaucacischen Gebürge*, hrsg. T. I-II, St. Petersburg. 1787-1891.

Pîrbal, Ferhad: *Mela Mehmûdî Bayezîdî (1799-1860) Yekemîn Çîroknûs û Pexşannûsî Kurd*, Weşanên Aras, Arbil, 2000.

Prym E. - Socin, A: *Kurdische Sammlungen, Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr ‘Abdin*, St. Petersburg, 1887.

Qedrî, Mamoste: “Eliyê Teremaxî û Dîtinên wî yên li ser Rêçikên Rêzimana Kurdî li Gor Pirtûka wî ya bi Navê “Destura Zimane Erebî bi Kurdî Digel Hinde Nimûneyêd Farisî û Kurdî” *Kovara Bîr*”, j. 1, Bihar 2005.

Qeredaxî, Mihemed Elî: *Bûjandinewey Mêjûyî Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe*, Bergî Çwarem, Çapî Yekem, Çapxaney Elxensa, Bexda 2002.

Qeredaxî, Mihemed Elî: *Bûjandinewey Mêjûyî Zanayanî Kurd le Rêgey Destxetekanyanewe*, Bergî Siyem.

Quatremere, E. M: *Notice extraite des manuscrits de la Biblithequs du roi et autres Biblitheques*, Paris, 1836.

Rahman, Fuad - Galetti, Mirella: *Kürt Yemek Kültürü*, wer. Fuat Serdaroğlu, Avesta, İstanbul, 2010.

Reychman, Jan: “Ji Rûpelên Nenaskirî yên Rojhilatnasiya Polonî ya Sedsala Nozdehan”, wer. Sidqî Hironî, *Nûdem Werger*, j. 1, Swêd, Payiz, 1996.

Rhea, Samuel A: “Brief Grammar and Vocabulary of the Kurdish Language of the Hakari District,” *Journal of the American Oriental Society*, 10/1, 1872.

Rodiger, Emil - Friedrich Pott, August: “Zeitschrift fur die Kundef des Morgelandes 3”, *Kurdische Studien*, 1840.

Rudenko, Margaret: “Edebî Kurdî Sedey Hevdehem”, *Ronakbîrî*, j. 1, Stocholm, 1992.

Rudenko, M. B: “*Li Ser Destnivîsên Kurdî; Hilgirtiyên Rojhilatnasiyê li Mezintirîn Pirtûkxaneyâ Yekâtîya Sovyetê*”, Moskova, 1961.

Rudenko, M. B: *Koleksiyona A. D. Jaba (Destnivîsên Kurdî)*, “Xebatên Pirtûkxaneyâ Giştî ya Hikûmî ya bi navê M. E. Saltîkof Şedrîn, Berhemên li ser rojhilatê”, Lenîngrad 1957.

Rûhanî, Baba Merdoxê: *Tarîxê Meşahîrê Kurd*, c. 2, Tehran, 1986.

Sadinî, M. Xalid: *Mela Huseynê Bateyî -Jiyan, Berhem û Helbestên Wî-*, Nûbihar, Stenbol, 2010.

Sağniç, Feqî Huseyn: *Dîroka Wêjeya Kurd*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002.

Said, Edward W: *Şakiyatçılık –Batının Şark Anlayışları-*, ç. 8., wer. Berna Ülner, Metis Yayıncılık, İstanbul, 2014.

Said, Edward: *Oryantalizm -Sömürgeciliğin Keşif Kolu-*, ç. 2., wer. Selahattin Ayaz, Pınar Yayınları, İstanbul, 1989.

Said, Edward: *Oryantalizm -Sömürgeciliğin Keşif Kolu-*, ç. 4., wer. Nezih Uzel, İrfan Yayıncılık, İstanbul, 1998.

Samî, Şemseddîn: *Qamûsul-‘Alam*, c. 5, İstanbul, 1896.

Samur, Aziz: *Destana Zembîlfiroş û Gulxatunê*, Nûbihar, Stenbol, 2015.

Şemo, Erebe: *Dimdim*, Lîs, Amed, 2007.

Şemo, Erebe: *Dimdim*, Yêrîvan, 1966.

Şimşir, Bilal N: *Kürtçülük (1787-1923)*, ç. 2., Bilgi Yayınevi, Ankara, 2007.

Şucaî, Behroz: “Zimanê Partî”, *Kurmançî*, j. 28, Parîs, Çile 2001.

Tan, Samî: *Rêzimana Kurmancî*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, ç. 2., Stenbol, 2011.

Tavernier, Jean-Baptiste: *Les Six Voyages de J. B. T. Etc., en Tirquie, en Perse, et aux Indes*, Ist ed., Paris, 1677.

Tavernier, Jean-Baptiste: *Tevarnier Seyahatnamesi*, Editör: Stefanos Yerasimos, wer. Teoman Tunçdoğan, Kitap Yayınevi, İstanbul, 2006.

Tavernier, Jean-Baptiste: *The Six Voyages of J. B. T. La Haye, Through Turkey Into Persia, and the East Indies*, 1677.

Tuğrul, Abdülmecit: *Batı'da Kürdoloji Çalışmaları ve Kurumları*, Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, İstanbul Üniversitesi, İstanbul, 2010.

Uzun, Mehmet: *Kürt Edebiyatına Giriş*, ç. 1., Belge, İstanbul, 1999.

Vasîlyêva, E. Î: "Pirtûka Wenda ya Dîroka Kurdîstanê", *Almanaxa Kurdî*, Weşanên Roja Nû, 1997.

Wallin, George August: *Georg August Wallins Reseanteckningar Från Orienten Åren 1843-1849*.

Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, amd. Huseyn Şemrexî, Nûbihar, Stenbol, 2010.

Xanî, Ehmedê: *Nûbihara Biçûkan*, Şîrovekirin: Huseyn Şemrexî, Nûbihar, Stenbol, 2008.

Xasî, Ehmedê: *Mewlidê Kirdî*, Amadekar û Tadayîş: Roşan Lezgîn, Nûbihar, Stenbol, 2013.

Xelikan, Îbn: *Siltan Selaheddînê Eyyûbî*, ji erebî wer. M. Emîn Narozi, Avesta, Stenbol, 2008.

Xeznedar, Marûf: *Destûrî Zimanî 'Erebî be Kurdî*, Elî Teremaxî, Çapxana Dar el-Zeman, Bexda, 1971.

Yıldırım, Kadri - Pertev, Ramazan - Aslan, Mustafa: *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, İstanbul, 2013.

Yılmaz, Hüseyin: *Camilerin Eğitim Fonksiyonu*, Dem Yayınları, İstanbul, 2013.

Yücel, Müslüm: *Berdel Evlilik İttifakı*, Agora Kitaplığı, İstanbul, 2008.

Yüksel, Metin: *Kurdolojî û Malbata Celîlan*, Avesta, Stenbol, 2014.

Zaremba, Felician Martin von: “*Reise des Missionars Zaremba in die Russisch-türkische Provinzen am Euphrat*”, vom April bis Juli 1830; Magazin für die neueste Geschichte der evangelischen Mission – und Bibel.

Zinar, Zeynelabidîn: *Nimûne ji Gencîneya Çanda Qedexkirî*, Stockholm, 1991.

Zinar, Zeynelabidîn: *Xwendina Medreseyê*, Pêncinar, Stockholm, 1993.

Znatowicz, E: *Księga Spiwakow*, “Tygodnik Ilustrowany” j. 336, 1889.


Zozanî, Wisif: “Alfabeya kurdan a herî kevn”, wer. Newzad Emînoglu - Mihemed Jiyan, *Nûbihar*, j. 110, Stenbol, 2010.

ÇAVKANIYÊN JI ÎNTERNETÊ

- Arşîva Kurdolojiyê ya Aleksander Jaba li Mêrdînê ye <http://www.aa.com.tr/kk/s/287617--arsiva-kurdolojiye-ya-aleksander-jaba-li-merdine-ye> (13.02.2014)
- Avcî, Ziya: Mele Mehmûdê Bazidî, <http://www.kovarabir.com/mele-mehmude-bazidi-1799-1867> (10.05.2013)
- Berezin, Il'ya Nikolaevich (1818-96): <http://www.iranicaonline.org/articles/berezin-ilya-nikolaevich> (04.09.2014)
- Coletti, Alessandro (1928-1985): <http://www.iranicaonline.org/articles/coletti-alessandro> (07.04.2015)
- Dittel, V: Biblioteka dlya çteniya “Kurdi: İz Neizd Putevih zapisok 1846 goda” (Kurd: Notên Neweşandî Yên Gera 1846an), 1853, c. 119, beş 7. <http://www.ajansafirat.com/news/guncel/19-yuzyylda-rus-basynynda-kurtler-anjelika-pobedonosteva-kaya.htm> (26.01.2015)
- Evro festîvala Mela Mehmûdê Bayezîdî li Dihokê dest pê kir <http://www.kulturname.com/?p=549> (25.05.2015)

- Kurdish Language, II. History of Kurdish Studies
<http://www.iranicaonline.org/articles/kurdish-language-ii-history-of-kurdish-studies> (07.09.2014)
- Paradowska, Maria: “Destnivîseka Kurdî ji Koleksiyonên August Kościesz Jabayî û Girîngiya Wê bo Etnografiya Polonî”, ji polonî wer. Sidqî Hirorî
<http://www.kulturname.com/?p=10321> (10.04.2015)
- Prbedonostseva, Anjelika: 19. yüzyılda Rus basınında Kürtler
<http://www.ajansafirat.com/news/guncel/19-yuzyylda-rus-basynynda-kurtler-anjelika-pobedonosteva-kaya.htm> (26.01.2015)
- Reşîd, Tosinê: “Stêrkeke Geş Li Esmanên Kurdnasiyê; Margarîte Rûdenko”,
<http://www.kovarabir.com/2015/11/tosine-resid-sterkeke-ges-li-esmanen-kurdnasiye-margarita-rudenko/> (13.11.2015)
- Xelîl, Têmûrê: “Elfabeya pêşin, romana pêşin û romannivîsê pêşin”,
http://www.nefel.com/articles/article_detail.asp?RubricNr=2&ArticleNr=4399#.VAr9pPl_vIU (06.09.2014)

1. Destxeta li Petersburgê ya bi jimara (Kurd 34)*



(Rûpela ewil ya destxeta Mela Mehmûdê Bazîdî)

* Temînkirina nusxeya muelîf bi xwe ya li Petersburgê bi saya Mamoste Hayrullah Acar û Mamoste Abdurrahman Adak mimkûn bû, mala wan ava be.

عادات و رسوم تامة الكردية

بسم الله الرحمن الرحيم (وبه الفتية)

الحمد لله رب العالمين • والصلاة على محمد وآله اجمعين **اما بعد**

babitin - bouin

مردی جنابد طالب و ناظران بیستی کواقی طوابقد اکرادان

ber - desait

ز طوابقد اکرابید بدوی بد برین کوزمانه ما ضمیمه داروان

طوابقد اکرابان مفدارک جدابونیه وبقان کنارانزابه عمال

hatine in hatin

والاطفال هانده و هو قبده یس بونه و بری لسانه وان نری نری

bouné - bouin

زمانه بحیه بونه و باب طایفه بونه حتی وی زمانه لفظ کوردستانه

tou troupe

تونه بویه پشی و کوهانده فان اطرابند خاله دسینوریداران و

ne bouye

il n'y

avait pas

ایجاری

(Rûpela duduyan ya destxeta Mela Mehmûdê Bazîdî)

istirk Etale

المعزبه الموان استرکان من دکن و شقان انضبا

بکنه اولاسترکان دکنه و بریان و اهلانہ

دزاین و بدرتینی و ژ سیردان

استرکان مندا یونیا برف

و بارانہ فہم

دکنہ

disfikirin,
fikirin re-
garder, b-
des ver

bedestirin
bis. desanin

et d'après leur
mouvement ils
recommencent
la plume et la
reig...

(Rûpela dawiye ya destxeta Mela Mehmûde Bazîdî)

2. Destxeta li Petersburgê ya bi jimara (Kurd 35)

1 عادات و رسوماتنامہ
اکرادیہ

2

(Rûpela ewil ya destxeta Şah Nezer)

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ الْحَمْدُ لِلّٰهِ رَبِّ الْعَالَمِیْنَ ۥ وَ الصَّلَاةُ ۥ ۱۵
عَلٰی مُحَمَّدٍ وَ اٰلِهِ اَجْمَعِیْنَ .

اما بعد معلومی جنابد طالب و ناظران بیتن کواش
طویفد اکرادان ژ طویفد اعرابید بدوی ید برینه کو زمانی
ماضیه دا ژ وان طایفید اعرابان مقدارک جدا بوینه و بقان
کنارندا به عیال و اطفال هاتی نه . و هو قبیله یک بو نه .
و بری لسانی وانی ژری بالعموم زمانی عربی بو نه . و یک
طایفه بو نه . حتی وی زمانی لفظا کوردستان تونه بو یه . پاشی
و کو هاتی نه قان اطرافید خالی و سینورید ایران و
خوره سانی ۥ او مروئید هاتی مثلا چندین البتّه هر یکی ۲۵
نافک هیه حیدر مثلا نافی یکی بو یه هر چی ژ اولادید

(Rûpela duduyan ya destxeta Şah Nezer)

اولاسترکان دڤکرین و زیان و اطرافان دزان و
بدرتینن. و ژ سیرا وان استرکان مثلا بوینا برف
و بارانی فهم دکن.

(Rûpela dawiyê ya destxeta Şah Nezer)



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**MOLLA MEHMÛDÊ BAZÎDÎ’NİN ‘ADAT Û
RUSÛMATNAME’Ê TEWAYIFÊ EKRADIYE ADLI RİSALESİ
(İnceleme ve Metin)**

Murat ÇELİK
12711008

Tez Danışmanı
Yrd. Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin 2015